


SÎYAH PÛŞ

SEYFULMULUK



S Î Y A H P Û Ş

SEYFULMULUK

(dastan)

CELÎLÊ CELÎL
ji bona çapê amade kir,
pêşgotin, berhevdan û peyvîz nivîsand



ISBN 3-926522-21-6

Herausgeber:

-Verein zur Erforschung und Förderung der
kurdischen Sprache, Kultur und Geschichte (Wien)
-Institut für Kurdologie - Wien

SÎYAHPÛŞ
SEYFULMULUK
(Dastan)
Wien - 2000

Celîlê CELÎL
Ji bona çapê amade kir, pêşgotin, berhevdan
û peyvrêz nivîsî

Wêneyê bergê: nîgarkêş MALVA
(Omer Hemdî Amûdî)

Rêzkirina ser kompyûterê: Nara CELÎL

©Jalile Jalil

VORWORT

Die internationale Forschung schenkte der klassischen Literatur der Kurden in den letzten Jahren verstärkte Aufmerksamkeit, was sich auch in verbesserten Publikationen niederschlug. In Wien steht das Studium kurdischer Handschriften im Vordergrund, als Beitrag für eine vertiefte Kenntnis des Überlieferungsbestandes, wodurch kritische Ausgaben, die modernen Maßstäben entsprechen, ermöglicht werden sollen. Mit der Aufarbeitung des - weithin unterschätzen - literarischen Erbes der kurdischen Kultur hoffen wir, ein einigendes and für die vielen kurdischen Gruppen und Gruppierungen anbieten zu können, damit der steinige Weg zur einen, für alle verbindlichen Nation erfolgreicher als in der Vergangenheit beschrritten werden kann.

Mit öffentlichen und privaten Mitteln wird in Wien ein Katalog aller erreichbaren kurdischen Handschriften (in aller Welt) erarbeitet, zunächst primär als Projekt des Fonds zur Förderung der wissenschaftlichen Forschung (P 09895-SPR und P 11330-SPR), dann auch mit Unterstützung des Bundesministeriums für Wissenschaft und Verkehr bzw. für Bildung, Wissenschaft und Kultur, des Magistrats der Stadt Wien (Referat Wissenschafts- und Forschungsförderung), des Helmut Zilk-Fonds und des Vereins zur Erforschung und Förderung der kurdischen Sprache, Kultur und Geschichte. Erfreulicherweise konnten auch in Wien wichtige Handschriften entdeckt werden, wie etwa zu „Mam und Zin“, „Ahmadiye“ und „Sharaf Name“.

Im Zuge dieser Arbeiten stieß Prof. Jalil auch auf einen bis heute wenig bekannten kurdischen Dichter, Siyapush und dessen kostbares Werk „Seyfulmuluk“. Siyapush ist das Pseudonym des kurdischen Klassikers Mohammad Javad, der an der Wende vom 18. Zum 19. Jahrhundert lebte. Während über seinen Geburtsort nur Vermutungen existieren, wissen wir sicher, dass er einige Zeit im Iran verbrachte und später nach Bagdad zog, wo er auch obiges Poem schuf. In seinem Werk deutet er starke Gefühle des Heimwehs an, fühlte sich aber infolge einer unglücklichen Liebe in die Ferne getrieben.

Siyapush ließ sich für sein Werk von einer Erzählung der arabischen Märchensammlung „Tausend und eine Nacht“ inspirieren. Das Poem

erzählt vom ägyptischen Prinzen Seyfulmuluk, der sich in ein Mädchenbild verliebte, das in einen wertvollen Teppich eingewoben war. Nach dem sich Seyfulmuluks Vater erfolglos bemüht hatte, die Heimat dieses Mädchens zu eruieren, machte sich der Prinz selbst auf den Weg, in Begleitung seines Freundes Sedelmuluk. Natürlich bringt die lange Reise durch viele Länder eine Fülle von Gefahren und Schwierigkeiten. Endlich findet Seyfulmuluk das Mädchen, die Tochter des Königs von Engels. Die Eltern sind beeindruckt von der großen Liebe Seyfulmuluks zu ihrem Kind, aber auch von seiner tiefen Kenntnis der Wissenschaften und Künste, von seiner poetischen Begabung und erst recht von seinem männlichen Charakter. So stimmen sie zu, dass ihre Tochter, Badia al Jamal, mit dem Prinzen in dessen Heimat zieht.

Der Dichter schrieb das Poem in lyrischer Stimmung. Besondere Aufmerksamkeit widmet er der Darstellung der verzweifelten Sehnsucht des Prinzen, der Tag und Nacht Tränen vergoss und sich in Trauergesängen verzehrte.

Jalile Jalil hat dieses Werk für die *editio princeps* vorbereitet, wobei er sich auf vier Handschriften aus London, Kurdistan und Istanbul stützen konnte (die zweite Istanbul Handschrift war allerdings eine neuere Kopie). Auf dieser Grundlage war es möglich, das Gedicht in seinem vollen Umfang zu rekonstruieren, sodass es heute zu den längsten der kurdischen Klassik zählt. Im Vorwort setzt sich der Herausgeber mit der Biographie des Autors auseinander, versucht eine Würdigung des literarischen Wertes und erläutert die Editionsprinzipien. Der Text selbst wird in lateinischer und arabisch-persischer Schrift geboten. Der für die weitere philologische Arbeit wichtige *apparatus criticus* findet sich am Ende des Textes. Auch die Auflistung archaischer und nicht-kurdischer Wörter des Textes wird der kurdologisch interessierte Leser zu schätzen wissen.

Die Publikation dieses Poems in der Originalsprache bedeutet eine Bereicherung der klassischen Literatur der Kurden und eröffnet somit den Weg für die Übersetzung in andere Sprachen.

Wien, im Juni 2000

Werner Seibt

P ê ş g o t i n

Lîteratûra kurdaye klasîk di rojên meda: li dawya sedsaliya XX û destpêka sedsaliya XXI derbazî li ser jîyandariya nû bûye. Îro dastan û dîwanên hilbestvanên kurd ji destnîsên kevn û pizînî, ji hev ketî û ji tozê gewrbûyî bi destê rewşenbîrên kurd yê n xemxur û zanyar jîyana nû distînin, têne bergirtin, dikevin ber çapê, dibin pirtûk û ji bona sedan sala dimînin wek milk û dewlemendiya çanda gel.

Hilbestên Elî Herîrî, Melayê Cizîrî, Feqîyê Teyra, Ehmedê Xanî û yê n mayîn li ser tîpên erebî, latînî û kirîlî ne bi carekê, lê belê gelek caran çap bûne. Hinekê ji wana hatine wergerandin li ser zimanên gelên cînar û yewropî.¹

Îro ji bona çapkirina sêwrandinên hilbestvanên kurd li Kurdistanê, li Yêvropayê û li Rûsyayê rîya berfire vebûye. Di ancamêda li ser masa xwandevana bi dehan dîwan û dastanên klasîkên me hatine danîn.² Xemxurî himberî kelepûra pêşîyan alîkariyê dike, ku navê hilbestvanên heta naka nenaskirî, nivîsarên wana derên holê û goveka lîteratûra kurdaye kevnedîrok dewlemend û diha bi xeml û rewş bibe.

Yek ji wan hilbestvana, ku navê wî nû tê naskirin Sîyahpûşe, hunermendek, ku bi hunera xweye hilbestvanîyê steyrkeke ronake di goveka lîteratûra kurdaye berfireda.

Navê Sîyahpûş heta naka ji rewşenbîrên kurdara him nas bû û him jî nenas bû. Nas bû, ji ber ku navê wî di hine pirtûk û wûtarada, rex rêznavê hilbestvanên klasîkên kurda carna dihate biranîn.³ Ne nas bû, ji ber ku heta vê paşwextiyê ji hilbestekê, yan jî ji xezeleke wî zêdetir tu tişt ji xwandevanên kurda nas nebû, îşaretek û zanistîke berfire li ser jîyana wî û hozanvaniya wî li destê rewşenbîrên kurda tunebû.

Vê paşwextiyê li ser Sîyahpûş bi çelengî tê behs kirin. Dastana wîye mezin bi navê „Seyfulmuluk“ hiltînin ser zar. Ew bi destnivîs derketiye holê û hê çap nebûye. Çavpêketina pêşin bi vê dastanêra bandûreke xuya li ser zanyara hişt. Balkêşîya mezin, ku dastan li bal xwandevana pêşda anî, bû rêber û bingeh, ku zanyar û pisporên lîteratûra kurda Ebdurreqîb Yusif, Ebdurrehman Mizûrî, Reşo Zîlan, Enwerî Sultanî û yê n mayîn bi wûtarên taybetî li ser Sîyahpûş di kovar û rojnameyên kurdîda pêşda bèn, mînakan ji hilbestên wî çap bikin.⁴ Bi taybetîya zanîyariyê li ser Sîyahpûş û li ser dastana wî „Seyfulmuluk“ cara pêşin sala 1991-ê Reşo Zîlan li ser rûpela kovara „Bergeh“ bi wûtareke giranbaha bi sernivîsa „Hilbestvanê kurd Sîyahpûşê nemir û

destnivîsarek“, pêşda hat.⁵ Reşo Zilan wûtara xwe li ser destnivîseke nû ya vê dastanê ava kiribû.

Di bergeha nirxandina lîtêratûra kurdaye klasîkda Înstîtûta kurd ya Stambolê karekî hêja dimeşîne. Tevî civandina destnivîsên giranbaha, karkerên înstîtûtê bi alîkariya zanayên lîtêratûra kurda, dest bi çapkirina van cewahira kirine. Berhemê wî karî îdi berçavane.⁶ Pîrozbayîke wî karî çapkirina pirtûka „Çend xezel û helbest“-ên Sîyahpûşe.⁷ Di vê pirtûkêda xezelên Sîyahpûş, çend hilbestên wî û du-sê parçeyên biçûk ji dastanê cî girtine.

Ji wûtarên Ebdurreqîb Yûsuf, Reşo Zilan û pirtûka Înstîtûta kurdî ya Stambolê tê femkirin, ku li ber destê van nivîsarvana mînakên destnivîsên dastana Sîyahpûş hebûne.

Van salên dawîyê çar mînakên (kopîyên) destnivîsa dastana Sîyahpûş ketin destê min. Berhevdana van destnivîsa ber min rê vekir, ku karibim dastana „Seyfulmuluk“ ji bona çapkirinê kamil û zêndî bikim.

Destnivîsa pêşin li sala 1992-a li Stambolê kete destê min. Ew destnivîs milkê camêrê hêja Mela Ehmed bû. Balkêşîya ziman û navaroka dastanê ji minra awqas mezin bû, ku min destxweda, hê li Stambolê, dest bi xwandin û veğerandina wê li ser tîpên latînî kir. Xudanê destnivîsê Mela Ehmed ji ber dijwariya xwandina hine parçê nivîsarê yên kevnbûyî, alîkarê min bû, ku ez wî karî bi rûspîfî cî binim. Di nava bîst rojanda min xwandin û nivîsandina vê destnivîsê ya destê pêşin serhevda anî. (Ji virhada: destnivîsa A)

Hema li wê salê, bi vexwandina hine hevala, ez bi mêvanî çûm Kurdistanê bakur. Xîyala min ew bû, ku li ser rîya xwe herim seredana gundê Qizilqulê (li qeza Dîgorê, ser wilayeta Qersê), gundê ku bavê min lê hatibû dinê û zarotîya xwe li wir derbaz kiribû, bibînim. Li ser rîya xwe berbi bajarê Patnosê, navenda qeza wilayeta Agrîyê, bi pirs-pirsyara min destnivîseke dastana Sîyahpûşe nû jî dît. Ew destnivîs milkê şêxê qeza Dûtaxê bû. (Ji virhada: destnivîsa C)

Pîştî veğerê, li Stambolê hêja Feqî Husêyîn ji minra got, ku ewî li Titwanê destnivîseke „Seyfulmuluke“ kevn daye dastê xweşnivîsekî kurd û wî jêra ber girtye. Mînaka vê destnivîsa nû Feqî Husêyîn bi dilxweşî da min. (Ji virhada: destnivîsa B)

Gava ez veğeryam Yêvropayê pêhesyam, ku destnivîseke „Seyfulmuluk“-ê li bîbliotêka Bîrîtanîyayê (li Londonê) tê parastin. Kopîya vê Destnivîsê bi alîkariya hêja Enwerî Sultanî gihîşte destê min. (Ji virhada: destnivîsa D)

Demek, ber destê min çar destnivîsê vê dastanê hebûn. Her destnivîseke dastanêda kêmanîyê cûrbicûr hebûn: yan rûpel jê kêmbûn, yan rûpel qelişibûn, rexên belga şewitîbûn û h.w. Dastan bi giştî hewceyî berhevdana zanyariyê bû, ku ji wan herçar mînaka mînakeke

tam jê derketa. Ev herçar destnivîs bûn bingeh, ku ez karibim têksta „Seyfulmuluk“ bi şert û şirûtên zanyariyê kamil bikim.

Di vî karîda ji minra xuya bû, ku bingeha herçar destnivîsa yeke, destnivîseke û têda guhastinên mezin cî negirtine. Cudatî ku di navbera van destnivîsanda hebû min yek bi yek îşaret kir û lîsta wê di para berhevdanêda, pey têksta dastanê, cîwar kirye. Ji hev dûrketin di nava van destnivîsada çend rengin: kurtkirina mîkanîkî, undakirina rûpela, peyvguhastin, cudatîya şewê nivîsara peyva, cîguhastina peyva û beyta û h.w.

Ji bona çapkirinê min destnivîsa A bingeh girtye, ji ber ku ew di nava herçar destnivîsada ya here kamil û kevne.

x x x

Kîye Sîyahpûş û em li ser jîyana wî çi zanin?

Wûtarên ku li ser Sîyahpûş hatine nivîsandin di bingeha xweda hev dubare dikin û tişteki giring ser jîyana wî zêde nakin. Ji van wûtara tê naskirin, ku navê Sîyahpûş Muhemmed bûye. Li ser vê em îşaret dastanêda dibînin. Sîyahpûş dibêje:

Îlahî tu mukemmel kî, îlahî,
Îman û sidqê min sahib gunahî.

Big'efrînî gunehanê Sîyahpûş,
Ji camê muhbetê key mest û medhoş.

Munewwer key bi rehmet ya mûmeced,
Ji nûrê merifet qelbê Muhemmed.

(Beytên Nr. 502-504)

Dîsa, ji beytekê em pêdihesin, ku pêşiyê ew li Îranê jîye, lê paşê welatê xwe terikandîye û hatye Bexdayê:

Me xar camek şeraba xoş bi destê saqiyê mehweş,
Wekî min hişt-û Îran û berê xwe da bi Beg'dayê.

(Beyta Nr. 476)

Wek tê femkirin, ew pey koçkirinê ji jîyana xwe razî nîbûye. Kesera welêt timê di dilê wîda wek agir gur bûye. Çima Sîyahpûş welatê xwe berdaye çûye xerîbyê? Bersiva vê pirsê em dîsa ji navaroka dastana „Seyfulmuluk“-ê pêdihesin. Em serwaxt dibin, ku ji ber evîna dîlberekê, dîlbera ku ji ber hine sedema jêra nebûye qîsmet, ew mecbûr bûye rîya xerîbyê bide ber xwe û bê Beg'dayê. Çima evîna wî jêra nebûye qîsmet? Em serwext dibin ji halê wîye sosîal-aboriyê. Xuyaye Sîyahpûş li aliyê mal-milk û hebûnê merikî hejar û belengaz bûye. Gele cara ew di dastanêda wek himberîhevkirin dibêje, ku xelqê hejar û belengaz mîna wî bûne:

Bi emrê şah li paşan tas û fincan,
Gerandin saqîyan ser dest û pancan.

Ji ewwelda vexwar şah û emîran,
Heta dor hate me jar û feqîran.

(Beytên Nr. 2750-2751)

Bêşik, ji ber vê tunebûnê ew negihîştîye mirazê xwe û xem di dilda ji welatê xwe dûr ketîye.

Sîyahpûş - nasnavê hilbestvane. Nasnavê wî eşkere dike, ku xweyê wî xwe bi reş poşandîye, kincê reş berkiryê. Di tradîsyona hilbestvanên kurdada kêr nînin mînakên usa, gava hilbestvan xênji navê xwe, ji xwera nasnav hildane navên cî warê ku tê jîyane, yan jî ser navê xwe navê eşîra xwe zêde kirine, wek Elî Herîrî, Ehmedê Xanî, Melayê Cizîrî û yên mayîn, yan jî navên usa li ser xwe danîne, ku ewan nasnava hal û rewşa jîyana wana dane xuyakirin, wek Suadî, Hejar, Bêkes, Cegerxwîn û yên mayîn. Navê Sîyahpûş belû dike, ku xudanê wî navî merivekî xemgîn û dilkovan bûye, ji halê xwe nerazî û birîndar bûye. Reş berkirin, reşpoşîn di nava kurdada rengê şînê, rengê xema giran dide xuyakirin. Sîyahpûş bi xwe alî me dike, ku bawarya me li ser vê gotinê hebe:

Camê işqê ez kirim mest û xerab,
Lew Sîyahpûş bûme manendê g'urab.

(Beyta Nr. 1023)

Ji ber çî hilbestvan nasnavê xwe Sîyahpûş danîye? Ser vê pirsê di nava gelda lêgênd bi galegal geryane. Ser van lêgênda Mîr Celadet Bedîrxan bala xwe daye û di berevoka „Klasîkên me“-da, mîr bin navê Herekol Ezîzan, li ser du lêgêndên balkêş qal dike. Dinivîse: „Dibêjin leqeba Sîyahpûş pêva bûye ji ber ko hewranîkî reş bi xweva dikir“. Lêgênda duda ku zêde aqilê Mîr Celadet jê bîrîye, eve: „Dibêjin, ku ew [Sîyahpûş-C.C.] dil berdide keça malmezînekî. Lê bavê keçikê naxwaze keça xwe bide wî. Bi serda jî welatê xwe ji wîra qedexe dike. Li ser vê yekê ew yekcar dibe sewdaser. Hew dikare tehemûlî dîrîya ji dîlbera xwe bike. Rojekê, da ku bîskêkê jî be dîlbera xwe ji dîrva bibîne, bi dizîka têt û xwe di nava zevîyên nêzîkî mala dîlbera xweda vedişêre. Ji tîrsa ku bête dîtinê, xwarin vexwarinê nahizîre, wîsan xwe bi rojan têda vedişêre. Heya ku rojekê ji tî û birçîna bêhiş dikeve. Zemanekî dirêj di serra derbaz dibe. Rojekê siwarek reşahîyekê di nav zevyanda dibîne. Xwe nêzîkî wê reşahîyê dike, dibîne ku miroveke. Dest davêje ebaya wî, çî bibîne, ji qirêj û rêvînê ew reş bûye, bûye fena qîrê. Siwar alî wî dike, xwarin û vexwarinê didê, hişê wî tîne sêrî. Bi çîroka wî dihese... Li ser vê yekê liqabê wî dimîne „Sîyahpûş“, ango, yê ku reş li xwe poşîye, kincê reş li xwe kirye“.⁸

Ev herdu lêgênd girîngin, ji ber ku ew nîşan didin: yek, ku navê hilbestvan di nava gelda naskirî bûye û ya duda, ku evîna bêmiraz bûye bingeha xemgîriya wî û hilgirtina vî nasnavî li ser xwe.

Di dastana xweda Sîyahpûş dîsa vedigere li ser nasnava xwe. Di xezelekêda gava ew xemgînîya xwe eşkere dike, dibêje: „Camê firaq ez kirim ser ta be pê Sîyahpûş.“ (Beyta Nr. 1962).

Sîyahpûş ji jîyana xwe razî nebûye. Di xerîbîyêda hejarî û belengazî rêberê wî bûne. Ji ber vê hilbestvan dinya bêbext û xayîn gunehbar dike. Ew ji dinyayê nerazîye, ji ber ku hemû kes jêra qelç û nemam derketin, lewra ew dibêje ku dinya pûç û derewîne:

Ku aqîbet mirin bî, ey Sîyahpûş,
Eger ehmeq nebî nabî tu dilxoş,

Bi vê dunyâê dînî, qehbe û pîr,
Necis û pîs û sewda şubhetê qîr.

(Beytên Nr. 1641-1642)

Kîjane welatê Sîyahpûş, li ku hatye dinê û zarotîya xwe lê derbas kirye? Ser vê yekê bingehêkî xuya, çavkanîk, ku ji mera rastîyê bêje, li ber destê me tune. Gotinên zanyara û axaftinên di nava gelda li ser vê pîrsê bi hev nagrin. Ebdurreqîb Yûsuf û Reşo Zîlan ji melle û zanyarên olê bihîstine, ku Sîyahpûş xelqê Silîvanê (Ferqînê) bûye, ji herêma Narêkê. Ji ber vê jî, gorî bihîstina Reşo Zîlan, melle jêra gotine Sîyahpûşê Silîvî.⁹ Mamûsta Cegerxwîn, bi şedetya Reşo Zîlan, welatê Sîyahpûş Hekkarî hesab kirye. Ser bingeha lêkolîna çavkanîya dîrokî li ser devera Hekkarîyê û taybetîya ziman-zarava dastanê, Reşo Zîlan tê li ser wê bawarîyê, wekî gotina mamûste Cegerxun ji bona rast bê naskirin, çavkanî lazimin.¹⁰ Zanyar lêkolînavanên alman Yêvgênî Prûm û Albêrt Sotsîn sedpêncî sal berê dîtineke nû li ser welatê Sîyahpûş nivîsîne. Wana ji devê xelqê Kurdistanê bihîstine, ku Sîyahpûş xelqê Amêdîyê bûye.¹¹

Ser bingeha van malumatîya em çar deverên ji hev dîr, ku ew bûne cî-warê Sîyahpûş, dibînin: Ferqîn, Hekkarî, Amêdîyê û Îran. Bi berhevdana van gotina dikarin bîn ser bawerîkê. Sîyahpûş li dastanêda wek nasnaveke nû tine ser ziman, ji xwera dibêje *Îranî*. (Beyta Nr. 703)

Li beytekî dinê, wek me jorê jî got, Sîyahpûş dibê ku wî Îran hiştîye û hatye Bexdayê. Em dibînin, ku Îran di jîyana hilbestvanda walatekî xerîb nîbûye. Baş zanîna zimanê farisî şedetîya wê yekê dide, ku ew yan xelqê Îranê bûye, yan jî demeke dirêj li wê maye. Ji ber kurmancîya wî ya delal dîr nîne, ku ew ji herêma Îranêye bakûr-rojavayê, ji der-dora Êrmyayê bûye. Herêma zaravê kurmancî li Îranê bi giştî dikeve li jorî Êrmyayê, ji aliyê Turkyayê nêzîkî herêma Serhedêye. Em zanin, ku di vê herêmêda bajarê Bazîdê û dorana wî di jîyana kurdaye kûltûr-zanyarîyêda dewreke mezin listine. Ehmedê Xanî û peyhatîyên wî ji vê herêmê bûne.

Li nîveka sedsalîya XIX rewşenbîrên kurda: şayîr û zanayên vê herêmê bi konsûlê rûsa, Aleksandr Jabara di peywendîya rewşenbîryêda bûne û ewana tevayî xizmeteke mezin ji bona çanda kurdî kirine. Bi deha destnîvisên kurdî civandîne û dane destê konsûl. Di dema civandîna destnîvisên hilbestvanên kurda yê kevn nivîsarên Sîyahpûş, bi taybetî dastana wî, berçava neketine û navê wî jî nehatye bîranîn. Dêmek, rewşenbîrên kurda yê herêma Bazîdê bi navê Sîyahpûş û nivîsarên wî nas nîbûne. Gelo çima?

Divê em qebûl bikin, ku Sîyahpûş di xortanîya xweda ji welatê xwe dûr ketiye. Dîroka evîndarîya wî ji salên xortanyê destpê dibe. Hilbestvan dibêje:

Çira îşqê şebabî pîrr şewate,
Dilê îşq tê nebi ew dil mewate.

(Beyta Nr. 805)

Dêmek dûrî rastîyê nîne, ku ew di xortanîya xweda hunera xwe ya hilbestwanîyê hê dîhar nekiribû, wek hilbestvanekî hêja nava xelqêda nehatibû naskirin. Gotineke kurda heye: „Meriv ji êşa dilê xwe dibe dengbêj“. Bi bawarîya min Sîyahpûş li xerîbyê, dûrî qewm û pismamên xwe, dûrî evîna xwe, bê mal û milk, rîya hilbestwanîyê daye ber xwe, her tenê li ser evîna dilê xwe straye, hilbest hûnandine.

Ta kengê Sîyahpûş tu di medhêda bibêjî,
Şoxî-yû ter û nazikî, horî û cemalê.

(Beyta Nr. 389)

Çend parçê hilbestên Sîyahpûş, ku gihîştine destê me, didin xuyakirin ku Sîyahpûş bi kurdî her tenê li ser evîndarîyê nivîsiye. Hilbestvan straye evîna xwe, straye bona xwe. Ji ber vê jî hilbestên wî hahanga nehatine naskirin. Wekî hunera wî xewle nemîne, ji bona xwe bergeha fire veke, Sîyahpûş çîroka Seyfulmuluk ji xwera kirye bingeha dastanê û evîndarîya xwe, hemû derd û kulê xwe bi zarê Seyfulmuluk êşkere kirine.

Behdînan herêma pêşin bû Sîyahpûşra, ku zimanê wî, kurmancîya wî, ji xelqê vê herêmêra xerîb nîbû. Dema ku Sîyahpûş jîye û sêwirandîye bajarê Amêdîyê - paytexta emîrên Behdînanê, di meydana huner û zanariyêda gelekî pêş bû, nirxa hozanvanîyê û hilbestvanîyê li wir berz bû. Dibe ku Sîyahpûş dem-dem ji Beg'dayê çûye Amêdîyê û xelqê Behdînanê bi hunera nivîsandîna xwe daye nasandin. Behdînan timê ser durîyana jîyana Kurdistanê bûye. Bûyarên çandî û dîrokî hêsa û zûbizû ji Behdînanê gihîştine Cizîra Bota, Dîyarbekirê û bela bûne. Silîvan dûrî ji van herêman nîbû. Bi raya min, şertên dîrokî bûne bingeh, ku Sîyahpûş li Serhedê heta nîveka sedsalîya XIX nehatibû naskirin.

Li ser dema ku Sîyahpûş jîye û hilbestên xwe nivîsîne, hine zanarî dest meda hene. Ji çavkanîyên erebî tê zanîn ku li sedsalîya XIX, di nîvêka pêşinda li Beg'dayê hilbestvanek bi nasnavê Sîyahpûş hebûye û navê wî Muhemmed Cewad bûye. Sala mirina wî sala 1247 Hicrîye

(sala 1831-32 bi hesabê xaçparêzî).¹² Sîyahpûşê Muhemmed Cewad mêla wî li ser terîqeta Mewlana Xalid bûye û hilbestek bi zimanê erebî ser mirina Mewlana Xalid nivîsîye. Sîyahpûşê Muhemmed Cewad aya Sîyahpûşê xudanê „Seyfulmuluk“-e yan na, ji lêkolîvanên kurd tu kes bersiva vê pirsê nade. Lê belê ev melûmatîyên jorê gotî balkêşin bi çend xala. Berî pêş em bêjin, ku salên jiyana Sîyahpûşê Muhammed Cewad û ya Sîyahpûşê xudanê dastana „Seyfulmuluk“-ê ji hev dîr nînin. Nêzikî aqila nîne, ku di demekêda li bajarekê du hilbestvan ser nasnavêkê hebin.

Dîroka nivîsandina dastana xwe Sîyahpûş bi hesabê abcedê daye xuyakirin. Reşo Zîlan bi çend rêkên hesabkirina ebcêdê cêribandye û dîroka sala 1200 Hicrî jê derxistye. Wek ew dibêje „...derûdora salên 1800-ê zayîni“ nêzikî rastyêye, ku Sîyahpûş dasatana xwe nivîsbe.¹³ Hesaba ebcêdê li ser beytên Nr. 452-454 avakirye. Pirtûka ku Înstîtûta kurd ya Stambolê çapkirye ji van beyta sala 1205 H. (1790-91 bi saljimêra xaçparêzîyê) derdixe.¹⁴ Beytên ebcêdê evin:

Qelemkêşa ji lewhêk safê ez sîm,
Elîf û bê û tê, heta ku bê cîm.

Bi avê zêrr nivîsî xetê kûffî,
Temam ebcêd ji ekî ta uluffî.

Muelim da bi dest wan lewhê sîmîn,
Bi carek elf û bê wan kirne telqîn.

Cudatîya navbera herdu jimartinên ebcêdê bi hesabê Hicrî (1200 û 1205) pênc sale (1785 û 1790 bi hesaba xaçparêzîyê). Heger wê saljimêrê em wek derûdora sala nivîsandina dastana „Seyfulmuluk“ nas bikin, dem tê dawîya sedsalîya XVIII. Eva raste. Bawarîya min heye, ku Sîyahpûş dastana xwe nivîsîye li salên, ku îdî xortanîyê ji wî bar kiribû û ahiltîyê li wî kar kiribû. Dêmek, heger em Sîyahpûşê Muhammedê Cewad nas bikin wek xudanê dastanê, sala jiyana wî û sala nivîsandina dastanê cîyê xwe digrin û em dikarin bêjin, ku Sîyahpûş xatirê xwe ji dinya ronik di dema kaltîyêda xwastye.

Îşareta salekê jî, ku alî me dike sala nivîsandina dastanê bi derûdorî rast hesab bikin, em bînin berçava. Ji *texellusa* destnivîsa A pêdihesin, ku ew di sala 1211 Hicrîda (1796-ê xaçparêzîyê) hatye bergirtin. Yanî 5-10 sal pey nivîsandina dastanê. Dûr nîne, ku Sîyahpûş hilbestên xwe bi zimanê erebî li dema ahiltîyê destpêkiribe binivîse, gava ew bi bîrûbawarîya xwe îdî nêzikî terîqeta Mewalana Xalid bû.

Dawîya sedsalîya XVIII û destpêka sedsalîya XIX, gava Sîyahpûş wek hilbestvan jîye, demeke giring bû ji bona dîroka litêratûra kurdî. Li wê demê, wek tê zanîn soranî di meydana edebyeta kurdîda bi xurffî xwe da nasandin. Hilbestvanên mezin Nalî, Kurdî, Salim û yê mayîn bi

soranî hatibûn li ser goveka edebyeta millî. Wa tê dîtîn, ku lîteratûra kurdî li ser zaravê kurmançî tradîsyonê xwe qels kiribû û çiyê xweye pêşengî hiştibû. Ev dîtîn rast nîne. Jiyandariya Sîyahpûş wek hozanvan xuya dike, ku bizava lîteratûra kurda bi zaravê kurmançî, li ser bingeha dibistana Ehmedê Xanî, hê zêndî bû.

Evîndariya Sîyahpûş pirseke taybetîye. Ji ber giringaya vê bûyarê di jîyana hilbestvanda û cîgirtina derdê evîna şayîr di dastana „Seyfulmuluk“-da hêjaye, ku meriv li ser wê zêde bisekine.

Wek jorê me got, navaroka çîroka Seyfulmuluk ji Sîyahpûşra bûye bergeh, ku karibe derdê evînê, tiştê hatye serê wî, dag'a birina dil û cegera xwe bide ber bê. Ji navê Seyfulmuluk xwexwe Sîyahpûş dinale û dizare. Ji mera vê gavê hunermendiya hilbestvanêye poyêfik balkêş nîne û ne ji zimanê dewlemend, ku wî kar anîye ji mera girînge. Ji ber vê jî em ser nasekinin. Lê belê, bîrûbawariya wî li ser evînê, kiritêriyayên moralî, ku rêberê wî bûne li salên giran, li salên xortaniyê, gava agirê evînê li dilê wî gur bû, bala me dikşîne ser xwe. Filozofîya ser evîndariyê, morala, ku di nava salada jêra rêber bûne, Sîyahpûş bi fireyî di dastanêda ber xwandevala vedike. Eşkerekirina evîndariyê ne ji hemû kesaraye. Ew baş zane, ku gotinê wî wê çêtir serwest bin kesên, ku bi xwe bi vî agirî hatine sotin, ji ber vî agirî xewna şeva unda kirine.

G'emê îşqê û zewq û lezetê îşq,
Dizanin ê vexarî şerbetê îşq.

Kesê cure'k nexwarî camê îşqê,
Heta bimirî nizanî tamê îşqê.

(Beytên Nr. 787-78)

Sîyahpûş ji vê kasa eşqê vexwarye, serxoş bûye, ji ber wê jî ew yê weke xwera şêwr û nesiheta dide. Eşqa evînê eşqa surrêye. Serpêhatiyên evînê ne ji bona galagalkirinêne. Meriv bi xwe tenê divê bi wê surrê bişewite, bi wê surrê şabe.

Hikayatên di îşqê purr dirêjin,
Emanet, surrê îşqê hûn mebejin.

Neşêtin surrê îşqê qet eyan ken,
Meger bo yarê canî hûn beyan ken.

(Beytên Nr. 789 - 790)

Di lîteratûra kurdîda wesfê evînê ji aliyê hemû klasîkada hatye dayîn. Serxoşî û evîndari lîteratûra sufistiyêda bûye uslûbeke nivîsarvaniyê, ku evîndariya rêal, ya ser rûyê zemîn, beremberî evîna berbi Xwedê bikin. Di poezîya rojhilatêda carna dijware ji hev bişkivin kîderê evîna rast xilas dibe û li ku evîna oldariyê destpê dibe. Lê belê, ji mera nasin mînakên usa, ku evîndariya rast û rêal ewqas xurt bûye, ku vê himberhevkinêda evîna ser zemîn ser olperestiyê ketye. Bîr binin mînaka Şêxê Sena'na. Şêx, sofîkî şkestî, ji ber evîna keça

xaçparêz di mala bavê wêda şivantîya beraza dike. Sîyahpûş sicûda nazdara xwe naguhêre bi hemû zêr û zegerê dinyaêva.

Şerabê saqîyan nadem bi kewser,
Sicûdê dilberan sed textê qeyser.

(Beyta Nr. 2934)

Sîyahpûş di emrê mezinda heq dide xwe biaxive ser evînê, ne li ser evîna xwe, lê li ser evînê û evîndariyê bi giştî. Ew bi çavê rêalîstî li dinyaê dinihêre. Zane ku li dinê mirin heye, jîyan ji şayê, xoşiyê û derd û girînê ava bûye. Ev herdu hisên ji hev dûr û dijî hev bi tevayî li ser rîya jîyana meriv sekinîne. Dêmek li hisa evîndariyê, xem û şayiyê, dibê meriv lê bi çavê rêalîstî mêze ke, wek bûyereke obêktîv binirxîne.

Gelî yaran nezer den halê gerdûn,
Ne mesrûr bin ji teb'ê wî, ne mehzûn.

Gehî ehwalê wî huzn û girîne,
Gehî şadî-yû kêyf û hem kenîne.

Dibînin hûn, ku dunya bêwefaye,
Ji kesra wî nihin ehd û wefaye.

Serencam dê bidet we şerbetê merg,
Heta ew terki det, hûn wê biden terk.

(Beytên 783-786)

Evîn hinekara dikene, ji hinekara derde, agirê sotinêye. Merivê bêmiraz divê barê evînê hilgire, divê bizanibe, ku rîya evînê dijwar û girane. Evîndar divê heta axir ji evîna xwera helal û amin bimîne, xayîn derneyê, li ber dijwariya ra neke. Sîyahpûş bi bawîreke mezin, wek tecrûba jîyana xwe, serborîya xwe bêje, rewşa evîndara himberî rewşa perwanayê dike. Çawa perwane aşiqê çirêye, evîndar jî divê aşiqê dilbera xwe be û li ser wê rêda bê sotin.

Aşiqê sadiq ewe ê ku di rîya dilberê,
Ger ewî binin bi ker ken, neşkinî peymanê.

Karê şem'ê her şewata muhbeta sohtinêye,
Lew disojîtin Îranî şubhetê perwaneê.

(Beytên Nr. 702-708)

Sîyahpûş navaroka dastana „Seyfulmuluk“ ji çîrokên „Hezar û yek şev“ („Elif leyle we leyle“) girtye. Ev çîrok bi navê „Seyfulmuluk û Bedîe ba-Cemale“ di nava litêratûra gelên Rohilata Nêzîk û Navînda gelekî belabûyîye. Ji sedsaliyên buhurî ew bûye bingeha nivîsarên vekirî û dastana. Bawariya me mezine li ser wê yekê, ku dastana Sîyahpûş bi zimanê kurdî, di nava hemû nivîsaranda, ku li ser vê çîrokê hatine sêwirandin, ya here mezine û bi kêş û qafîya xwe, bi hunera poyêtîk ya here bilinde. Dastan ji 3056 beyta pêk hatye. Têda 13 xezelin, muxemmesek (pêncxiştî), munacatek û çarmalîkek hene.

Navaroka dastanê bi kurtî eve. Di welatê Misirêda padşakî dilovan, adil û xêrxwaz hebû, navê wî Asim. Hemû ji fermandariya wî razibûn. Hesabê hebûna wî tunebû. Asim kal bû û kete nava xem û xîyala, ji ber ku jêra ewledekî nêrîn tunebû. Kes tunebû ku ew hebûn, text û dewlet jêra bihiştta. Ji ber vê Asim dikeve nava xemgînya giran, textê xwe berdide, xwe ji xelqê vedişêre û rojê xwe bi duakirinê derbaz dike. Daxwaza wî ewe, ku Xwedê gunehê wî bibexşîne û kurekî nêrîn bide wî. Bi emrê Xwedê Asim-şah qîza padşayê Yêmênê ji xwera tîne, dizewuce û kurek jê dibe. Navê wî datînin Seyfulmuluk. Di wê demêda ji wezîrê wîra Saliho Poşînî îbinî Hamra jî kurek dibe, navê wî jî datînin Sedelmuluk. Ev herdu zarok bi teyayî mezin dibin, teyayî hînî hemû hunera û hemû zanariya dibin. Roj û sal derbaz dibin şahzade û Sedelmuluk mezin dibin, dibin xortên ser piştta hespan. Carekê Seyfulmuluk di sinduqekêda ser berreke neqîşandî dêma keçikekê dibîne û ji bedewiya û rindiya wê serxweş û bengî dibe. Axî û zarîna dilê bengî wî zeyîf û jar dikin. Dê û bavê wî pêdihesin sedema nexweşiya wî çiyê, qasida dişînin li heraçar aliyê dinê, ku bigerin xweya wê sûretê bibînin û ji kurê xwera bixwazin. Lê bêfeydeye. Kes nikare salixiya çiyê xweya wê sûretê bide. Şahzade neçar dibe tevî heval-hogirê xwe, dê û bavê xwe, text û payê Misirê bihêle û terkeseî dinê be, here bigere û xwayê wê sûretê Bedîe ba-Cemala bibîne.

Siyahpûş dastana xwe bi giranî li ser evîndariya şahzadê hûnandye. Gera wî, cefa û dijwariyên, ku ber Seyfulmuluk vedibin, yekoyek daye xuyakirin. Hostatiya Siyahpûş ji bona nivîsandina xemgîrî û dilkovaniya şahzadê gelekî bihêze. Hemû gava, li ku Sedelmuluk bûye: li rewşa xweşyê, li hêsiyê, ber kuştin û zêrandinê, yeke, xem û xîyalên şahzade her evîna wîye. Daxwaza wîye mezin ewe, ku bighîje dîlbera xwe. Siyahpûş her deqek û gaveke serpehatiyên şehzadê kar tîne, ku kûrayî û gurbûna agirê evîna dilê şahzadê bide xuyakirin. Di vê armancêda 13 xezelên evîndariyê ber xizmeta hilbestvanin. Siyahpûş bi rîya van xezela karibûye agirê dilê xwe tevî agirê evîna Seyfulmuluk bike û wek vûlkana alavî ji dil û hinavê xwe derxe, raberî xwandevana bike. Li ser rîya dijwar û bi hezar qezyava tîjî, şahzadê timê bi serfînyazî û serketî jê dertê. Ew hergav bi hunermendîya xwe, bi merdbûn û helalîya xwe, fen û qewata şerbaziyê, bi zanîna ulm û merifeta dinê serfînyaz dertê. Odîsêya şahzadê di dastanêda çiyê giran digre. Li dawîya dastanê şahzade di welatê perîyada bi ulm û zanîna xwe, bi saya sirafet û merifeta xwe, logîka kur û tûj, baş dinênaskirinê, qencî ji xirabyê bişkavtinê ji înthama giring li diwana giranda, ber padşahên horiya rûspî dertê û hêjayî destê Bedîe ba-Cemala dibe.

Dastan serhevda tê bi wê yekê, ku şahzade û hevalê wî Sedelmuluk, tevî dergîstiyê xwe vedigerin walatê xwe û çavronahiyê dighîje Asim-şahê kal. Li walatê Misrê hemû kes, xort û kal, hejar û zengîn bi hevra dest bi şayê û xweşiyê dikin.

Çiroka „Seyfulmuluk“ di nava xelqê Kurdistanê di şewbihêrkada hê tê gotin. Me li Serhedê mînakeke vê çirokê nivîsiye. Navaroka çirokê û ya dastanê nêzikî hev nînin. Îdentîk nînin usa jî navaroka dastanê û ya çiroka jî „Hezar û yek şev“. Berhevdana navaroka van nivîsara lêkolîna filologiyê ya taybetî jêra dixwaze. Em li ser vê pîrsê nasekinim. Ji navaroka dastanê bala me dikşîne ser xwe êpîzoda (dîmena) pîrs û bersivên di navbera Seyfulmuluk û padşê perîya Şahêbal di meclîsa giranda. Li ser hev ew şanzde pîrs û bersivin. Bi van pîrsa û bersiva Sîyahpûş him bîrûbawariya xwe ser dinênasînê û xwedênasînê dihar kirye û him jî nihêrîna xwe, ku bi taybetîya çivaka kurdîva girêdayîye, anîye ber çava. Baldariya me li ser du pîrskirina heye, ku bi taybetîya çivaka kurdîva tèn girêdan. Şahêbal ji Seyfulmuluk dipirse: „Ji mêran û jinanda ew kîne purr?“ Bersiva şahzadê dîyar dike, ku jinin pirtir ji mêra, ji ber ku „...ê ku jinin, bi qeydin ew jin, Ji jin hem kêmtire ê tebiyê jin“. Ev bersiv gotineke pêşîya tîne bîra me: „Sê tişt hene li dinê weke mirinê, berxê ber bizinê, mişkê terazinê, mêmê xebera jinê“. Dêmek, mêmê ku xebera jina xwe bike hesêbankî miriye. Ev dîtîn li ser jina, ji dewr û rewşa jina tê, ku li çivaka Rojhilatê cî girtye. Pîrsa ku pey vê tê, bi mena xwe jî pîrsa pêşîn dîr nîne, temamkirina wêye: „Ji miryan û ji sag’an ew kîne pîrr?“ Şahzade bersivê dide:

Go: „Ey şahê tebiîbê derd û dag’an,
Mueyyen purrtirin mirdî ji sag’an.

Çira? Her çî mirin, carek dî naê,
Çi sag’î ku hene dêçin fenaê.

Kesê bi qewlê jinê kir, her mirîne,
Mebên sag’in, bi sag’î wan mebinê“.

(Beytên Nr. 2784 - 2786)

Di mîfologîya kurdada çirokek heye û li nava kurda gelekî belabûyiye, ew li ser Sulêyman pêxember û jina wî Belqîsêye. Navaroka vê lêgêndayê eve: Rojekê Belqîsê gote Sulêyman: „Heger raste, ku tu pîrr hij min dikî, divê tu bircekê jî perê teyra (perenda) ji minra çêkî. Sulêyman gelekî ji Belqîsê hiz dikir, ji gotina wê dermeket û ban li hemû perenda kir bêne dîwana wî, ku pêrê xwe daynin. Divên, hemû perende tèn dîwana Sulêyman xên ji bûmê. Sulêyman pêxember perendekê dişîne pey, wî tinin. Sulêyman pêxember hêrsa xwe ser bûmê dirijîne û jê dipirse, bo çî giro bûye? Bûm bersivê dide, ku dijmart, gelo li dinê jîyandar pîrrin yan mirî? Û hatye ser wê bawariyê, ku mirî jî zêndîya zêdetirin, ji ber wê, ku ew li ser mirya hesab kirye mêmên ku xebera jina dikin. Ji bersiva bûmê em dibînin, ku mêmê ku xebera jina xwe dike hesabê mêra nîne, hesabê miryane. Ev lêgênda,

wek em dibînin, dewra jina di çivaka kurdada bi giştî kê m nake. Ev gotin li ser wan jinane, yên ku ji bedewya xwe, xweşikbûna xwe, naz û nazdariya xwe pêva li jîyanêda tu tiştî nas nakin. Di bersiva Seyfulmulukda em vê taybetiyê nabînin. Gotina wî ji bawariya, ku di çivaka îslamîda cî girtye tê.

Xezelên ku li dastanêda cî girtine, li ser evîna Seyfelmulukin û bi kela dilê Sîyahpûş hatine hûnandin. Her yek ji wana wek mîna keke poyêzîya bilind hatye avakirin, her yek bi xisûsyateke poyêfik ber me disekine. Ji ber vê jî ev xezelana ji dastana „Seyfulmuluk“ der jîyandar bûne, hatine bergirtin û dest bi dest geryane. Eva bûye bingeh, ku hine rewşenbîr van xezelana bi dastanêra girêdayî nedîtine û wek xezelên ji dîwana hilbestên Sîyahpûş hesabkirine.

Dastan paravedibe li ser 37 serîya (birra). Sî û şeş serî bi sernivîsên bi hang û bangin. Ev sernivîsa li destnivîsa B-da hebûn û me jê wergirtye. Bi raya me, evana ji bona hêsakirina xwandina dastanê paşwextiyê hatine zêdekirin. Dîyare, xweşnivîs xwe êşandîye, ku sernivîsên birra nêzikî ziman û hunera Sîyahpûş bibe. Lê belê, zimanê van sernivîsa, rewşa hilbestî û ziman û hunera dastanê ji hev dûrin, hev nagrin.

Bervedana Destnivîsa

Destnivîsa A: Li ser rûyê pêşin navê xudanê dastanê û navê dastanê undabûye, nemaye. Dema nivîsara dastanê dawya sedsalya 18-ane (binhêre kolofon). 89 Belgin (178 rûpel).

Kaxazê belgên destnivîsê tevliheve, him kaxazê rohilatîye, him yêvropîye. Kaxazê rohilatî, yê eslîye, hinekî qaline, ne pir şidyayî. Mezinaya belga himlî 245 x 155 mm, bergeha nivîsarê 225 x 115 mm. Gele cara çapa nivîsarê tê guhastin. Nivîsar li ser du stûnane, bi giştî ser tîpa nişanên danganî danîne. Herdu rûyên pela nivîsandîne. Ser her rûya 16-18 rêzên nivîsarêne. Hijmara rêza tê guhastin, cî-cîya digîje bîstî. Bi hubra reş hatye nivîsar, tîp nesxê cuwane, carne ser şikestê diçe. Li ser rûpelê vajo, jêrê li ser destê çepê bi destê xweşnivîsê, bi hubra bingehî îşareta belga (kûstod) hatîye nivîsandin.

Destnivîs gelek hatye karanîn. Belgên pêşin û paşin kevn bûne û zîrar gihîştîye nivîsarê, rengê belga jê çûye, belg zer bûne û ji qirêjê, dukelê rengtarî bûne, nivîsarê ser rûyê wan belga ancax tê xwandin. Lêvên belga pizîninê, maşyane, ji ber vê jî nivîsarên beyta hine cîya nivîcî tene xwandin.

Pagînasya (hijmarê) rûpela ji serê sêrîda li destnivîsê tunebûye. Xudanê destnivîsê Mella Ahmed hijmarê belga ser her rûyî bi qelesa risas, nêzikî lêva belgêye jorê, bi hijmarên yêvropî, gelekî mezin û nexwaşîk danîne. Bi şedetya xudanê destnivîsê di nava van çend salada hine belg jê undabûne (pelek pey r. 54-a, du pel pey r. 62-a, pelek pey r. 70-î), ji ber vê jî pagînasya danye.

Di destnivîsêda ji 13 xezela 11 mane (r.r. 23, 29-30, 45, 48-49, 54, 61, 115, 120-121, 122, 126, 132). Dora hine xezela paşwextîyê bi qelema risas bi xet çarçov kirine, yan jî bi xeta horizontal îsaret kirine. Xuyaye vê yekê ji ber armanca piraktîk kirine, ku dema xwandinê xezel zû bêne ber çava.

Kaxaza hine belga ne eslîne, xuyaye ji deftera hesabdarîyê ya kirîn-firotanê bi kar anîne (r.r.19-26, 39-46, 55-58, 169-170, 173-174 kaxaz li dora lêva bi cot xeta çarçovkirîye û li ser kêlekê bi e'rebî peyva „mulahezat“ heye.) Li ser r.r. 29-38, 47, 54, 59-62, 171-172, 175-176 rûpel bi xetê çargoşe çarçovkirîne. Rûbelgên li jor navkirî bi destê xweşnivîsekî xerîb hatine bergirtin. Herdu destnivîsandin bi hêsanî tên xwandin.

Di destnivîsêda navê serîya tunene. Dawîyê, li ser rûpela 178-a kolofon (texellûs) heye: „Temmet el-kitab bi ewnîlilla el-melik el Wehab 'ala yedî ez zeyîf ul-qellab, e'nî Mehemmed bin sofî Mûrad ellahuma e'tîqhuma mîn ezab el-muşedded nuwîştîm zehalem nedanem xeber ke umrem çî mane, çî ayet be ser illahî efu kun gunehanî men, kê taqet nedarem be narê seqer ah, ah, ah, mîn al-mewt, wel-halat we mîn teqsrî selawet, we mîn qelîl el-umlat fi 1211 we m'elumen lîman yan zor illa hazîhî suturat beyanen lî umrî Ebdul Hadî fi 1206 we Ebdul Baqî fi 1210.”

Destnivîsa B Feqî Husêyîn ji destnivîseke kevn ji nûva daye bergirtin. Têksta dastanê li ser kaxaza deftera dibistanêye çargoşe xezkirî bi xeta nesx nivîsîne. Li ser tîpa îşaretên danganî danîne. Navlêkirina serya di her birrêkêda heye. Destnivîs ji 195 rûpelane. Navê serya û xezela bi cotxezên horizontal ji jorva û ji jêrva hatine cudakirin. Li dawîyê dastan ji ber birîndarbûna belga bi temamî nehatye xwandin.

Destnivîsa C ji 98 belgane, çapa wê 200 x 145 mm, bergeha nivîsarê 180 x 110 mm. Li ser her rûpela 13 beytin, bi du stûna hatine nivîsar. Nivîsar hêsa tê xwandin. Cûrê nivîsarê nesxe, bi hubra reş bergirtye, îşaretên danganî li ser tîpan hene. Têkst di çarçova duxezên bi hubra sôr bendkirîye. Di navbera stunada du cot xezên vêrtîkal danîne. Gele cîya çarçovên horizontal bi hubra sor û bi nexşên prîmîtîv cî qetandine û têda nivîsîne: „Heza beyta Seyfulmuluk“, yan jî „Heza mebehsa Seyfulmuluk“. Destnivîs gelekî kevnê, lêvên kaxezê maşyane, pizînîne, niçên wê gilover bûne. Li ser hemû rûpela dewsa tenîyê, reşbûnê û tîliyên şil hene, kaxaz zer bûye. Bi giştî zirara mezin li têkstê negihîştîye. Lêvên belgê paşin awqas maşyane, ku peyvên beyta baş nayên xwandin. Çend beytên vê rûpelê, li destnivîsên A, B, D - da tunene.

Qaba destnivîsê eslîye, ji kartona hişk û maşyayî pêk tê, awqas kevn bûye, ku rengê xwe qimitandîye û lêvên wê maşyane. Girêdana piştê destnivîsê ji kevnbûnê vebûye û pelên wê ji hev dikevin. Rûyê

destnivîsêyî pêşin tune, unda bûye. Destnivîs ji pelê sisya destpê dibe, ji beyta Nr. 70. Ne navê xudanê nivîsarê heye, ne jî navê dastanê. Li destpêka destnivîsê belgekî nû, kaxazekî spî ser hatye zêdekirin. Li ser wê, ser herdu rûpela bi destê xerîb paşwextîyê yekî şêx, dibe ku xweyê destnivîsê, silsila malbata xwe nivîsiye. Belg pirr kevn nîne.

Xweşnivîs li ser rûpelê 16-17 çend beyt wergerandine li ser zimanê turkî. Destnivîs kurtkirina A,B,D-ye. Beytên kurtkirî hîmlî ew derin ku Sîyahpûş gazî saqî dike meyê bine ji bona xemrevandinê (r. 43), tune dîdema cirîdê û goglistinê (r.33-37) û h.w.

Destnivîsa D Londonê li pirtûkxana Bîrîtanyayê, beşa komkirinên ji Hindistanê û Rojhilatê, li bin hijmara Ms. or. 8208-a tê parastin. Destnivîs ji 62 belgane. Mezinaya belga 250 x 180 milîmêtre, berfireya nivîsarê 225 x 130 milîmêtre. Ser her rûpelî 18-19 beyt hatine nivîsîn. Ser hine rûpela hijmara beyta dighîje 17, 20 beyta. Bi giştî têda 2232 beyt hene. Têxt li ser du stûna nivîsîne. Navê xudanê dastanê û navê dastanê ji ber ku rûpelê pêşin unda bûne, neşkereye. Navê xweşnivîsê Mela Bekire. Destnivîs bi awayê nesx, bi hubra reş hatye nivîsîn. Xweşnivîs xwe neêşandye xeta nivîsarê cuwan bike, rêzê wî ser xeta rast nehatine bergirtin. Nişanên danganî li ser tîpa daniye. Herf yek bi yek hatine nivîsar, ji ber vê jî xwandina nivîsarê gelekî hêsaye. Kustod li ser her belgî, rûpelê vajo, jêrî têkst, li ser destê çepê bi destê xweşnivîsa bingehî, bi hubra reş hatye nivîsar. Rû bê hijmarin, paginasîya tune. Destnivîs gelekî birîndare, belgên pêşin (ji dehi zêdetir) undabûne, niçên derûnî şewutîne û zirarekî mezin gihîşt ye têkstê. Kevîyê belga ji tenîya çirê û qirêja desta tarireng bûne. Rûpera dawîya dastanê peritîye, ji ber wê jî kolofona destnivîsê baş nayê xwandin. Li ser kunca jêrê nivîsiye sala 1289. Gorî salhijmara xaçparêza dibe sala 1872. Ev sal dikarin qebûl kin wek sala serhevdaanîna bergirtina destnivîsê. Destnivîs bêqabe.

Di dawîya pêşgotinêda divê em çend peyva li ser mercên rastnivîsandina dastanê bêjin:

1. Wekî xwandina dastanê giran nekin, peyvên erebî bi tîpên *eynê* me hemû dera bi apostrof îşaret nekiryê. Apostrof her tenê li hina peyva hişt ye. Me giring dît usa jî bi dubarîkirina tîpa *r* li gotinên *purr* (*pirr*), *zêrr*, *durr*, *surr* u h.w. xwandina *r-ê* hişk bidin xuyakirin.

2. Hene gotin ku Sîyahpûş bi du cure nivîsiye. Pêşyê me xwast wana bikin yek rengî, lê me dît ku Sîyahpûş bizanetî du cure nivîsiye. Hilbestvan bi cudanivîsara van peyva hang û bang, kêş ava kiryê. Mînak, hine ciya nivîsiye *qazî*, hinek ciya jî *qadî*. Peyva *qazî* bi peyvên *razi*, *tazî*, *nîzebazî*, *qadî* bi peyvê *madî* kêşa beyta avakiryê. Du cure nivîsiye usa jî peyva *şekerrêz* û *şekerriş*. Peyva *şekerrêz* bi peyvên *xûnrêz*, *himbêz*, *têz* û peyva *şekerriş* bi peyvên *dilawîz*, *fitneengîz*, *hîleengîz*, *emberemîz*, *şekeremîz* kêşa beyta avakiryê.

3. Ji bona beyt rast bixûnin û teqla wana neşkênin, hilbestvan dewsa îzafê hine cîya *û* danîye û ew bi peyva pêşiyêva girêdayî tê xwandin. Ji ber vê jî me ew *û* bi xeza biçûkva bi peyva pêşiyêva girêdaye. Bi vê menê me *yû* jî bi peyva pêşiyêva girêdaye. Beyt bi van girêdana diha harmonîk û bi teqilrast tê xwandin.

4. Ji ber rastxwandinê me usa jî nivîsara peyva *şah - şeh, nay - ney, Bedîe ul-Cemal - Bedîe ba-Cemal* rast nekirye, hîştîye wek têkstêda bûye.

x x x

Ez bi şêkirdarî spasdariya xwe dîhar dikim ji wan heval, hevkar û zanayên kurdara, yên ku dema amadekirina vê destnivîsê ji bona çapkirinê, bi zanebûn û jêhatina xwe mira alîkar bûne. Bi taybetî spasîya xwe divêjim ji Mela Ahmedra, Mamûsta Goranra, Seyîd Dêreşîra, Kerîm Bîyanîra, Ebdurrehman Mizûrîra û Nîgarkêşê navdeng Malvara.

Celîlê Celîl

1 Ahmedê Xanî, Mem û Zîn. Werger li ser zimanê rûsî, pêşgotin û nivîsarnasî M.B. Rûdênko. M. 1960; Xarîs Bîtlîsî, Leylê û Mecnûn. Werger li ser zimanê rûsî, pêşgotin û nivîsarnasî M.B. Rûdênko. Moskva 1965; Feqiyê Teyran, Şêxê Sena'na. Werger li ser zimanê rûsî, pêşgotin û nivîsarnasî M.B. Rûdênko. Moskva 1965; Bîjen û Menîje. Werger li ser zimanê firansî, pêşgotin û nivîsarnasî Muhemmed Mokrî. Paris 1966; Ehmedê Xanî, Mem û Zîn. Çapkirin û werger li ser zimanê turkî M. Emîn Bozarslan. Stambûl, 1968; Rûdênko M.B., Şaxên lîteratûrî û zargotinê li ser dastana kurdî „Usuf û Zelîxe“. Moskva, 1986; Zembîlfiroş. Werger li ser zimanê rûsî pêşgotin, nivîsarnasî Mûsaêlyan J.S. Moskva 1983; Dîwana Mellayê Cizîrî. Werger ser zimanê rûsî, pêşgotin, kurtejiyan, nivîsarnasî, navarok K.R.Êyûbî. Sankt-Pêtêrbûrg 1994.

2 Melayê Batêyî û berhemê wî. Komkirin û vekolîn Tehsîn Doskî û Muhsîn Doskî. Dihok, 1996; Ji hilbestên Ehmedê Xanî. Komkirin û towijandin İsmayîl Badi; Feqiyê Teyran, Ey avê av. Şêxê Sen'anî. Stanbol 1999; Selîm, Yûsiv û Zuleyxa. Tîpguhêz Feqî Husêyîn Sag'nîç. Stanbol, 1998; Ehmedê Xanî, Nûbar. Stokholm 1986; Mela Ehmedê Batê, Mewlûd. İstanbûl, 1992.

3 Qanatê Kurdo, Tarîxa edebyeta kurdî. Ankara 1992; Abdurreqîb Yûsuf, Şayîrên klasîkên kurd. Uppsala-Swêden, 1988.

4 Ebdurreqîb Yûsuf, Bo yekemîn car li berhemê şayîrê kurd Sîyapûş. „Beyan“ (Beg'da), 1978, Nr. 51, r. 34-35; Her ew. Sîyapûş şayîrêkî kurdî payeberze. „Beyan“ (Beg'da), 1979, Nr. 57, r. 85-87; Ebdurrehman Mizûrî, Sîyapûş... Careka dî. „Hevkarî“ (Îraq), 1983.08.11. Nr. 799; Enwerî Sultanî.

Bîstûyek destnusê kurdî (û farisî sebarete be kurd) li kitêbxanekanî Berîtanîya Sweden, Jönköping, 1997, r. 31-47.

5 Reşo Zîlan, Hilbestvanê kurd Sîyahpûşê nemir û destnivîsarek. „Bergah“, 1991, Nr.9, r. 75-95

6 Selîm, Yûsiv û Zuleyxa. Ji tîpên erebî tîpguhêzî Feqî Huseyn Sag'nic. Istanbul, 1998. Feqîyê Teyran. Ey avê av. Şêxê Sen'anî. Stanbol 1999;

7 Sîyahpûş, Çend xezal û helbest. Tîpguhêziya ji erebî M. Reşî Igrat. Stenbol, 1999.

8 Herekol Azîzan, Klasîkên me. „Hewar“, Şam 1941, Nr.33, r.11.

9 Ebdurreqîb Yûsuf, Sîyahpûş şayîrekî kurdî payeberze. „Beyan“ (Beg'da), 1979, Nr.57, r. 86; Reşo Zîlan, Hilbestvanê kurd Sîyahpûşê nemir û destnivîsarek. r. 84.

10 Reşo Zîlan, Hilbestvanê kurd Sîyahpûşê nemir... r. 84 - 85.

11 Eugen Prym und Albert Socin, Kurdische Sammlungen, Erzählungen und Lieder in den Dialekten des Tûr 'Abdîn und von Bohtan, Abteilung 2b, St.-Petersbourg, 1890, r. 192.

12 Ebdurreqîb Yûsuf, Sîyahpûş şayîrekî kurdî payeberze, r. 86

13 Reşo Zîlan, Hilbestvanê kurd Sîyahpûşê nemir..... r.89.

14 Sîyahpûş Çend xezal û helbest. Tîpguhêziya ji erebî M. Reşî Igrat. Stenbol, 1999, r. 5.

SERÊ I

*Bismillahî, errehmanî, errehîm,
Webîhî neste'înû webîhîl tewffiq.*

Li ser lewhê qelem gerya ji heqda,
Tilû'i fecrê uşaqê şefeq da.¹

Ji bêhna g'unçeê bag'ê meya saf,
Mu'etter bû gulistan Qafê ta Qaf.

Me lew hatin bi nezmê în hikayet,
Ji neqlê rawîyan min kir riwayet.

Der eyamê Sulêymanê peyember,
Di Misrêda hebû şahêk muzeffer.

5 Ji e'dl û dadê wî alem bi rahet,
Nebû qet kes bi zehrê wî qebahet.

Pez û gur ew bi hevra çûn çeragah,
Nebû zehrê guran ez heybetê şah.

Bi çengalê serê sinan zehrab,
Pezê bêçare rake ez serê xwab.

Tealellah ji wî hukim û e'dalê,
Ji wî cah û celal û îqibalê.

Xudê dabû ji bo Asim bi rehmet,
Xudêtirsî-yû text û tac û dewlet.

10 Xisûsan medhê wî pêşî Sulêyman,
Digo teyr û wuhuş û cin û însan.

Di a'lemda gera bû nam û namûs,
Bi qencî lêdida awazeê kûs.

Di ber hukmê wîda caê xerabe,
Nemabû tu îşaret key sebabe.

Çi cihê ku hebû xoş abidanî,
Tê danîbû şehê cennetmekanî.

Çi bêjim, hukmê wî alîcenabî,
Dêh û qerye tamam naên hesabî.

15 Çiharsed şehr û bajarê xudannam,
Di ber hukmê wî bû wek Misr û wek² Şam.

Di eyamê xweda g'eyrî Sulêyman,
Nebû qet kes mîsala îbinî Sefwan.

Çi bêjim, esker û komê suwaran,
E'ded zêde ji du nehsed hezaran.

Di hîna çawîşan kirbaya³ gazî,
Suwar datin ji dengê dûlebazî.

Hemî merdê dilawer, şêrîgîr bûn,
Bi gurz û nîze û şemşîr û tîr bûn.

20 Ji ser ta⁴ pê di polaê mûcewşen,
Dihatin sef bi sef, kom-kom, bi qewşen.

Wekî Berzo û Zehrab û Feramerz,
Qewî heykel wekî Rostem xuyê 'erz.

Dibûsîn erdê pêxî şahê mesrûr,
Ji hed zêde suwarê şubhê Têymûr.

Ji mal û ni'met û genc û cewahir,
Nizanî qet hesabî g'eyrî qadir.

Di dunyâê nebû esla çî⁵ ne'met,
Ne dabû xaliqî bo wî bi rehmet.

25 Ji g'eyrî yek puser dilbend û waris,
Dilê şeh ji bo ewladî bû haris.

Sed û heştadî sal bûrî ji umrî,
Şev û roj ew dinalî-yû çu qumrî.

Ji bo ewladekî nêrîne û qenc,
Bo wî mîras bimînî mulket û genc.

„Îlahî, ez dinalînim şev û roj,
Ji işqê cam û hubbê werdê pişkoj.

Wirêkî⁶ bo me tu yek g'unçeê baqî,
Ku serxoş bim ji camê⁷ tu û saqî.

SERÊ II

*G'emxwarîya şahê Asime ji bo yek waris, ji bo ku li piştî
wî li milkê wî bibe haris*

30 Wekî rebbî îrade bikat û teqdîr,
Bi cî bê, dê biket mexlûqê tedbîr.

Ji wî rengî sual ken bê hicabe,
Dua lew paş dibîtin mustecabe.

Ji qewlê rawîyanê, ehlê urfan,¹
Meger rojek di dilda îbinî Sefwan,

G'eriq bû ew di deryaê tefekkur,
Bi *Kullû men eléyha fan* tesewwur.

„Sed û heştadî sal umrem resîde,
Bi mal û genc û ne'met aremîde.

35 Çi kem dunya, ku bê ehd û wefaye,
Ji kesra axirî ta ser nemaye.

Li serda tu bibîn kan Adem û Şîs,
Refî' bû hem li dunya paşê Îdrîs.

Wefat kir hem li dunya Nûh peyember,
Nema baqî bi Îbrahîm û Azer.

Ku Îsmayîl çû keyber, bû teesuf,²
Di gel wî hem neman Yeqûb û Yûsuf.

Nema Mûsa, kelîmê rebbê rehman,
Nema Dawud, wefa bû hem Sulêyman.

40 Ji minra namînî dunya hem axir,
Gelek min cemi' kir genc û cewahir.

Di hîna min ku hişt ew kohneabad,
Wekî bo min nebî yek qencî ewlad.

Ji wîra bîte ew ne'met temamet,
Heyif g'eyrek wî bigrî textê dewlet.

Çi kem lêkin bi dest min nîne ew kar,
Ne bi firotin diê ta zêrr û dînar.

Di buhaê bîdem dused defîne,
Hemî cewher ji zêrr nehsed xezîne.

45 Hezar û sed hezar espê³ xudanbext,
Cewahirbend ji zêrrê kesme û rext.

Bihaê esp û rextêk min beraber,
Xeracê Misr û Şaman bî seraser.

Diger herçî ku qenc ez pê bibim şad,
Bi nêvî kem di bihaê yek ewlad.

Welê ewlad bi destê zulcelale,
Heta ku ew nedet, tehqîq betale.

We qence rû bikem lew paş di dergah,
Ku rehmetka⁴ bi fedlê xoşî ullah.

50 Big'efrînî minê mehzûn û naşad,
Ji emrê kun bidet min ew yek ewlad.

Li ser ta pê ezim mestê belaê,
Ji rebbê xwe dixwazim ez rizaê.

Bi ehsan û bi fedil û hem bi rehmet,
Îlehî tu bidey me camê mehbet“.

Kesî ba sidq û dil rû da derê heq,
Umîda xwe birî g'eyrî wî mutleq.

Eger şeh, ger geda bî, ger mesakîn,
Ji meqsed bê hîvî nabî bî te'yîn.

55 Tealallah ji wî şahê mubarek,
Bi ezmê xelweê xoş kir tedarek.

Qedem danî bi sidq û dil bi dergah,
Umîda xwe birî wî g'eyrî ellah.

Tesedduq da yetîm û hem esîran,⁵
Bi derwêş û mesakîn û feqîran.

Hisabê nan û goşt û sîm û hem zer,
Nizanî kes, çi binivîsim bi defter.

Heta çil roj tamam, her rojî sed kîs,
Eta kir şah bi ehlê ilm û tadrîs.

60 Libasê şahîyê yekser eta kir,
Bi libsê derwêşan xwe bînewa kir.

Li ser ta kohne şal û xirqe poşî,
Ji zikrê xaliqêra dil xuroşî.

Ji ber xwe avêtin sencab û qaqim,
Di kuncêk tarîda rûnişte⁶ Asim.

Şev û roj wî dikir zikir û îbadet,
Ji rebbîra dikir ew zêde taet.

Bi roj saim, bi şev qaim herdem,
Zeîf û zer bibû ez zehmet û g'em.

65 Ne germa wî dipirsî û ne serma,
Ji î'şa ta î'şa xwar nîmî xurma.

Şevêk cume' di ber fecrê îbadat,
Qeti' kir, dest hilanî, kir munacat.

M U N A C A T

Xudewenda, tu xellaqê qedîmî
Bi halê min besîrî û e'lîmî,⁷
Tu sahib rehmet û fedilê⁸ emîmî,
Bi ebdê xwe etabexş û kerîmî.

Eger kerdem gunah, esteg'firullah,
Ji⁹ sidq û bawarî hatim bi dergah.
Nihin min g'eyrî tu esla çi¹⁰ ullah,
Big'efrînî gunahê meyî¹¹ qedîmî.¹²

Wekî bê emrî îzhar¹³ bû ji Adem,
Girî-yû¹⁴ hem nezer da erşê e'zem,
Muhemmed dî resûlê tey mukerrem,¹⁵
Şefaet kir bi wê nûra selîmî.

70 Bi heqê hurmeta¹⁶ navê Muhemmed,
Bibexşî cumle efa'lê meê bed,
Duaya ku dikem, ya rebb, nekey red,
Tu g'efarî-yû rehman û errehîmî.¹⁷

Ne muhtacem bi cah û menseb û text,
Çi kem bê kur, bi esp û kesme û rext?
Xuda, tu bidey me ewladek xudanbext,
Xebîr û qadir û heq û kerîmî¹⁸.

Di hîna xaliqê qeyyûm û dadar,
Emir kir, ku bi cî bê meqsed û kar.

Mueyyen dê biketin ref' hicabê,
Ji şug'lêra muheyya ket sebabê.

Ji neqlê rawîyê,¹⁹ ku kir riwayat,
Sedaê g'eybê hatî ez munacat.

75 „Sebeb navê Muhemmed, ey dil azad,
Xudê tu bexşî û dê bide te ewlad.²⁰

Welê tu jinkê bînî zêde mehbûb,
Ku tu şa bî bi Yûsuf şubhê Yeqûb“.

Ji xelwetya wî çû hîna²¹ çihil roz,
Nehat ser textê hîkmet şahê fêyroz.

G’ul û awaze peyda bû çep û rast,
Ji ewwelda keran xwe bê ’inan xwast.

Dinêrî pez guran çavê xîyanet,
Hilatin şert û peyman û emanet.

80 [Ji ber] ku ew welat mayî bê hakim,
Bêhed şabûn muzewwer xelqê zalim.²²

Wekî dî a’rifan ew reng rabû,
Tilu’ê exterê bedbext rabû,

Li bal hev ceme’ bûn miftî û qazî,
G’enî-yû dewlemend, birçî û tazî.

Di gel destûrekî şahê Êlame,
Wezîrê şahê Poşîn îbinî Hame.

Ji hevra go ewan qenc û qebaih:
„We qence em biçîne pêşî Salih.

85 Çira ew merdekî zêde emîne,
Ji eqil û raê xwe wek wî tunîne.

Emînê hakimê destûrê şahe,
Xudan esl û neseb, hem alîcahe“.

Hemî rabûn û çûn, wan go bi hacib,
„Tu herr pêş Salihê, bê, xelqê g'alib,

Dixwazin bêne pêş îbinî Hemîdî,
Bi eqil û re'yê xwe²³ tu ferîdî“.

Hemî hatin û westayin ji dergah,
Di gel tu ew biken tedbîrî bo şah.²⁴

90 Bi çespan hatî²⁵ hacibê xuyî e'rz,
Xeber dan pêş Salih, wî kirin e'rz.

Îcazet da we Salih ba dilî geş,
Çira wî zanî hatin ew muşewweş.

Bi cemi'îyet ku hatin ew seraser,
Li dîwanê rûniştin sef beraber,

Ji ewwel bûn ji bo Salih senaxwah,
Heta ku hatin ew ser mebhesê şah.

Bi hevra go ewan²⁶ cumle cemaet:
„Bi bê hakim hilak dibît reîyet.

95 Di hîna ma li çolê bê şivan pez,
Çi hal dêbît ji²⁷ destê gurgî xoş pez.

Wekî bag'ê di dêhat û bilûkan,
Bi bê bag'van ji dest cewrê biçûkan.

Ne tî man û ne sinc dêbît, ne sîmar,
Çi²⁸ namînî ji g'eyrî qotekî dar.

Çiqas ava bî bajar na sewabe,²⁹
Bi bê hakim, yeqîn dêbît xerabe.

G'erez, ey Saliho, tu alicahî,
Bi eqil û kamil û destûrê şahî.

100 Qedem nê ser serê me em biçin pêş,³⁰
Şehê alîmiqam bûyî bi derwêş“.

Dilê derwêşê danaê mukemmel,
Kîye ê ku vexwarî camê ewwel.

Ji destê saqîyê meyxaneê îşq,
Bi secde û rake' ji pûtxaneê îşq.

Bikin guhdarîyê danaê kamil,
Xudan erfana û qelbê şahê adil.

Ji esrarê nihîna xalî çî³¹ arif,
Eger alim, eger adil, çî xayif.

105 Bi hevra hatin ew cumle temamet,³²
Ji³³ ber dergahê alî kir îqamet.

Nedîman go bi hacibê senaxwah,
Ji ber me tu bibûse penceê şah.

Eger destûrê da em bêne xidmet,
E'rz keyn em bi zarî³⁴ çendî sohbet“.

Çeleng rabû û hacib³⁵ hate pêş şah,
Be xidmet erdê bûsî, ba senaxwah.

Ecaib nerm û şîrîn, wek kerîman,
Temamê e'rzî kir qewlê nedîman.

110 Şehê alî riza da, kir şeker purr,
Lebê şêrîn û rêhtin gewher û durr.³⁶

Be cumle hatin ew,³⁷ gotin tebarek,
Yekayek bûsî wan destê³⁸ mubarek.

Ji wanra şahî xeyr û hem sefa da,
Le paş³⁹ ehlen we sehlen, merheba da.

Ewan dî şah di wî şîrîn meqalî,
Zeîf û zer bûyî şubhê hîlalî,

Bi hevra gotin: „Ey şahê xudanbext,
Çi ehwale, ku tu naêye ser text?

115 Nema tiştê biken serhingê tu şer,
Bi hevra bêne şewtîn hişk û hem ter.

Ne kirye qet kesî textê te telbe,
Çi⁴⁰ şah nînin biken ew ser te g'elbe.

Ne karê hakimane ew rizalet,
Ditirsî ger ji heq tu bike e'dalet.

Li bal xaliq, bizan, ew zêde qence,
Nebin mezlûm ji dest zalim bi rence.

Bi burhan û ehadîs û delail,⁴¹
Dibit cennetmekan⁴² sultanê adil.

120 Hîvîdarîn ji şah, bêjî teheyyur,⁴³
Çira ew g'erqê Omanê⁴⁴ tefekkur?“

Cewab da şahê Asim îbinî Sefwan,
Cewahir rêhtin û go ba nedîman:

„Ne meqsûd tirsê şahane, ne ku text,
Ne gazindek heye me ji tali' û bext.

Welê, min kir tesewwur gel xudûkî,
Dibî hîvî di weqtê tu biçûkî.

Dibêjî dê bimînim ta bi kehlî,
Dikey hîvî spî key rîh bi sehlî.

125 Ji wê wêda bi tehqîq dê bimîrî,⁴⁵
Eger şah, ger geda bî, ger wezîrî.⁴⁶

Delîlê⁴⁷ *Kullu nefsîn* tu bibîne,
Ji دنیاê tu baqî xwe⁴⁸ mebîne.⁴⁹

Bi *Kullu men elêyha fan* nezer de,
Mueyyen dê bibî tu tehtê erde.

Dîger hen *Kullu şeyîn halîkun* bîn,
Ji mirnê xwe biken bawer, bi te'yîn.

Xusûsa ez dibînim, ey wezîran,
Ji hakim û selatîn û emîran.

130 Kesê mirbû, dibîtin kur bi waris,
Ji bo ewlad nihin mane', ne bais.⁵⁰

Bibêjîn ew medeyn kur, mal û emlak,
Eger cewher hebin, heta bi eflak.

Nihin bo min ji nêrîne çî⁵¹ ewlad,
Heta ez hem bi dîdarê bibim şad.

Ji dîna wî bibim her rojê haris,
Di pey minra ji minra bîte waris.

Ji wîra bît ew⁵² mulk û tac û hem text,
Defayîn û xezayîn, kesme û rext.

135 Sed û heştadî sal bûrî ji umrem,
Zeîf û pîrem û tirsem ku bimrem.

Me lew rû da⁵³ derê ullahê sami',
Mebin bo min, gelî mîran, bi mani'.

Munacatek me kir vî subhê la reyb,
beşaret da bi min xoş hatifê g'eyb.

Bibexşînî gunahanê⁵⁴ yekî kurr,
Jinek dê bînî lêkin şubhetê durr.

Bi qîmet qed wekî serwê gulistan,
Perîrûx, nazik û narinc û⁵⁵ pustan.

140 Nizanim jin xewase, yan ewame,
Ji Misre, yan ji Meg'rib, yan ji Şame?

Ji sidq û dil dinasim heq bîlareyb,
Çehvnêrim ji bo awazeê g'eyb“.

Nedîman got û: „Ey şahê xudanbext,
Beqa bî bo te u'mr û tac û hem text.

Refîqet bît û ya rebb, *qulhu wellah*,
Ji wê mizgînyê sed *şukr û lillah*.

Ji bo zanîne jin, ey şah, meke g'em,
Dizanın hem bi g'eyb ehlê munecem“.

145 Bi eqlê şahê qewlê hem nedîman,
Bi xatir da riza şubhê kerîman.

Ji arifan muheyzer nabî qet kes,
Xudan fayîdene ew mislê qeqnes.

Hemî awaz û nezmê wane mewcûd,
Li pê wan ger herî, tu dibînî meqsûd.

SERÊ III

*Tedbîrdîtina şahê Asim ji bo dawetê û muheyyakirina wîye
esbab û serwetê, we şîyandina qasidane bîl yûmnî wel
se'adetê*

Itaê hakimê adil bûye ferz,
Be ulul-emrî zillullahî fil erz.

Bi zîrê sayeê sultanê adil,
Dibin cabir hemî ba qencê mail.

150 Feqîr û hêsîr û miskîn û alim,
Dibin rahet ji dest ehlê mezalim.

Ji xelwetê bi derket şahê Asim,
Li ser ta penc û poşî kurkê qaqim.¹

Li ser textê xwe rûnişt ew şehinşah,
Nedîman bûse da dest ba senaxwah.

G'ulamana bûse da destê bi sef-ser,
Hemî westan li pêş şahê muzeffer.

Wekî rûjê mezalim çûn bi hevda,
Pez û gur çû çerê dîsan ti hevda.²

155 Mufferreh saqîyan anîn mey û beng,
Mitirban lédida tenbûr bi sed reng.³

Wekî dîwanî mest bûn ez mey û benc,
Şehê Asim nezer da Salihê qenc.

„Xeber ken,- go,- di eqtar û di etraf,
Munecim û hekîm bèn Qafê ta Qaf“.

Li paşî hevteyek bêhed munecim,
Dibên, hatin hekîm û hem muallim.

Sih rojan xwestî⁴ muhlet cumle yekser,
Heta yek-yek kirin tali' beraber.

160 Etarid û esed, sertan⁵ û hem heml,
Muqabil sewr û cewza, hût û kir reml.

Ji delw û sunbul û cedî-yû⁶ eqreb,
Muqabil yek kirin tali' bi eg'leb.

Ji cifrê muşîkaf û remlê kamil,
Bi necmê se'd kirin tali' muqabil.

Keçê şahê Yemen bû îbinî Efwan,
Puder bû îbinû Emr û namî Qehtan.

Bi xidmet erdê bûsî ba senaxwah,
Munecim û hekîman mijde da şah.

165 Di mijdêda eta kir şahê Asim,
Ji hedê zêde şal û kurkê qaçim.

Diger esp û çek û sencab û qapût,
Eta kir hem ji wanra zêrr û yaqût.

G'ereq⁷ bûn ew di deryaê etaê,
Heta ew hen bixun, pê biken sefaê.

Etaê arif û danaê kamil,
Ji behran zêdeye qet nabî zail.

Divêtin lê ji wanra mêrê sadiq,
Bi adab û kemal û hub û aşiq,

170 „Ji şerêda sebir ken zêde qence,
Mebada hen bibin waqî' bi rence.

Ji karê xêrêra meguzarî ewqat,
Yeşîn tu bizane *lîl ttexîrî afat*.

Bi te'cîl rabû ew şahê mubarek,
Ji bo daxwazîyê xoş kir tedarek.

Emir kir şah bi Poşîn îbinî Hame,
„Bibî binvîsî, katib, qencî name.

Ji bo şahê Yemen ba e'z û îkram,
Hedîsê doxterî têda serencam“.

175 Di hîna gote katib îbinî Hame,
Di dest girt kag'iz û tîz kirdî xame.

Nivîsî: „Dewlet û izaz û îqbal,
Hemî ferxende bada cah û îclal.

Sea'det hemdemê tu bad û hem bext,
Mubarek bin ji bo te tac û hem text.

Pes ez de'watê wa fiyatê⁸ her dem,
Mebada der dilet esla yekî g'em.

Wekî kafûr û enber bûn mulahiç,
Dibit peyda mehebet ez du sadiç.

180 Di eyamê di ber me bab û ecdad,
Bi name-û kag'izê hevdu dibûn şad.

We reng min hîvîye, ku ew muhebet,
Bibît taze bi yek bin herdu dewlet.

Mutî' bim ez di fermanê şehinşah,
Diger herçî heye meqsûdê bi xwah.

G'erez zîn nameê amîzmehbet,
Şunîdem ez pesê perdeê ismet.

Heye bo şahê Qehtanê muzeffefer,
Letîf û nazenîn yek xûbê doxter.

185 Temaê hîvîye ku bo me bîtin,
Umîda qiseya min red nebîtin.

Bidet min wê durrê,⁹ şahê serefraz,
Di nextêda çî meqsed bî tu bixwaz.

Nîşanî min wurê kir,¹⁰ ey şehinşah,
Ji bo wê nazenîna şubhetê mah.

Di ger herçî heye bo şahê meqsûd,
Wirê ket balê meve cumle mewcûd“.

Wekî kag'iz tamam bû, Asimê şah,
Emir kir ser xezîndarê du pencah:

190 Devan bînin bixemilînin, biken bar,
Ji zerbeft û qumaş û zêrr û dînar.

Ji şalê tirme û kemxa û qapût,
Ji dîba û qeseb, elmas¹¹ û yaqût.

Ji safîhaê mirwarîdê feyroz,
Ji durr û hem guherhaê şebefroz.

Çiharsed namîdarê espê xudanbext,
Cewahirbend ji zêrrê kesme û rext.

Di ger sêsed g'ulam ez a'ribê reş,
Li ser ta pê bi zîba û muneqqeş.

195 Ji ebdê romî û gurcî du heftad,
Dilaram û kemerzerîn û dilşad."

Ji hindî carîyan hefsed be dilxwaz,
Wirê kir¹² şahê Asimê serefraz.

Emir kir şahê Misrê mîrê esker,
Go: „Hazir bin sed û pencah be defter.

Li ser her mîrekî hedê suwaran,
Ku bijmêrî nebî kem ez hezaran“.

Ceme' bûn mu'teqîd û merdê qaif,
Ji salih û ji kamil û ji arif.

200 Di gel wan muftî û qazî û alim,
Biçîn yekser bi emrê şahê Asim.

Herîfê xoşîbêjê, hem melahet,
Bi husnê dengê xoş dil kir beg'aret.

Hezar şêrîn suwarê şubhê Yûsuf,
Bi dengê husnê xwe sahib teletuf.

Di gelda mitribê sahib terane,
Di dest saz û ney û çeng û çeg'ane.

Bi emrê şahê Poşîn îbinî Hame,
Bi destê Salihê da muhrî name.

205 Emîrê eskerî kir şahê Asim,
Bi Salih da xelat du kurkê qaqim.

Bihaê her yekî sed kîsê zêda,
Bi emrê şahê lew paş çûn bi rêda.

Bi keyf û xurem û dilşad û mesrûr,
Bi nêzîkê Yemen bûn ez rehê dûr.

Xeber çû şahê Qehtanê muzeffer:
„Ji erdê Misrê hat bêhedê esker.

Çiqas deşt û newal û kuh hesarin,
Hemî yekser tejî Ristem suwarin.

210 E'gîd û pehlewan ba nîzeh û gurz,
Ji rengê Teymûr û Berz û Feramurz.

Nizanîn bo çi ew hatine êre,
Bi şer hatine, ya xud ew bi xêre?“

Wekî zanî xeber şahê muzeffer,
Emir kir ceme' bûn bêhedê esker.

Hemî şerare wek şêr û pilengî,
Di gel wan bûn dused filanê cengî.

Beraber eskerê g'eyran muqabil,
Bi sef seknîn û pursîn jê mesail.

215 Wekî dît misiryanê sewtê bilbil,
Seda û dengê waweyla û g'ulg'ul,

Ji Yemen bû bi gazî û be hawar,
Bi tîp û sef suwar hatin zirîdar.

Kuh û deşt û newal bûn purr ji esker,
Bi gurz û nîze û şemşîr û xencer.

Mîsala eskerî pûrê Peşengî,
Di gel wanda dihatin filê cengî.

Ji dengê kerewaw, saz û niqare,
Newal purr bûn û esker bê şumare.

220 E'gîdan gurz û nîze girte çengan,
Di ber hatin wekî şêr û pilengan.¹³

E'gîdê Misryanê merd û dilêr,
Bi sef seknîn û gotin Salihê şêr:

„Eger îznê riza bî tu bikey hez,
Biçîn wan em¹⁴ bikeyn wek gurgê ba pez.

Bi îznê qadirê qeyyûmê dadar,¹⁵
Be yek lehze nehêlîn yek ji rêdar.¹⁶

Kele, burc û hesaran jê bistînin,
Efiya nazenîn bo şahê bînin.

225 Cewab da Salihê sahib melahet,
Go: „Ew qise dibîtin purr qebahet.

Çira em dawetên mest ez mey û benc,
Wusan hatîne em dê bikeyn ya qenc.

Eger em wê bikeyn dêbit xirabî,
Cewab dêçî¹⁷ û pêş alîcenabî.

Riza nîne bi cengê îbinî Sefwan,
Di gel ehlê Yemen ba şahê Qehtan“.

Li paşan gote Salihê senaxwah:
„Bi du aqilê kamil herne pêş şah,

230 Bibêjin dostin em, nîne¹⁸ duşmen,
Bi qasidî ku em hatine Yemen.

Hedîye w namihaê îbinî Sefwan,
Me anîne ji bo wî şahê Qehtan“.

Wekî aqil û kamil çûne pêş şah,
Be xidmet erdê bûsîn ba senaxwah.

Yekayek nerm û şêrîn ba fesahet,
E’riz kir qewlê Salih ba selahet.

Dilê şahê Yemen bû zêde mesrûr,
Beşaret da suwaran nêzîk û dûr.

235 Bi şahî tevlihev bûn herdu derya,
Seda û dengê espan çû sureyya.

Egîdanê ji xwe bûn zêde razî,
Demek kir wan bi hevra nîzebazî.

Welê ehlê Yemenyanî xwe qail,
Ji sed ba yêkî Misrî neyî muqabil.

Bi emrê şahê Qehtanê muzeffer,
Qunag’ê qencî didan bo¹⁹ cumle esker.

Kirin arasite hem text û dîwan,
Ji bo Salih, di gel be’dê nedîman.

240 Wê rojê qise bû nav wane mestûr,
Şehê Qehtanê²⁰ çû ser textê mesrûr.

Serîrê textê erfân û mehebet,
Lebê camê şerabê surrê wehdet.

Dixwazim ez ji te, ey nûrê e'ynêyn,
Di gel remzek ji surrê *qabê qewsêyn*.

SERÊ IV

*Beyana Salehe name ez bo şahê Qehtan, we razîbûna wîye
be g'aê îbin Sefwan*

Di hîna fecrê sadiq bû muetter,
Tilu' şemsê kir dunya munewwer.

Tufeylê bag'ê kir mêylê gulistan,
G'ulam hatin li pêş şahî vewestan.

245 Emir kir Salih û çend merdê qaif:
„Hedîyan hûn biben pêş şahê arif.

Bibêjin cumle şandîn îbinî Sefwan,
Di gel bêhed dua bo şahê Qehtan“.

Wekî wan bir hedîye şahê e'lam,
Bi wan bû yek bi yek cumle bi itmam.

Bi xidmet erdê bûsîn kirdî¹ teqrîr,
Ecaib qiseha wek şekker û şîr.

Li canê şahê xoş hatin wesîyet,
Duaê qencê tuhfat û hedîyet.

250 Dilê şah ez hedîye ma ecaib,
Çira kem dîbû nik xwe ew g'eraib.

Emir kir wê demê şah ba xezîndar:
„Helîn û yekser hedîye qenc bi ejmar“.

Li paşan gote çawîş îbinî Qehtan:
„Tu her pey qasidanê îbinî Sefwan,

Kerem ken bên bixun cam û mey û beng,
Biken guhdarîyê saz û ney û çeng“.

Bi emrê şahî hatin cumle yekser,
Di gel Salih sed û pencahê² serwer.

255 Yekayek bûse dan³ wan paê textî,
Dua kir wan ji bo îqbal û bextî.

Li pey ehlen we sehlen, merhebayê,
Di gel xoş hatin û xêyr û sefayê,

Muedeb rabû Salih muhr û name,
Çeleng wî da bi dest şahê e'lame.

Emir kir katiban kag'iz bixwînin,
Ji metnê hûrê⁴ menaê derînin.

Wekî xwendî⁵ katiban xetê mehbet,
Beqa bada ji bo şah textê dewlet.

260 Hedîsê doxterê têda bi itmam,
Ji me'nê şahê halê bû serencam.

Li paşan name pêça, bûsî da ser,
Emir kir şahê Qehtanê muzeffar.

Bedel⁶ kag'iz ku pê binvîsî katib,
Ji bo şahê Asim, sahib meratib.

Nivîsî katiban dewlet muezem:
„Celîlê şanî wel qedir wel mukerrem“.

Hemî fexende, bada bext û îqbal,
Seadet yawerî ba cah û îclal.

265 Beqa bin bo te dayîm tac û hem text,
Mebada kes bi mîslet tali' û bext.

Pes ez dewatêî name cumle mefhûm,
Ji minra metn û menî bû bi me'lûm.

Eger çenda⁷ ku ez zerîn kulahem,
Qedîmî bendeê an alîcahem.

Ji bab û ced eger çi tacîdarîn,
Çû bende bê ser û xidmet guzarîn.

Hedîsê doxterî wek min dî yekser,
Me pêça name, bûsî danî ser ser.

275 Bi çeşm û ser, ji kîs xu kem tidarek,
Wirêkem ez ji bo şahê mubarek.

Çira dunyaê dîn purr bêwefaye,
Bê ehd û bê qîrar û bê sefaye.

Eger têda xerabî bikey mucereb,
Dibînit wî ji qencî bît muqereb.

Ji nehsî nabînî tu g'eyrî nehsî,
Ji qencê tête dîn ewradê qudsî.

Eger tu arifî, ya qenc biçîne,
Ji g'eyrê qencîyê tişteq mebîne.

275 Tu nabînî ji wî pîs û mirarî,
Ji g'eyrê dayî-yû wergirt û xwarî“.

SERÊ V

*Kêyfxoşîya şahê Qehtane bi wê g'ayetê, we kêyfxoşkirina
wiye milletê bi wê de'watê*

Were ser dîde, rûnê ehlê razim,
Tecellaê cemalê heq dixwazim.

Ji qelbê min tîyê bêhnê kebabê,
Were saqî tu bîn camê şerabê.

Wekî kag'iz tamam bû şah bi pencan,
Îşaret kir tijî ken tas¹ û fincan.

Meyê heft sal û saqî çarde sale,
Çi xoş şurb û nezer husnê cemale.

280 Di dîwanê gerandin mey firoşan,
Dilê sahib kemalan hate çoşan.

Bi hevra mitribanî mest û mexmûr,
Li sed reng lêdida tenbûr û sentûr.

Ji dengê saz û awazê çeg'ane,
Sedaê mitribê sahib terane.

Nezerbazîyî çeşmê meyîperestan,
Gulê rûsadeê fincan bi destan.

Gelek sahibkemal bûn dîn û ebter,
Nebûn hişyarê esla ta bi mehşer.

285 Ji berqê iŝqê, ŝewqê camê zerkeŝ,
Dilê uŝaq û mesta bû muŝeweŝ.

Wekî mest bûn di dîwan cumle yekser,
Emir kir wê demê ŝahê muzeffer,

Xelat bînin ji bo wan kurk û qapût,
Qeba û ŝal û tirme, zêrr û yaqût.

Ji gurz û nîze û ŝemŝîr û cewŝen,
Ji rext û kesme û ayîn û rewŝen.

Ji wanra dan xelat yekyek bi tertîb,
Welê ŝah kir bi Salih zêde terg'îb.

290 Li ser ta pê ŝeland xwe ŝahê Qehtan,
Bi Salih da wezîrê îbinî Sefwan.

Muhessel, roj bihurandin bi itnam,
Bi kêyf û xurem û ŝadî heta ŝam.

Di gel Salih rabûn û çûne begler,²
Bi fanosan kirin qonag'ê enwer.

Munewwer bûn dilê mecruh û tarî,
Ji ŝewqa badeê çeŝmê xumarî.

Uyûnên dilberan purr g'emzebazin,
Serê mijgan wekî sertîr û gazin.

295 Dilê min bû ji wan mecruh û mesrûr,
Gehî zulmate, geh purr ŝu'leê nûr.

SERÊ VI

*Şîyandina şahê Qehtane ya şûxa yemanî bi şadî, ji bo şahê
Asim û şadbûna wîye bi wê muradê*

Di gel fecrê ku pişkift helqeê gul,
Di navda gurnî kir¹ uşaqê bilbil.

Qijîna bilbilan çû g'unçe dîsa,
Ji hev rakir nesîm zulfê semensa.

Di gel deng û sedaê wan tiyûran,
Diêtin û li min herdem di ewran.

Ezim mucrim we hem gunehêkare,
Hîvî û hem medet rebbê cebare.

300 Îlahî, tu efû key ez gunahan,
*Wema kesebe lena sû û sîyahan.*²

Li ser textê xwe rûnişt şahê Qehtan,
Emir kir ser xezîndar û nedîman,

Cihazê doxterê ken qenc tedarek,
Ko xas û a'm bibêjin sed tebarek.

Bi emrê şahê heft filê wekî Qaf,
Kirin bar cumle yekser ez zerê saf.

Di ger nehse deve ez kurk û qapût,
Kirin bar ez qumaş û durr û yaqût.

305 Ji încî û ji elmas û cewahir,
Nizanî kes hesabê g'eyrî qadir.

Ji mercan û bedexşan û ji feyroz,
Eqîq û gewher û sengê şebefroz.

Ji bêhnê xoş û misk û u'd û enber,
Kirin bar sed deve bilcumle yekser.

Ji hindî carîyan û a'ribê reş,
Du sêsed bûn tamamê pence û şeş.

Ji gurecî û ji romî carîyan pes,
Du panced bûn tamamê xêst û şeş kes.³

310 Du şeşsed espê dûv qetranê wesme,⁴
Cewahirbend ji zêrrê rext û kesme.

Xudamê nasih û mehbûbê pencah,
Kirin hazir şehê Qehtan ji bo mah.⁵

Emir kir şah xudaman cumle yekser,
Tedarek ken letîfa mah û peyker.

Xudam hatin⁶ letîfa nazik endam,
Serê wê şuştin û anîn ji hemam.

Bi husna zîwerî dan mahê tezyîn,
Dused Ferhadî kuştin le'lê Şîrîn.

315 Keja⁷ û mehfe anîn pêşî dergah,
Di nav ewrê star bû çardeê mah.

Bi emrê şah li paşan cumle esker,
Bi rêda çûn, birin ew mahê peyker.

Bi Salih got û şah û dayî name:
„Bibûsî penceê şahê Êlame“.

Du pased namîdar çûn kuhê Elberz,
Werê kir şah mîsala Gîvî Goderz.

Wekalet hem bi Salih da şehinşah,
Ji bo eqdê nîkahê muhrê⁸ ba mah.

320 Li paşan çûn bi rêda ew be şadî,
Kirin tey menzil û sehra û wadî.

Bi şadî û bi kêyf û zewq û mesrûr,
Bi nêzîk bûn ji Mistrê ez rehê dûr.

Du kes çûn mijdebir bo şahê Asim,
Bû wan da şah du esp û kurkê qaçim.

Ku Salih hat û esker cumle dilşad,
Hedîye w nameê şah û perîzad.

Bi emrê şah di wê gavê delalan,
Nehêla kes biseknî qet di malan.

325 Ji bazar⁹ û ji sûkê Mistrê yekser,
Bi xas û a'm û hatin pêşê esker.

Çi mêr û jin, mezin û hem piçûkan,
Ne ma qet kes di malan û di sûkan.

Di pêşê şox û mehbûb û delalan,
Didan tirçîk bi hevra pîr û kalan.

Bi ser mehfe perîzadê durrefşan,
Bi xas û a'm kirin vêkra zerefşan.

Zenanê misiryanê g'emzeperdaz,
Ji mehfe anîn¹⁰ der ew g'unceê naz.

330 Di qesrek xasêda danîn ew mah,
Heta subhe bikin mehrê wê ez şah.

Me kir eqda dilê xwe ba cemalek,
Şîrîn û enwerîn û rû bi xalek.

Heta heşrê venabit ew mueyyen,
Ji wê bû dil teji şewq û muzeyen.

Wekî bêhna nesîmê fecrê sadiq,
Li zulfê enberîn da qelbê aşiq.

Bi bê cezbe dilerzî, hate recfê,
Li wechê gul belav bû taê zulfê.

335 Xudamê nasîh û mehrê wî çûn gul,
Li bal hevdu deranîn ce'dê sunbil.

Wekî miskê belav bûn taê zulfan,
Şîkavtin yek bi yek bişkoj ji qulfan.

Der anîn nerm û şîrîn dest ji came,
Ji xew rabû ji paşan newnemame.

Li hemamê ku rûnişt ew perîrû,
Li belgê gul belav bûn enberîn mû.

Letîfa nazenîn şûştin perîweş,
Le paş avêtine ser libsek muneqqeş.

340 Heta ku hişkî bûn gul ez gulavê,
Ji ce'dê enberîn, avê xunavê.

Muzeyen kirne ber çûn gul kirasek,
Li ser wergirtî ez sundus libasek.

Li ser ferqê wekî miskê bi du ker,
Şîrîn danîn û tacek zer ji gewher.

Cewahîrbend û elmas û mirarî,
Muselsel hatne xwar ser ce'dê tarî.

Ji ber xalanve yek-yek misk û enber,
Nuqet danîne ser wechê munewwer.

345 Du çehvên wê ji subhanê kirin reş,
Dibû qelbê uşaqan jê muşeweş.

Gelek bê dil kirin çehvê¹¹ xumarî,
Du ebrû wesmedan çûn qewsê tarî.

Guharên şebçirag' bend kir muheyya,
Di koşanda wekî êqdê sureyya.

Di enfê kir ji zêrrê saf wekî nûr,
Xezêmek lê di navda gewherek hûr.

Tejî kir gerdena zer durr û mercan,
Muselsel zêrrî çûn ser cotê fincan.

350 Wekî fincanê fêrfûrî du bustan,
Muşeweş kir dilê heyran û mestan.

Kemberbestin li bejna e're'rî şeng,
Du destên nazenîne bûne henareng.

Di engûştan kirin elmas û yaqût,
Li paşan kirne ber sencab û qapût.

Li ser ta paê xemlandin cebîn nûr,
Li ser textek zerîn danîne ew hûr.

Li paşan saqîyan anî mey û beng,
Muheyya kir mitirban neg'me û çeng.

355 Kirin zewq û surûr û kêyfê pêş mah,
Heta şev bît û zava Asimê şah.

Bi emrê îbinî Sefwan şahê Asim,
Ceme' bûn muftî û qadî û alim.

Wekîl bû Salih û damadî bû şah,
Bi tewrat û zebûr û hukmê ullah,

Birîn eqdê nikahê bintê Qehtan,
Ji bo wî şahê Asim îbinî Sefwan.

Li paşan rabû şahê dil munewwer,
Xiraman hate ber dergahê doxter.

360 Xudaman nêrî hev, ku ew meqale,
Bi hevra rabûn û dîwan betale.

Yekayek, cumle çûne der bi itmam,
Li paşan şahî go: „*El-sîn û wellam*“.

„*Elêyke*, - hem cewab da gul,¹²- *selamê*“,
Bi nerm û şirînî wê newnemamê.

Di hîna şah deranîn kurk û qapût,
Li ser kafûrê danîn le'1 û yaqût.

Kirin himbêzê hevdu, bûn hem ag'ûş,
Ji le'1 û rûyê hev dan bûseên xoş.

365 Li paşan ketine ser hev mihr û ba mah,
Du destên xwe li bejnê kir kemer şah.

Du saqê sîmê saf ez pûşt bi der kir,
Bi elmasê durrê nasufte kun kir.

Bi emrê şahê rebbê asîmanî,
Ji ewwel carê hemlê xwe hilanî.

Li paşê g'uslê şah û mahê dilber,
Bi hevra bûn heta roj bû munewwer.

Ji hevdu wan dikir ez işqê seyran,
Ji nûşîna meyê bûn mest û heyran.

370 Ji husna enwerî şîrîn perîzad,
Bi sed dil şahî aşîq bû çû Ferhad.

Bedel wî şahê Asim yek g'ezel xweş,
Reqem da aşîqê bê dil Sîyahpûş.

G' E Z E L

Ya rebb, çi eceb mame li wê husn û cemalê,
Wê dêmzerî û surperî û ebrû hîlalê.

Çîn-çîn li xwe berdane sîyah zulfê muenber,
Marên di reşin cumle dîkin e'zmê qîtalê.

Cebhet wekî bedrêye munewwer xetê reş lê,¹³
Bê cezbe dilerzîn li teref zulfê delalê.

375 Ebrû tu dibêy cedwelê neqqaşê kêşandin,
Bê surme sîyahin li xwe çaw şubhê¹⁴ xezalê.

Bînî¹⁵ wekî elfê xetê katib lê reqem day,
Ebrû we li ser hatine, her yek şubhê dalê.

Lê ez ji xizêma qeneffîlda¹⁶ mame heyrî,
Zêrrê ji xwe xalis bû wekî nuqteê dalê.

Xeddeyn li mîsalê qemer û şemsê¹⁷ duha bûn,
Du goşê li perwînê guhar û têne balê.¹⁸

Naête hesabê sifetê sîmê binagûş,
Çend tuhfe hejandin taê reş, baê sebalê.

380 Le'leyn we şîrîn kes nedîbû dewr û zemanan,
Şehd û şeker û qend û nebat nîn¹⁹ di xîyalê.

Çûn g'unçe dihen teng wekî helqeê yaqût,
Elmas û mirarîne didanên wê şepalê.

Çaha zeqenî Zemezeme yan e'ynî heyate,
G'ebg'eb wekî sêvê bag'ê Ridwan di fesalê.

Gerden wekî şûşê safîye, dûre ji eyban,
Zulfê di reş xal lê dikin ceng û cidâlê.

Teşbîhê g'ezalêye bi gerden tu nezer dey,
Mercan û durr û yaqût û zêrr têne sefa lê.

385 Singê spî û sadeye lewhê sîmê²⁰ safe,
Narinc û tûrincên ter û leymûnê zîba lê.²¹

Mabeynê di²² narincan muneqqeş bû mudewwer,
Neqşek ji wê neqşê weke neqşê heyûla lê.

Bişkojê serê fincanê fêrfûrî ji zêrr bûn,
Tiflê dilê uşaq û li ber weyl û wela lê.

Qamet wekî şemşad û ney û e're'r û serwî,
Çîn-çîn sefê şehmarê bi serda muşîha lê.

Ta kengê Sîyahpûş tu di medhêda bibêjî,
Şoxî-yû ter û nazikî, horî û cemalê.

SERÊ VII

*Zavatya Salehe bi carya şeng, we welidîna Seyfulmuluk û
Sedelmuluk bi nav û deng*

390 **Ji** şemsa xawerê eywanê şahî,
Di hîna bû munewwer murg'ê¹ mahî.

Muferreh bûn û teyran kerdî perwaz,
Be derket şah ji perdê mehremê raz.

Xiraman hate ser textê durrefşan,
G'ulaman kir bi ser şehda zerefşan.

Cemaet cumle hatin ehlê dîwan,
Yekayek merheba da şah ji bo wan.

Li paşan çeng û nay û xemr û saqî,
Bi hevra bûn li dîwanê mulaqî.

395 Şerab noşîn ji destê meyfiroşan,
Neyê kir nale û tenbûr xuroşan.

Ji şahra xasî bû yek carîye şeng,
Simen bû û perîrû û dihen teng.

Cebîn bedir û du ebrû qewsê tarî,
Eceb qetalî bûn çehvêd xumarî.

Li ser ta pê ji husnê reng² perî bû,
Ji nuqsan û ji eyban ew berî bû.

Ji istebireq wekî horan³ xemilî,
Letîf û nazenîn sorgul kemilî.

400 Ji Salihra eta kir ew perînaz,
Di gel çend xele'ta şahê serefraz.⁴

Bi emrê tacêdarî nûrê tele't,
Bi bêhed û qîyas anîn û xele't.

Yekayek, dû bi dû wan⁵ cumle yekser.
Ji bo pîr û cuwan û cumle esker.

Wê rojê ta êvarê zewq û aheng,
Kirin badan û eta û ney û çeng.

Ji dîwanê ku rabû Asimê şah,⁶
Berê xwe da derê burcê heremgah.

405 Çeleng xoş rabû Salih ba dilê geş,
Xiraman hate bal şoxa perîweş.

Ku sohbet kir di gel alîcenabî,
Hilanî hemlê xwe wê mahêtabî.

Li paş çend rojê xelqê kir nezare,
Ji hemlê herduan bû aşêkare.

Beşaret dane şahê reng bedexşan,
Ji hemlê carî û mahê durrefşan.

Emir kir, mu'tedil den wan teaman,
Hemî înan xisûsa subh û şaman.

410 Wekî neh mah û neh roj çûn temamî,
Beşaret hate⁷ wî alîmiqamî.

Letîf û dilbera şoxa yemanî,
Kurek bû ehzen û hemlê xwe danî.

Di gel wî mujde da yek merdê nasîh,
Ji hemlê cariyê kur bû be Salih.

Beşaret, hey beşaret, xoş beşaret,
Şeh û malxu biken malê xwe g'aret.

Delalan⁸ gazî kir miskîn û muhtac,
Xezîne herduan ken bo xwe tarac.

415 Ji Misrê ê bigotan qet tunîne,
Ji wî malî ew bû sahib xezîne.

Wekî mizgînî da şah û wezîran,
Zer û ne'met bi derwêş û feqîran.

Emir kir şahî ba çend merdê nasîh,
Ku hazir ken li dîwanê me Salih.

Ku Salih hat û bûsî erdê xîdmet,
„Beqa bî,- go,- ji bo şah, text û dewlet“.

Bi Salih got ewî⁹ şahê serefraz,
Tilu' fecrê kir ez bextê ber raz.¹⁰

420 „Şukur şa bû dilê me şubhê Yeqûb,
Bi dîdarê ruhê dûr¹¹ Yûsufê xûb.

We qence tu bişeynî carî û kurr,
Heremgaha meyê mehbûbê çûn durr.

Mezin bin ku bi hevra yekşevî mah,
Yekî bîtin wezîr û ya dî bî şah“.

Mufferreh bû dilê Salih ji sohbet,
Temenna kir dibûsî erdê xidmet.

Wurê¹² kir wê demê wî îbin û carî,
Heremgahê serefrâz tacîdarî.

425 Kurê xo nami kir Seyfulmuluk şah,
Diger Sedelmuluk û bo wî hemrah.

Li paşan hatne pêş bêhed munecim,
Bi e'mrê şah hekîm û hem muelim.

Ji tali'ê¹³ xeberden, xeyr û hem şer,
Ji bo Xosrew beyan ken nefî', eger zer.

Muneciman li hev dan sewr û mîzan,
Îtarîd û esed, cewza¹⁴ û sertan.

Ji delw û hût û heml û eqreb û qews,
Muqabil bû ji cedî û se'd eger nehse.

430 Munecim hatne pêş şahê serefrâz,
Ji bo bextê puser kir cumle ag'az.

Ku necmê tali'ê wî hate qewse,
Ji bo Seyfulmuluk û Sehd û¹⁵ nehse.

Ji ilm û merîfet, adab û erkan,
Suwarî w nîzebazî, go û çogan.

Nehin qet kes misala wî beraber,
Diket wî mulk û tac û textê axer.

Welê ku çarde sal burîn ji umrî,
Ji derdê işqê dê bnalî çû qumrî.

435 Sebeb wî dê hilak bitin ji mexlûq,
Welê axir dibit şa ew bi meşûq.

Dirêj dêbît û umir û hem bi şewket,
Xudêtirs û bi e'dil û dad û dewlet.

Ji derdê işqê kor bû şah bi mehzûn,
Ji çavan av rêht û ez zemîr xûn.

Welê espare kir wî şehriyari,
Ridaê xwe bi emrê kirdigarî.

Li paşan şah emir kir çend şepalan,
Godayîn bin li ser herdu tefalan.

440 Heta heftsale bûn ew cohte gewher,
Du exter bûn di burcekda munewwer.

Bi ilmê menzilê cuhlê biken tey,
Ji nûrê merîfet qelbê mirî hey.

Kesê bê ilmî be, ew bê kemale,
Nihin¹⁶ haê ji surrê zulcelale.

Wekî heftsale bûn ew alîmenseb,
Bi emrê şah û herdu çûne mekteb.

Bi te'cîl çêkirin hicrek muneqqeş,
Ku bixûnin di navda ew du mehweş.

445 Tê raxistin firaşîn zêde cindî,
Ji sof û etles û dîbaê hindî.

Bi ser ferşan kirin xoş enberefşan,
Der û dîwarê hucre bûn zerefşan.

Di g'ayet zîwerî¹⁷ û zînetî bû,
Mîsala qesrekê ji cennetî bû.

Bi şayî çûne nav herdu selîm tebi'h,
Qebûl kir wan emrê bîlqelb we semi'h.

Muelim hatî merdek zêde wer'ê,
Tecawez qet nebû esla ji şer'ê.

450 Bi cumle ilmuha yekser xebîr bû,
Ji adabê kemalê bê nezîr bû.

Şerî'et xoş dizanî, hem terîqet,
Muhîd bû der zemîr durrê heqîqet.

Qelemkêşa ji lewhek safê ez sîm,
Elîf û bê û tê, heta ku bê cîm.

Bi avê zêrr nivîsî xetê kûfî,
Temam ebced ji ekî ta ulufî.

Muelim da bi dest wan lewhê sîmîn,
Bi carek elf û bê wan kirne telqîn.

455 Muedeb herdu rûniştin muqabil,
Ji sêydaê xwe pirsîn çend mesail.

Çi me'na tê ji elf û ta bi yaê,
Ji huba wehdetê barî xudaê.

Bedel seyda ji elf û bê Sîyahpûş,
Bi inşâ' kir tamamî yek g'ezel xoş.

G' E Z E L¹⁸

Elif ullahû la îlahe îllahû di me'naê,
Beraet purr muşeweş tê ji xala nuqteya baê.

Tebarek xwendî herfê ta ji husna ehseên dilber,
Wekî summestewa remzek qelem da nuqteên saê.

460 Cemala cîmû we nnecmî, weke perwane ez sotim,
Welê haên di hamîman heyata bêdilan daê.

Tecellaya cemala heq wekî perwane ez sohtim,
Me xef kir ew şîrîn esrar, çi deng û his ji min naê.

Xîyala xaê la xaufin elêyhîm kê dîye îro,
Ji remza dalê ud'unî beyan ket ew bi inşayê.

Ji zala uzkirûnî ger çi dil sohtin qewî îro,
Ji raê rehmetun mina heyata cawîdan daê.

Binê zeynê çi reng uzlê fetul cennet bi me'nîda,
Selamun qewlen go sînê di remza wê mue'mmaê.

465 Şua'a şînê we şemsî weke perwane ez sohtim,
Sedaê sad wel Qura'nê çû heta bi Cewzaê.

Çi xoş dadê wudû bestim di dew'ê we duha-yêda,
Tihûr bû dil bila şubhê bi herfê taê tahaê.

Zihûr kir zaê we el zahêr mucellaê ser ewreşan,
Ji e'ynê endehû e'crûn ezîm danî di tug'raê.

Ji g'eynê g'asîqin îro, eger çi dil bi azarim,
Mufferreh tê dilê aşîq ji wî faê fetehna-yê.

Ji qafê qul hû wellahû ehed cana çi mektûbe,
Di gel kafê di kullun men elêyha fan we îmzaê.

470 Ji lamê len tenalu el birê heta tunfiqû îro,
Me can û mulk û dil bexşîn di rîya wê semensaê.

Ji bo dînê me pirsek kir, cewabê len teranîda,
Ji dil sohtim gelî yaran, ji dest nûrîn şekerxaê.

Binê mîmê di ma kane Muhemmed-da çi nîşan kir,
Çi cah û mensebek çê bû nezer den ehzen esmaê.

Eceb nûn welqelem min dî di remza qabê qewseynê,
Ji wawê we leylî îro şefeq da nûr û ruhnaê.

Ji haê huwel hûtî nehen nefsê bi me'nêda,
Ji lam elfê layû dîû' ecrel muhsinîn daê.

475 Ji ya yawmê yakûnûn nasû pirr xewf û muşewş tê,
Sîyahpûş xoş nezim anî temamî herfê hêcaê.

Me xar camek şeraba xoş bi destê saqîyê mehweş,
Wekî min hişt-û Îran û berê xwe da bi Beg'daê.

Di hîna ew du feydî bûn ji dersan¹⁹,
Xilas û hem zebûr xwendin bi dersan.

Ji tewrat û suhuf û ilmê mayî,
Hemî xwendin dû feyzê yek²⁰ xudayî.

Çi serf û nehew, mentîq û çi heye't,
Çi ustirlab û adab û eqîdet.

480 Bedî' û hem beyan xwendin ez uluman,
Ji reml û hem felekyat, nicûman.

Di cifrêda kirin xoş muşikafi,
Uruz xwendin tamamî wan bi safî.

Tefasîr û ehadîs û şerîet,
Hemî xwendin tamam dest dan terîqet.

Ji seydaê xwe wergirtin îcazet,
Kirin meşg'ulê xwe ba rîyazet.

Nifûsê sabî'e yekser li hev dan,
Eqîq û cewher û elmasê tevdan.

485 Ji²¹ paşê qebdê bestin ku dihatin,
Celal û hem cemal û cezbe hatin.

Ji behrê hîret û eciz û tesewwur,
Bi derkeftin meqam û çûn ser tefekkur.

Tesewuf xwandin û zanîn heqîqet,
Ji ilm û dersê işqê bûn ferîqet.

Wekî musteg'nî bûn ez dersê işqê,
Bi hevra herduan dest kir bi meşqê.

We reng bûn ew, bi mislê wan nebû qet,
Çi²² xetatê bi wanra deynî ser xet.

490 Di inş'a'yê xweda munşî bûn ew purr,
Ji elfazan dirêhtin gewher û durr.

Ji neqaşê neqîşan neqş kîşan,
Ne tewrat û zebûran jê xeberdan.²³

Ji neqaşê fikir wan neqşê texmîn,
Wekî Manî nabe²⁴ neqaşê çîn û maçîn.

Di şî'rê herdu manendê Lebîd bûn,
Di eyamê xwe ew herdu ferîd bûn.

Mîsala neg'meê Dawud û ewan²⁵ deng,
Li sed reng lêdidan tenbûr û hem çeng.

495 Di hîna ku binoşîyan meyî û benc,
Dibûn meşg'ûl bi le'bê nerd û şetrenc.

Ji rûxê²⁶ hev didan wan fil û ferzîn,
Wekî Behmen di gel Azade Berzîn.

Eger hazir bîyan sed merdê aqil,
Di le'bêda nebûn ba yek muqabil.

Çi le'b û mûsîqar û rûdê şahî,
Şiya ling û çî brbit goşê mahî.

Yekayek cumle adabê suwarî,
Hilanîn herdu durrê şehrevarî.

500 Kemend û nîzebazî, go û çogan,
Çi tîrendazî û mertal û cewlan.

Mukemmel bûn ji adabê kemalî,
Di hîna herdu bûn ew çardesalî.

Îlahî tu mukemmel kî, îlahî,
Îman û sidqê min sahib gunahî.

Big'efrînî gunehanê Sîyahpûş,
Ji camê muhbetê key mest û medhoş.

Munewwer key bi rehmet ya mûmeced,
Ji nûrê merîfet qelbê Muhemmed.²⁷

SERÊ VIII

*Tecrubekirina Seyfulmuluk û Sedelmuluk di kemal û
şetaretê û bexşîşkirina wane bi caizan, li ber êl û cimaet û
eşîretê*

505 **D**i hîna g'unçe pişkivt ez gulistan,
Xûmarî bûn uyûnên meyperestan.

Sedaya endelîb û sewtê bilbil,
Ji xew rakir şîrîn du nergisê gul.

Di alemda gera deng, ew xeberdan,¹
Munewwer bûn bedir ez burcê Sefwan.

Meelqise, ku seyda dîtî ew reng,
Mukemmel bûn du gul ez bag'ê ew şeng.

Di gel subhê ku „şemsê *we duha*“ xwand,
Mufferreh ber bi dîwanê qedem rand.

510 Cewab çû şahê Asim: „Hatî seyda“,
Surûr û xuremî bûn bo wî peyda.

Go: „Bînin, hey g'ulaman, wî bi izaz,
Li bal min cihê wî çêkin bi sed naz“.

Herîfan anî textek purr ji gewher,
Muqabil textê şah danîn beraber.

Muşeker hatî, seyda û çû ser text,
Dua kir wî ji bo şah tali' û bext.

Şehê Asim ji wîra merheba da,
Selam û emn û hem xêyr û sefa da.

515 Go: „Bînin,-şahê Asim,- şerbet û mey,
Ji xemra xas, ku miryan û diket hey.

Ji bo seydaê me dil pê biket geş,
Li paşan xoş xeberden halê mehweş“.

Gulab û şerbet û hem xemr û saqî,
Li dîwanê bi hevra bûn mulaqî.

Reşandin ser serê seyda gulabe,
Li paşan dane dest xemr û şerabe.

Wekî serxoş bû seyda în çinîn guft,
Cewahir rêhtin û elmasêha suft.

520 Bi urfan got ewî: „Ey şahê Asim,
Nema qet kes di دنیاê çî² alim,

Ku ilmê wan me ne anibîye ber kuf,³
Heta Loqman û Eflaton û Asuf.⁴

Bi carek min nîşan Seyfulmuluk da,
Ji ber min wî nîşan Sedelmuluk da.

Ji adabê suwarî û nîzebazî,
Çi le’b û nerd û şetrenc û tenazî.

Hilanîn yek bi yek, cumle bi itmam,
Ji şerq⁵ û le’b û cumle xas û hem a’w.

525 Nema esla di دنیاê çî⁶ urfan,
Nizanin ew bi wî, ya îbinî Sefwan“.

Wekî Asim bihîst ew reng ji seyda,
Hezar kêyf û surûr bûn bo wî peyda.

Li ser ta pê şeland xwe şahê Asim,
Ji bo seydaê purr urfan û alim.

Li paşan gote seyda: „Tu çirayî,
Di gel min tu ji yek pişt û birayî.

Çiqasî min hebî, tu jî şerîkî,
Purr û endik, ji sed heta ba yîkî“.

530 Li paşan şaho⁷ emrê çawîşan kir,
Letîf û nazenîn û mehweşan kir.

Di gel Saliho Poşîn îbinî Hame,
Musahîbê dîwanê xas û a'me.

Ji mîr û begleran û merdê qaif.
Ji aqîl û çî dana, merdî arif.

Biçin yekser pey Seyfulmulukî,
Di hicrêda di gel Sedelmulukî.

Di hîna çawîşan kir ban û gazî,
Ji dengê kerrena û tebil û bazî.

535 Du çar nehse hezar faris mucewşen,
Dibên, hatin bi sef, tîp-tîp, bi qewşen.

Ji reng Têymûr û Berzo û Gîwî Guderz,
Kerîman û Cihangîr û Feramerz.

Kirin arasite eywan û hem text,
Ji bo şehzadeê ba tali' û bext.

Tê raxistin firaşê sof û etles,
Zerefşan dane wa taqê muqewwes.

Gulab û misk û anîn lê reşandin,
Ji ferşê etlesê enber fêşandin.

540 Der û dîwarêha bû enberamîz,
Li ser burcan vewestan fitne engîz.

Xumar û serxoşan zewq û hizûre,
Ji her şeş cîhetan kêyf û surûre.

Mitriban girte destan naye û çeng,
Mug'enî da li tenbûrê li sed reng.

Bi emrê şahê Asimê xudanbext,
Du esp anîn ji zêrrê kesme û rext.

Di gel du destê libsê zêde faxir,
Du tancê⁸ şahêwarî purr cewahir.

545 „Biben yekser ji bo Seyfulmulukî,
Di gel hem sohbetê Sedelmulukî“.

Ku çûn cumle di gel Salih beraber,
Di burcekda deranîn⁹ ew du exter.

Libasê faxire xoş kirne ber wan,
Du tancê şahêwar danîne ser wan.

Wê rojê du hezar mehbûbê nadir,
Ji mehbûbanê Misrê bûne¹⁰ hazir.

Li ser ta pê g'ereq ez zêrr û gewher,
Bi misk û enberan ew bûn muetter.

550 Kesê dîbanî ew mehbûbê mehweş,
Bi bê beng û şerab dêbûne serxweş.

Ku wan çavê xwe da Seyfulmulukî,
Cemala dilkeşî Sedelmulukî.

Bi hevra navê xwe ji lewhê kirin hek,
Go hîv û rojin ew,¹¹ la reyb û la şek.

Weya ruhanîne ew hatne erdan,
Birin rengê royê nesrîn û werdan.

Me lew zanîn çi¹² qedir û qet ne tiştin,
Ne mehbûbin û belku zêde ziştin.

555 Meelqise, bi cewzara beraber,
Kewakib çûne destê mahê enwer.

Ku yenî Salih û cumle guşade,
Yekayek çûne destê şahizade.

Du esp anîn û reftar berqê lami',
Ji bo şehzadeên ba bext û tali'.

Di gel şemşîr û gurz û nîze û tîr,
Museleh bûn suwar ew cohte pismîr.

Sedaya çawîşan gerya di şehre,
Ji etrafan dihatin xelqê Misrê.

560 Temaşa ken rûyê Seyfulmulukî,
Cemala dilgeşî Sedelmulukî.

Bi girda-gerdê şehre ew gerandin,
Bi meydanê suwaran ew gehandin.

Suwarên cindî û meşhûrê meydan,
Di ber xwe avêtin wan go û çogan.

Muqabil hev vewestan sef beraber,
Şiqîna goyê çû ber çerxê exder.

Tealallah ji wan cindî suwaran,
Di dest wandaye çogan, zulfê yaran.

565 Ku meydan arize, go xal û g'ebg'eb,
Gelek mecnûn kirin Lêyla şekerleb.

Meelqise, du pismîrê di gulbav,
Ku wan dî, go li meydanê biheştav.

Kirin ne'rî û pehnî dane rexşan,
Bi lez dest dane çoganên zerefşan.

Bi ser meydanêda çû mah û xurşîd,
Mîsala Heyderê G'azî û Xalîd.

Suwarên namêdar bûn cumle yek sef,
Di gel Saliho Poşîn çogan¹³ der kef.

570 Sefa dî herdu mehbûbê dilawer,
Vewestan xoş muqabil wan beraber.

Kirin ne'rî-yû g'errê-yû xuroşîn,
Cemîyê esker û Saliho Poşîn.

Bi tecîl go li meydanê revandin,
Be pêşî herdu şehbazan gihandin.

Li serda hatinê şehbaz û şahîn,
Bi kaşûê hîlanîn goyê zerîn.

Ji destê wan deranîn go bi le'bê,
Ji şerqê lêdidan heta bi g'erbê.

575 Heta deh ser tamam bû go nedan kes,
Du cindyê farisê danaê eqdes.

Suwarên namîdar mabûn muheyyer,
Di gel Saliho Poşîn cumle yekser.

Ji wan şîrîn suwarê çapik û têtz,
Zulf û çogan, go xal û leb şekerrêz

Cebîn meydane, lê go xalê zengî,
Dileyzîn xoş li ser mexmûr û bengî.

Li paşan kirne rimbazî û cewlan,
Ji dest xo avêtin wan go û çogan.

580 Du car nehse hezar¹⁴ farisê xunxwer,
Bi hevra hatne wan şêrê dilawer.

Du cindî namîdaran kir xuroşîn,
Li serda hatinê Saliho Poşîn.

Wekî ew rengi dî Xalîd û Heyder,
Bi hevra herduan da qelbê esker.

Ji rast û çep diavêtin bi herban,
Neda kes wan şehan destê çî¹⁵ derban.

Wekî Berzo û Zehrabin¹⁶ di cengî,
Şîkîrand eskerê purê peşengî.

585 Li serda nee'reên Seyfulmulukî,
Di berda hohoyên Sedelmulukî.

Sef û tîp û suwaran têk şikandin,
Du çobanê şîrîn pez vêk gihandin.

Bi hevra çawîşan sed barekellah,
Digo ruhanyan *nesrun mîn ullah*“.

Ji wan cindî suwarê mest û dilêr,
Çeleng û çapik û çespan wekî şêr.

Muhessel, go wê rojê ta bi esrê,
Kirin zewq û berê xwe dane qesrê.

590 Mug'enî da li çeng û tebl û naê,
Dinê ker bû ji dengê kerenaê.

Çi xelqê şehri û xelqê sipahî,
Zerefşan û durrefşan kir bi şahî.

Bi ser wan du suwarê şubhê Yûsuf,
Dilêr û cindî û sahib telettuf.

Di hîna çûne ber dergahê e'zem,
Du pismîr û sipahî cumle ba hem.

Peya bûn xoş ji wan espê zerefşan,
Berê xwe dane eywanên durrefşan.

595 Du pismîr çûne ser textê muresse',
Ji elmas û cewahiran mulemme'.

Ji Asimra hebûn deh xûbê mehweş,
Sîyah çeşm û xumar û mest û dilgeş.

Letîf û nazik û mehbûb û dilber,
Zeqen sêb û dihen g'unçe, leb ehmer.

Tejî bû gerdena wan durr û mercan,
Muneqqeş bûn di ber wanda du fincan.

Milî¹⁷ bûn ew ji xemrê meyperistan,
Qed û qamet wekî serwê gulistan.

600 Wurê kir cumle bo Seyfulmulukî,
Di gel deh dî ji bo Sedelmulukî.

Di gel çend gurgîyan û a'ribê reş,
Li ser ta pê bi zîba û muneqqeş.

Bi şadî roj bihurandin heta şam,
Nezer ken dê çi bît axir serencam.

Ji xidmet şahizade cumle esker,
Vegeryan ber bi qonag'ê xwe yekser.

Ji pismîran standin rext û cewşen,
Ji şem'ê rûyê wan bûn qesrê rewşen¹⁸.

605 Bi fanosan kirin eywanê enwer,
Vewestan gurgî û carî beraber.

Bi emrê şahizade xwanî zerrîn,
G'ulaman anî û danîn bi tezyîn.

Tejî bû xwan ji enwa'ê teaman,
Şerab û qend di nava¹⁹ tas û caman.

Di destê saqîyanda bûn du fincan,
Meyê heftsale û xoşabê rumman.²⁰

Li paşê xurînê, nuqîl û kebabê,
Meyê heftsale û qend û şerabê,

610 Kirin zewq û surûr û kêyf û xoşî,
Ji awazê neyê, tenbûr xuroşî.

Di hîna ku bihurîn pêncê sahet,
Bi şadî meylê kir wan isterahet.

Li ser textê cewahirbendê me'mûr,
Di xewra çûn du şêrê mest û mexmûr.

Xewa şîrîn çî xoşe ba dilê xoş,
Were, ey saqîê zîba û serxoş.

Bi yek fincan meyê du heftê saleh,
Dilê mehzûn bike şeyda û waleh.

SERÊ IX

*Dayîna şahê Asim ba kirasî ji bo şehzade û dîtina wîye
şeklê qîzê li ser wê libasî û aşiqbûna wî û mubtelebûna
wîye zêde ji qîyasî*

615 Di hîna ku tilu' da fecrê sadiq,
Sedaya bilbilê şeyda û aşiq.

Ji xew rakir¹ uyûnîn meyperistan,
Nesîm da çîçek û terheyn gulistan.

Çeleng rabûn û gurcî dilguşade,
Şîrîn dan² bûse pîyên³ şahizade.

Bi nermî carîyanê serxoş û mest,⁴
Didan bûse serê enguşt û ba dest.

Du çeşmê nêrgisîn rakir ji xwabê,
Ji bêhnê enber û⁵ misk û gulabê.

620 Ji zulfê carîyan hatî dimag'î,
Hilanî ser şîrîn çeşm û çirag'î.

Bi hevra bûne ew herdu xudanbext,
Pes ez dewatê subhê çûne ser text.

Bi yek sef bûn û gurc⁶ û a'ribê reş,
Sefa dî carîyê mehbûb û mehweş.⁷

Vewesta bûn muqabil hev⁸ beraber,
Di⁹ xidmet pûrê şahî tacê ber ser.

Gerandin saqîyan şûşê şerabê,
Fîg'an kir têlê tenbûr û ribabê.

625 Ji awazê ribabî, têlê¹⁰ tenbûr,
Lebê camê meyê saqîyê mexmûr.

Gelek aqil bûyîn mecnûn û şeyda,
Nizanin tiştêkî ew g'eyrî Leyla.

Sedaê aşîqan çû çerxê e'zem,
Heta şemsê tilu' da cumle alem.

Di hîna şemsê xetê we zuha xwand,
Bi hevra berbe dîwanê qedem rand.

Du pismîrê xudan irfan û alim,
Selamkarî biçîn pêş şahê Asim.

630 Xiramên şubhetê kebkan¹¹ bi hemrah,
Du pismîr çûne dîwanê şehinşah.

Temena kir şîrîn û bûse dan text,
Dua kir wan ji şehra tali' û bext.

Bi emrê şah du kursî zêrrê sade,
Kirin hazir, çû ser yek şahizade.

Ê dî Sedelmulukî badepêyma,
Çû serda û rûniştin mah-û sîma.

Nezer kir şah ji wan mest û xumaran,
Misalê aşiqan ber rûyê yaran.

635 Dilê şah bû guşade, zêde mesrûr,
Bi wan du tacêdarê mest û mexmûr.

Ji sidq û dil digo: elhemdû lîllah,
Hezar û sed hezar: eşşukru lîllah.

Bi çavê xwe me dî rûyê dilawer,
Dilê min bû bi wî mesrûr¹² enwer.

Dibên, wê rojê nehse dî mîr û begler,
Rûniştîbûn li dîwanê beraber.

Ji g'eyrî¹³ Saliho Poşînî Hame,
Xusûs ehlê dîwanê xas û ame.

640 Bi mislê kewkeban bûn cumle yekser,
Ji etrafê meh û xurşîdê enwer.

Şehê Asim we reng go ba xezîndar,
„Werîn sindoqê xasê min tu, ey yar“.

Xezîndar anî sindoqek muresse',
Cewahirbend ji elmasê mulemme'.

Bi muftê fetih kir babê mug'elleq,
Deranî şah di navda zerfek ebleq.

Kirin xaric ji zerfî şahî derhal,
Cewahirbend ji zêrrî heyjde desmal.

645 Deranî şah ji wan etles pelasek,
Di nav wî bû ji istebreq libasek.

Du engustîlê qaş ez le'lê¹⁴ feyrûz,
Ne wek van bûn û ew belkî şebefrûz.

Şeva deycûrfî mislê zilf û xalan,
Diîsan herdu qaş şubhê¹⁵ şemalan.

Kirin hersê zîyaret şah bi dilsûz,
Di destek girte libas û qaşê feyrûz.

Kirin eta ji bo Seyfulmulukî,
Le'l avête ber Sedelmulukî.

650 Şekerrêz bû zubanê îbinî Sefwan,
Go: „Ev hersê hediye ez Sulêyman,

Ji minra hatine purr qedir û qîmet,
Ji wan tiştekan me nîn bêtir bi hurmet.

Me hersê dan ji bo we, ey serefraz,
Di ger herçî ku meqsed bê tu bixwaz“.

Temena kir, dibûsîn erdê xidmet,
Du pismîrê xudan îqbal û şewket.

Li dîwanê şehinşahê muzeffar,
Şîrîn rabûn û ew herdu dilawer.

655 Xiramîn, nazenîn, mehbûb û mehweş,
Berê xwe dane eywanên muneqqeş.

Bi kêyf û xurrem ew herdû xudanbext,
Misala roj û heyvan çûne ser text.

Bi sef westan muqabil gurec û carî,
Di gel çend saqîyê mest û xumarî.

Mitriban girte destan¹⁶ naye û çeng,
Bi caman saqîyan anîn mey û beng.

Çû çerxê heftimîn awazê mitrib,
Kirin zewq û xoşî heta bi meg'rib.

660 Nezer ken hûn ji le'bê wê şeva reş,
Çi dê bînit bi ser pismîrê mehweş.

Were saqî, werîn camê mehebed,
Ku hişyar bîti dil ez sîrrê wehded.

Di gava ku vexum fincanê işqê,
Bibarînim ji dil mercanê işqê.

Were mitrib di gel çengê bibêje,
Newaê mehbetê xwînim birêje.

Dilê ku tê nebit enwarê işqê,
Ji wî dûre gelek esrarê işqê.

665 Di hîna zag'i şeb şehper belavkir,
Siyeh zulfan li ser enîyê silav kir.

Li ser burcan firîn teyrê wusalê,
Ji kişîna¹⁷ nesîm û zulf û xalê.

Ji bo şehzadeê mest û dilawer,
Ji şem'ê kir şepalan qesrê enwer.

Li pêş danî¹⁸ delalan xwanê zêrrîn,
Ji enwa'ê teaman bûyî rengîn.

Li paşê xwarinê, nuql û şerabê,
Kemançe çû selam têlê ribabê.

670 Li ser têlan ku hat û çû kemançe,
Mug'ennî da li ser teblê tebançe.

Ji ber awazê mitribê şekerxend,
Şîrîn rewhanîyên ba reqs û govend,

Kirin zewq û surûr ehlê mulaib,
Di xewra çûn heta çeşmê kewakib.

Nema¹⁹ qet kes ji mexmûrî bi hişyar,
Ji gurc û carîyanê mest û xumar.

Welê wan du emîran qet nehat xew,
Heta sê payî buhurandin ez an şew.

675 Ke ez wasêteê libsê muneqqeş,
Cewahirbend durrexşan zêde dilkeş.

Bi hevra wan dinêrî libsê zerbeft,
Saet çû ta şevê kanûnê du heft.

Di hîna ku bihurîn çarde saet,
Meyil kir pûrê Salih istirehet.

Di xewra çûn li bal Seyfulmulukî,
Du çeşmê nergisî Sedelmulukî.

Li paşan ma bi تنها mîrê mehweş,
Ji işq û dil dinêrî libsê dilkeş.

680 Ji hev pişkafî²⁰ libs û qenc nihêrî,
Cewahirbendi bû yekser ji zêrrî.

Li ser dî²¹ sûretek herkes²² nedîde,
Bi çeşman û ne gûş, ez kes şunîde.

Ne neqaşan bi hikmet neqîş kêşay,²³
Ne tewrat û zebûran jê xeberday.²⁴

Di hîna dîtî sûret mîrê sadiq,
Recfê girt û bi sed dil lê bû aşiq.²⁵

Dilerizî û direcfî ew bi bê cezb,²⁶
Ji ferq û sîneê xwe wî didan zerb.²⁷

685 Ji wê rabû çû kuncêk zêde tarî,
Digirya û dikir efg'an û zarî.

Ji derdê işqê bû bê sebir û taqet,
Neman²⁸ bo wî qerar û sekn û rahet.

Dil û cerg û ceger bûn pîrr ji ateş,
Gehî hişyari bû, ew gahî bêheş.

Serê xwe danî ser dil şubhê jojî,
Kesê aşiq bî dê dil lê bisojî.

Dilê xwe wî diguviştî û dikir²⁹ ah,
Dûxanê dil mijî bû pêşberî şah.³⁰

690 Di gel ahan³¹ ji çehvê wî dibûn rêz,
Dused qitre çû ateş, germ û hem têz.

Ji ahîna dilê rencûrî³² xûnxwar,
Dinalîn cumle yekser dar û dîwar.

Dişewitî dil ji işqê şubhetê zeyt,
Dinalî-yû digotin in çûnîn beyt.

G' E Z E L

Ez nizanim ew çi sûret bû me dî der cameê,
Şubhê şem'ê sohtê cergê min³³ wekî perwaneê.

Waê weyla, soht û³⁴ qelb û³⁵ ez kirim mest û cinûn,
Lew me qesde secde bem ber saqîyê meyxaneê.

695 Min qebûlin xemr û saqî, dêr û zunnar û senem,
Min nevên succade û³⁶ ewrad û³⁷ di gel sed daneê.

Ey hebîba, ger cehenem dave bit, tu dane bî,
Bi³⁸ qesem dê biçme navda ez bi qesda daneê.

Lê nizanim tu ji kêyî, ey Leyla ibnaê Tey,
Şubhê Mecnûnê zemanî rû bikem wêraneê.

Ez çi çar kem, kê ji derdê min xeberde, ey hewar,
Dê ji kê pirsim, nizanim menzilê³⁹ cananeê.

Şemê' cana⁴⁰ dûredeste, menzila min zulmete,
Ez ji kê gazinde kem⁴¹ bînî şemala xaneê.

700 Xozya roja wusalê da bixwe⁴² zulfê hebîb,
Ku bi mijgan ta bi ta kem ez misala şaneê.

Muhbetê kuştim Sîyahpûş şubhetê Seyfulmuluk,
Lew li ser min ferd û e'yne secdeya pûtxaneê.

Aşiqê sadiq ewe ê ku di rîya⁴³ dilberê,
Ger ewî bînin bi ker ken, neşkîni peymanê.

Karê şem'ê her şewata muhbeta sohtinê,
Lew disojîtin Îram⁴⁴ şubhetê perwaneê.

SERÊ X

*Beyana îşqa şehzadeye li sûretê zîba, we tuhmeta wîye bi
cinûn we tebdîra nivîştan we tebîba we bêhûdabûna se'ya
wan lebîba*

Di hîna rewneqa şemsê ji erdî
Bilind bû ta bi çerxê lacuwerdî.

705 Ji xew rabûn uyûnên murg' û mahî,¹
Ji tîrêjnan munewwer² qesrê şahî.

Çeleng rabû kurê Salih muşewweş,
Nihêrî çend,³ nedî pismîrê mehweş.

Go: „Hey, hey, ey eceb⁴ wî şehriyarî,
Hewes kirye nizanim weslê carî.

Du çêsmê kewkebê wî qet⁵ nehat xew,
Bi hişyarî buhurand cumleê şew?⁶

Ji cî rabû nihêrîn⁷ cumle carî,
Ketî⁸ xwabê xoş ez⁹ mest û xumarî.

710 Ji etrafan dinêrî, lê dikir¹⁰ deng,
Sedayek hate wî ez kuncenkî teng.

Ku çû dît şahizade der girînê,
Ji du çehvan dirêjî hêsir¹¹ û xwînê.

Di destanda¹² libas û sûretê mah,
Dinalî, lê dinêrî û¹³ dikir „ah“.

Dirêj kir destê xwe Sedelmulukî,
Revand libas¹⁴ ji dest Seyfulmulukî.

Libas kir pareh û go: „Ev çi hale,
Bi vî rengî girîn û ah û nale?

715 Çi hatî ser te, ey çeşm û çirayem?
Bibê¹⁵ bo min tu, ey şêrîn birayem.

Bi vê surrê,¹⁶ ku ez îro bizanim,
Bibin qurbanî te¹⁷ sed ruh û canim“.

Muhessel, çend xeber da Sedê çûn mah
Ji wî tişteke ne dî cuz nale û ah.

Ji nik rabû melûl û zêde mehzûn,
Xeber bir bo şehê g'emxwarî mecnûn.¹⁸

Çeleng rabû şehê Asim muşewweş,
Bi çespan hatî dît ew mîrê¹⁹ mehweş.

720 Dinalî-yû dikir efg'an û zarî,
Digirya şubhetê ebrê beharî.

Wekî şeh dîtî şehzade bi ew reng,
Çiqas pêra xeber da,²⁰ qet nekir deng.

Çunîn go²¹ şahê Asim ba nedîman:
„Ditirsim rastî be qewlê hekîman.

Ji derdê işqê bîtin ew hewale,
Wuha²² rengî fig'an²³ û ah û nale“.

Nedîm û arifan go: „Ey şahinşah,
Ji çeşmê zexmê dan an naleh û ah.“²⁴

725 Bişewtînin di berda u'd û enber,
Ji bêhnê xoş demag'î ken muetter.

Bila bân mu'teqîd û merdê qaif,
Musannif û xudêtirsan û arif.

Biken bo wî tilismat û niviştan,
Selîm dê bît²⁵ bi duaê ferîştan“.

Bi emrê şeh xudêtirsan û weri'î,
Ji nehsed zêde hatin cumle cemi'î.

Nivîsîn in *yekad* û ba²⁶ *tebarek*,
Tilism û çendi ayetên mubarek.

730 Di gel hirzê yemanî w nûrê qudsî,
Mee'l exlasê hizbûl *behrê kursî*.

Di gel ismê e'zîm û herdu cewşen,
Ji g'eyrê vanê çend esmaê rewşen.

Hemî yekser nivîsîn wek hemail,
Kirîn ber gerdênê²⁷ şirîn şemail.

Bixûr û misk û çîn û u'd û enber,
Di berda sohtin ew cumle bi yekser.

Nebû esla elacê derdê mecnûn,
Ji çehvan av dibarî-yû ji dil xûn.

735 Tekellum qet nekir esla wî ba kes,
Li sed rengî dinalî şubhê qeqnes.

Hekîm hatin nihêrtin nebze²⁸ û dest,
Rehê qolinc û rengê şahê sermest.

Nebûn alim ji derdê wî bi hikmet,
Ji rencê wî hılanîn zêde heybet.

Bi hevra go ewan:²⁹ „Ev derde zore,³⁰
Ji halê wî bûyîn em cumle kore.

Nihin ev derde *illa fi fuadih*,
Kî *subhane el lezî esra bi e'bdih*³¹.

740 Ji azarê dile, ew bê tekellem,
Bi lez tèn coyê³² ab ez çeşmê purr nem.

Bi emrê şeh li paşan dayekaneş,³³
Di gel ummê heqîqî dûrrfeşaneş.

Bi lez hatin bi hevra û bi te'cîl,
Ji pûrê³⁴ şeh biken meqsûdê tehsîl.

Çiqas pêra xeberdan,³⁵ şahizade
Nekir hasil ji wanra yek³⁶ mirade.

Girîn û şîwen³⁷ û zarî û aheng,
Kirin, danîn³⁸ û şehzade nekir deng.

745 Li nik³⁹ rabûn melûl û aciz û zar,
Teheyûr bûn ji halê wî bi yekcar.

Dinalî şahizade şubhê qeqnes,
Ji halê wî me çêkir in muxemmes.

G' E Z E L

Îro me ji dest g'unçe leban nale⁴⁰ ji dil tèn,
Ahîn û girîn û şîwen ez cerhê di kul tèn.
Zêde ji cefa û elemîn tîrê qizil tèn,
Sed bilbilê şeyda ji teleb badeê gul tèn,
Lê cumle be zarî ji g'edengan be qetil⁴¹ tèn.

Sewdazedeê işqê tu em, ey rahetê can,
Ta kengê ji hicranî te kem nale û efg'an,
Bê dîn û wusala te, nihin bo me çi derman,
Eflaton û Calînos û Îsa, mee' Loqman,
Billah⁴² ji cefa û elemê ma bi xecil tên.

Serxoş û xumarim ji meyê horî suruştan,
Eql û dil û fehmê me birin kakul û qiştan,⁴³
Te'wîz û tilismat û duaê di ferîştan,
Naken eserê ji dil be birînê rim û xiştan,
Lewma ku sîyehmar bi ger û bi fetil tên.

750 Cana, çi bikem ger nebikem nale û zarî,
Ro be şevê ez e'şqê dused şêrê şikarî,
Dil bir be kerî kir senema çeşmê xumarî,
Zulf û xet û xal û serê ce'dên reş û tarî,
Reng sunbul û reyhan û binefş û qenefil tên.

Dû e'ynê be suwadê te çira zêde be nazin,
Ehdabê li canê me mîsal nişter û gazin,
Hemrazê me îro ji hewayet ney û sazın,
Qurbanê du çeşmê te bim û zendê be bazın,
Sed şubhê Sîyahpûş ji cefayan be qetil tên.

Li paşan şeh emir kir ser xezîndar,⁴⁴
Cewahir û zer û sîm bîn⁴⁵ bi xerwar.⁴⁶

Go: „Eta keyn bi derwêş û feqîran,
G'erîb û hem mesakin û esîran“.

Delalan⁴⁷ gazî kir manendê qumrî,
G'erîb û bînewa, miskînêd şehrî.

755 Ceme' bûn ber derê şahê keremdar,
Cewahir û direm⁴⁸ bir wan bi xerwar.

G'ulaman bir bi emrê şahê Asim,
Ji hedê zêde şal û kurkê qaçim.

Cewahîr û zer û sîm sed hezar kîs,
Eta kir wan bi ehlê ilm û tedrîs.

Feqîh⁴⁹ û alim û miskîn g'ina kir,
Mesacid û pîrr û xanha⁵⁰ bîna kir.

Ji dused xezne bêtir⁵¹ kirne tarac,
Di Misrêda neman esla çî⁵² muhtac.

760 Welakin, red nekir teqdîrê ellah,
Go: „*La hewle we la quwat illa billah*“.

Çûnîn go şahê Asim îbinî Sefwan:
„Ella, ey qadirê qeyyûm û mennan.

Tesedduq çendê min da û⁵³ muqedder,
Nebû red û murada min muyesser.

Nebû ba rûyê⁵⁴ şehzade surûrî,
Qedîm û qadir û heq û sebûrî“.⁵⁵

Bi emrê şeh bi zencîrek muresse',
Ji elmas û cewahîran mulemme'

765 Kirin qeydê du paê şahê mehcûr,
Ji mehcûrî dibû her lehze rencûr.

Di hucrek xasida şahane⁵⁶ zerkeş,⁵⁷
Kirin mehbûs û bend ew mîre mehweş.

Li nik rabûn bi cemi'î cumle mayûs,
Bi tenhayî⁵⁸ ma şahê xûnxwar û mehbûs.

Dinalî ew seraser cumleê şew,
Wekî tûtak û goyînan nebû xew.

Xew û xwarin hilatin jê bi yekcar,
Gehî bêhiş dibû, ew gahî hişyar.

770 Ji derdê işqibazî û xîyalê,
Zeif û zer bibû şubhê hîlalê.

Welê Sedelmulukê mest û mexmûr,
Nebû g'afil demî ez şahê mehcûr.

Şev û rojê di xidmet îsitade,
Zeif bibû ji derdê⁵⁹ şahizade.⁶⁰

Çi bêjim, Asimê mehzûn û g'emnak,
Dinalî şubhetê goyîn û tûtak.

Ji derdê şahizade ew şebefruz,⁶¹
Nebû mesrûr demê an şahê feyruz.

775 Dinalî şahê Asim wek kebûter,
Di gel ummê pûser⁶² şehizade mader.

Hezîn û mustemend ez çeşmê purr ab,
Dirêhtin ab û xuyî ser kurkê sencab.

Wekî Yeqûb dixwarin purr teesuf,
Digo wan ew çî bû ba îbnî Yûsuf.

Çiqas ehlê biladê Misr û Şaman,
Çi mêr û jin, ji xas û hem ewaman,

Hemî yekser hezîn û⁶³ dil purr ez g'em,
Ji g'emxori⁶⁴ nebûn mesrûri yek dem.

780 G'emê şehzadeê mest û dilawer,
Dixwarin zêde⁶⁵ çendî mîr û begler.

Di bin dayîreê çerxê muqernes,
Çira wan qet ne dîbû mislê wî kes.

Hemî yekser hezîn û mustemend bûn,
Melûl û aciz û hem derdêmend bûn.

Gelî yaran nezer den halê gerdûn,
Ne mesrûr bin ji tebiê wî, ne mehzûn.

Gehî ehwalê wî huzn û girîne,
Gehî şadî-yû kêyf û hem kenîne.⁶⁶

785 Dibînin hûn, ku dunya bêwefaye,
Ji kesra wê nihin ehd û wefaye.

Serencam dê bidet we şerbetê merg,
Heta ew terki det, hûn wê biden terk.⁶⁷

G'emê işqê û zewq û lezetê işq,
Dizanin ê vexarî şerbetê işq.

Kesê cure'k nexwarî camê⁶⁸ işqê,
Heta bimrit nizanit tamê işqê.

Hikayatên di⁶⁹ işqê purr dirêjin,
Emanet, surrê işqê hûn mebêjin.

790 Neşêtin surrê işqê qet eyan ken,
Meger bo yarê canî hûn beyan ken.

Meelqisse, ku bûrîn çende eyam,
Nebû Asim bi⁷⁰ hale pûrî 'elam.

Ji derdan bû zeîf û mest û medhoş,
Wekî dêwanekanê îşqê serxoş.⁷¹

Ceme' bûn ehlê Misrê cumle yekser,
Di gel Saliho Poşîn⁷² mîr û begler.

Ji dîwanê şehê Asim bi tedbîr,
Digo wan: „Qet mug'eyyer nabî tedbîr.⁷³

895 Welê⁷⁴ nabî bi tedbîr şahizade,
Me goftarek ji halê wî mirade.

Ji halê wî nizanîn em çi bêjîn,
Ji derdê wî hemî em⁷⁵ mest û gêjîn.

Nihin bo me qirar û sebr û taqet,⁷⁶
Nema purr şahizade çit helaket.

Xew û xwarin hilatin bo me yekcar,
Ji ber derdê şehê mehzûn û xûnxwar.

Çi⁷⁷ daînin nebî bo wî dewayek,⁷⁸
Li pey her cewrekî dê bit⁷⁹ sefayek“.

800 Ve reng go Salihê dana û aqil:
„Ji behrê heyretê⁸⁰ fikir û teemil.

Nebû bendek, kû min⁸¹ ew bend kuşa kir,
Nebû qeydek, ku min ew qeyd riha kir.

Ji ehwalê şehê mehzûn çi tedbîr,
Ne maîn û⁸² ne kirye min çi teqsîr.

Welê tedbîrekî dî⁸³ ez dizanim,
Ji wî halê ji⁸⁴ zûda ez gumanim.

Dibêjim ew⁸⁵ ji işqê bûye mecnûn,
Ji sewdaê dile ew renga mehzûn.

805 Çira işqê şebabî pîrr şewate,⁸⁶
Dilê işq tê nebi⁸⁷ ew dil mewate.

Çi⁸⁸ kes nînin⁸⁹ di halê çardesalan.
Ji dil meylê nedet ebrû hîlalan.

Yeqîn dildaye mehbûbek bi yarî,
We ya ber sûretek wî şehrîyarî.

We rengî ew ji işqê dil hezîne,
Bi ah û şîwen û nal⁹⁰ û girîne.

Îlaca⁹¹ haletê Seyfulmulukî,
Dibê ba yarê can Sedelmulukî.

810 Bi nerm û şêrînî bînî bi goftar,
Di nav wanda hebûne surr û esrar.

Bi halê hev dizanîn⁹² ew ji mêjî,
Dibê remzek ji halê xwe bibêjî“.

Ji şeh xoş hatin ew gofter û teqrîr,
Di dil min, ku we renga husnê tedbîr.

Bi emrê şahê hat Sedê dilawer,
Vewesta pêş muqabil şeh beraber.⁹³

Şehê Asim ve rengê goto: „Ey Sed,
Ji te min telbeye îro bikey cehd.

815 Bi goftar bînî tu⁹⁴ şehzadeê mest,
Ji ah û nalîyan da wî çîye qest?⁹⁵

Bila îzhar biket ew bo te⁹⁶ meqsûd,
Bi tofîqa Xudê dê bîte⁹⁷ mewcûd“.

Bi ferman Sedî çû nik şahizade,
Go: „Ey mestaneê bê xemr û bade,

Ji derdê te zeîfîm wek hilalê,
Şev û rojan dikem fikir û xîyalê.

Ji halê te nizanim ez çi bêjim,
Wekî dînan xumar û mest û gêjim.

820 Nemaîn bo me sebr û hoş û taqet,
Xew û xwarin me çûn û⁹⁸ zewq û rahet.

Heta kengê wuha bî bê tekellum,
Bi yarê xwe çira nakî terehhum?

Dizanî yarîcanim bo te, ey yar,
Di gel min tu çira naê⁹⁹ be goftar.

Ji bo halê te ez muşkul gûşame,
Di gel te yarîcanî û¹⁰⁰ birame.

Ji te me'lume, ku yaranî canî,
Çi esraran ji hev naken nihanî.

825 Were bo me¹⁰¹ bike surrê xwe îzhar,
Mueyyen bim ku¹⁰² jbo derdê te, ey yar.

Bi halê hev dizanin em ji mêjî,
Heta key sirrê xwe bo min¹⁰³ nebêjî?

Eger ê min tu nabî, yarê dilbend,
Li min billah, were tu bde bi¹⁰⁴ sewkend.

Weger ne, bes hilîne te'nê merdan,
Dizanî da çi rengî hen xeberdan.

Çiqasî cumlê¹⁰⁵ xas û ewame,
Dibên, şehzade aqil natemame.

830 Sefiye û ehmeqe,¹⁰⁶ mecnûn û dîne,
Weger ne, ew çi nalîn û girîne?

Eger pêra xeberdan kir ji sed reng,
Sedayek jê venayê¹⁰⁷ şubhetê seng.

Çi aqil wek te nabin bê tekellum,
Bi bab û dad çiran nakey terehhum.

Ko, bab û da ji bo te her bi ahin,
Li ser ta pê di libasê¹⁰⁸ sîyahin“.

Li paşan gote wî Sedê dilawer,
„Bi heqê hurmetê, an şîrê mader.

835 Bi ab û nan û an meyê dilefrûz,
Bi zewq û sehbet û xabe şebanrûz.

Be şîranîyê an yaranî canî,¹⁰⁹
Çi esraran ji hev naken¹¹⁰ nihanî,

Ji te min telbeye, ey mahê enwer,
Ku halê xwe bikey tu bo me ezher“.

Çiqasî cehdi kir wê gulbiharê,
Ji wî tiştekan ne dî cuz ah û zarê.

Ku wî dî sey-yû cehdê wî betale,
Go: „Ey şehzadeê purr ah û nale.

840 Were ehwelê xwe bo min xeberde,
Weger ne, dê bikem hulqûm bi kerde.

Ji hilqumê kerî kem ta bi navkê,
Ji derdê te bibem ez xwe hilakê.¹¹¹

Dirêj kir destê xwe Sedê dilawer,
Ji kalanê kişand elmasê xencer.

Serê xencer bi nêzîk kir ji hulqûm.
Wekî ew reng û¹¹² hal dît şahê meg'mûm,¹¹³

Bi lez destê xwe xencer girt¹¹⁴ ji destan,
Stand û goti:¹¹⁵ „Ey, dildarê mestan,

845 Tu çi dixwazî ji derdê¹¹⁶ min bibêjim,
Ji derdê işqe ew reng mest û gêjim“.

G' E Z E L

Aşiq bi perîzadême bê nam û nîşane,
Çavnyêrê mehême, ku ji e'wrê nexuyane.

Ger çi ku hebîb g'aibe pêş çavê me lêkin,
Wek şemsê zuhaê¹¹⁷ di dilê minda e'yane.

Ehwalê g'emê e'sşqê ji a'mê çi eyan kem,¹¹⁸
Tuhmet zedeê mahê rûyîyem¹¹⁹ g'ayîbane.

A'mê çi bibêjin derheqê halê me meqbûl,¹²⁰
Çil roje çi zanet lezetê çeng û çeg'ane.

850 Ser da be pîyan dê bikem ez xwe bi Sîyahpûş,
Ku şem'ê munîra me¹²¹ ji zulmatê nihane.

SERÊ XI

*Beyankirina surra Seyfulmulukê ji bo Sedelmuluk û beyana
şahê Asime ya kiras, ku sebebe ji bo ev hal û xudok*

Li paşan gote Sedê mest û zîba:
„Eger ya min dî, carek tu bi dîba,

Ji min bêtir dibûy mecnûn û ebter,
Dîmayî serxoş û heyran ta be mehşer“.

Go: „Yara, tu¹ çi dî, ey şehizade?
Me goftarek ji wî halî² mirade“.

Go: „Min dî sûretek mehbûb û dilkeş,
Li ser libsê zerefşan û muneqqeş.

855 Nizanim, ew perî bû, yane insî,
Weya şeklek bedî ji enwarê qudsî.

Dil û cerg û ceger purr³ herişandin,
Ji du çehvên me ab û xwîn rijandin⁴.

Bi min şerm û heyaye, purr hicabe,
Ku vê surrê beyan kem pêşê babe.

Çira ew sûret⁵ û şeklek ji mêje,
Dixwazî tu bibêjî, herr bibêje“.

Ku surrê xwe beyan kir şahê serxoş,
Di gel ah û girînê geştê xamûş.⁶

860 Wekî Sedelmuluk ev rengê teqrîr,
Bihîstin yek bi yek çûn şeker û şîr,

Bi nermî e'rzê kir pêş şahê Asim,
Li ser wî zêde bûn lutf û terehim.

Ku ew teqrîr bihîstî⁷ îbinî Sefwan,
Serê xwe danî ser dil mest û heyran.

Bi muqdarê seatek qet nekir deng,
Li paşan xoş xeberda wî bi ew reng:

„Gelî mîran,- go,- ev surre ji mêje,
Hikayetên⁸ di vê surrê dirêje.

865 Rûniştîbûm⁹ li eywana xwe carek,
Bi tenhayî¹⁰ dikir zikrê mubarek.

Ji nageh hatê bayek¹¹ sextê dijwar,
Diricfin û dihejyan dar û dîwar.

Me go, belkî ku dunya dê xirab bî,
Çira dunya bi baê dê xirab bî.

Li paşê lehzeyek heft ten¹² be etimam,
Selam kir wan, li min nageh ji endam.

Me go: „Hûn kîne? Bêjin¹³ bo me, ey merd“.
Ji ber baê dihejya cumleê erd.

870 Ewan got: „Tu metirs,¹⁴ ey îbinî Sefwan,¹⁵
Ku heyn em qasidî têyn ez Sulêyman“.

Ji cî rabûm be şadî ez ji endam,
Ji wanra purr me kir izaz û îkram.

„Eger te divê bizanî, ku me¹⁶ kîne,
Eger çi qasidin, lê em perîne“.

Li ser textê me¹⁷ cî da wan ku rûnîn,
Dilê min bû ji şadîyê bi temkîn.

Ewan da dest me engustîl û elmas,
„Ji bo te ev hedîye, ey xudênas.

875 Sulêyman şandine¹⁸ bo te dîyarî,
Ku tu ebdê xudawendê g'efarî“.

Li ser çavan me danî, kir bi carek,
Zîyaret ehsenullahû tebarek.

Me libas ku nihêrî, dît û sûret,¹⁹
Dilê min jê vexwarî²⁰ zêde hesret.

Me go: „Eslek heye bo sûretê he,²¹
Bi îşqa xwe revayî wî dilê me,

Weya bê esle, xwe ev dil²² hebandî,
Meger neqşek²³ bi zînet neqîşandî?“

880 Bi min go wan: „Ku ew sûret bi esle,
Xudan cah û meratîb û bi nesle.

Bizan navê wê Bedîe ba-Cemale,
Şehê peryane, binta²⁴ Şahbale.

Kurê şahê Rûxe, bag'ê Êramda,
Ji şeklê wê neqaşan ev reqem da.

Hedîye şandî²⁵ peryan bo Sulêyman,
Sulêyman şandî²⁶ bo te îbinî Efwan“.²⁷

Di hîna min bihîstin ew îşaret,
Me bêhtir kir temena û kiramet.

885 Li paşan xwastî xatir wan ecaib,
Li pêş çavê me filhal bûne g'aib.

Nearif bûm, ku ew reng tête ser me,
Terîqek zêde dijwar kete ber me.

Sulêyman îbinî Dawud çû wefatê,
Ku em îro ji²⁸ ber wî keyn şikatê.

Ji min naêt ew²⁹ karê giranî,
Gulistanî Êram kî pê dizanî?

Ecaib muşkile³⁰ ew şug'ul û kare,
Me hîvî û meded şahê cebare.

SERÊ XII

*Belavkirina seyyahane li dinyae ji bo dîtina bag'ê Êremê
û yan nîşanek wê li ser g'ebraê û zivirîna wan bi bêhûde û
heyran û belaê*

890 Çi xoş zewqe, ku bê hîvî bî aşiq,
Ji dîdara wusalê¹ yarê sadiq.

Nebit nam û nîşanek qet ji metlûb,
Ji nageh bêt mizgînî ji mehbûb.

Meelqise, xudanê Misr û Şanian,
Ve şêrîn go: „Gelî aqil temaman,

Çi tevbîre ji halê şahizade,
Ku ew pê bît mufferreh dilguşade“.

Bi cemi' got:² „We qence Sedê mesrûr,
Bibet mizgînî ji bo³ şahê mexmûr.

895 Bibêjîtê nişan û namê dilber,
Bi tofiqa Xudê dê bit muyesser“.

Bi emrê şahê⁴ Sedê dilguşade,
Bi mizgînî çû xidmet şahizade.

Temena kir dibûsî erdê xidmet,
Go: „Ey şehzede, mizgîn⁵ û beşaret,

Go, navê dilberê Bedr⁶ ûl-Cemale,
Şehê peryane, bintê Şahbale.

Ji neslê şahê Rûx, şahê Êrambag’,
Ji min tehqîqi zan⁷ tu sag’i be sag’“.

900 Ku şehzade bihîst ew⁸ dilguşadî,
Ji hiş çû ew ji zewqan û ji şadî.⁹

Ji hindav rabû ser xwe mest û mexmûr,
Bi şadî-yû bi kêyf û zewq û mesrûr.

Go: „Min zen bir, ku ew sûret edem bî,
Weya şeklek ji esrarê qêdem bî.

Me lew gahî girîn bû, gahî bêheş,
Dil û cerg û ceger bûn pîrr¹⁰ ji ateş.

Muayyen bû, ku ew sûret bi esle,
Ji eslê şahê peryane¹¹ w be nesle.

905 Weya dbînim û pêra xeberdem,
Weya sed can¹² di rîya wê bi derdem.

Li paşan goti:¹³ „Ey Sedî mubarek,
Divêtin bo me hemam û tedarek“.

Bi emrê şahizade gurb û¹⁴ carî,
Bi cemi' hatin ew mest û xumarî.

Birin şehizade û danîne hemam,
Gulab anîn û şuştin cumle endam.

Libasê şahî xoş kirne berda,
Dilê wî sed hezar¹⁵ ah û keser da.

910 Bi nerm û şîrînî rabû çû ser text,
Bi ser kêyfxoş,¹⁶ di dilda agirek sext.

Ji sed rengî team anîn bi defter,
Li paşî xwarinê badam û şeker.

Şerab û çeng û nay û tebl û saqî,
Ji pêş şehzade bûn vêkra¹⁷ mulaqî.

Sedaê¹⁸ aşiqan çû çerxê çaran,
Dibarî av û xwîn ez çeşmê yaran.

Dinê xoş bû ji dengê wî sedaê,¹⁹
Mug'enî da ji çeng û tebl û naê.

915 Cewab çû şahê Asim, ku surûre,
Ji pêş şehzade xoş zewq û huzûre.²⁰

Ji hindav rabû ser xu ba dilê geş,
Di gel şûxa yemanî mahê mehweş.

Bi hevra hatne bal mîrî dilawer,
Ji dîna wî kirin ebsarê enwer.²¹

Li paşan şahê Asim xoş dîyar kir,
Ji etbaê xwe sed mêr extyar kir.

Xudan erfân û alîm û hunermend,
Bi adab û kemal û eql û dilbend,²²

920 „Herin,-go,²³- cumle etrafan binêrin,
Di alemda evê qisê bigêrin.²⁴

Kesê bînî cewabê²⁵ bag'ê Êrem,
Ji wê mizgînîyê şa ket²⁶ zemîrem.

Didem wî ez devek zêrrên²⁷ bi zahir,
Di cewfêda tejî le'l²⁸ û cewahir.

Ji g'eyrî wî çiqasî hûn dixwazin,
Bixwazin hûn xudan rahê²⁹ di razin“.

Bi cumle gotin: „Ey şahim, seme'na,
Ji vê emrê te ser me qed³⁰ ete'na.

925 Welê muhlet dixwazin em yekî sal,
Ji şahê alîcah û sahib îqbal“.

Rida da yek sene şahê mubarek,
Li paşan cumle kir e'zmê tedarek.

Çiqasî wan teleb kir şahê Asim,
Bi wan da xoş di gel sed kurkî qaşim.

Ku destûr xwast û³¹ cumle çarê etraf,
Bi rêda çûn bi e'zmê Qafê ta Qaf.

Bi çar canib dibêjin, çûn û³² ew merd,
Ji meşriq³³ ta bi meg'rib tey kirin erd.

930 Nihêrîn Çîn û Maçîn û Xurasan,
Xeta û Xûten û mulkê libasan.

Ji tirk û hind û sind û mulkê zengî,
Nihêrîn ta bi Romî û Firengî.

Muhessel, wan nihêrîn cumle etraf,
Seraser³⁴ cemi' dunya Qafê ta Qaf.

Nedîn nam û nîşanek qet ji Êrem,
Ne go kes, ez bo wê pirsê³⁵ xebîrem.

Di hîna duzde meh wan bûn temame,
Vegeryan pêşî şahê Misr û Şame.

935 Welê ji bintê şehan çarsed bi defter,
Cewab anîn ji bo şahê muzeffer.

Hemî şeker dehan û zêde mehbûb,
Perîrû-yû semen bû, nazik û xûb.

Mîsala meşe'lê teysan şebî tar,
Suwed ul e'yn û nûreyn wech û xumar.

Lefîf û dilber û xoş qed û qamet,
Ji fitnê wan nebûn alem bi rahet.

Cewabê wan bihîst ku Asimê şah,
Go: „*La hewle we quwwe illa billah*“.

940 Me nînin quwet û taqet, îlahî,
Munewwer key ewê³⁶ xetê sîyahî.

Xudaya, tu munewwer key şebê tar,
Kerîm û qadir û heqî û cebbar.

Li paşan şeh ve reng go ba xutabê:
„Eger şehzade bibêhtin³⁷ cewabê,

Ji new dê bît û sewdaî û³⁸ mecnûn,
Bi ahîn û girîn û derd û mehzûn.

Neşêtin³⁹ qet evê surrê dîyar ken.
Emanet, hûn ji şehzade sitar ken.

945 Welê şehzade herdu⁴⁰ çav li rê bû,
Dem û saet di wê fikir û g'emê bû.

Dibûrand roj bi roj⁴¹ şahê yekane,
Bi ser xwe rozûgarên aşiqane.

Gehî ba hol û kaşo, geşt û seyran,
Gehî rimbazî û mertal û cewlan.

Gehî ba reqs û govend û şîyahî,
Gehî şetranc û nerd û gûşimahî.

Gehî saz û mey û fincan û saqî,
Gehî çeng û g'ezelhaê firaqî.

950 Welê şehzade herroj çav li rê bû,
G'ezelhaê firaqî wî di dil bû.⁴²

G' E Z E L

Ey hebîbê qelb û ruh-û wey qirarê canê ma,
Dê çi bîtin carekê ger tu bibî mēhmanê ma.

Bêye ser çavê me rûnî, menzeret qelbê me bî,
Ez g'ulamê kemterîn bim, her tu bî sultanê ma.

Sed wekî Îsa û Eflaton û Calînos, Hekîm,
Çareê derdê me naket bê te, ey Loqmanê ma.

Qelb û dil mecrûhê e'ynêyn eswed û birhên tene,
Nîne bê cama meyê qet melhem⁴³ û dermanê ma.

955 Tûr û Sînaya dilê min dayîme e'rşa teye,
Ehdê çil rojî tamam kir Mûseê Umranê ma.

Çav ji rêda kori bûn Yeqûbê ez bêytul hezen,
Qet nema carek xuya bit Yûsufê Kenanê ma.

Ez esîrê qeyd û bend û zulfê zencîrê teme,
Rehmê kun tu ba esîran, ey mehê tabanê ma.

Qet nema hudhud xuya bit pêşî Belqîs ez Seba,
Pê mufferreh bit Sulêyman, mutmein bî canê ma.

Sohtim ez narê firaqî, mujdêya weslê nehat,
Ku ji wî şem'ê munîr bît zulmetê eywanê ma.

960 Zulf û xalên, mah û rûyan çoq Sîyahpûş êdîler,
Qorqerem ben qere olse, çadir û sêywanê ma.

SERÊ XIII

*Xeberanîna seyyahane ji nezanîna wê xeberê, we extyerya
şahizadêye ya seferê û piştana felekê û berîdana qedere*

Meelqise, wekî salek tamam bû,
Şehê me rû¹ bi qasidan elam bû.

Go: „Qasid hatin û nanîn² cawabe“,
Dilê şehzade bû purr ez-tîrabe.

Pêsîra xwe qelaşt û wî ji hindav,³
Bi lez tatin ji çehvan qetreê av.⁴

Di gel ah û girînê, geşt û⁵ xamûş,
Gehî hişyari bû ew, gahî bêhûş.

965 Cawab çû şahê Asimê xudanbext,
„Gehayî şehzadeê te haletek⁶ sext.

Ji new bû dîn û sewdaî û mecnûn,⁷
Ji çehvê wî bi lez tîn qetraê xûn“.

Şehê Asim ji cî rabû muşeweş,
Bi tecîl hate bal pismîrê mehweş.

Go: „Ey sebr û qîrar û taqeta min,
Heyat û ruh û can û raheta min.

Şehîdellah, nekîrye⁸ min çî teqşîr,
Elîmullah, nizanim ez çî tedbîr.

970 Ji bo te serf kirî min bê e’ded mal,
Me sed qasid virê kir ta yekî sal.

Seraser⁹ cumle dunyaê¹⁰ kirin tey,
Nebû hasil ji bag’ê Êremî şey.

Welê ji bintê şehan çarsed bi etmam,
Cewab anîn û mehrû¹¹ û gulendam.

Hemî me tele’t û şîrîn şeker leb,
Perîrû û semen bû sîbê g’ebg’eb.

Weîn ixterte min hunne hebîben,
Bibî bo min cewaben ‘en qerîben.

975 Ku ez bînim ji bo te, ey ruh û can,
Weger ne, tu dizanî ku Sulêyman,

Vexwarî şerbeta merg û¹² heyatê,
Zemanek bûrî, ew çûye wefatê.

Me taqet nîne ba caê Êrembag',
Ne kes pê alime heq sag'ê ba sag'.¹³

Cihê peryan ne melûme, sitare,
Ji g'em te çûn ji dest min extyare.¹⁴

Eger meqsûdî tu genc û cewahir,
Di ger¹⁵ esp û çek û rext û esakir.

980 Bi cumle hazirin bo te serefraz,
Tu çi dixwazî ji mal û mulkî bixwaz'.

Ku şehzade bihîst ev rengî teqrîr,
Ji şahê alîcax wek şeker û şîr,

Go: „Ey şahê xiredmend¹⁶ û bi îqbal,
Eger neynî ji bo min¹⁷ bintê Şehbal,

Yeqîn ez dê hilak bim, nîne derman,
Ji bo derdê me nik¹⁸ Îsa we Loqman'.

Ku şahê alîcax qewlîn bi ev reng,
Ji şehzade bihîstî, qet nekir deng.

985 Serê xwe danî ser dil, ma muheyver,
Go: „Ya rebb, tu muqeder key muyesser'.

Wekî şehzade dî baba¹⁹ bi ev reng,
Sebeb wî bû²⁰ hezîn û mest û dilteng.

Go: „Ey şahê xudan îqbal û şewket,
Dilet mesrûri bit ez nûrê rehmet.²¹

Qedaê rebbîye ev reng û ev hal,
Dilê min sohtî şem'ê bintê Şehbal.

Dizanim, te ji bo me renc û muhnet,
Gelek dîn û vexwarî²² zêde hesret.

990 Ne ku ji tedbîr û teqsîrê te bû ew,
Welê²³ ne ji teyrê nêçîrê te bû ew.

Ne hat destê te ew taûsê meqsûd,
Weger ne dê te banyaye mewcûd.²⁴

Welê ger şeh rida det çend xeberdan,²⁵
Heyin bo me bibêm ez²⁶ îşq û derdan“.

Şehê Asim go: „Ey cana,²⁷ bibêje,
Ewan le'1 û cewahiran birêje“.

„Dixwazim,-go,-ji ewwel min helal key,
Ji dil me sparî şahê zulcelal key.

995 Bi iznê²⁸ te li paşan biçime g'urbet,
Bibînim iczê²⁹ rah û renc û muhnet.

Eger min dîfî ew dildarê mehbûb,
Weya nam û nîşanek qenc û hem xûb.³⁰

Weger ne dê bibînim germ û serdî,³¹
Bela û muhnet û rencê ji³² erdî.

Dê sar bîtin ji ber min ew şîrîn mah,
Bi şadî û fereh dê bême pêş şah“.

Şehê Asim go: „Ey dilbend û rahet,
Çi rengî dil bidem tu herî g'urbet“.

1000 Nedarem taqetê barî firaqî,
G'emê to û belaê eştiyaqî“.

Cewab da şehizade: „Ey şehinşah,
Nikarît kes betal ket hukmê ellah.

Bi her rengî hebit dê bidey tu destûr,
Ku ez herm-û binêrim nêzîk û dûr.

Temaşa kem ji mewc û pêlê derya,
Bikem pirsê ji ehlê çîn û xota.

Weya hasil bibîtin bo me weslet,
Weya sar bit dilem ez renc û muhnet.

1005 Weger carek nebînim germ û serdan,
Mueyyen dê hilak bim ez ji derdan“.³³

Wekî ev rengi dî îşqê wî dijwar,
Şehê alî riza daê bi naçar.

Wekî Seyfulmuluk bi hoş û mexmûr,³⁴
Ji şah û begleran xoş xwastî destûr.

Di gel Sedî dilawer ber be geştê,
Melayik rengî çû qesrê beheştê.³⁵

Kewakib naseha çav dane kewkeb,
Cerandin keştîhara³⁶ ber be metleb.

1010 Di hîna keştî ceryan îbinî Sefwan,
Ji dil kir nale-û zarî û efg'an.³⁷

Ji camê firqetê şeh keftî³⁸ serxoş,
Di gel ah-û girîne geştî xamûş.

Di gel Saliho Poşîn îbn-û Hame,
Hilanîn wê demê şahê Êlame.

Di gel şûxa Yemanî hate qesrê,³⁹
Bi cumle cemi' hatin berbi şehrê.

Di hucrek xasida danîn⁴⁰ şehinşah,
Ku hişyar bû ji bêhoşî dikir ah.

1015 Gelo, şehzadeê min berbi kuda,⁴¹
Dibên çû û ji halê wî çî rûda.⁴²

Dilê min sohtî narê iştîyaqê,
Dibêjim lew ji dil qewlên firaqê.

G' E Z E L⁴³

Bê şikîbim dil⁴⁴ ji destê iştîyaq,
Can bi derdem lew li min tale mezaq.⁴⁵
Ah û efg'an serwî⁴⁶ qeddem geştî taq,
El firaq û el firaq û el firaq.

Çav li rême, dayîme leyl û nehar,
Da bibînim carekê an şehsuwar.
Dil bi dag'im, bê qirarim, bê qirar,
El firaq û el firaq û el firaq.

Xozya roja ku min xoş bî dimag',
Bêti bayek wesletê zan⁴⁷ werdî bag'.
Can bi derdim, sîne serdim, sextîdag',
El firaq û el firaq û el firaq.

1020 Şubhê Mecnûn mam ji Leylaê g'erîb
Çareê derdê me naket çû tebîb.
Çûn ji dest min taqet û sebr û şikîb,⁴⁸
El firaq û el firaq û el firaq.

Ey hewara, çû bi kuva serfiraz,⁴⁹
Ê ku qelbê me⁵⁰ giviştî şubhê gaz.
Dil ji derdê wê dinalî şubhê saz,
El firaq û el firaq û el firaq.

Min ji dil tèn nale û zarîn e'ceb,
Ji iştîyaqê şewqê an yarê e'reb.⁵¹
Çav li rême dayîma her roz û şeb,
El firaq û el firaq û el firaq.

Camê iştê ez kırım mest û xerab,
Lew Sîyahpûş bûme manendê g'urab.
Kel uqabim, xweş ribabim, dil kebab,
El firaq û el firaq û el firaq.

SERÊ XIV

Mehzûnbûyîna şahê Asim û arkanê wîye di gel girîné û çûyîna şehzad û hevalane bali şehê çîné û xoşbûna şahê çîneye bi wê nazanîné we cehdkirina wîye di gel şehzadê ji bo dermanê wê birîné we mayûsbûna wîye di gel g'emgîné

Şehê Asim digotin în çûnîn beyt,
Dinalî û disohta dil wekî zeyt.

1025 Li¹ ser ta pê libasê xwe sîyah kir,
Umîda xwe bi dergahê îlah kir.

Ji g'eyrî heq birî ûmîdî qeti'î,
Şehê Asim ji mal û mulk û cemi'î.

Çiqas ehlê biladê şahê² medhoş,
Bi³ ser ta pê bi cemi'î bûn sîyahpoş.

Ji huznê pûrê⁴ şahê îbinî Sefwan,⁵
Di Misrêda nebû yek leb bi xendan.

Çiqasî begler, mîr û wezîra,
Digotin qewlê *Welyebkû kesîra*.

1030 Ji vê dunyaê dîn qence bişom dest,
Ji camê muhbetê⁶ serxoş û sermest.

Were saqî, werîn camê tijî mey,
Ji wê meyê ku emwat pê bibin⁷ hey.

Ji minra bîne û da⁸ ez binoşim,
Zemîr û qelbê pîrr zewq û xuroşim.

Tu wer mitrib bi saz û neg'me û ney,
Bireqsîn qelbê me ba hey bi wî mey.

Bizaêi' da neçît ew umrê baqî,
Nebim xalî ji fikrê tu û saqî.

1035 Çi xoş bêhne ji qewlê arifan tê,
Sedayek xoş ji sewtê aşiqan tê.

Hedîsê cane eqwalê şerîet,
Terîqet f'îl û ehwalê heqîqet.

Şerîetra bi keştî tu bi nase,
Bina ken keştîyê mehkem esase.

Terîqet behr û deryaê mezin tê,
Heqîqet durr û⁹ ilmê mîn ledun tê.

Eger çî key tu wî tertîb û sazî,
Heqîqet dê bibînî tu ji mecazî.

1040 Weger ne, dê bimînî tu ker û kor,
Di nav derd û bela û mîhnetên¹⁰ zor.

Meelqise, di hîna keştîbanan,
Kîşandin keştêhara neg'mexwanan.¹¹

Kirin zewq û surûr û kêyf û aheng,
Di gel saz û ney û tenbûr û hem çeng.

Gehî dixwarin kebab û şîr û şeker,
Gehî badam û incîrîn şekerwer.

Gehî came mey û tiryak û hem benc,
Gehî meşg'ûl bi le'bê, nerd û setrenc.

1045 Gehî şîrîn zubanîn sînesade,
Qisesbêj bûn muqabil şahizade.

Bihurand şahizade subh û şame,
Ji qewlê rawîyan çel roj temame.

Li paşan dîn¹² bi derket şehre çînê,
Ku nêzik bûn ji wî erd û zemînê.

Cewab çû şahê çînê namê Feg'fûr,
„Îlahî dewletê tu¹³ badî memûr.

Bi derket eskerek bêhed ji behrê,
Bi lez tèn ew ji canib şehre Misrê“.

1050 Bihîst ew rengî xaqanê hunerwer,
Emir kir, cemi' bû¹⁴ bêhedî esker.

Bi nermî berbi wan hat ew¹⁵ muqabil,
Bi qasidî hinar çend merdî aqil.

„Biken pirsê, ku dostin, ya ne dujmen,
Ji xelqê Misirin ew, ya¹⁶ xelqê Yemen?“

Dibên, rabûn û çûn qasid bi tecîl,
Ji xelqê Misirê kir meqsûdê¹⁷ tehsîl.

Li paşan çûne pîşî şahê mestan,
Muqabil dest li ser destan vewestan.

1055 Bi nerm û xîrînî, wek şekker û xîr,
Çû totî bûn, şekerxa ew bi teqrîr.

Dua kir wan ji şehra bext û tali',
Diger ya rebb, neçît rencê te tali'.¹⁸

„Bi qasidî hinarn em şehê çîn,
Ji şehzade bikeyn meqsûdê¹⁹ te'yîn.

Ji hatnê te çi meqsûd û mirade,
Mueyyen tu bibê, ey sînesade.

Ne karê çînyane cengê duşmen,
Xususa şahê Misir û ehlê²⁰ Yemen.

1060 Diger herçî hebîtin bo te meqsûd,
Bibê, xanê²¹ çîn dikatê²² mewcûd“.

Wekî ev rengê teqrîr²³ bi dilxaz,
Ji qasidan bihîst şahê serefraz.

Bi wanra zêde kir izaz û îkram,
Ji eta û kerem dayîn û ena'm.²⁴

G'erîq bûn ew di deryaê etaê,
Eceb mabûn ji wê cûd û sexaê.

Li paşan şahizade xoş eyan kir,
Meger şemmek ji halê xwe beyan kir.

1065 Ji bo qasidê şahê Çîn û Feg'fûr,²⁵
Muadeb rabûn cumle²⁶ xwestî destûr.

Vegeryan pêşî şahê Çîn û Maçîn,
Be ew zêde kirin wan²⁷ medh û tehsîn.²⁸

Dilê xaqanê Çîn bû purr guşade,
Bi şadî hat muqabil şahizade.

Wekî şehizade dî hat şahê çînî,
Ji eqlê wî didan²⁹ sed aferînî.

Di gel Sedelmulukî mest û mexmûr,
Bi nermî çûne pêşî şahê Feg'fûr.

1070 Bi şîranî û îkram û bi i'zaz,
Hilanîn dest bi dest şahî serefraz.

Li ser textek zerîn danîn muresse',
Ji elmas û cewahîran mulemme'.

Bi emrê şahizade xemr û saqî,
Di gel çeng û ribabê bûn mulaqî.

Kirin zewq û surûr û kêyf û xoşî.
Di gel awazê ney, tenbûr xuroşî.

Heta penc roz tamam bûn, şahê mexmûr,
Neda destûrê şahê Çînê Feg'fûr.

1075 Bi şadî û bi i'zaz û bi îkram,
Buhartin pênc roj ez subhê ta şam.

Dibêjin ew qeder îkram û i'zaz,
Di gel Feg'fûrî kir serwî³⁰ serefraz.

Ku ehlê Çîn û Maçîn bûn muheyyer,
Ji wê cûdê sexaê³¹ mîrê dilber.

Li paşan³² şahê Çîn go nerm û şîrîn:
„Ela ey şahibazê bircê tehsîn.

Dixwazim ku tu bêy mêhmanê min bî,
Çira û³³ meşe'lê eywanê³⁴ min bî.

1080 Çiqasî bît ji me i'zaz û îkram,
Bikeyn em bo te, ey serwî gulendam.

Diger em gazî keyn cumle neqaşan,
Ji sûretçêkeran em keyn temaşan.

Bipirsin em ji wan caê Êrembag',
Dibîtin ew bibêjin sag'ê ba sag'“.

Ku ew şîrîn meqalê şahê Feg'fûr,
Bihîstin şahibazê mest û mexmûr.

Reda da û çeleng rabû di gel şah,
Di gel Sedelmulukî, mîrê hemrah.

1085 Bi cumle hatin ew³⁵ eywanê xaqan,
Ji şikl û sûretan, qelbê usşeqaan.

Dinalîn şubhê goyîn û kebûter,
Ku ferş û taq û eywan dîn musewwer.

Ji bo şehzade danîn textekî zer,
Tejî elmas û durr û le'l û gewher.

Çû ser textê murese' şahê mehcûr,
Muqabil padişahê Çînê Feg'fûr.

Ku rûniştin muqabil yek beraber,³⁶
Vewestan dest li ser dest mîr û begler.

1090 Bi emrê şahê Çîn fincan û saqî,
Li dîwanê bi hevra bûn mulaqî.

Gerandin saqîyan fincan û şûşe,
Dilê mestan bû purr zewq û xuroşe.

Bi kar êxistî mitrib têlê tenbûr,
Fîg'an kir çeng û nay û saz û sentûr.

Sedaê aşiqan çû çerxê heştêh,
Dinalîn xoş li ber sûret fereşte.

Heta pênc roj tamam bûn, şahê Feg'fûr,
Surûr û kêyfi kir ba şahê mehcûr.

1095 Gehî ba çeng û nayî û xemr û caman,
Gehî xwarin ji enwa'ê teaman.³⁷

Gehî ba mûsîqar û rûdê şahî,
Gehî şaling û berbet,³⁸ gûşêmahî.

Ku bûn pênc rozî³⁹ şehzade bi etmam,
Şehê Çîn kir ji wîra zêde îkram.

Ji enwa'ê nefaisêd ecaib,
Meta'ê Çîn û Maçînê⁴⁰ di g'eraib.

Li paşan çûn biken vêkra temaşan,
Ji sûretçêker û cem'e neqaşan.

1100 Wekî şehzade çû dîn sûret û neqş,
Zer û sîm û cewahir kir bi wan beqxş.

Çiqas pirsî ji sûretçêkerên kal,
Ji bag'ê Êremê-yû bintê Şehbal,

Nedayî kes cewabek xoş û kafi,
Ji bo derdê dilê şehzadeê şafi.⁴¹

SERÊ XV

*Pirsa şehzadêye ji pîrê kale û bag'ê Êrem û bintê Şehbale û
derketîna wane ji çînê bi bedhale û g'erqbûna hindêk
gemîyê wî berbi zewale û qetandîna wî û Sedelmuluk ji
hev bi emrê barîyê zulcelale*

Welê¹ gotin ji bo şehzadeê mîr,
„Fulan caê heye dêhqaneyek pîr.

Zeîf û zer bûye şubhê hîlalê,
Meger ew de cewabê vê sualê“.

1105 Dibên, şehzade û Feg'fûr û² xaqan,
Bi tecîl çûne nik ew³ pîrê dêhqan.

Kirin pirs û sual ez merdomî kal,
Ji bag'ê Êremê-yû bintê Şehbal.

Ecab ma pîr ji pirsê di g'irraib,
Ve rengî go: „Me dîne pîr ecaib.

Ji seyahê ku ez geryam di şehran,
Çiya û deşt û çol û berr û behran.⁴

Sed û heştadi sal umrem resîde,
Ne min dîn ew, ne gûş⁵ ez kes şunîde.

1110 Ji wan pirs û سوالان ez ecîbim,
Ji bag'ê Êrem û Şehbal g'erîbim.

Welê mumkîne der Qustentîniye,
Tu bibihî wê cewabê pîrr belîye.

Ku ev rengî bihîst şehzadeê mîr,
Ji wî kalê ketî, dêhqaniyê pîr.

Li nik rabû û xoş ezmê sefer kir,
Ji şahê çînîyan destûr teleb kir.

Hezîn û dil bi g'em hat berbi geştê,
Melaekrengê çû qesrê buhuştê.

1115 G'emê işqê eceb⁶ zewq û sefaye,
Eger çi zahîrî derd û belaye.⁷

Were saqî, werîn camê sefaê,
Ku ez mest bim ji wê derd û belaê.

Bibûsim ku lebê fincan û şûşe,
Dilê mehzûn be pîrr zewq û xuroşe.

Tu wer mitrib dilê dana bireqisîn,
Bi sewtê xoş û şîer û lewzê şîrîn.

Ji şia'rên xweş mufferreh ke zemîrem,
Ji destê muhnet û derdan esîrem.

1120 Ji işqê dûr mebîn ger çî mecaze,
Çira ku bo heqîqet karîsaze.

Nihin xalî çî⁸ sûret der terîqet,
Ji nûrê zatê işqî biken⁹ heqîqet.

Eger tu arifî sûretperest be,
Besî meyxane û mehbûbê mest be.

Dibît carek bidet saqî nihanî,
Du sê fincan şerabê erg'ewanî.

Meelqise, ku derket şeh ji Çînê,
Ribab û çeng û ney dest kir girinê.

1125 Berê xwe dane¹⁰ Qustentînê dilkeş,
Ji nalîna neyê dil bûye¹¹ ateş.

Heta çil roz tamam, ba zewq û mesrûr,
Buhartin eskerê û¹² şahê mehcûr.

Ji nageh hat û bayek sext û dişwar,
Li hev dan gemîe û çil jê kirin xwar.

Di behrêda g'erîq bûn yek hezar merd,
Dilê şehzade bû g'emgîn û purr derd.

Di gel birq û birûsk¹³ ebrê biharî,
Wekî tofan bi ser wanda dibarî.¹⁴

1130 Ji dengê re'd û baê sext û nexoş,¹⁵
Dibên şehzade bû pirr derd û¹⁶ bêhoş.

Ji bêhoşî ku hişyar bû sena kir,
Di gel hemdê xudayî¹⁷ xoş dua kir.

Go: „Ey xellaqê xelqê cumle alem,
Ji qudret çêkirî Hewa û Adem.

Dizanim g'afilîn her¹⁸ rûz ta şeb,¹⁹
Bi *nefs û elletî yerte' we yele'b.*

Tu sahib rehmet û fedlê²⁰ emîmî,
Big'efrînî me tu rehman û rehîmî.

1135 Li paşan xoş emir kir şahizade,
Ji xwe dûr ken çî alatê fesade.

Neî û saz û ribab û çeng û xemrê,
Bi cimiî bavêjin nav pêlê behrê“.

Bi cimiî avîtin wan xemr û fincan,
Çiqas çûn zêde bûn lê ba û baran.

Gehî ji pêlan diçûn teht-el seraê,
Gehî bala dibûn fewq el semaê.

Ji nageh hatî pêlek²¹ zêde dişwar,
Du heşt²² û şeş hizar keştî kirin xwar.

1140 Dilê şehzade bû pîrr derd û ateş,
Welê Sedelmulukê mest û serxweş.

Digo, ba şahizade: „Ev belaye,
Nihîn illa ji canibê xudaye.

Divêtin şukrê bêhed û hesabe,
Mebada em bimîn teht-el 'iqabe“.

Diken şukrî li ser derd û belayê,
Xudanê fikir û teslîm û ridayê.

Ji nûda²³ hatê bayek bê eded sext,
Li hev da gemîye û jê ker kirin text.

1145 Dîger baqîyê keştêha g'eriq bûn,
Welê²⁴ şems û qemerha jêk feriq bûn.

Ji ber berq û birûs²⁵ û baê nexoş,
Dibê, şehzade bû dîsane bêhoş.

Muhessel, ta sê rojan ba û baran,
Dibên, hat²⁶ û bilind bûn pêlê behran.

Wekî sê roj û sê şev bûn bi²⁷ ejmar,
Temamî şahizade bû bi hişyar.²⁸

Rûniştin pêlê behrê, ba û baran,
Eyam xweş bû wekî rojê biharan.

1150 Nezer kir şahezade gemîye û merd,
G'erîq bûyî, keşandî ahekî serd.

Nihêrî çend, nedî Sedê şirîn²⁹ şah,
Nebûn hazir li nik wî g'eyrî pencah.

Ji ber Sedelmulukî mest û mehweş,
Dibên şehzade bû dîsane bêheş.

Ji bêhoşî ku hişyar bû uşaqî,
Digotin qewl û eşa'rê³⁰ firaqî.

G' E Z E L

Ah, ji dest narê firaqê,³¹ dil wekî biryanim ez,
Her li ber wê iştîyaqî,³² purr kul û kovanim ez.

1155 Purr bi kovanim,³³ derd û ahem, aşiqê rûyê çû mahem,
Bendeê zulfê sîyahem, Yûsufê cananim ez.³⁴

Yûsufê min ber bi kuda çû, ji halê wî çi rûda,
Tehlyan ser li me zû da, Yeqûbê Kenanim ez.³⁵

Yeqûbê pîr û hezînim, purr fig'an û purr girînim
Mestê camê eyn û şînim, bê mey û fincanim ez.

Bê mey û mexmûr û mestim, aşiqê sûretperestim,
Serxoşê camê *elestim*, Mûseê Imranim ez.

Şubhê Mûsa min li Tûrê xoş temaşa kir li³⁶ nûrê,
Nalyam şubhê bilûrê, bi nale û efg'ananim ez.

1160 Nale û efg'an û zarî, xweş li min bûne dîyarî,
Şubhetê teyrê biharî, maîlê bûstanim ez.

Maîlê werd û hîlalan, dê³⁷zeyîf bin wek xîlalan,³⁸
Ah ji dest fikr û xîyalan, bê ser û samanım ez.

Bê serûber şubhê goyê, dil ji min bir ce'dimûyê,
Maîlê çeşm û birûyê an, mehê tabanim ez.

Mah û xurşîdên munewer bestî sêywanên mudewer
Xweş dibin zulfê muenber, sunbil û rêyhanım ez.

Sunbil û rêyhan û sorgul, rast û çep bûne muqabil
Lew dinalım şubhê bilbil, teyrê xweş elhanım ez.

1165 Lehn û awazê uşaqan, tèn ji hubê sîmê saqan,
Dad ji dest derd û firaqan, welih û heyranım ez.

Weleh-û heyran dimînim,³⁹serxoşê camê yeqînim,
Sakinê beytelhezînim, çav li rê cananim ez.

Çav li rê bê mahîtabım, nale çûn çeng û ribabım,
Aşiqê rend û xirabım, mest û sergerdanım ez.

Mest û sergerdan û serxoş, gahî hişyar, gahî bêhoş,
Dil birîndar û Sîyahpûş, purr kul û kovanim ez.

SERÊ XVI

*Keftina şehzadeê bengî bi destê segsar û zengî we îzaê wî
ji destê qîza şahê zengîyan ku lê bûye bengî*

Nebîtin kes giriftarê firaqê,
Xisûsa derd û dag'ê eştîyaqê.

1170 Eger waqî' bibit yek merdê dilêr,
Dibîtin rû be ew eslanê wek şêr.

Muelqise, dibên, mîrê hunerwer,
Sual kir halê Sed û halê esker.

„Bi cemi'î esker û keştî g'eriş bûn,
Welê gemîyê me û Sed¹ ji yek firiş bûn.

Nizanîn ew kuda çû bê ser û ber,
Ji g'eyrî me ne ma baqî çû esker“.

Bihîst ku şahizade ew hewale,
Ji nû kêşa ji dil sed ah û nale.

1175 Go: „Ya rebb, Sedê min çûye² bi kûda,
Nizanim ez ji halê wî çi rûda?“³

Ji wî rengî digotin qewl û eşa'r,
Dikir⁴ ah û girîn û nale û zar.

Emîrek rabû, go: „Ey⁵ şahizade,
Muyeser bî te⁶ meqsûd û mirade.

Qezaê rebbîye, dê⁷ tu bikî sebr,
Di gel hemd û senaê û bê eded şukr“.

Ji wî qewlî bû şehizade g'enî dil,
Bi naçarî fikir sebir û tehemil.

1180 Li paşan go: „Heye tişteke ji etam?
Bixwem ez da çi bit⁸ axir serencam“.

Team anîn li pêş danîn be tezîyîn
Kebab û nan û şurbê xoş û şîrîn.

Dibên, çend loqmekî⁹ xwar, ahekî serd,
Kîşand û gotî: „Ay û way,¹⁰ li min Sed.

Bi kuda çû gelo, ew yarê canî,
Li ber min şem'ê rûgeş¹¹ bû nihanî.

Ji dest çû melhemê êş û birînê“.
Bi nermî go di gel ah û girînê.

1185 „Gelî yaran, dizanin ev çi cêye,
Ku em îro diçîn têda li rêye?“¹² ..

Bi cumle gotin: „Rebbê pê dizanî.
Weger ne, yek ji me esla nizanî“.

Di van qal û meqalan bûn, yekî merd,
„Ji dûr,- go,- wa diên çend gemîye û merd“.¹³

Dibên, şehzade go ba karêdanan,¹⁴
„Dibêtin ew cemaet karêwanan.

Biken pirsê ji wan, ew pê dizanin,
Ku ev çîye, çi cî û hem mekanin?“

1190 Di hîna bûn bi¹⁵ nêzîk ew cemaet,
Çihil keştî û zengî¹⁶ bûn temamet.

Di nav her keştîyek bû şêstê¹⁷ zengî,
Museleh bûn tamam û¹⁸ mêrê di cengî.

Ji wan zengîyê rûreş ger yekî merd,
Berê xwe bidet çîyaek dê biket kerd.¹⁹

Ji ewwel karê wan bû cumle anan,²⁰
Biken yeg'man û g'aret karêwanan.

Ku wan dî keştîyê şehzadeê mîr,
Bi cumle gote hevdu²¹ werne nêçîr.

1195 Kulabî²² ahînin avêtne keştê,
Kîşandin berb xwe ba qehr û zeştê.

Wekî şehzade dît ew rengê zengî,
Go: „Bikujin wan sekan, yaran bi cengî“.

Muselleh bûn tamam û zirx û cewşen,
Bi lez wergirtin wan ba cengê duşmen.

Kirin hingînî²³ şûr û gurz û nîzeh,
Bû heşîr û neşîr û rojê restexîzeh.

Li hev xistin wekî şêr û pilingan,
Bi gurz û nîze û şûr²⁴ û kulingan.

1200 Ji ber derbê demê sînanê zehrab,²⁵
Dibên, bû behrê xûn ew behr û ew ab.²⁶

Welê kuştin, dibên, şehzadeê mîr,
Ji hedî zêde ba gurz û rim û tîr.

Dibên, şehzade destda tîr û tîrkeş,
Gelek kuştin ji wan zengîyê rûreş.

Ji derbê şahizade, merdê cengî,
Deh û du gemye bûn wala²⁷ ji zengî.

Ji derb û hînge-hîngê şêr û mêran,
Seda û ne'rîyê merd û dilêran.

1205 Dibên, ew rojê bû wek rojê heşrê,
Çiqasî behrî bûn, çûn qeerê behrê.

Dibên, şehzadeê mexmûr û mehweş,
Eceb şer kir bi gurz û tîr û tîrkeş.

Digotî²⁸ zengîyan: „Ey şêrê sermest,
Nedît me kes wekî te çapik ez dest“.

Ji yarê şahizade bûne kuştî,
Çil û sê kes temamî²⁹ ew di keştî.

Wekî dît zengîyan salarê şêran,
Bi tenha ma di gel penc û du mêran.

1210 Kirin gazî û qîrînî û hawar,
Go: „Wernê hûn bi cemi'i, wek seê har.

Bi dest bigrin ewan³⁰ em şubhê hêsîr.
Hedîye em biben bo zengîyê mîr“.

Dibêjin, hatinê ew çari canib,
Welê şehzade bû mêrek ecaib.

Gehî dikuştin bi zerg³¹ û tîr û tîrkeş,
Gehî ba şûr û rim û gurz³² û perşeş.

Ku nêzîk bûn û zengî ji şahizade,
Bi dest girtin g'ulamêd bê mirade.

1215 Welê şehzade da ne'rfî û hunner,
Ji dused zêde kuştin wî bi xencer.³³

Çiharsed merdê dilêranê zengî,
Bi hevra hatne şehzade bi cengî.

Ji derban rehti bûn wî dest û hem zend,
Ji piştra şahizade xoş kirin bend.

Bi teşbîhê hêsîran rakişandin,
Li paşan gemye û keştî cerandin.

Sîyehpûş, tu bike cehd û cihadê,
Di gel nefsê dibînî tu miradê.

1220 Wekî şehzade bi mêr û bi huner,
Bikuj nefsê xebîsê xo bi xencer.

Emanet, guh nedêy fikrê hewayê,
Se kî nefsê û kîbrî û rîyayê.

Li ser ta pê reşin ew şubhetê qîr,
Bi mislê zengîyan dê bken te hêsîr.

Di hîna zengîyê ehlê inade,
Kirin hêsîr g'ulam û şahizade.

Kêşandin der ji behrê gemîye û merd,
Qirar girtin mekanek xoşî ez erd.

1225 Bi lez anîn û danîn textekî zer,
Tejî mercan³⁴ û le'l û durr û gewher.

Ji jorda³⁵ hate ser bala minarek,
Li ser ta pê reş û şewitî çinarek.

Di gerdenda ji zêrrî toqê lenet,
Li ser textê zerîn rûnişt bi minet.

Cewahirbendi bû an toqê ez zer,
Çû zînê espê şehzadan li pişt xer.

Li paşan zengîyan şehzade û yar,
Hilanîn û birin pêş pîre kevtar.

1230 Kiyani hakimê zengîyê naxoş,
Şikil pîs û reş û sergîn benagoş.

Go:³⁶ „Ehlen, merheba, ba qedir û qîmet,
Ecaib bo me kir hûn zêde xidmet“.

Dibên, şehzade seh kir ba feraset,
Emîrê zengîyane ew necaset.

Temenna kir ji wîra û go: „Îlahî,
Xelas key me ji destê wî rûsîyahî“.³⁷

Ji hevdu payê kirin zengîyê rûreş,
Bi emrê şeh g'ulam û mîrê mehweş.

1235 Muhessel, du g'ulam û mîrê çûn mah,
Ji payê ew ketin bo doxterê şah.

Hilanîn zengîyan du yar û ba mîr,
Birin bo doxterê şahê wekî qîr.

Ku doxter dîn g'ulam û mîrê sadiq,
Bi sed dil bû ji şehzade bi aşiq.

Emir kir doxterê zengî çûn zag',
Biben şehzade û yaran di nêv bag'.

Biken xidmet ji wanra zêde mehbûb,
Ji dil ez talibim ber royê metlub.

1240 Hilanîn yar û şehzade bi izzet,
Birin³⁸ bag'ek³⁹ mîsala bag'ê cennet.

Tijî xurma û xox û cewz û encîr,
Henar û sîb⁴⁰ û incazê wekî tîr.

Turinc û qeysî û leymûn û narinc,
Tirî-yû fişne û badam û hem sinc.

Wekî şehzade û yaran we rengî,
Team dîtî di bag'ê bintê zengî.

Dibên, xwarin ji newê' cumle îtam,
Heta heft roj û heft şev bûn bi⁴¹ îtnam.

1245 Welê bintê digo: „Min hersê xwarin,
Ji babêra,- ku tu⁴² bo min hinarin“.

Ku çû yek hefte, bintê şahê zengî,
Ji iştan bû xumar û mest û bengî.

Ji dil kir e'zmê iştê şahizade,
Ji weslê wî bibînî da⁴³ mirade.

Çû ser behrê sîyah, xwe şûst û ew reng,
Heta bû tehl û şor û pîs û pirrjeng.

Kefê behrê û xûnê reş wekî dû,
Du rûyê⁴⁴ şubhê kosîdan û pîsû.

1250 Ewan zulfê wekî dêlê di hespan,
Vemaliştin bi xûn û kefê behran.⁴⁵

Du guhê şubhê palas û tejî mû,
Ji zeng û kefê derya bûn wekî gû.

Du ebrû wesmeh dan⁴⁶ ba dûd û sergîn,
Ji xûn û kefê derya bûyî rengîn.

Du çehvên zer teyîsan şubhê meşe'l,
Mukehel kir ji xûn û neft⁴⁷ û dûkel.

Bi wan çehvan dikir naz û kirişme,
Du firmê pozê wê bûn mislê çeşme.

1255 Dibêjin, lêvê jêrî çûbû⁴⁸ ser sing,
Bi serda hatibû ya dî wekî ding.

Reş û qalîn⁴⁹ bi dev şubhê mig'are,
Didanêd⁵⁰ wê dirêj bûn wek muqare.

Ji ber lêvan çenê wê kes nedîbû,
Go,⁵¹ bêhna dev wekî kelbê mirî bû.

Wekî du meşkê mey bûn wê du bistan,
Reş û pîs û necis daimî zîştan.

Wekî min go delal bû wê dev û zar,
Ser û gerden di singêda çûbûn⁵² xar.

1260 Qed û qamet wekî şewtê çinarê,
Du neh gaz bû devê jêrîn mig'arê.

Dibên, dehlek tamam bû wê mû û pirç,
Di navda bûn gur û wehşî, ner û hirç.

Ji pêra hatibû heta bi navî,
Ji piştra ser bi milda bû ziravî.

Nezer ken hûn ji wê pîsa muneces,
Çi rengî bû ji libsê qenc mulebes.

Li ser dehlê⁵³ serî bû tacek ez zer,
Cewahirbend ji le'l û durr û gewher.

1265 Di berda bû, go⁵⁴, belgê gul kirasek,
Li ser wergirtî ez sundus libasek.

Dused men zêrr kemer bû wê⁵⁵ li piştê,⁵⁶
Serê şirkan dihatin ser qeliştê.

Di gerden bû benek sêsed ji gewher,
Bi ser xweda reşandî misk û enber.

Çi xoş meş kir bi mîsalê meşê zag',
Bi wî şikil û fesalê hate⁵⁷ nêv bag'.

Çû qesrek xoş mîsala qesrê cennet,
Bi şadî û bi kêyf û zewq û sohbet.⁵⁸

1270 Emir kir saqîyan, anîn şerabi,
Bilind bû sewt û awazê rubabi.

Ku çeng û saz û nayî kir bi nale,
Dîlê mestan dibû heyran û wale.

Bi emrê dîlê san qîza seê pîr,
Kirin hazir li nik şehzadeê mîr.⁵⁹

Go: „Ey çeşm û çira û raheta min,
Qîrar û hoş û sebr û taqeta min.

Bi mislê min nehin esla çi mehweş,
Letîf û nazik û mehbûb û dilkeş.

1275 Ji şerma min bi şev şemsê veşar xu,
Ji husna min sîyahin bû qemer rû.

Ji hesret min gelek şehzade zengî,
Bûyîn mecnûn û şeyda ta firengî.

Didin methê me bozeng û libasan,
Xeta û Hind û Qibçaq⁶⁰ û Xorasan.

Di alemda bi deng û navim⁶¹ ez purr,
Ji husna min bê qedrin gewher û durr.

Ji derdê min xirab bûn çendî kişwer,
Bibê, bo min tu çawanî,⁶² dilawer.

1280 Te ez dîm û nedî te ji min mirade,
Me da destûrê te, ey şahizade.

Bi bêtirsî were tu wî⁶³ bi dilxwaz,
Ji min meqsûdê xo bigre⁶⁴ serewraz“.

Ku ew rengî bihîst qewlê seê reş,
Ne guh daê, ne nêrî, bû be⁶⁵ bêheş.

Ji bêhoşî ku hişyar bû dilawer,
Ne guh daê, ne nêrî şikil û menzer.

Ku ew reng dêlê reş dî, hat iqabe,
Go: „Wernê wî bibin purr den ezabe.

1285 Biben wî û hevalê wî biden rex,
Herro bînin bi wan⁶⁶ êzingê metbex“.

Dibêjin, herdu hevalan bi destar,
Şe'îr û hinte û garis dikir ar.

Birin şehzade û yar dan teniştê,
Hero danîn⁶⁷ bi wan⁶⁸ êzing bi piştê.

Ku endik baye⁶⁹ hersê piştîyê wan,
Di⁷⁰ mehrûm bane ew ez ab û ez nan.

Dibên, Seyfulmuluk û herdu heval,
Ji destê zengîyan bûn zêde bedhal.

1290 Ji derd û muhnet û cewr û cefaê,
Feramûş kirbû wan⁷¹ namê sefaê.

Bi xef rabûn revîn û⁷² xoş nezer kir,
Nedîn zengî û çûn ezmê sefer kir.

Ji⁷³ rex behrê bû hêj gemya berêdayî,
Wekî şehzade û yar bûn⁷⁴ têdayî.

Ji her enwa'ê fêkî wan çinî xoş,
Birin gemîyê bi dest û piştî û doş.

Li paşan gemîyê berdan û⁷⁵ çirandin,
Bi te'cîl û sulbê dû canib weşandin.⁷⁶

1295 Feqet qalû *tewekelna elellah*,
Nufawwid emrena herdem ilallah.

Kesê emrê xwe bispêrît îlahî,
Yeqîn ew dê xilas bît ez sîyahî.

Munîr dêbît⁷⁷ ji wîra rengê zulmet,
Bi ser diçîn cefa û derd û muhnet.

Çi xoş wexte wekî emmareê nefis,
Bi dûr bîtin di gel lewwameê nehs.

Seyri ket mulheme pîrr zewq û pîrr derd,
Dilê derwêşî dana, arif û merd.

SERÊ XVII

*Xilasbûna şehzadeye ji zengîyan bê aman we dîtina wîye
ecaibê behran we rasthatina wîye li şahê serkûçikan merdî
heyran*

1300 Meelqise, dibên, şehzade û yar,
Li ser behrê wekî gemyê kirin kar.

Heta bîst roj û şev çûn, lê ecaib
Gelek dîn û gelek¹ tiştê g'iraib.

Neşî² bêjim ji tetwîla kitabê,
Ecaib û g'eraîbên di abê.

Welê şehzade go ba du g'ulame:³
„Eger erdek bibînin pîrr teame.⁴

Heta em sag'i bin dê bikeyn sebrê,
Sefer nakeyn qet esla em di behrê.⁵

1305 Me ew reng dîn ecaib bê e'ded bes,
Ji ewwel ta bi axir qet ne dî kes.

Nezer kir şahibazê mest û serxoş,
Bi nêzik bû⁶ li wan⁷ purr adeyek xoş.

Bi derkeftin ji behrê çûn cizîre,
Têda dîn xurme û sêv û hejîre.

Ji enwa'ê fewake dîn bi⁸ mutleq,
Çû engûr⁹ û henar û sinc û findeq.

Helanîn dest û şehzade dua kir,
Di gel şukrê gelek hemd û sena kir.¹⁰

1310 Li paşan gote yaran: „Dê bikeyn¹¹ sebr,
Heta em sag'i bin di vê adaê behr“.

Wê rojê bûne rahet ta êvarê,
Bi¹² meg'rib hersê çûn ser gulîyê darê.

Mebada¹³ cenawer bên buxun wan,
Ji mexluqatê behr elwan bi elwan.

Wekî şev tarî bû, dîtin cenawer,
Ji behrê derketin bêhed û defter,

Çû bufr û hirç û gurg û rubah û wehş,
Dixwarin wan fewakê ba dilî xweş.

1315 Diger be'dî cenawer şubhetê merd,
Li ser avê diçûn xoş-xoş, wekî erd.

Diger be'dî dihatin ew bi te'cîl,
Bi gazî wan dihat tesbîh û tehlîl.

Diger be'dî ji çeng û naye û saz,
Gelek xoştir bû sewt û deng û awaz.

Diger be'dî mîsala şêrê şerze,
Ji dengê wan dihat alem bi lerze.

Ko dev dabane ser avê bi lez xweş,
Dibû derya ji lêvê wan bi ateş.

1320 Çi binivîsim, sifet cumle cenawer,
Temam naken¹⁴ dused kitab û defter.

Muhessel, gote yaran mîrê dilber,
„Werin da em ji vê adê herin der.

Eger bên û bibînin me cenawer,
Mueyyen dê biken ew me bi kerker.

Ku alem bû mumîr ez tele'tê şems,
Cenawer çûne behrê qenc û hem¹⁵ ne'hs.

Ji darê hatne xar şehzade û yar,
Çinîn fêkî birin gemîyê, kirin kar.

1325 Tewekkul dane ê bêxwarin û xew,
Li ser behrê gemî çû ta çihil şew.¹⁶

Teamê wan xilas bû qet nezanîn,
Ji behrê ew çi cî û hem mekanîn.¹⁷

Bi emrê xaliqê heyy-û qedîre,
Ji dûr dîtin bi derket yek cezîre.

Ku nêzîk bûn û çûn dîn cîyekî qenc,
Tejî xurme û xox û fişne¹⁸ û senc.

Henar û sêb û bih, incîr û engûr,
Turinc û leymûn û narincê mexmûr.

1330 Tejî hirmî û goz û darê gilyaz,
Diger badam û qeysî, darê incaz.

Gelek bindeq hebûn têda we e're'r,
Ney û yesmîn û hem serw û senewber.

Spîndar û bîyê şeng, darê bilbil,
Reyahîn û binefş û nêrgiz û gul.

Helal û sosin û sunbil muheleq,
Reyahîn û şilêr û mîlaq û ebleq.

Ji bêhnê xoş û misk û u'd û enber,
Gelek dîtin şeh û yaran û dîger.

1335 Durrextî bûd û bergeş, hem çû le'le,¹⁹
Semer bustanê bintê çarde sale.

Heme şeb ta seher manendê uşaq,
Bi sewtê xoş bilind mîgoftê²⁰ waqwaq.

Durrextî dîgereş qehqeh bixende,
Heme şeb ta seher mîkerd bilende.

Hebû darek di²¹ belgê wî şebefroz,
Dîsa şubhê meşe'l şeb heta roz.

Ji belgê darekî dî her ji meg'rib,
Heta subhê dihat awazê mitrib.

1340 Li ser daran hebûn tawus û bilbil,
Di gel qumrî û tûtî bêtehemmil.

Dibêjin, şahibazê mest û heyran,
Ji işq û dil dikir wî geşt û seyran.

Gehî wek bilbilan bû ew bi awaz,
Gehî tûtî dibû wî²² mehremê waz.²³

Gehî dinêrî qeddê şemşad û e're'r,
Gehî yesmîn û hem serw û²⁴ senewber.

Gehî dinêrî ji rengê nêrgiz û gul,
Gehî xetê binefş û ce'dê sunbul.

1345 Gehî dinêrî qedê bêşeng û nîsrîn,
Gehî narinc û bih, leymûnê şîrîn.

Dibûrand rozigarên²⁵ aşiqane,
Ji nageh dîti hatê²⁶ g'aêbane.

Ji ser wehşan dibîn qewmê libasan,
Du yarê şahzade girt bi asan.

Helanîn û birin ew şubhê hêsîr,
Li paşan hatine pey şehzadeê mîr.

Revî şahzade, lê du kes ji serwehş,
Bi nêzîk bûn ji mîrê mest û mehweş.

1350 Dibên, şehzade destda şûr û xencer,
Bi du derban kirin²⁷ herdu bi du ker.

Li paşan xoş revî û ma bi تنها,
Li hev xistin çîya û deşt û sehra.

Heta sê roj û sê şev bû²⁸ temame,
Bi çolêda diçû ew bê teame.

Nezer kir şahibazê sînesade,
Ji ber xwe dît-û rêyek xoş û cade.

Ji destê rastê rê çû ew şirînsurr,
Ji dûrda dît şehrek bê e'ded purr.

1355 Çû şehr û dît û merdum²⁹ ruştê³⁰ rûçik,
Cesed însan û lê ser şubhê kûçik.

Wekî serkûçikan dîn mîrê çûn mah,
Dibên, girt û hılanîn birine pêş şah.

Di qesrek xasida şahane zerkeş,
Ji pêşî şahî danîn mîrê mehweş.

Nezer kir şahibazê mest û pirr³¹ g'em,
Li ser textî dî yek ji³² ewladê Adem.

Bi sef-sef sekinîn bêhedê segser,³³
Mûtîi û dest li ser destan beranber.

1360 Temenna bû ji ber mîrê serefracz,
Welê şeh kir ji wîra zêde i'zaz.

Bi emrê şahî textek pirr ji gewher,
Dibên, danîn muqabil şeh beraber.

Çû ser text şahibazê Misr û Şame,
Bi emrê şeh li ber danîn teame.

Emanet, ku ji bo te³⁴ hatî mêhman,³⁵
Bi te'cîl bîne ber tu³⁶ av û hem nan.

Dilê birçî bî ew têr ke ji teame,³⁷
Li paşan tu bike pirs û kelame.³⁸

1365 Meelqisse, dibê,³⁹ mîrê xudênas,
Li ser xwanê zerîn⁴⁰ dîn durr û elmas.

Firaq û tas û temsî, cumle yekser,
Ji le'l û şebçirax, yaqût û gewher.

Ji ewwel xarinê go:⁴¹ „Bismî ullah“,
Wekî têr xwar û go: „Elhemdulîllah“.

Bi nerm û şîrînî mîrê hunerwer,
Bi⁴² şahê segseran go: „Ey birader,

Ji halê te gelek mayim⁴³ ecîbe,
Dizanim, tu wekî min bûyî⁴⁴ g'erîbe.

1370 Ji ewwelda⁴⁵ tu halê xwe bibêje,
Çira ku qiseta min pîrr dirêje“.

Çi xoş kir şahê segseran hikayet,
Ji ewwel halê xwe heta nihayet.

Go: „Ey yar û biraê min ji Adem,
Hebûm ez îbinî merdê şahê Belg'em.

Bi bazirganî ez hatim di behran,
Ji nageh hat-û⁴⁶ bayek sext û baran.

Helanîn gemîye û ji yek rakirin⁴⁷ text,
G'erîq bû mal û ez⁴⁸ mam ser yekî text.

1375 Li paşan mewc û pêlan ez hilanîm,
Li nik bajarê bûzengan deranîm.

Wekî bûzengîyan dîm şubhê hêsîr,
Hilanîm û birim wan, ez kirim mîr.

Ji ewwel qaêde û qanûnê segsar,
Dibêjim bo te, guhdî, ey şîrîn yar.

Heye sed şehîrî pîrrtir mulkê bozek,⁴⁹
Hemî serkûçîk û reş, pîs û pîrzek.⁵⁰

Ji g'eyrî ademî naken bi sultan,
Li ser xwe ew mutî'ê emr û ferman.

1380 Ku ew mir, dê yekî di bînne ser⁵¹ text.
Diken hakim ji xora bi⁵² tali' û bext.

Mûtî' dêbin ji emr û nehyû hikmet,
Diden dest qesr û mulk û mal û zewcet.⁵³

Di ber min hakimê wan bibû merhûm,
Ji bêhakimî ew bûn zêde meg'mûm.

Ku wan ez dîm, ji rex behrê helanîm,
Bi sultanî li ser vî textî danîm.

Mûtî' bûn ew di fermana me yekser,
Eger bikujim ji wan⁵⁴ dused bi xencer.

1385 Me nêrî qesr û mal û mulk û metlûb,
Di qesrêda me dî yek doxterek⁵⁵ xûb.

Me go: „Tu kîî, bibêje, ey şîrîn meh“.
Go: „Ez bintê şehême, ku di ber teh“.

Me anî mehir kir ba ew rizayî,
Tewekul xoş me da barî xudayî.

Me go halê xwe bo te endek û purr,
Tu hem⁵⁶ halê xwe bêje, ey şîrînsurr“.

Dibên, şehzade halê xwe beyan kir,
Ji ewwel ta bi axir xoş eyan kir.

1390 Gelek bû şahê segseran muheyyer,
Ji bag'ê Êrem û Şehbalê serwer.

„Ne min dîn û⁵⁷ bihîstî qise ew reng,
Ji şehrê Belg'emê û heta be Bûzeng“.

Heta wan kir hikayet derd û asîb,
Dibên, roj çû û nêzik bû ji meg'rib.

Were saqî, werîn camê bi fincan,
Ku rahet bim ji dest derdan û rencan.

Di hîna ku bibûsim xoş lebê cam,
Dilê mehzûn û mest bê ta serencam.

1395 Were mitrib bi saz û naye û çeng,
Bireqsîn qelbê mexmûr û ji mey⁵⁸ û beng.

Neçît zayeh umr ez derd û asîb,
Sebahê umrî çû, nêzîke meg'rib.

SERE XVIII

*Bexşîşkirina şehzade ji mîrê segseran we xatirxwastina wî
ji wan dîyaran, di gel ku tenha maye ji dost û yaran*

Di hîna eskerê meg'reb zemînê,
Bi derket munhezim bû şahê çînê.

Çiya û deşt û sehra bûne zengî,
Edem bû şahê meşrîq û firengî.

Be emrê şahî danîn xwanî¹ zergeş,
Di pêşî şahî mîrê mest û mehweş.

1400 Kebab û nan û nuql û şîr û şeker,
Firaq û tas û temsî,² durr û gewher.

Li paşî xwarinê xoşab û rumman,
Di dîwanê gerandin mey bi fincan.

Wekî meyxwar şah û mîrê mehweş,
Diger ehlê dîwanê bûne serxweş.

Dikir bûzengyan nalî wekî çeng,
Li ser erdê didan pê heng û hey heng.³

Ku şewqê mey li ser wan bû teg'ellub,
Dibên, şehzade pîrr ma der teaccub.

1405 Direqisîn û fikir wan nale û zar,
Ji şewqa mey mestîye cumle segsar.

Dibêjin, êkî bûzeng bê xeberdan,
Di nêv dîwanê seknî wek şemadan.

Çira danî li ser xwe wî bi bê g'em,⁴
Heta şemsê tilu' da cumle alem.

Wekî dunya ji şemsê bû⁵ munewwer,
Bi iznê şeh, dibên, mîrê dilawer.

Ji qesrê ew bi derket⁶ mest û heyran,
Ji bo ezmê temaşa, geşt û seyran.

1410 Didîtin wî di şehređa ecaib,
Gelek⁷ enwa'ê⁸ mexluqê g'iraib.

Heta çû dît û merdek ademî kal,
Dibên, Lahîdê nam bû, umrî sed sal.

Go: „Ey Lahîdî namê dil munewwer,
Dizanî tu mekanê durr û gewher?

Di gel min tu were da bçîn xudênas,
Temaşe keyn durr û yaqût û elmas“.⁹

Dibên, Lahîdi rabû ba¹⁰ dilawer,
Bi şadî çûne kuhê durr û gewher.

1415 Yekayek şahizade durr û elmas,
Helanîn li nik¹¹ Lahîdî xudênas.

Go: „Wan bavêje, wan qîmet tunîne,¹²
Tu wer, ya qenc ji vî erdî hilîne“.

Dibên, şehzade çû cewher ji sed reng,
Hilanîn û birin pêş şahê Bûzeng.

Wekî şeh dîti ew reng durr û gewher,
Go: „Ey yar û bira, şîrîn, dilawer.

Çiqas te divê hilîne tas û temsî,
Teecub jê bimînin cin û insî“.

1420 Muhessel, ta du sal û nîv¹³ temame,
Li nik şeh ma emîrê Misr û Şame.

Ji bîr kir rencê rah û muhnet û derd,
Ji dil kêşa ji nageh ahekî serd.

Çira û¹⁴ meşe'la işqê ku hil bû,
Dilê şehzade pirr coşan û kul bû.

Nema taqet ji işqê mîrê mehcûr,
Ji şahê segseran xoş xwestî destûr.

Dibên, şah dan bi wî çend durr mulemme',
Li paşan espek û zînek jê¹⁵ muresse'.

1425 Bi wî bexşîn du mêrê¹⁶ ademîreng,
Emanet lê esip¹⁷ gel mîrê Bûzeng.

Tewekkul da xudawend şahizade,
Li paşan dane ber xo rêy û¹⁸ cade.

Heta ew çûn bi ser hedê welayet,
Li paşan mîrê Bûzeng erdê xidmet.

Dibên, bûsî serê espê kirî bend,
Li paşan bû peya şahê xiredmend.

Vegerya mîrê Bûzeng, şahizade,
Di gel yaran diçûn ser rêyî cade.

1430 Dibên, şehzade û herdu hevale,
Tewekkul dane şahê zulcelale.

Li ser derd û bela û muhnet û rah,
Dibên, şehzade kir ez dil yekî ah.

Bi bîr ket Sed û şahî û perîzad,
Ji dil kir nale û zarî û feryad.

Li paşan şahizade dil bi ullah,
Dibên, xoş kir, digo: „El hemdulillah,

Xudaya qadir û rebb û rehîmî,
Elîmî û besîrî û kerîmî“.

1435 Muhessel, hersê çûn heta bi behrê,¹⁹
Muhîtî ew gihîştin şubhê bedrê.

Dibên, şehzade û herdu hevala,
Digeryan nav cezîre, namê Wala.

Gelek dîtin di nav tiştên ecîbe,
Ji xakê zêrr û elwanin g'erîbe.

Wekî u'd û e'bîr û darê sendel,
Wekî kelban hebûn mûrî muhessel.

Nezer kir şahibazî mest û dilêr,
Ji jorda hate wan teyrek wekî şêr.

1440 Helanîn herdu yarê şah û der seyr,
Dirêj kir dest û girtin penceê teyr.

Helanîn teyrî hersê bilind kir,
Bi çavê heybetê mehweş nezer kir.

Tewekkul da xuda û²⁰ qetiê umîd,²¹
Ji xwe kir wî û dest ez can bibirîd.²²

Ji deryaê muhît û behrê tîre,
Bi derxistin gîhandin yek cezîre.

Ji sed fersex bêtir teyr ew hilanîn,
Di nava dehlekî purr dari²³ danîn.

1445 Ku nêzîk bû ji²⁴ erdê şahê medhoş,
Ji sewda û hewaê keft û²⁵ bêhoş.

Dibên, şehzade ma, lê teyr û du yar,
Birin ser²⁶ hêlîna xwe, ber²⁷ serê dar.

Wekî şehzade hişyar bû, nezer kir,
Teyr dî herdu²⁸ yarê wî bi ker kir.

Ji bo çar têjikên xwe, hate pey mîr,
Welê şehzade dest da qebdeê şîr.

Dibên, carek nezer kir mîrê dilber,
Ji bala hate xwarê marek ejder.

1450 Ji dengê wî dilerizîn erş û kursî,
Bi enfasê dikêşa ga û masî.

Di hîna teyri dît ew heyê ejder,
Bi çengalan çûyê mislê g'ezenfer.

Welê²⁹ ejder bi enfasê kişand teyr,
Ji dunyaê edem kir, şeh dikir seyr.

Ji pêş şehzade ejder çû serê dar,
Bi yek loqme edem kir ferxê herçar.

Li paşan mar û çû û geşti medûm,
Bi tenha ma şehê mehzûn û meg'mûm.

1455 Dibên, lew paş bi rêda çû heta şew,
Ku tarî bû çû ser darek ji bo xew.

Di xewra çû şehê xunxwar û aşîq,
Li ser darê heta bû fecrê sadiq.

Wekî bû fecrê sadiq û³⁰ munewwer,
Ji rojê bû dinê, rabû dilawer.³¹

Bi çolêda meşî³² ew bê teame,
Heta penc roj û penc şev bûn³³ temame.

Dibêjin, bûne avik herdu riclêyn,
Ji rehtî purr dihatin abê e'ynêyn.

1460 Muneqqeş bûn ji xûnê pê û enguşt,
Ji birçan mutesil hev bûn³⁴ zik û puşt.

Ji rehtî û ji derdê îştîyaqê,
Hemî goft in çunîn qewlên firaqê.

Li paşan got: „Ey xellaqê alem,
Qedîm û qadir û ellam û ekrem.

Nedarem taqetê azar û muhnet,
Xisûsan ateş û narê mehebet.

Eger kirye ji bo min te muqedder,
Mîrad û meqsedê min key muyesser“.

1465 Ku dua kir, nezer da³⁵ mehweşê mîr,
Ji nêzik dî muqabil darek incîr.

Çû bin darê û têr xwar mîrê aşiq,
Di xewra çû heta bû fecrê sadiq.

Îlahî tu şeva reş key munewwer,
Ji bêhnê xoş demag'i key muetter.

Were saqî, werîn camê mey û xemr,
Helatin bo me hoş û taqet û sebr.

Bibûsim ku lebê camê şerabê,
Ji mijde wesletê bibhêm cewabê.

1470 Were mitrib, bi saz û çeng û naê,
Dilê mest bîne ber reqs û semaê.

Ji awazê ney û çeng û ribabê,
Ji wusalê hebîban deh cewabê.

SERÊ XIX

Dîtina şehzadeye li Melke xatûn û kuştina perîyêye meqbûn we sehkirina bêhna muradêye bi emrê xaliqê bêçûn

Li ser xwe ku vegerya şahê meşrîq,
Ji etrafan esakir¹ bûn² bi tefrîq.

Ji yara³ tên şehê şerq û ferengî,
Bi meg'rîbda revîn⁴ hindî û zengî.

Di gel fecrê ku rabû şahê mexmûr,
Ji etrafan dinêrî⁵ nêzîk û dûr.

1475 Mu'lla⁶ dîti qesrek, çû kir û⁷ qest,
Ku nêzîk bû ji qesrê şahê sermest.⁸

Li⁹ ser ta pê li bin dîn sîm û hem zer,
Ji wê qesrê misela qesrê qeyser.

Bilind bû bê e'ded ew¹⁰ qesrê şahî,
Muneqqeş dergehêk tê dîti mahî.¹¹

Ji etrafan dinêrî şeh ne dî kes,
Ji weşş û teyr û mar¹² û cin û hem ens.

Tewekkul da xudewendê mezin mîr,
Ji kavlanê¹³ kişand elmasê şemşîr.

1480 Feteş kir dergehê qesrê mu'lla,
Bi ser ket nerdewanên zêde e'lla.

Ji ber xu dîti qesrek xoş û dilber,
Ji misk û enber û u'dan muetter.

Zerefşan û muneqqeş bû murebbe',¹⁴
Ji le'l û şebçirag' û durr mulemme'.

Ji her çar ruknêha yek textê zîba,
Tê danîbû firaş û ez xez û dîba.

Musewer bûn ji sed reng dar û dîwar,
Hebûn têda ji newiê cumle etyar.

1485 Wekî tûtî û qumrî, kubik¹⁵ û bilbil,
Çu taûs û kebûterha bi g'ulg'ul.

Çu uşaqan dikir wan nale û zar,
Muqeffs bûn, muelleq ew bi dîwar.

Hebûn têda çihil¹⁶ pencere û der,
Temam ez şebçirag' û durr û gewher.

Muheyyer bû tee'ceb şeh ne dî kes,
Muqabil dîti yek perde ji etles.

Helanî perde mîrê mest û mehweş,
Mug'elleq¹⁷ dîti yek dergeh muneqqeş.

1490 Bi bê mifte feteh kir *Ehsenullah*,
Bi hundur keft¹⁸ û go: *Nesrûn mîn ellah*.

Nezer kir dît yek textê muresse',
Ji le'l û şebçirag'an bûn mulemme'.

Li ser dî dîlberek razayî medhoş,
Şîrîn û mehweş û simîn benagoş.

Letîf û nazik û¹⁹ mehbûb û dilkeş,
Xumar û mest û dildar û perîweş.

Cebîn bedr û du ebrû qewsê tarî,
Sîeh zulf û çeşm mest û xumarî.

1495 Şekerxa leb, dehen g'unçe, du bistan,
Çû narinc û bi qed serwî gulistan.

Li ser wechan bû desmalek muneqqeş,
Dibû qelbê uşaqan jê muşewweş.

Selam kir lê²⁰ şahê alîcenabe,
Nedayî wê mehê esla cewabe.

Li ser dêmê²¹ hilanî şah û desmal,
Li ser wechan²² xuya bûn zulf û hem xal.

Wekî kafûr û werd û misk û enber,
Dimag'ê şeh ji bêhnê bû muetter.

1500 Bi destan girt hejand şahê şirînsurr,
Nebû hişyar ji xwabê xwe²³ şirîn durr.

Di ber guhan bi deng gazî²⁴ kirê şeh,
Nebû hişyar ji bêhoşî²⁵ şirîn meh.

Teeceb ma gelek şahê xudanbext,
Nezer kir, dî ji yek pace,²⁶ yekî text.

Ji asnê²⁷ wî nivîsaî du-sê xet,
Ji wî rengî nivîsan şeh ne dî qet.

Dibên, çû text deranî, ku bixûnî,
Çû cîkî rûnî surrek jê hilînî.

1505 Wekî şehzade text dûr kir ji pacê,
Helanî ser mehê gerden ji a'cê.

Nezer kir şeh, nexwendî hêje mektûb,
Ji xew rabû mehê²⁸ dildarê mehbûb.

Mufferreh texti danî²⁹ pace mehweş,
Ku qest kir, dîtî mehbûb keftî bêheş.

Go: „Hey, hey, ey³⁰ eceb, xew jê kirin³¹ bend,
Bi wî textî³² ji wê mehbûbê dilbend.

Helanî texti dûr kir wî ji qesrê,
Ji xew rabû çeleng mehbûbê e'srê.

1510 Nezer kir dîtî şahê Misr û Şame,
Mehê enwer ji³³ şeh xoş kir selame.

Selam istand-û şah û halê wê³⁴ pirsî,
Go: „Ey dilber, tu cinî, yane insî?“

„Feqalet innenî min neslî Adem,
Welê tu kîyî, bibêj, ey yarê hemdem?

Çi rengî tu gehiştî vî mikanî,
Bi behran hatî, ya abê tu anî?“

Cewab daê şehê mexmûr û bengî,
„Ji neslê Ademem, men her we rengî.

1515 Welê halê xwe bo min tu³⁵ bibêje,
Çira ku qiseta min pîrr dirêje“.

Bi nermî zuhreê bo me xeber da,
Welê, ez dil dused ah û keser da.

„Du xûşk bûn em, keçê şahê Serendîb,
Di bag'ê şahîda bê derd û asîb.

Dikir seyran û reqs û eşqibazî,
Ji nageh serserê baê mecazî

Eceb dijwar-û hat û tehlê kir³⁶ seyr,
Ji jorda hate me eslanî yek³⁷ teyr.

1520 Di cîda xûşk û malê ez hilanîm,
Bi bêhoşî bi³⁸ ser vê textê danîm.

Ku hişyar bûm, me nêrî yek dilawer,
Muqabil min vewestayî beraber.

Bi min go: „Tu metirs, ey³⁹ yarê sadiq,
Ji dîdarê teme ez dil⁴⁰ bi aşiq.⁴¹

Bi min xoş ke dilê xwe, ey ruh û can,
Ji camê wesletê min noş ke fincan.

Ji bab û dan dilê xwe sar ke, ey meh,
Ji perîyê Qulzemême, ez kurê şeh.

1525 Cihê peryane ev erd û mekane,
Ji insanan gelek ebe'd bizane.

Eger insan biken cehdê-cihadê,
Bi sed salan naênê vê muqadê.⁴²

Nihin taqet ji bo insani e'sla,
Ku wasil bîn bi wê qesrê mue'lla.

Çi reng ez aşiqê tem, tuj wusa be,
Ji camê wesletê noş keyn şerabe.

Gehî mest bîn⁴³ ji xemr û bûse û leb,⁴⁴
Gehî dilxoş ji zewqê sêbê g'ebg'eb“.

Çiqasî wî fikir meylê wusalê,
Me go bes ke temenayî⁴⁵ mecalê.

1530 Ku bêhed cehdi kir wî, min⁴⁶ ne kir meyl,
Bi sû hat ew li min, go: „Hey, lekel weyl“.

Ji wî textê hesin xew kir li min bend,
Li cem min rabû çû eyyamekî çend.

Li paşan ku vegerya ew perîzad,
Ji xwabê mestîyê ez kirme azad.⁴⁷

Bi min go: „Ey şîrîn meh, hey çi⁴⁸ muqdar,
Ji ewwel bêhişî ta bûyî hişyar“.

Me go: „Yek saete, belkî ku kêmîr,
Ne tû hala le nik min bûyî hazîr“.

1535 Bi min kenya û go: „Yek meh temame,
Ku ez çûm û tu bûyî mest û⁴⁹ name“.

Team anî me xwar û camê⁵⁰ weslet
Be min da û me da wî⁵¹ camê firqet.

Bi min go wî: „Bibim nêzîk te, ey hûr“.
Me go: „Ney, ney, here tu ji weslê min dûr“.

Çiqasî wî ji qurba min fikir cehd,
Me bêtir⁵² her ji bue'da wî fikir cehd.

Li nik min rabû dîsa ew xiredmend,
Heta heyvek dî xwabê me kir⁵³ bend.

1540 Muhessel, halê min wî her wusane,
Ji heyvek⁵⁴ carekê dêbît eyane.

Didet min xwarinê ez⁵⁵ her teame,
Ji qurb û biu'dê deh sal bûn⁵⁶ temame.

Me go halê xwe bo te, ey dilawer,
Tu hem îzhar ke surrê⁵⁷ xwe seraser“.

Dibên, şehzade go: „Ey raheta min,
Gelek dûr û dirêje qiseta min.⁵⁸

Bi rojek qise nabîtin temame,
Ditirsim bêti ew perîyê nemame“.

1545 Letîfa nazenîn go: „Ey dilefrûz,
Ji we'dê hatinê wî mane⁵⁹ sê rûz.

Bibêje halê xwe tu, ey şirînsurr,
Ji ewwel ta bi axir, endik û purr.

Xudaya hafîz û rehman û rehîme,
G'efûr û qadir û rebb û kerîme.

SERE XX

*Mizgînî dayîna Melkeye ji bo şehzadeê dil terav bi dîtina
Bedîe ba-Cemal û bag'ê Êremê di nêzîk weqt û.gav*

Ku dûr¹ ket mulheme pîrr zewq û hem ne'hs,
Dê la heq bit bi mutmeînneê nefis.

Bi ser dêçîn² zelifî-yû heqaret,
Ji weslê dilberan xoş tê beşaret.

1550 Dibên, şehzade ewwel ta be axir,
Yekayek, nukte-nukte kir bi³ zahir.

Ji işqê bintê Şehbal ku xeberda,
Dilê wî sed hezar ah û keser da.

We reng kir medhê bintê şahê Şehbal,
Tee'cub ma gelek ew enberîn xal.

Ji firaqê hebîb û Sedê dilkeş,
Dibên, şehzade purr girya û mehweş.

Gulendama⁴ hebîba naz û rengîn,
Go: „Ey şehzade, ger⁵ ez dem te mizgîn.

1555 Ji bag'ê Êremê û bintê Şehbal,
Gelek xêr û sewabe, ey şirîn xal“.

Dibên, şehzade sê car⁶ kir temena,
Lî ber wê nazenîna xûb û re'na.

Bi sed zarî ku bûsî⁷ erdê xidmet,
Go: „Cana, te çi go, ey mahê telet?“

Xeber da dilberê wek şeker û şîr,
Şekerxa bû çû tûtî ew bi teqrîr.

Go: „Ey şehzadeê pirr naz û terg'îb,
Bizan sê xûşki bûn em⁸ der Serendîb.

1560 Ezim Melke , duwem Bedrê Cemale,⁹
Sêyem nav Bedîe ba-Cemale.

Ez û Bedre ji yek talib û metlûb,
Ridayî bû welê ew perî mehbûb.

Nebûn bo bab û daê min çi¹⁰ ewlad,
Ji g'eyrî min, ku ew pê bin be dilşad.

Ji teqdîrê îlahî bû bi hemle,¹¹
Bi Bedrê maderem hemleş bû kesle.¹²

Hebû babê me¹³ bag'ek zêde cindî,
Di navda çadirê ji dîbaê hindî.

1565 Vegirtin xoş û perde lê hebûn çeft,¹⁴
Ji kemxa û qeseb, hevrişim û zerbeft.

Bi emrê şeh çû bag' û xîme¹⁵ mader,
Disohtin miskê, çîn û u'd û enber.

Bi teqdîrê xudaê asîmanî,
Heta ku maderem hemlê¹⁶ xwe danî.

Gelek bû zewq û şadî, kêyf û aheng,
Ji cam û badeh û saz û ney û çeng.

Ji teqdîrê xudaê rojêkey¹⁷ mader,
Bi tenhayî rûniştibû di¹⁸ çader.

1570 Ji nageh dî bi derket me cebînek,
Letîf û şeng û xûb û nazenînek.

Qed û qamet wekî serwê xiraman,
Ji e'yban dûr û ez ser ta bi daman.

Salam kir nerm û şîrîn wê ji mader,
Bi mader bexşî çengek durr û gewher.

Salam estand û mader²⁰ rabû, îkram
Gelek kir bo hebîba nazik endam.

Bi mader go: „Hebîba şengê wek durr,
Heqê te ketye ser me bêe'ded purr“.

1575 Dîya min go bi wê mehbûbê mehweş,
„Tu cinî, yane insî, ey perîweş?“

Bi nermî go: “Zenê Şehbalê mîrem,
Kurê şahê Rûxê peryanî Êrem.

Heye yek hefte ser darek teame,
Di bag'êda me kir bo xwe meqame.

Bi teqdîrê xudaê esêmanî,
Ji rengê²¹ te me jî hemlê xwe danî.

Kerîm xoş kir kerem yek xûbê doxter,
Letîf û nazenîn û mah û pêyker.

1580 Di bag'ê we li ser darê bû mewcûd,
Li paşan hatî bêhnî enber û u'd.

Dimag'ê min ji bêhnê bû muetter,
Dizanim bo te jî yek xûbê doxter.²²

Xudê daî bi rehmet hem bi teqdîr,
Eger destûr bidî, dê ez bidem şîr“.

Dîya min da bi dest wê Bedre xatûn,
Heta têr xwarî şîrê durrê meknûn.

Ji wan bistanê wek narincê bûstan,
Dikir mexmûr û şeyda qelbê mestan.

1585 Li paşan Bedre da destê dîya min,
Ewê ezmê sefer kir lê dîya min

Go: „Ey yar û hebîba²³ hemsera min,
Dikey rabî, te şîr da doxtera min.

Heqê te ketye ser min, yarê²⁴ dilgîr,
Dixwazim doxterê tej²⁵ ez bidem şîr.

Perîzadê bi darêda nezexûş,
Cewahirbend ji zêrrê yekê dergûş.

Perîrûyanî carî xoş ji darê,
Bi sed nazdarî û naz anî xwarê.

1590 Bi nerm û şîrînî dan destê dilber,
Hebîba dilrûba²⁶ da destê mader.

Li ser dergûşê bû perdek muneqqeş,
Dîya min ku hilanî bû muşewweş.

Ji husna wê cemala nazî perwer,
Semen bû dilrûba û²⁷ mah û peyker.

Muheyyer bû xumar û mest û sewda,
Bê sebr û taqet û dilbend û şeyda.

Wekî bişkojê zêrr bû goyê bustan,²⁸
Welê bustan wekî narincê bûstan.

1595 Serê bişkojê da²⁹ ser g'unçeê gul,
Ji işqan bû xumarî mest û bilbil.

Bi sed naz û teneu'm, le'l û şeker,
Dimijya şîr û mey ez hewzê kewser.

Wekî têr xwar şîr wê g'unçeê naz,
Helanî ku bibet wê mehremê raz.

Bi sed işq û muhebed ew perîzad,
Dîya min bûse da, ew kir bi firyad.

Dîya min go: „Nedarem sebr û taqet,
Ku ew dildarî nazik bî bi³⁰ firqet.

1600 Eya hemser bihêl da ez bidem şîr,
Bidet aram û sebr û³¹ canê dilgîr“.

Perîrûê go: „Ey dildarê hemdem,
Ji derdê firqeta wê tu meke³² g'em.

Bi tewfîqa Xudê wê husnê wek mah,
Dê bînim tu bibînî her serê mah“.

Dîya min go: „Eya mehbûbê dilber,
Çi name wê cemala naz û perwer?“

Go: „Navê wê Bedîe ba-Cemala,
Şehê peryane, bintê Şehêbale“.

1605 Ko perî dî dîya min pîrr fikir cehd,
Bi dilxoşî di gel mader kirî ehd.

Serê her mahê³³ dê bî bi yeki hefte,
Di bag'da rûnî rûmahî du hefte.

Bedîe ba-Cemala nazê perwer,
Nihin wek wê di nêv peryan çû dilber.

Ku tên bag'ê me ew³⁴ dildarê reng-reng,
Heta heft ro³⁵ diken purr zewq û aheng.

Xuzî ku ez li wê bam, şahizade,
Sebeb bam ez ji tehsîla mirade.

1610 Bi tewfîqa Xudê dê baye mewcûd,
Ji bo te wesletê dildarê meqsûd“.

Dibên, şehzade go: „Ey yarê serxoş,
Nizanim rast dibêjî, yane dilxoş.

Dikey tu³⁶ her bi wan lewzê şekeryar,
Wekî şîr û şeker hatin te goftar“.

Qesem kir wê mehê billahê ekber,
Go: „Sadiqim ji qewlê xwe, dilawer.

Emanet, ku te bikujin her bi sadiq,
Ji kizbê dûr be tu, ey yarê aşiq.

1615 Şîrîkê xwe bigir wek quretuleyn,
Ku rebbî go: „Ezim salis şerîkeyn“.

Di hîna rastî hev bîn rûyê sadiq,
Mueyyen şug'lê wan rast³⁷ tînî xaliq“.

SERÊ XXI

*Beyana kuştina peryêye bi asan û birina Melkeye bal
qewm û nasan û fereh bûna wane bi ew fe'l û ewşan*

Meelqise, dibên, şehzadeê mîr,
Bi doxter go: „Nizani¹ qet çi tedbîr?

Xilas bîn em ji wê peryê bi quwat,
Xudan cah û meratîb û bi şewket“.

Hebîbî go: „Çi tedbîr kem dilara,
Ku canê wî heye der qe'rê derya“.

1620 Dibên, şehzade purr girya² û purr g'em,
Gelek bo gotê: „Ey dildarê hemdem,

Ruhê perîyê çî rengîye di³ behrê?
Bibê bo min tu, ey enwarê bedrê“.

Letîfa nazika muenberamîz,
Çî tûtî bû, şekerxa bû, şeker rîz:

Me go rojek: „Çî cîye ew besîte?“
Bi min go: „Peryê deryaê muhîte“.

Ji vî erdî me pirsî jê bi asan:
„Çî muqdar rêye bo⁴ cinî û insan?“

1625 Go: „Insan qet nikarin, ger şev û roj,
Heta sed salê bên, lê cini⁵ sê roj“.

Me go: „Emrê perî dibît çî muqdar?“
Go: „Hefsed sal tamam diçin⁶ bi ejmar“.

Ji ruhê wî ku min pirsî, g’ezeb kir,
Bi sû hat û⁷ li min dengê kereb kir.⁸

Ku min ew rengi dî, dest kir girînê,
Me go: „Hêja ne bes gel wê birînê.⁹

Ji bab û dê û yaran ez kirim dûr,
Ji bo pirsek dikey tu min bi rencûr“.¹⁰

1630 Li min hat¹¹ rehmê ew, dûr bû ji g’edrê,
„Ruhê min,- gotû,- wê¹² bin qe’rê behrê.

Di sinduqek bilorîndaye ew can.
Eger peyda bî yek xatem Sulêyman.

Nîşan den wî, ji behrê dê byêt der,
Di sinduqdaye ew can wek kebûter“.

Ku ew rengî bihîst şahê xiredmend,
Go: „Xatem wa di gel min, yarê dilbend“.

Dibên, rabûn bi derkeftin ji qesrê,
Bi şadî û fereh çûn¹³ rûyê behrê.

1635 Muqabil ruhê wî xatem kirin av,
Ku dîn sinduq bi derket, hat bi heştav.

Ku nêzîk bû ji wan, girtin, hilanîn,
Birin qesrê, kevokek jê deranîn.

Dibên, şehzade ser jêkir bi xencer,
Ji qesrê dûr avêt û¹⁴ ew bi huner.

Eceb peyde bû ba û toz û hem serd,
Wekî kuhek li ser ruh kefte ser erd.¹⁵

Ku can û ruhê şirîn jê berî bû,
Hebîba dîlrûba¹⁶ go: „Ew perî bû“.

1640 Dibên, şehzade go: „El hemdulîlla,
Di gel hemd¹⁷ û sena û şukrûlîlla“.

Ku aqîbet mirin bî, ey Sîyahpûş,
Eger ehmeq nebî nabî tu dilxoş,¹⁸

Bi vê dunyaê dînî, qehbe û pîr,
Necis û pîs û sewda¹⁹ şubhetê qîr.

Serê şahan û xundkar û wezîran,
Elîmê fikir û teswîrî²⁰ zemîran.

Di hîna da reqem xetê mecazî,
Qulubê arifan da²¹ işqê bazî.

1645 Ji cezb û fikir û seyranê terîqet,
Dê wesil bit micazê ba heqîqet.

Dibên, şehzadeê mexmûr û pirr cehd,
Di gel Melke kirin purr qewl û purr ehd.²²

Bi hevra ku biçin bag'ê Serendîb,
Biket²³ Melke hikayet derd û asîb.

Ji ewwel ta bi axir hali, haval,
Ji pêş enwercebîna²⁴ bintê Şehbal.

Di gel zarî biket hîvî ji dilber,
Ku nîşan det rûyê xwe ba dilawer.

1650 Wekî ehd û qîrar kirin²⁵ temame,
Li paşan wan hîlanîn purr²⁶ teame.

Di gel bêhed cewahirê şebefrûz,
Ji le'l û şebçirag', elmas û fêyrûz.

Bi şadî ew bi derkeftin ji qesrê,
Xiramîn²⁷ nazenîn çûn rûyê behrê.

Dibên, şehzadeê mexmûr û çalak,
Girêda keştîyek ez dar û xaşak.

Tewekul dan xudaê heq û dadar,
Li ser gemîyê suwar bûn û kirin kar.

1655 Ji behrê çûn heta şeş meh temame,
Muheyyer bûn, xilas bû ji wan teame.

Dibên, şehzade go: „Ya heyê bêçûn,
Du sedîqîn li nik hev qelbê mehzûn.

Kerîm û qadir²⁸ û heqîy-û ekber,
Mîrad û meqsedê me bikey muyesser“.

Ku dua kir şehê mehzûn²⁹ bi tehsîn,
Dibên, Melke digo: „Ya rebbê amîn“.

Bi emrê heqê³⁰ rabû bayek efrûz,
Rehê³¹ deh sal gemî bir wî bi sê rûz.

1660 Nezer kir wan, gihîştin adeyek³² qenc,
Tejî xurma û xox û nar û narinc.

Bi emrê xaliqê hey û qedîre,
Bi derkeftin ji gemîyê çûn cezîre.

Kirin hemd û sena û zewq û sohbet,
Heta yek mah-û³³ man û bûne rahet.

Li paşan rabû şehzade di gel yar,
Çinîn fêkî, birin gemîyê kirin kar.

Ji behrê çûn heta sê mah û sê şew,
Bi emrê xaliqê bê xwarin û xew.

1665 Gelek dîtin ecaîbêd ecîbe,
Ji behrê û bi elwanên³⁴ g'erîbe.

Di xew³⁵ rabû, dibên, şehzade carek,
Seleb dîngaft û du destê moberek,

Ji nageh dî bi derket reis yek hût,
Ezim kir gemîyê, dabelînê wek qût.

Dibên, Melke bi wan le'lê şeker yar,
Fêg'an kir, gotû: „Ey şehzade, hawar“.

Çelek rabû ji xew ew³⁶ şêrê mexmûr,
Bi tecîl dest da ser qebzeê şûr.

1670 Ji kalanê kişand tîg'ê bi cewher,
Bi huner xist li masî, bû bi du ker.

Gelek hemd û sena û şukrî ekber,
Di gel Melke dikir³⁷ şahê dilawer.

Muhessel, dît û³⁸ nêzîk şahê medhoş,
Ji wan bû purr fewake adeyek xoş.

Bi derkeftin ji behrê, çûne adê,
Ji wê adê bibînin xoş miradê.

Heta yek mah tamam bû, ew li wê man,
Bi şadî û fereh serxoş û heyran.

1675 Gehî şehzade derdê iştîyaqê,
Digo bo Melke û dag'ê firaqê.

Gehî Melke ji bo mîrê dilawer,
Digo medh û sena û wesfê dilber.

Ji nageh hate wan awaz û hem deng,
Ji reng³⁹ dengê fesalê ademî reng.

Çeleng şehzade rabû serxoş û mest,
Wekî şêrê şikarê çû kir-û⁴⁰ qest.

Ku nêzîk bû ji wan şeh, dîti çend merd,
Ji hat û çûnê wan xoş tey dibî erd.

1680 Ku wan dî hate pêş wan şêrê dilê,⁴¹
Muqabil şahî hatin penc⁴² û du mêr.⁴³

Bi nerm û şîrînî wan kir ji şeh deng:
„Çi merdî, ey g'erîbê ademîreng?“

Go: „Ez insanîm û hem ademîzad,
G'erîb keftim ji îşqê yek perîzad.

Di gel min Melkeye, pîrr naz⁴⁴ û terg'îb,
Bîla reybe⁴⁵ keçê şahê Serendîb.

Welê hûn kîne, ser vê rêyê⁴⁶ cade.
Ji hat û çûn çî meqsûd û mirade?“

1685 Ewan go: „Ev terîq û⁴⁷ xas û a'me,
Rehê bajarê mey Wasête name.

Xeracê em dideyn şahê Serendîb,
Ku babê Melkeê pîrr naz û terg'îb“.

Bi dilxoşî vegerya tebiê mewzûn,
Bi lez şehzade pêşî Melke xatûn.

Go: „Ey nazik, lebê şîrîn kelame,
Heyîn ew şehriê Wasête name.

Xeracdarîn ji bo şahê Serendîb,
Ji te mizgîn, mehê purr naz û terg'îb“.

1690 Muferreh Melke go: „Ey yarê hemdem,
Ji Wasêt min heye hakim yekî e'm.

Ji edlê wî xoşin qerye û bêlûke,
Bizan, namê⁴⁸ wî hem Tacelmuluke.“

Bi dilxoşî ku rabûn herdu dilber,
Di gel xwe wan birin elmas û cewher.

Ku nêzîk bûn ji sûrê şehîr û bajar,
Bi şadî û fereh çûn bin yekî dar.

Di cîda⁴⁹ Melke ma, lê mîrê esrê,⁵⁰
Bi qesda mîrê bajêr hate qesrê.

1695 Ji e'mê Melke pirsî, mahê dilgîr,
Cewab danê û gotin: „Çûne⁵¹ nêçîr“.

Sebir kir lehzeyek, çavnêrî rahan,
Ji nageh dî bi derket Tacê şahan.

Peya bû mîr li hespê, hate dîwan,
Muheyya bûn⁵² ji wîra text û eywan.

Nezer kir, dîti mîr lawê⁵³ dilawer,
„Dibînim, ku g'erîbî, ey dilawer.“⁵⁴

Ji xelkê kîderêy, bêje çi meqsûd,
Heyin bo te, bibê,⁵⁵ da bêtê mewcûd?“

1700 „Ji Misrem,- go,- g'erîb, ey hemser⁵⁶ û yar,
Nihin bo min çi meqsed g'eyrî dildar“.

„Çi mig'dar,⁵⁷ go,- tu hatîyî di g'urbet?“
„Deh û du sal tamam bûn,-go,-di mehnet“.⁵⁸

Dibên, Tacelmulukê mest û du çav,
Ji derdê Melkeê xoş bûn tejî av.

„Temam bûn yazde sal,- go,- bê serûber,
Ku ew wenda bûye mislê dilawer“.

Dibên, şehzade go: „Mizgîn, tu mehzûn,
Mebe her wê di gel min Melke xatûn“.

1705 Ji hindav rabû ser xwe Tacê mesrûr,
Bi mehbət bûsî rûyê şahê mexmûr.

„Çi gotin bû te go ez weslê dilber,
Te xoş mizgînî da min, ey dilawer“.

Go: „Raste, wê di gel mindaye⁵⁹ dildar,
Ji der sûrê me hêla bin yekî dar“.

Dibên, Tacelmuluk û mîrê mehcûr,⁶⁰
Di gel ehlê dîwan rabûn û mesrûr.⁶¹

Bi şadî û fereh çûn, bi yek mehfe
Cewahirbend birin bo mahê tuhfe.

1710 Ku dît Tacelmuluk Melke û cewahir,
Go: „Sibhan el kerîm ul heq û qadir“.

Di hîna Melkeê dît rûyê mamê,
Bi şadî-yû fereh rabû qîyamê.

Bi nerm û şîrînî çû bûse da dest,
Welê Tacelmulukê serxoş û mest.

Dida bûse serê mehbûbê dilber,
Di nav ewrî sitar bû bedrê enwer.

Helanîn mehfe, rabûn çûne qesrê,
Bi derket jê çeleng mehbûbê esrê.

1715 Kirin şadî û zewq û kêyf û aheng,
Di gel saz û ribab û naye û çeng.

Heta şemsê munîr çû rûyê meg'rib,
Bi ser wan çûn⁶² cefa û derd û asîb.

Îlahî, tu li min dûr key cefaê,
Ji camê dilberan bînim sefaê.

Ji wê camê bibim serxoş û heyran,
Di bag'ê dilberan kem geşt û seyran.

SERÊ XXII

*Çûyîna şehizade û Melke û mamêye bi Serendîb û
ferehbûna babêye bi binta g'erîb, we liqaya şehizadêye li
Sedelmuluk wê hebîb*

Binefş û sunbil û rêyhan û enber,
Teg'elub bûn li ser werdeynêî ehmer.

1720 Gul û nergîz û sosin çûn û xef bûn,
Binefş û sunbil û rêyhan şeref bûn.

G'ulam û carîyanê Tacê şahan,
Hemam xoş kir¹ germ bo şems û² mehan.

Birin hemamê, şûştin nazê³ endam,
Şîrîn û pak û⁴ şehzade gulendam.

Mulebbes bûn ji libsê padîşahî,
Duaçî bûn⁵ ji wanra⁶ murg' û mahî.

Birin Melke bi izet der heremgah,
Welê şehzade der dîwanê wek mah.

1725 Li ser textek zerîn⁷ danîn bi izet,
Muqabil textê Tacê şah û şewket.

Li paşî xwarinê şahane reng-reng,
Kirin hazir şerab û bade û çeng.

Wekî serxoş û mest bû mîrê mehcûr,
Ji wesf ul⁸ halê xwe bû Tacê mexmûr.

Ji ewwel ta bi axir kir hikayet,
Teecub bûn ji wana⁹ rojê heybet.¹⁰

Çiqas ehlê dîwanê bûn muheyyer,
Ji îbret wan digo: „Allah û ekber“.

1730 Muhessel, ta hikayet kir dilawer,
Ji nûrê¹¹ rojê bû dunya munewwer.

Diburand roj bi roj ba nerd û setrenc,
Welê şeb ba lebê camê mey û benc.

Di gel Tacelmuluk heta tedarek,
Kirin kar bo Serendîbê moberek.

Wekî bû karê wan cumle muheyya,
Kirin tey menzil û wadî û sehra.

Bi bê renc û cefa û derd û asîb,
Ku nêzîk bû ji wan şehrê Serendîb.

1735 Cewab çû bo şehê manendê Çengîz,
Go: „Hat Tacelmuluk û Melkeê qîz.

Di gel şehzadeê Misrî sena xwan,
Dilawer îbinî Asim, îbinî Sefwan“.

Ku ev rengî bihîst şahê keremdar,
Delalan kir bi gazî û bi hawar.

Di şehréda çiqasî cumle xelke,
Bi xas û a'm hatin pêşî Melke.

Di gel Tacelmuluk û şahizade,
Bi mesrûrî û zewq û dilguşade.

1740 Ji etrafan dihatin xelqê sef-sef,
Suwarên namidarîn, nîzeh der kef.

Dibên, nehseid suwarê namê cindî,
Di nav xelqê dihatin şaşê hindî.

Kirin şadî û zewq û kêyf û aheng,
Mitriban da li tebil û naye û çeng.

Bû waweyla û gazî, şubhê mehşer,
Muhessel, şahî bû wasil bi doxter.

Mîsala pîrê Kenanîyê Yeçûb,
Ji husna Yûsufê dildar û mehbûb.

1745 Du çehvên xwe kirin rewşan ji dînê,
Hebîb û nazik û¹² enwer cebînê.

Roê me bûse da an¹³ şahê sermest,
Welê mahî dibûsîn penceh û dest.

Wekî dilxoş bû şeh ba weslê dilber,
Bi çavê muhbetê nêrî birader.

Di gel şehzadeê mexmûr û şehbaz,
Di gel wan pîrr kirin îkram û izaz.

Bi şadî-yû surûr û naz û terg'îb,
Bi cemi' bûn û¹⁴ daxil ez Serendîb.

1750 Di hîna çûne ber dergahê şahî,
Dibêjin, Bedreh-û mader bi şahî,

Di gel çend jin letîf û xûb û tuhfe,
Mehê enwer bi derxistin ji mehfe.

Bi nerm û şîrînî rabûn, kirin meş,
Birin qesrek zerefşan û muneqqeş.

Li ser textek zerîn danîn bi izzet,
Dipirsîne¹⁵ cefa û derd û muhnet.

Ji ewwel ta bi axir sînesade,
Hikayet kir ji xwe û şahizade.

1755 Welê şehzade bir şahê Serendîb,
Li ser textek zerîn danî bi terg'îb.

Go: „Ey şehzade, tu mesrûr be, dilşad,¹⁶
Nihin bo min ji nêrîne çî ewlad.

Qebûlê min tu ba¹⁷ ewladê dilbend,
Muyesser ket miradê te¹⁸ xudawend.

Çi rengî te ez kirim dilxoş bi ewlad,
We rengî tu bi meqsed bî, bi dilşad.

Eger ellah kiribî bo te teqdîr,
Ji bo me qet nihin bo te çî teqsîr.

1760 Biket Melke di gel Bedre bi mader,
Recaê te ji husnê mah û¹⁹ pêyger“.

Dibên, Tacelmulukê mest û mexmûr,
Dikir herdem ji bo şeh qise mezkûr.

Ji halê Melke û şehzadeê mîr,
Ji ewwel ta bi axir xoş û teqrîr.

Kirin arasite qesrek zerefşan,
Ji bo şehzadeê mest û durrefşan.

Tê raxistin firaşên sof û dîba,
Dused balîn²⁰ muneqqeş, karê zîba.

1765 Be ser ferşan reşandin misk û enber,
Firaş û dar û dîwar bûn musewwer.

Du textê zêrr danîn tê²¹ muresse',
Ji le'l û şebçirag'an bûn²² mulemme'.

G'ulam û carîyanê xûb û dilber,
Ji dused zêde beşîn ba²³ dilawer.

Dilê şehzade xoş û mutmein bû,
Wusalê dilberan bo wî qerîn²⁴ bû.

Çi ger dilxoş bû ew ba²⁵ weslê dilber,
Welê herdem g'emê Sedî dilawer,

1770 Dikêşa, we dikir efg'an û zarî,
Digirya şubhetî tavyêd²⁶ baharî.

Muheyber bû ji dil pîrr derd û asîb,
Ji wî û Sedê dîr şahê Serendîb.

Nebû xalî ji fikrê wan şeb û roz,
Ji hal û muhbeta wan şahê fêyroz.

Gehî şehzade dilxoş bû ji dildar,
Gehî pîrr g'em ji hicrê yarê g'emxwar.

Gehî kir wî temenayê sefayê,
Gehî purr g'em ji hicrê²⁷ purr cefayê.

1775 Gehî zewqê ji temanaê wîsalê,
Gehî mehzûn ji hicranê²⁸ hilalê.

Gehî mesrûri cam û xemre²⁹ bade,
Gehî g'embarî³⁰ Sedê bê mirade.

Gehî çavnêrî şîrînî şeker leb,
Gehî g'emgînê Sedê³¹ xesrewî leb.

Çi xoş wexte li pey dag'ê firaqê,
G'em û endûhû³² derdê îştîyaqê.

Bibin wasil³³ bi hev du yarê sadiq,
Ji camê wesletê bin mest û aşiq.

1780 Dibên, şahê Serendîb her mudamî,
Dixwend dîwanê şahê Misr û Şamî.

Çi carê ku bikirya zewq û aheng,
Ji cam û bade û saz û ney û çeng.

Wekî şehzade serxoş bû ji sohbet,
Dikir ehwalê xwe ba şeh hikayet.

Ji bo Sedelmuluk û derdê firqet,
Dikêşan³⁴ bê e'ded ahîn û hesret.

Li nik şahê Serendîb bû bi reg'bet,
Gelek şehzade ba işq û mehebet.

1785 Çi xidmet bê emir ne dikir çi caran,
Mîsalê aşiqan ber emrê yaran.

Ji ulm û merîfet, adab û arkan,
Suwarî û nîzabazî, go û çogan.

Ji aqil û ray û tedbîrê şehane,
Nedîbû mislê wî şahê yekane.

Çi carê ku biçûba³⁵ geşt û seyran,
Di gel xwe dê bibirba³⁶ mest û heyran.

Di seyrêda dibûrand rozi³⁷ ta şam,
Welê şeb ta seher mest ez lebê cam.

1790 Di gel şahê Serendîb mest û heyran,
Bi şadî û fereh çûn geşt û seyran.

Gehî ba bilbilan bû ew bi awaz,
Gehî ba tûtîyan bû ew bi hemraz.

Gehî wek qumrîyan bû ew bi nalan,
Gehî heyran ji du çehvên g'ezalan.

Ji nageh nû cuwanek dîtî mehweş,
Ji reng, şikil û fesalê Sedê dilkeş.

Emir kir ser g'ulaman şubhê ceyran,
„Hilînin,- go,- biben wî qesr û eywan“.

1795 G'ulaman bir cuwanê sînesade,
Ji seyrê ta vegerya şahizade.

Wekî şehzadeê ba tali' û bext,
Vegerya hat û çû rûnişt li ser text.

Bi nerm û şîrînî go: „Hey g'ulaman,
Çi pê kir we³⁸ herîfê³⁹ tas û caman?

Biken hazir ji ber min, da bibînîm,
Gelek xetên⁴⁰ ji mêjî⁴¹ gel bixuynim⁴².

Kirin hazir ji pêş mîrê dilawer,
Bi nerm û şîrînî ew Sedê dilber.

1800 Dibên, şehzade go: „Ya quretule’yn,
Fequl ismek, mikanek, lî mîn el eyn?“

„Ji Misrem,- go,- kurê Salih senexwan,
Wezîrê şahê Asim îbinî Sefwan.

Di gel şehzade em hatin di behran,
Me pîrr dîtî cefa û ba û baran.

Cuda bûn em ji hevdu bêserûber,
Nizanim qet kuda çû ew dilawer.

Bizan, şehzade nam Seyfulmuluke,
G’erîbê bende nam⁴³ Sedelmuluke“.

1805 Ku ev rengî bihîstin qise teqrîr,
Muşeweş keftû bêhiş şahê dilgîr.

Feqal û îdribû haza el-seharî,
Revî, bazda, çû kuncêk zêde tarî.

Li pey çûn û nedîtin ew dilawer.
Ji bêhoşî ku rabû tacê ber ser,

Go: „Kanê, hey g’ulaman, raheta min,
Qîrar û hoş û sebr û taqeta min.

Bi nerm û şîrînî bo min bixûynin,
Di dilda min⁴⁴ ji wî bêhed birînin“.

1810 Ji etrafan dinêrîn, lê kirin deng,
Sedayek hate wan ez kuncckî teng.

„Çi kirye min, g'erîbê dil birîndar?
Ji zerbê dari ken hûn min wekî ar“⁴⁵.

Ku dengê wî bihîstin nerm û şîrîn,
G'ulam çûn, rakirin anîn bi tehsîn.

Dibên, şehzade rabû purr⁴⁶ bi dilşad,
Weranîn dest di cîdê⁴⁷ serwê azad.

Go: „Seda, tu bizan, şehzadeê tem,⁴⁸
Ji dil îro ji g'em azadeê tem“.⁴⁹

1815 Du aşîq bûn ew,⁵⁰ ba hem resîde,
Ji weslê yek dîger bûn⁵¹ aremîde.

Dibên, şehzade û Sedê dilawer,
Muqabil hevdu rûniştin beraber.

Bi ser wan çûn cefa û renc û muhnet,
Ji weslê yek dîger bûn şad û rahet.

Cewab çû şah û Melke, Bedre xatûn,
Go: „Hat Sedelmulukê tebiê mewzûn“.

Muferreh bûn gûşad⁵² û dil munewwer,
Emir kir bîne dîwanê dilawer.

1820 Du husnê enwerê tele't wekî mah,
Muferreh çûne dîwanê şehinşah.

Du textê zêrrî danîn pîrr ji gewher,
Ji bo şehzade û Sedê dilawer.

Çû destê şah û⁵³ Sed ez tali' û bext,
Dua kir wî ji şehra, çûne ser text.

Misala heyv û rojan ew dilawer,
Ku rûniştin⁵⁴ muqabil hev beraber.

Çiqas ehlê dîwanê⁵⁵ bûn muheyyer,
Ji wan husnê munîr û⁵⁶ mahê pêyger.

1825 Emir kir saqîyan, anîn şerabe,
Ji dengê mitriban dil bûn kebabe.

Ribab û çeng û nayê kirne⁵⁷ nale,
Bi fîncanan şerabê çardesale.

Di dîwanê gerandin, zêde bû⁵⁸ şewq,
Ji şadî û surûr û kêyf û hem zewq,

Wekî dîwanî serxoş bûn bi carek.⁵⁹
Di gel Sedelmuluk, şahê mubarek,

Gelek kir bê e'ded îkram û izaz,
Ji zêrr û cewher û hesp û çekanbaz,⁶⁰

1830 G'ulam û carîyanê mest û mehweş,
Diger qesrek⁶¹ zerefşan û muneqqeş,

Li ser ta pê libas û lubsê şahî,
Bi Sedê dilrûba da şeh bi şahî.

Birin hemamê, şuştin ew dilawer,
Libasê şahîyê⁶² wergirtî yekser.

Dibên, şehzade û Sedê wekî mah,
Di gel şeh çûn mufferreh der heremgah.

Ku Melke, Bedre û xanim⁶³ bi carek,
Ji dil bûsîn milê Sedê moberek.

1835 Wezîr û mîri rûniştin di gel şah,
Bi kêyf û zewq û şadî der heremgah.

Were saqî, werîn⁶⁴ fincan û bade,
Munewwer ke zemîr û⁶⁵ qelbê sade.

Ji meya⁶⁶ ku dinoşîn der gulistan,
Diket serxoş û şeyda qelbê mestan.

Were mitrib, bi çeng û saz û tenbûr,
Bireqsîne tu qelbê mest û mexmûr.

Ji dil talibe ji⁶⁷ bo husnê suheylê,
Bûye Mecnûn ji işqê camê Leylê.

SERÊ XXIII

*Ferehbûna Seydelmuluk û Sedelmuluk bi hev ji ber furqet
û kederê û qisetkirina wane ji hevra hal û rencê seferê*

1840 Çi xoş kêyfe ji zewqê xemr û bade,
Muqabil hevdu rûnîn¹ sînesade.

Ji destê rencê eyam ken şikayet,
Bi hemzazî² di gel hev ken hikayet.

We rengê rawîyanê³ sîne safî,
Ji halê dilberan kir mûşikafî.

Dibên, şehzade go: „Ey Sedê dilber,
Bibê⁴ bo min hewalê xwe seranser.

Ji wextê ku li min tu⁵ bûyî bi firqet,
Çi hat ser te ji renc⁶ û derd û muhnet?''

1845 Ji teqrîrê şîrîn bû ew şekerrîz,
Muselsel zulf û exbar, enberamîz.⁷

Go: „Ey şehzade, min dî bayekî sext,
Eceb dijwar-û hat⁸ jêk rakirin text.

Bi تنها çûm di gemyêda çehil roj,
Me xwe espare şahê alem efroz.

Ji rehmet min dî seknîn ba û baran,
Ger û mewc û ezîm û pêlê behran.

Ji nageh min dî nêzîk⁹ adeyek qenc,
Ji metûmat¹⁰ nebû têda becûz û senc.

1850 Me go, ez dê bimînim ta bi merden,¹¹
Be şod¹² halem xirab ez sencê xorden.¹³

Bi naçarî bi derkeftim ji dest renc,
Birin¹⁴ gemyê ji xwera bê e'ded senc.

Ji behrê¹⁵ çûm heta sê meh temame,
Ji g'eyrî sinc nebû bo min teame.

Welakin, her çi ku min dî di behran,
Ji masîyê eceb elwan bi elwan,

Xelas nabit¹⁶ bi çil salê seraser,¹⁷
Temam naken¹⁸ dused kitab û defter.¹⁹

1855 Ji nageh min dî behrê kir xuroşan,
Ji pêl û mewc û derya hate coşan.

Helanîm ez, birim ber²⁰ adeyek qenc,
Tejî sêb û hinar û xurme û senc.

“Bese,- min go, - heta ez sax bimînim,
Di²¹ vê adê bi naçarî dimînim.”²²

Bi ser minda buhurîn çendî eyam,
Xewa min hat û *innî kuntu fi el-nam*.

Ji nageh dîtîm ez qewmê libasan,
Di xewda girtîm ez wan xoş bi asan.

1860 Ku ez girtîm misala²³ seyd û nêçîr,
Helanîm ez, birim wan şubhê hêsîr.

Ku wasil bûn mekanê xwe wekî teyr,
Qefes kirm, ez ji dil mam pîrr muheyir.²⁴

Bi darek xurmeda ez daliqandîm,
Ji kerb û hesretan wan ez teqandîm.

Bi min dan û²⁵ gîhaê sebz û hêşîn,
Heta heyvek temam bû xoş bi tey'în.

Fequltu el şî'r mîn el efnanî wel cu'i,
Wekanû cemi'în bil qewlî mesmu'i.

1865 Eceb mabûn²⁶ ji sewt û gazî û deng,
Nedîbûn qet çî caran ademîreng.

Ji derd û cu'i û g'em heta ku carê,
Hejand xwe, ez ji darê ketme xarê.

Tijî bin xurme bû, ew darê xurma,
Me têr xwar²⁷ xurme û g'em çû bi ser ma.

Ku wan dî ez dixum xurmaê her car,
Didan min xurme û heta çendi miqdar“.

Dibêjin, şahê²⁸ go: „Ey Sedê dildar,
Çi şekil û heyetin ew qewmê mekar?“

1870 „Bi ser xinzîrin ew, ecisad unase“.
„Çi rengî,- go,- jî²⁹ dest wan bûyî xilase?“

Go: „Şaha, carekê wan ez bi yarî,
Ji dostekra dişandim xoş dîyarî.

Muqefes wan hilanîm û³⁰ bi heştav,
Bi rêda çûn, gihiştin ser yekî av.

Ji erdê danîm, wan meşqûlê³¹ pirr tab,
Qefes min avêt û ez çûme nêv ab.

Go: „Hey, hey, ew revî“. Dest kir şitabê,
Kirim dûr ez ji wan pêlên di abê.

1875 Xelas bûm ez ji destê wan kerê boz,
Bi avêda diçûm heta³² bi pênc roz.

Di avêda me dîtin çendî zengî,
Di gemîyêda hemî çengal û çengî.

Ku wan ez dîm û girtim³³ şubhetê seyd,
Helanîm û birim, wan ez kirim qeyd.

Gehiştin ta³⁴ mekanek sebz û exzer,
Bi min da bê e'ded badam û şeker.

Li wê mam ez gelek, muqdarkî pirr,
Nebûn g'afil li³⁵ min qet ew seê dirr.

1880 Ji şeker û hem gîyah³⁶ ez bûm wekî meşk,
Fefîhî el-rîhû qîrbe, wek kurebeşk.

Digotin, be'zekan dê bixweyn³⁷ nêçîr,
Welê be'zek digo, dêbeyne bo mîr.

Muhessel, wan hılanîm û³⁸ seê pîr,
Birim gemîyê, biben bo zengîyê mîr.

Welê keştî mueleq ma di derya,
Heta sê roj nebû bayek muheyya.

Ji nageh rabû mewc û pêlê behran,
Ji jorda³⁹ av dihat teşbîhê tofan.

1885 Bi şidet rabû bayek zêde fêyroz,
Hılanî gemîye bir heta çihil roz.

Ko sekinîn mewc û pêl û ba û baran,
Eyam xoş bû, qerîb dîn şehrê Oman.

Nebûn⁴⁰ taqet ji wanra ku xelas bin,
Ji bo wî agirî ew dê risas bin.

Wekî dît⁴¹ şehrê Oman hatin⁴² zengî,
Bi hevra hatine vêkrayî⁴³ bi cengî.

Di gemyêda deranîn ew seê⁴⁴ pîr,
Yekayek⁴⁵ kuştin ew teşbîhê xinzîr.

1890 Xilas kirm ez ji⁴⁶ dest wan xelkê Oman,
Me go: „Hemdê xuda⁴⁷ û şukrê rehman“.

Heta heyvek li wê mam, bûme rahet,
Ji destî⁴⁸ çûn qîrar û sebr û taqet.

Di gel kerwanyan hatim muqabil,
Serendîb bûm meyit can bû bi wasil“.

Li paşan şahizade xoş beyan kir,
Hewalê rencê xwe bo wî eyan kir.

Ji destê muhnetê mîrê bi huner,
Ji bîr kir rencê xwe Sedê dilawer.

1895 Dibên, Sedelmuluk go: „Ya emîrem,
Nîşanek qet heye ez bag’ê Êrem?“

Muferreh bedrê enwer go: „Dilawer,
Şukirdarem, nîşan û namê dilber“.

Li paşan ehdê xwe û Melke xatûn
Beyan kir bû wî⁴⁹ Sedê te’bê mewzûn.

Şîrîn go: „Melke û Bedrê munewwer
Bi sê roj dî diêt ew mah û peyker.

Kêyanî bintê Şehbal ez Êrembag’,
Biêt dilxoş biket canan⁵⁰ di nêv bag’“.

1900 Şîrîn go Sedê mehrû: „Şukrî same’,
Neçû rencê me û şehzade zaye’ “.

Ku hikayet⁵¹ tamam bû, şemsê ba mah,
Şîrîn rabûn ji dîwanê heremgah,

Xiramîn, nazenîn, mest û durrefşan,
Berê xwe dane eywanên zerefşan.

Li ser textan rûniştin mislê xanan,
Çehvnêr⁵² bûn ji dil bo weslê canan.

Were⁵³ saqî, şerabê erg'ewanî
Tu bîne, tê hene surrê nihanî.

1905 Bibûsem kulebê camê şeker leb,
Ji şem'êra xebardem zulmetê şeb.

SERÊ XXIV

*Hatina peryane be Serendîb ji bag'ê Êremê û dîtina
şehzadeye Bedîe ba-Cemale piştî derd û g'emê û aşiqbûna
wêye li şehzadê wê demê*

Çi xoş zewqe ji cam û badeya saf,
Munîr bit qelbê zulmet Qafê ta Qaf.

Ji weslê dilrûbaê xoş¹ ebaret,
Peyapey bên li pey² hevdu beşaret.

Dilê danayê arif û mueref,³
Nezerbaze li ser husna muşeref.⁴

Eger çenda⁵ ku dil xoş bû ji Sedê,
Welêkin qelb û ruh û meyl û cehdê.

1910 Li ser husna⁶ cemalê le'lê qend bû,
Tecella û⁷ kemalatê bulend bû.

Di gel Sedî bû⁸ teqrîr û ebaret,
Tilu' da⁹ fecrê uşaqê beşaret.

Ji burca ehse nê cewzaê rengîn,
Ji le'lê me, ji şemsê bû bi mizgîn.

Ku kebk¹⁰ û bilbil û taûsê rengreng,
Bi g'ulg'ul hatin ew ser werdê bêşeng.

Dibêjin, Bedre hat nik şahizade,
Go: „Mizgînî,¹¹ tu rabe sînesade.

1915 Biçîn bag'ê temaşa keyn ji le'le,
Mufferreh hatî bintê Şahibale.“

Dibên şehizade û Sedê dilawer,
Di gel Bedre ku çûn nêv bag'ê dilber.

Dibên, yek çadirê¹² dîba muneqqeş,
Qirar girtê şahizade û Sedê dilkeş.

Seatek bûne¹³ meşqûl ew ji bade,
Nezer kir, dîtî hatin sînesade.

Kêyanî dilrûbayên mah û¹⁴ peyker,
Letîf û nazik û mehbûb û dilber.

1920 Bi ref-ref datin ew teşbîhê¹⁵ qazan,
Gelek xoştir bû dengê wan ji sazan.

Misalê kubik¹⁶ û taûs û kebûter,
Tejî kir bag' û ser werdeynê ehmer.

Bi kêyf û zewq û şadî û bi govend,
Direqisîn bir bi bir xûb û¹⁷ şekerxend.

Ji mehtabê rûxê peryani sade,
Nezerbaz bûn û Sed û şahizade.

Ji husnê wan letîf û mah û¹⁸ pêyker,
Muheyzer bûn şeh û Sedê dilawer.

1925 Ji bona serwebanûyê¹⁹ semenber,
Vegirtin çadirek ji²⁰ dîbayê exzer.

Tê raxistin firaşê etlesî û zûd,
Muatter kir ji bêhnê enberîn, u'd.

Bi nêzik çadirê şahê dilawer,
Dibên, borîn perîrûyan semenber.

Nedî şehzade lakin ew perîrû,
Çelek²¹ borîn û xoş ba²² serwebanû.

Ku çûn bin çadirê dîba perîweş,
Gerandin saqîyan fincanê zerkeş.

1930 Ji le'lê camê leb bûn mest û mexmûr,
Fêg'an kir çeng û nay û saz û sentûr.

Bedîe ba-Cemale naz û²³ perwer,
Bi Melke go mîsala şîr û şeker,

„Çi rengî tu xelas bûyî ji behran?²⁴
Bibê²⁵ bo min tamamê derd û kesran.²⁶

Ji destê wê perîzadê bi quwet,
Xudancah û meratîb û bi şewket.

Me qesd kirbû bişînîn bo te imdad,
Xilas keyn te ji mekarê²⁷ perîzad.

1935 Welakin, şukrê hatî tu selamet,
Bibê bo min hewalê xwe hikayet“.

Şîrîn go Melkeê mehbûb û dilber:
„Ji hatnê min sebeb bû yek²⁸ dilawer.

Xudêtirs û hunermend²⁹ û bi quwet,
Xudancah û meratîb û bi şewket.

Emîn û alim û dana û aqil,
Şîrînleفز û şekerrêz, husnê kamil“.

Perîrûyê go: „Ey Melke, çi rengî,
Li wî peyde bû ew mexmûr û bengî?

1940 Nihin taqet ji bo ewladê Adem,
Ku wasil bi³⁰ li wê, ey yarê hemdem“.

Dibêjin, Melkeê şîrîn riwayet,
Ji ewwel ta bi axir³¹ kir hikayet.

Ji halê xwe û şehzade seraser,
Ji dil guh da bi wê³² serwê semenber.

Ji nageh hate sewtê mislê Dawûd,
Bi eşa'rîn Lebîd, tenbûrê³³ ez u'd.

Bedîe ba-Cemale teb'ê mewzûn,
Şîrîn û nerm go ba Bedre xatûn:

1945 „Çi xoş denge diêt min her peyapey,
Ji wê sewtê³⁴ dilê miryan dibit hey“.

Go: „Ew şehzadeye wek durrê meknûn,
Di nêv behran xelas kir³⁵ Melke xatûn.“

Perîrûyê go: „Ey Bedrê munewwer,
Tu rabe çîn temaşa keyn dilawer.

Ku Melke anîye şîrîn çi rengî,
Li min xoş tèn³⁶ sedaê wî û dengî“.

Di³⁷ dil Bedrê wusan bû her bi meqsûd,
Dixwast ew hal û axir bû bi mewcûd.

1950 Çeleng rabûn û çûn serwu³⁸ semenber,
Temaşa ken rûxê xûbê dilawer.

Li bin darek rûniştin, dûr, muqabil,
Nezer dan hisn û nûrê bedrê kamil.

Welê şehzade serxoş bû ji şewqê,
Mey û cam û şerabê, işq û zewqê.

Ji wî rengî digotin qewl û eşa'r,
Muqabil bûn ji wî du mest û xumar.

G' E Z E L

Sohtim bi narê işqê hubê Bedîe ul-Cemal,
Perwanereng ji şem'ê sohtî li min per û bal.

1955 Wek bilbil ez işqe gul, nalîn me tên xoş ji dil,
İşqê hebîb ez kirm zil-zerd û zeyîf wek hîlal.

Şeb ta seher dinêrim husn û cemalê kewkeb,
Qet nabînim husnekî ehzen ji bedr-il kemal.

Heta bît umir baqî, çavnêrim cam û saqî,
Ya zehrê camê firqet, ya qitreê ez wusal.

Şahidê dil xudîye, nînin di dil me hubek,
Hember bi işqa te bî, talibên fikir û xîyal.

Sakinê pûtxaneme, çevnêrê cewra teme,³⁹
Sewdaê zulfa teme, dêm durrê, ebrûhîlal.

1960 Qet kes wekî me nabit şeydaê camê işqê,
Zehrê bela çeşîde, dil bendîyê xet û xal.

Ger⁴⁰ ez bibînim weslet, ehwalê rencê firqet,
E'rzê hebîb kem ji ser, heta dibîtin zewal.

Camê firaq ez kirim ser ta be pê Sîyahpûş,
Ya rebb, vexum qitreê weslê Bedîe ul-Cemal.

Bedîe ba-Cemale nazê perwer,
Ku dît şehzadeê mest û dilawer.

G'edeng û tîrê hubê işqê sadiq,
Ji ser dil ket hezar reng bû bi⁴¹ aşiq.

1965 Cezib kir hubê dil, dildarê meczûb,
Bû metlûb-û rûyê⁴² talib û⁴³ metlûb.

Ji dest çûn kêyf û xoşî, zewq û rahet,
Neman bo wê qîrar û sebr û taqet.

Çiqas şehzade leîzand têlê tenbûr,
Dilê mestan dibû zêde bi rencûr.

Ji awazê sedaê şahizade,
Tijî bû dil ji işqê sînesade.

Şîrîn go Bedre: „Rabe, ey⁴⁴ perîweş,
Nizanî⁴⁵ ku ji dest çûn taqet û heş“.

1970 Çiqas go: „Rabe tu, ey nazenînê“,
Peyapey wê dirêht⁴⁶ xûnê birînê.

Muhessel, rabû ew zêde bi naçar,
Bi qamê xwe şkestî, dil birîndar.

Di dilda ku mebada kes bizanî,
G'emê işqê hebîb dê bit nihanî.

Bi nermî hate çadir ew şîrînsurr,
G'emî işqê hebîb xwar bê e'ded purr.

Wekî mestan dikir xoş-xoş nezare,
Nîyet kir ku libas ket⁴⁷ pare-pare.

1975 Ji derdê işqê şehzade hezîn bû,
Bi ah û şîwen û derd û birîn bû.

Go: „Ta key⁴⁸ ez g'emê işqê nihan kem,
Ji kêra surrê mexfê ez beyan kem“.

Gelek dîtî ji işqê derd û asîb,
Bi ser çû rojê,⁴⁹ hat ewqatê meg'rîb.

Were saqî, werîn camê hîlalê,
Ji wî tê reng û bo, teamê wusalê.

Di hîna ku bibînim camê weslet,
E'rz kem derd û dag' û rencê⁵⁰ firqet.

SERÊ XXV

*Agehya işqa perîzadeye li şehzade û qewl û eşa're şehê
dildare û dîtîna herduwane li hevdu bi bûse û e'fet û azare*

1980 **J**i nefse mutmeîne rencê mazî,
Bi ser diçîn, yeqîn dêbîte razî.

Ku mazî bû nefes nûra tecella,
Dê wesîl bît kemalatê muella.

Nesîmê xoş ji meg'rîbê beharî,
Hejandin sunbul û reyhanê tarî.

Li ser wechê¹ gulê xuh bûn belave,
'Ebîrên² reş ji enyê kir silave.

Dibêjin, Melke û Bedrê ji çadir,
Çiraya wesletê yaranî hilkir.³

1985 Ji bêhnê enber û fincanê zerkeş,
Dilê uşaqî⁴ bû mest û muşeweş.

Çehvnêr bû⁵ gelek şehzadeê mest,
Di gel canan bitin wasil û sermest.⁶

Ku Melke û Bedre xatûn ken ricayê,
Ji wî şekerleb û nûrîn liqayê,

Riza det wan ji zarê sînesade,
Cemalê xwe nişan det şahizade.

Di⁷ dil bû ew temena, mîrê sadiq,
Bi hayî bû ji wê, ku bûye aşiq.

1990 Be damê⁸ mehbetê bûye giriftar,
Ji tîrê işqê dil bûye birîndar.

Ji dest çûn xwarin û xew, durrê meknûn,
Ji derdê işqê bû rencûr⁹ û mehzûn.

Di meclîsa şeva wek zulf û xalan,
Bedîe ba-Cemale mabû d-xîyalan.

Ku mest bûn sînesade ji camê¹⁰ zerkeş,
Bi Bedre go şîrîn şûxa perîweş.

Go: „Îşev ez nexoşim ba behane,¹¹
Divêtin bo me yek şîrîn behane“.

1995 Bi nermî Bedreê nazperwer werîde,¹²
Go: „Ez dîde¹³ bibêjim ba¹⁴ şunîde“.

Şîrîn go nazika xûb û şekerrîz,
„Bibêj ez herdu ta xoş enberamîz“.

Muselsel, Bedreê zulfên muenber,
Ji hev pişkavt û alem bû muetter.

Hikayet kir ji Asim îbinî Sefwan,
Ji engustîl û îrsal kir¹⁵ Sulêyman.

Ji hukim û edil û ze'f û halê şeybî,
Ji fikir û hem dua¹⁶ û surrê g'eybî.

2000 Ji wê şûxa yemanî sînesade,
Ji bûn û ulm û aqilê¹⁷ şahizade.

Ji şikil û sûretê libasê mezkûr,
Jê aşiqbûnê mîrê mest û mexmûr.

Ji derdê mehbetê zarî-yû¹⁸ efg'an,
Ji destûrê şeh û keştîyê û behran.

Ji mêhvandarîyê Feg'fûr û xaqan,
Ji ba û g'erq û¹⁹ hêcranî uşaqan.

Ji cengê zengyan û bintê keftar,
Ji serweş û ji qedrê şahê segsar.

2005 Ji teyr û herdû heval û ji ejder,
Ji derd û muhnet û qesrê li bin zer.²⁰

Ku tède Melke û qetlê perîzad,
Ji masî û ji Tacê e'm ba îcad.

Ji daxilbûnê wî şehre Serendîb,
Ji Sedê dilkeş û purr naz û terg'îb.

Yekayek kir hikayet enberîn xal,
Welê zêde ji işqê bintê Şehbal.

Çiqasî qise kir Bedre nerim-nerm,²¹
Bedîe ba-Cemal girya gerim-germ.²²

2010 Gelek tekrarê kir Bedrê şîrînxal,
Ji işqê şahizade û bintê Şehbal,

Perî go: „Ez dibêm, bêje hikayet,
Tu waqe' bûyî bi qisek bê nêhayet“.

Şîrîn go Bedreê: „Ey sînesade,
Bibêjim ez ji işqê şahizade,

Ji işqê te çi dîtin derd û muhnet,
Ku qelbê te²³ di gel wî wê bête rehmet“.

Perîrûyê go: „Ey Bedre, çi²⁴ meqsûd,
Dikey wê qisetê tekrar û mewcûd“.

2015 Şîrîn go Bedreê wek durrê meknûn,
„Miradê şah û mader,²⁵ Melke xatûn.

Ewe, ku em bikeyn²⁶ bo te hikayet,
Hewalê şahizade bi temamet“.

Şîrîn go dilrûbaê dil bi aşîq,
„Nizanim kazibe, ya xu²⁷ bi sadiq.

Perî û ademî qet cuftê nabin,
Di nav wanda gelek perde û hicabin“.

Şîrîn go Melkeê purr qewl û purr ehd,
„Di gel şehzade min kirye bikem cehd.

2020 Ku tu nîşan bidey wechê munewwer,
Bi şehbazî şîrîn mest û dilawer.

Ku ew bû nacîyê me ji wê belaê,²⁸
Ji te em purr dîkin hîvî û recaê“.

Bi nermî go hebîba enberîn mû:
„Be namuhrem çî reng nîşan bidem rû.

Eger bab û dîya min bin bi same’,
Bi vê surrê dibin bo min bi mane’.

Ku carek dî biêm bag’ê Serendîb,
Bibînim mader û²⁹ xwaher bi terg’îb“.

2025 Nerm go Bedre û Melke³⁰ şemalî:
„Herin cîyek³¹ ji cin û ins û xalî.

Bila şehzade bê û tu bibînî,³²
Ji ber te şerh û halê xwe bixuyî“.³³

Ji hêvî û recaê wan şekerbar,³⁴
Reza da xoş mehê mehbûb û dildar.

Bê hayî bûn ji wî ew g’emzeperdaz,
Ê aşîqdil ewe lakin diket naz.

Bedîe ba-Cemala işqê purr tab,
Go: „Hûn rabin, diêt min bê e’ded xwab“.

2030 Şîrîn rabûn, bi cemi’ enberîn xal,
Welê ji işqê nehat xew bintê Şehbal.

Çeleng rabû bi derket ew perîweş,
Cezib kir işqê şahê mest û mehweş.

Çû nêzîk çadirê şehzade dildar,
Nezer kir, xoş digotin qewl û eş'ar.

G' E Z E L

Ela, ey saqîyê şîrîn, werîn camê-ji meya ale,
Li min îro qewî bg'edrîn birû, zulf û xet û xale.

Şerabê³⁵ erg'ewanî bîn, di camek zernîşanî bîn,
Qirar û sebr û taqet çûn ji işqê bintê Şehbale.

2035 Nihin min quwet û taqet, di bag'ê Êrem û weslet,
Eger bim Heyderê G'azî, waya xod Rostemê Zale.

Hedîsê arezûyê dil hezar defter tamam naket,
Çi rengî ez di medhêda nebim heyran û hem lale.³⁶

Ji le'lê qasidê dilber sehergeh hate mizgînê,
Perîweş têne seyranê di bag'ê werd û helhale.

Bi ref-ref sî û³⁷ qaz û kew bi çehvê xwe me dî hatin,
Dinê purr bû ji wê deng û³⁸ sedaê tewq û xelxale.

Ji dengê wan muşeweş bûm, xerab û mest û bêhiş bûm
Me go sed car bi xêr bèn ew, be ser çehvê di minxale.³⁹

2040 Sîyahpûş û⁴⁰ birîndarim,⁴¹ çehvnêr û telebkarim,⁴²
Ji destê saqîyê mehweş du fîncanan⁴³ meya ale.

Di hîna bintê Şehbalê perîweş,
We rengê dîti şahê⁴⁴ mest û mehweş.

Ji işqa wê bûye serxoş û mexmûr,
Ji huba wê bûye purr derd û rencûr.

Bi sewtê Dawud⁴⁵ û şî'erên Lebîdî,
Ji husna Yûsufî hub kir mezîdî.

Ji camê muhbetê bû mest û serxoş,
Muşeweş bû ji işqê, keftî bêhoş.

2045 Welê Seyfulmuluk jê bêxeber bû,
Ji işqa wê bi ahîn û keser bû.

Ji nivê zêde wî burandî ew şew,
Ji sewdaê dil û işqê nehat xew.

Di xewra çûn temamê gurc û carî,
Du çehvê Sedê şehla û xumarî.

Bi تنها ma emîrê işqê bazan,
Eciz bû ew ji kêyfê, çeng û sazan.

Bi derket ew ji çadir mest û mexmûr,
Ji mehbûban dinêrî nêzîk û dûr.

2050 Ji nageh dî wekî şem' û şemalek,
Diîsa nûrê wechê rû bi xalek.

Diîsa şubhê meşe'l dêmê⁴⁶ ez nûr,
Çi ger⁴⁷ tarî bû ew şev mislê deycûr.⁴⁸

Ku qenc nyêrî ji wechê qed û eşkal,
Ji sûret ew yeqîn kir bintê Şehbal.

Ji nûrê işqê sohta dil wekî zeyt,
Muqabil çû digotin in çûnîn beyt.

G' E Z E L

Ey nûrê du dîdey⁴⁹ minî mestaneê mexmûr,
Wey ruh û heyatê dilê dîwaneê mehcûr.

2055 Ey şem' û şemalê qesrê Şehbalê perîweş,
Wey sebr û sukunê dilê g'emdîde⁵⁰ rencûr.

Ey g'unçelebê bag'ê Êrem zat il-îmadî,
Wey bedrê mehê zulmet û tarişebê deycûr,⁵¹

Ey abê heyatê, lebê camê Xidir û Elyas,
Wey hukmetê nûrê dilê Eskenderê me'mûr.

Ey heykirê emwatê lebê Îseê Meryem,
Wey Mûseê Umran û munecatê li ser Tûr.

Çil rojî tamam kir me ji ehdê te rîyazet,
Razîm bi cemalê ji şhabê qebesê nûr.

2060 Heta bi ebed serxoş û heyran bî Sîyahpûş,
Meyxwareê camê lebê şhkaseê ferfûr.⁵²

Wekî şehzade nêzîk bû ji mehweş,
Nezer kir, keftye ser pişt ew bêheş.⁵³

Wekî şems û qemer, enwarê tele't,
Ji husna wê munîre rengê zulmet.

Ji şehdê le'lê leb⁵⁴ şekir dibarî,
Du çeşmeş ah û asan⁵⁵ bû xumarî.

Muenber zulf û misk, efşan û eswed,
Cebîn bedr û qews, ebrû munîr xed.⁵⁶

2065 Hebîb û g'unçe û naz perwerfide,
Xetê kafûrê⁵⁷ bû bênê keşîde.

Nerm rûnişt li balê û hilanî
Serê dilber li ser zendê xwe danî.

Şîrîn şehzade danîn lêv li lêvê,⁵⁸
Bi destê rastê girt lêymûn û sêvê.

Ji işq û dil dinêrî wechê dildar,⁵⁹
Di gel şadî digotin qewl û eşa'r.

G' E Z E L

Ey g'unçebeba talibê dîdarê tu em ez,
Çavnêrê leb û le'lê şekerbarê tu em ez.

2070 Talib te bi meyxaneme bo zewq û dilê xoş,
Aşiqê bi du çehvê mest û xumarê tu em ez.

Ey gul, veke çehvan û⁶⁰ bibîn bilbilê aşiq,
Qurbanê du zilfê wekî şehmarê tu em ez.

Ellah çi bi erzan tu bi dest min ketî îro,
Ba can û heyat û ruh birîndarê tu em ez.

Min zû te dixwastî ji mekanek wehe⁶¹ xalî,
We'dek bidetê, aşiqê goftarê tu em ez.

Melhem bikerî min bi du⁶² destê henerengî,
Cerhê me bibînî, ku birîndarê tu em ez.

2075 Sed şukrê îlahî, me dî⁶³ husna te mukerrem,
Heqê xwe dixwazim, ku emekdarê⁶⁴ tu em ez.

Yek bûse ji le'lê lebê canbexşi bi min bexş,
Bê ruh û heyat û dil û bîmarê tu em ez.

Ev dewletê baqî bi Sîyahpûşê Xudê da,
Çavnêrê leb û le'l û şekerbarê tu em ez.

Dibûsîn le'lê şekerbarê mehbûb,
Digirya xoş ji zewqê weslê metlûb.

Ji girya abê du çêsmê dilawer,
Nerm weşyane ser werdeynê ehmer.

2080 Ji bêhnê ademî û abê e'ynêyn,
Bi hiş hat û hilanîn eswed û el e'yn.

Eger çî narê işqê dil germ kir,
Welê ez naz û eşwe purr şerm kir.

Bi dest û asitîn⁶⁵ rûyeş niqab kir,
Ji şehzade gelek naz û etab kir.

Ji naz go: „Ev çî gustaxî, xiredmend,
Çî dildarî serê min danî ser zend“.

Şirîn şehzade go: „Ey ruh û canim,
Nebî yek lehze bê te ruh û canim.

2085 Li ser wechê munîr wek aftarê,
Tub Xudê key, hilîn⁶⁶ dest û niqabê.

Bikem e'rzê hebîb yek qiseê dûr,
Ji işqê te çî reng ez bûme rencûr“.

Hilanî perde, go: „Ey⁶⁷ ademîzad,
Çî kar û qise darî gel perîzad?“

Şirîn şehzade go: „Ey yarê dildar,
Tub Xudê key, qesem ullahê cebar.

Bi heqê hurmetê şîrê te xwarî,
Ji qewlê min bikey tu guhidarî“.

2090 „Ecaib,- go,- dadeê ba min tu sewkend,
Tu çi dibêjî bibêje, ey xiredmend“.

Ji ewwel ta bi axir sûretê hal,
Şîrîn teqrîri kir bo bintê Şehbal.

Perîrûyê ji naz û g'emze durrsuft,
„Perî û ademî kê dî bibin cuft?

Wusalê ma û tu purr dûredeste,
Çi reng teslîmî⁶⁸ kem ez xwe bi dest te?

Eger bab û dîya min pê⁶⁹ xeber ken
Bi vê surrê, dê bînin me bi ker ken.

2095 Bi zayi' dê biçî rencê te yekser,
Welê tehqîq nizanim, ey dilawer.

Tu kazibî we ya xod⁷⁰ qewlê sadiq,
Ji can û dil bûyî tu ji min bi aşiq“.

Dikir ew rengê şehzade tecerub,
Welê işqê dikir ez dil teg'elub.

Dil û cerg û ceger hatin xuroşê,
Ji işqê şahzade meyfiroşê.

Ji nazdarê xeber da sînesade,
Ji işq û dil digirya şahzade.

2100 Mueyyen kir hebîb, seyrê terîqet,
Ji dil zanî ku işqê wî heqîqet.

Şîrîn go ba tecerub: „Ey dilawer,
Ji min çêtir hene, purr xûb û dilber.

Bibîn tu dilberek⁷¹ mestî û mehbûb,
Tu talib be bi⁷² wê, ew bo te⁷³ metlûb“.

Şehê mestan go: „Ey ebrû hîlalem,
Serê mûyek te ez nadem bi alem.

Tu çi dibêjî me, ey dilbendê rahet,
Saetek weslê te nadem bi cennet“.

2105 Mehê enwari go: „Ger tuyî be sadîq,
Heqîqet tu li min bûyî bi aşîq,

Bixwe sondê ji minra, ey dilawer,
Ji sidq û⁷⁴ işqê te ez bîm bi⁷⁵ bawer“.

Şîrîn şehzade go: „Ey mahê peyker,
Bellahê e'zîm û rebbê ekber,

Bi husnê enwer û⁷⁶ mahê cebînet,
Bi mişkên⁷⁷ xal û xetê enberînet,

Bi ebrûyê teên wek qewsê tarî,
Bi du çehvên teên mest û xumarî.

2110 Bi husnê wech û rûyê enwerînet,
Bi le'lên tey⁷⁸ şîrîn û şekerînet,

Bi zulfên te⁷⁹ sîyah û enberamîz,
Bi pişkojê dehanê teyî şekerrîz,

Bi qed û qametê serwê⁸⁰ xiraman,
Ji eyban dûr û⁸¹ ez ser ta bi daman.

Ji g'eyrî te nevên min qet çû dilber,
Eger bêtin çû şems û mah û enwer.

Weger horîsifet bin ew bi urfan,
Di firdewsê berîn û bag'ê rizwan,

2115 Ji g'eyrî te ji wan dê bim bi⁸² nifret,
Ji min tehqîqi zan,⁸³ ey mahê tele't,

Bi tîrê îşqê te bûyem birîndar,
Ji narê hubê te mestîme⁸⁴ yekcar.

Weger, cana, li min nakey tu bawer,
Bi xencer dê bikem hulqûm bi du ker.

Nevên min ruh û can bê wesletê te,
Yeqîn dimrim ji derdê firqetê te.

Ji pêş çavê te xwe bikujim bi xencer,
Yeqîn dê bim şehîdê îşqê dilber“.

2120 Kişand Seyfulmuluk xencer ji kalan,
Bi nêzîk helqê⁸⁵ kir elmasê peran.⁸⁶

Xumar û meyperestan şeng û dilber,
Heqîqet kir ji îşqê wî bi bawer.

Bi lez destê xwe bir⁸⁷ girt destê⁸⁸ xencer,
Go: „Ey ruh û heyat û canê dilber.

Ji îşqê te ezim dil⁸⁹ bûyî mehrûq,
Yeqîn ez aşîqê tem, tuyî meşûq“.

Wekî du ehlê hubê îşqê sadiq,
Nebin aşîq bi hev nabin muafiq.

2125 Ji işqê dilberê zendê xwe hilmîşt,
Şîrîn du çehvê şehzade vemalişt.

Şîrîn da bûse du le'lê şekerleb,
Li ser lêvê wî danî sêbê g'ebg'eb.

Go: „Ey şehzade, ê min dî ji muhbet,
Di dewran û zemanan kes nedî qet.

Bi carek dîtinê nûrê cebînet,
Sewadê e'yn û le'lê şekerînet“.

Ku ew reng dî şeh ez⁹⁰ dildarê sermest,
Ji dil dan bûse pê û pence û dest.

2130 Go: „Yareb, qet nebim ez bê wusalê,⁹¹
Dilê mecruh bî fikir û hem xîyalê“.⁹²

Du dildarê hebîb û mest û aşiq,
Bi ehd û qewl û pêyman, saf û sadiq.

Kirin himbêzê hevdu şubhê şehmar,
Bi meqsed bûn ji hevdû, mest û dildar.⁹³

Givaştin aşiqan hevdu bi himbêz,
Vexwarin şîr û mey le'lêyn şekerrêz.

Ji xemrê mesti bûn bedr û mehê new,
Gehîştin meqsedê Şîrîn û Xesrew.

2135 Ji le'lê şekkerîn bûn ew şekerxa,
Misala Yûsufê Misrê û Zuleyxa.

Ji weslê işqê dilber şahê dildar,
Digo: „Ya rebbî, di xewdame, yane hişyar?

Hebîb û nazika dildar û⁹⁴ meqsûd,
Di gel işqê⁹⁵ mehebed bûyî mewcûd.

Bi yek fincan tijî abê heyatê,
Xizir hey kir dilê min ez mematê.

Ji hicranê mirî bû qelbê pirr g'em,
Bi weslê sag'i kir Îsaê Meryem.

2140 Birîndarek xirab bûm ez bê ferman,⁹⁶
Di gel melhem li min peyda bû Loqman.

G'erîb bûm ez, terîq⁹⁷ wunda, cebel nehs,
Şeva tarî bi derket tele'tê şems.

Selamet çûm şukur, ser rêyê cade,
Di bag'ê dilberê⁹⁸ min dî mirade“.

Digo şehzade ew reng⁹⁹ qewl û eşa'r,
Digirya¹⁰⁰ nazika mehbûb û dildar.

G' E Z E L

Îro ji meyê işqa bitan,¹⁰¹ elhemdulîllah,
Camek me tamam xwar û nihan,¹⁰² elhemdulîllah.

2145 Meyxware û mestane û rendîm û nezerbaz,
Leb ber leb û hemrazeê¹⁰³ can, elhemdulîllah.

Mûsa sifet ez nêrîm tecellaê cemaîê,
Şema' me munîr kir xan û man, elhemdulîllah.

Wekî Heyder û Rûstem ji meyê işqê hebîbê,
Zillet bidehem sefsîkînan, elhemdulîllah.

Îro kî di gel min têtê meydanê uşaqan,
Keyfek bidemê ez¹⁰⁴ bi deman, elhemdulillah.

Heta bi ebed serxoş û heyran û cinûnî,
Daim ku bibêjî bi dehan, elhemdulillah.

2150 Afyet¹⁰⁵ noşbad li canê te Sîyahpûş,
Cama ji meya işqê bitan, elhemdulillah.

Îlahî, tu me mest key şubhê lale,
Ji le'lê cam û xemrê çardesale.

Were saqî, werîn xemrê heyatê,
Ku pê ehya dibît qelbê mewatê.

Li min xoş tên le'bê fincan û bade,
Ji noşîna meyê em sînesade.

Were mitrib bi çeng û naye û def,
Bireqisîn qelbê hey ez wey muşeref.

2155 Terk nadim lebê fincan û saqî,
Heta umrê e'zîzem bîti baqî.

SERÊ XXVI

*Agehya tamamî li Serendîbî li işqa herdu terefan bi hebîbî
û agehkirina Şehbanû bi işqa qîzê li wê lebîbî*

Wekî şehzadeê şîrîn perîzad,
Ji camê muhbetê bûn¹ mest û dilşad.

Firaqê rûsîyeh bûn camê² weslet,
Vexwarin,³ zêde bûn şewq û mehbet.

Perîzadê go: „Ey şehzadeê mîr,
Ji weslêra divêtin bo me tedbîr.

Ku mîn be'd em nebin esla ji hev dûr,⁴
Ji camê wesletê bîn⁵ şad û mesrûr.

2160 Ke warsin bizde yedî bîn perîweş,⁶
Letîf û nazik û⁷ mehbûb û mehweş.

Eger me'lûmê wan bit ew hewale,⁸
Dibêjin maderem gel Şahêbale.

Çi hîle dî bikeyn, ey yarê dilgîr,
Kerem kun,⁹ ey e'zîzem, husnê tedbîr“.

Cewab daê şîrîn şahê şekerrîz,
Go: „Ey nûrîn liqaê, fitneengîz.

Cemalê dilkuşayet bit mubarek,
E'zîzem, ma heye min extyarek.

2165 Tu abê kewserî, ez qetreê tem,
Tu şemsê enwerî, ez zerreê tem.

Tu yemlexayî, qitmîrê tuem ez,
Tu mehsîmayî, dilgîrê tuem ez.

Serê me û xakê paê tu beraber,
Ruhê me û zulfê saê te beraber.¹⁰

Bi kuda tu herî, ez dê bi bez bêm,¹¹
Li pey te purr bi tecîl û bi lez bêm.¹²

Çi rengî tu emir key, dê wusa kem,
Mueyyen ger bibî, ez can helakem.

2170 Li min xoş tê mirin, lê ez nebim dûr,
Ji husnê dilkeşet¹³ pirr şue'leê nûr“.

Perîzadê go: „Ey mehr û¹⁴ dilawer,
Bi minra hatine şadî û mader.¹⁵

Kêyanê serwebanûyê semenber,
Delal û dilberê Şahbalê serwer.

Xudan urfane û ehlê terîqet,
Bi ser wê hatye işqê heqîqet.

Eger alim bibêtin ew senewber,
Bi halê me dibêtin¹⁶ bo me rehber.

2175 Ilacê dê¹⁷ biket Bedre bi herro,
Di gel Melke li pêşî serwebanû.

Bibêj wan da biçin pêş serwê bûstan,
Beyan ken nerm û şîrîn halê mestan.¹⁸

Ji ewwel bêne ser bazarê işqê,
Gelek tekrar biken esrarê işqê.

Heta dil coş¹⁹ biden bê badeh û beng,
Biken tekrarê işqê ew li sed reng.

Ji g'eyrî wî gelek ez dê bikem cehd,
Ji bo weslê xwe û te, ey cebîn se'd.

2180 Binêrin qudretê dadarê dawer,
Çi kirye bo me teqdîr û muqeder“.

Bihurandin bi işq û şîret ew şew,
Du çehvê wan delalan qet nehat xew.

Heta wextê bi derket fecrê sadiq,
Bilind bû ba²⁰ xeber bûn herdu aşiq.

Li cem hev rabûn ew herdu bi naçar,
Mebada ku bizanin²¹ xelkê eg'yar.

Wekî perwane sohtin dil ji işqê,
Dinalin²² şubhetê bilbil ji işqê.

2185 Bi sed derd û bela çû ew perîrû,
Di çadirda rûnişt serda bi ecnû.²³

Dikêşa ahekî serd sîne²⁴ pîrr g'em,
Misela ku vexwarî şûşeê sem.²⁵

Ji zehrê purr belatir camê işqê,
Çi zanin ê nexwarî²⁶ tamê işqê?

Sehergahê bilind bû fecrê sadiq,
Ji xew rabûn eyûnên mest û aşiq.

Ji dengê endelîb û sewtê bilbil,
Di bag'ê gule'zaran bû bi g'ulg'ul.

2190 Bi تنها ma emîrê işqê bazan,
Bi mehebet da li têtê çeng û sazan.

Sedaê wî bilind bû çerxê çalak,
Dikir sêyr û temaşa cemi' emlak.²⁷

Ji dengê wî dinalîn cumle bilbil,
Binefşe ser bizan û²⁸ helqe sunbil.

Ji ber husna sedaê şahizade,
Ji xew rabûn temamê sînesade.

Sedaê wî çû guhê Melke û Bedir,
Şîrîn rabûn ji xewabê lêylet il qedir.

2195 Kirin guhdarîyê sewtê ney û u'd.
Seda û neg'meê manendê Dawud.

Bi remz û hal xeber da Melke xatûn,
Di gel Bedrê du hefte²⁹ tebiê mewzûn.

„We reng deng û sedaê şîrîn û purr,³⁰
Bi tehqîq û mueyyen nîne bê surr.

Tu rabe, da biçîn pêş şahizade,
Ji bo me dê bibê ew sînesade.

Ji istiqbal û hal nêzîk, eger dûr,
Çi dêbît şahêbazê mest û mexmûr“.

2200 Şîrîn rabûn xiramîn kebk û³¹ refdar,
Du mehsîma bi qesdê şahê dildar.

Wekî şehzade dîn ew mehremê raz,
Ji dest xwe avêtin tenbûr û hem saz.

Got: „Sed car hûn bi xêr bên, ser ser û e'yn,
Gelî yaran, ne mabû qet çi mabeyn,

Ku ez pehtame mislê ateqê germ,
Welakin zû bû, hêjan min dikir şerm.³²

Ji wê³³ hatnê we min sed eferîne,
Keramet bû li nik min ew yeqîne“.

2205 Muhessel, şah xeber da halê dilber,
Ji ewwel ta bi axir cumle yekser.

Muferreh bûn û Melke,³⁴ Bedre xatûn,
Ji qewlê şahibazî tebiê mewzûn.

Çeleng rabûn û çûn ew herdu mehrû,
Şîrîn westan li pêşî serwebanû.

Gulab û misk û u'd û enber û³⁵ mey,
Kirin hazir di gel çeng û def û ney.

Gerandin saqîyan fincan û bade,
Xumar û mesti bûn jê³⁶ sînesade.

2210 Bi nermî hatne ser bazarê îşqê,
Şîrînan da xeber³⁷ goftarê îşqê.

Xeber dan mehbete Hewa û Adem,
Qîrarê wan nebû bê hevdu yek dem.

Çi reng dil bir zenê Ūrya ji Dawud,³⁸
Dinalî dem bi dem wek naye û u'd.

Ji Belqîs û Sulêymanê bi aşîq,
Xeber dan haletê Ezra û Wamiq.

Hedîsê bilbil û perwane gotin,
Dilê uşaq û mestan pêkve sotin.

2215 Ji wê miçlîsê hil bû narê îşqê,
Mukerer bû gelek goftarê îşqê.

Ji nû hil bû çiraê serwebanû,
Gehandînan yek serî qewseynê ebrû.

Du ta bû qametê serwê elîf war,
Ji şewqê îşqê birqê, atêş û nar.

Çira wê dîtîbû azarê işqê,
Gelek wê dîtîbû bazarê işqê.

Ji nageh hatî sewtê şahê mexmûr,
Bi eşa'rên Lebîd û çeng û tenbûr.

2220 Eser kir der dilê serwî gulendam,
Bi narê mehbete sot cumle endam.

Go: „Hey, hey, ew çi sewte tê peyapey,
Ji wî deng û sedaê dil dibin hey“.³⁹

Cevab da Bedreê du hefti sale,
Go: „Ew şehzadeê şîrîn cemale.

Xudan cah û meratibe⁴⁰ bi şewket,
Hunermend û şecî' û purr bi qewat.

Emîn û alim û dana û aqil,
Xudan erfân û hisnê nûrê kamil.

2225 Şîrîn lefz û sera-pa⁴¹ durrê meknûn,
Ji behran anî der wî Melke xatûn.

Çi reng şîrîn leqayek nazenîne,
Bila bê meclîsê û tu⁴² bibîne.

Peyember zadeye, sahib sefaye,
Xudan ehd û qîrar û purr wefaye.

Yeqîn ew mehreme, qet nîne eg'iyar,
Di gel wî purr hene mehbûbê exbar.⁴³

Çi dengî⁴⁴ tu bixwazî dê bibêjî,
Wekî elmas û le'l û durr birêjî“.

2230 Ji qewlê Bedreê şîrîn û dilber,
Riza da serwebanûyê semenber.

Go: „Bînin şahizade mislê bilbil,
Temaşa ket⁴⁵ ji werd û g'unçeê gul“.

Çeleng çû Melke pêşî şahizade,
Go: „Rabe, ey emîrê sînesade.

Biçîn dîwanê wê serwî gulendam,
Bibîn şekerlebê şîrîn û endam“.

Mufferreh rabû şehzade çû bilbil,
Di gel Melke kirin qesd g'unçeê gul.

2235 Ku çûn dîwanê serwî nazik û rend,
Sê caran kir temena şahê dilbend.

Vewesta dest li ser dest, mislê e're'r,
Muqabil serwebanûyê semenber.

We rengî şahizade xoş dua kir,
Di gel medh û senaê dil heba kir.

Ji medhê zêde bûn meyl û mehebet,
Di gel wî serwebanû hate rehmet.

Go: „Rûnî, ey emîrê işq bazan,
Bikem guhdarîyê te û çeng û sazan.

2240 Sedaê te dihat min xoş peyapey,
Di gel awazê çeng û naleê wey“.⁴⁶

Temena kirdi rûnişt şahê mexmûr,
Şîrîn ringande têlê çeng û tenbûr.⁴⁷

Yeşîn mirîyê dused salî fikir hey,
Sedaê çeng û şia'r û naleê wey.

Muheyyer bû ji wê ew serwî dildar,
We rengî xoş digotin qewl û eşa'r.

G' E Z E L

Aşiq û bêdil⁴⁸ kirim, mexmûr û ebter kirim,
Bê yar û hemser kirim, işqê⁴⁹ Bedîe al-Cemal.

2245 Perwane rengem ji şem'ê, nazirê min cumle cem'i,
Rêz kir li çehvê⁵⁰ midemi', şewqê Bedîe al-Cemal.

Sohtî dilê jarî ma, dilber û dildarî ma,
Purr didet azarî ma, hubbê⁵¹ Bedîe al-Cemal.

Çeşmeyê çeşmem purr ab, yar me dî ew bê hicab,
Ateş û birqê şehab, dilê me⁵² kir wek kebab.

Azar û hubê hebîb têk birin sebr û şekîb,
Mecrûhim ez bê tebîb, nale û wek⁵³ endelîb.

Nale û ah û keser, têtin⁵⁴ ji qelb û⁵⁵ ceger,
Wez işqê le'lên şekerbarê⁵⁶ Bedîe al-Cemal.

2250 Le'lên şekerbar û mey, saz û def û çeng û ney,
Leb ji leb û leb le pey, qelbê me kir sag' û hey.

Hey kirim şûxa letîf, bade û camên⁵⁷ zerîf,
Qamet û bejnê elîf, warê Bedîe al-Cemal.

Qamet û bejnê çeleng, bir li me⁵⁸ namûs û deng,
Zîye û kemanê çu beng, dan⁵⁹ li me⁶⁰ tîr û g'edeng.

Tîr dan li qelbê Sîyehpûşî xu⁶¹ wî pîrr gile,
Bên kirî zulfêynî şehmarê Bedîe al-Cemal.

Wekî dît serwebanûyê semenber,
Seda û şîa'r û îşqê şahê dilber.

2255 Nihêrî Melke û Bedrê kemale,
„Bibêjin,-go,-çi surre ew hewale?“⁶²

Şîrîn û nerm û rêhtin⁶³ le'l û gewher,
Du le'lê⁶⁴ şekerîn û Bedrê enwer.

Ji ewwelda ji Asim îbinî Sefwan,
Ji şîklê ku şhandibû wî⁶⁵ Sulêyman.

Kêyanê sûretê şîrîn perîzad,
Ji aşîqbûnê şehzade bi îcad.

Muhesil, wê xeber da ta bi axîr,
Ji mezkûrî hikayet xoş bi teqrîr.

2260 Muheyyer bû gelek jê serwebanû,
Ji îşqê şehizade⁶⁶ şîklê⁶⁷ mehrû.

Sena û hemdê rebbanî gelek kir,
Li paşan meylê wan çavêd belek kir.

Nihêrî, ku li pişt perdê semen bû,⁶⁸
Ji zexmê tîri ser daê bi ejnû.

Diket ahîn û nalîn û girînê,
Ji çehvê xwe dirêjî⁶⁹ ab û xwînê.

Sivik rabû çû nik wî serwebanû,
Go: „Ey şîrîn liqayê⁷⁰ taqê ebrû.

2265 Sebeb çin⁷¹ ew girîn û ah û nale?
Bibêj, ey dilberê nûrîn cemale.

Ji ahê dilkeşet sohta li min dil,
Ji giryê helqêê zulfem çû sunbil.

Bi ker bû damenê sebrem ji halet,
Nehîşt nûrê rûxem şewqê cemalet.

Ela ey mahê rûyê nûr û⁷² ruxsar,
Were bo min bike surrê xwe îzhar.

Bi ullahê ezîm û rebbê ekber,
Be esmaê şerîf⁷³ û zatê enwer.

2270 Meger esla nebî qet çare û g'em,
Weger ne, dê bikem cerhê te melhem“.

Di hîna dîtî firsetê mahêtabê,
Beyan kir surrê ez rûyê hicabê.

Go: „Ey mader, nizamim ez çi bêjim,
Xumar û mest û sewdayî û gêjim.

Dilê min sohtîye enwarê îşqê,
Eceb dijware purr azarê îşqê.

Nihin min taqetê barê firaqê,
Ji dil sohtim ji derdê eştîyaqê.

2275 Dilê min pehtî îşqê wek kebabe,
Ji îşqêra nihin şerm û hicabe.

Birin îşqê heya û nam û namûs,
Li min îro misala bintê Teymûs.

Eger çi Leylê em Mecnûn sifetim,
Lebê Eysa dixwazim wek mewatim.

Lebê Şîrîn kirin Ferhadê Xosrew,
Zeîf û zer misala mahê yekşew.

Heyatê cawîdan ez Xizirê xwahem,
Şuaê nûr û⁷⁴ ez bextê sîyahem.

2280 Ço Yeqûbê hezîn ez mustemendem,
Ji husnê Yûsufêra derd û mendem.⁷⁵

Wekî perwaneê mayil bi şem'em,
Ji sozê işqê xoş tîn ce'mê demi'em.

Ji işqê bilbilê şeyda muheyzer,
Gulê rûyem ji işqê bûye esfer.

Ji işqê qametem wek qewsê ebrû,
Ji janê dil me ser daye bi ejnû.

Misala mûyî dilber bûme helqe,
Ji janê dil bûyî dû nîme û felqe.

2285 Mebîn kes mislê men purr derd û aşiq,
Nihin yek zerre em Ezra û Wamiq.

Felek ez işqê min ser geşte-geşte,
Ji ahê min dinalînin⁷⁶ fereşte.

Wekî avê çeman ez bê qirarim,
Şev û roj talib û mayil bi yarim.

Çi kem Eyse û Eflaton û Loqman,
Nihin cûz le'lê leb derdê me derman.

Dinalînim⁷⁷ ji iŝqê şahizade,
Wusalê wî mera⁷⁸ qesd û mirade.

2290 Çi halek xoşe rehber bêti mehrem,
Bi lez bînî ji bo cerhê me melhem.

Bide min mijdeê zewqê wusalê,
Şeb û roz ez bimînim der xeyalê“.

Meelqise, wekî dî serwebanû,
Hewalê iŝqê mehtabê perîrû.

Gelek hemdê xudewendê bi heq kir,
Rizaê dil bi ilmê ma sebeq kir.

Go: „Ey çeşm û çirayem, qet meke g'em,
Ji bo cerhê dilet hazire melhem.

2295 Bi tewfîqa Xudê dêbit muyeser,
Murad û meqsedet, ey⁷⁹ nûrê enwer.

Welê muqdarekê sebrî, bi herhal,
Divê da em diçîn⁸⁰ pêş şahê Şehbal.

Muhessel, serwebanûyê serefraz,
Bi derket xoş li perdê mehremê raz.

Nihêrî rûyê şehzade bi mehbet,
Mîsala umm û ferzendan bi şefqet.

Go: „Ey şehzadeê mest û dilawer,
Xudawendet⁸¹ biket meqsed muyeser.

2300 Li min xoş hatin ew remz û nîşanet,
Seda û husn û⁸² teqrîr û beyanet.

Tu çi dxwazî bixwaze, ey dilawer?
Dibit, rebbî biket meqsed muyeser.

Wekî bê dewletê zewq û sefaye,
Ji bala qet ne⁸³ muhtacê cefaye“.

Sê caran kir temena mîrê dilber,
Li pêşî serwebanûyê semenber.

Go: „Talîbem bi rûyî g’unçeê gul,
Wekî bilbil firîn sebr û tehemûl.

2305 Dixwazim g’unçeê bag’ê Êramzat,
Fefî qelbî hewaha kulle ewqat.

Sebeb ew bû, me hiştin mulk û emlak,
Ji ahê⁸⁴ min dinalin cumle eflak.

Me hêla maderê şîrîn û baba,
Sebeb işqê cemalê purr hêcaba.

Ji şehre Misir û yaran⁸⁵ bûm cudaye,
Ji behran bûm giriftarê belaye.

Ji Çînê çend me dîtin sûretê xûb,
Nebû⁸⁶ qet yek muqabil rûyê mehbûb.

2310 Ji mewc û pêleha çend bûme bêheş,
Ji dil min qet neçû hubê perîweş.

Ji destê zengîyan min purr cefa dîn,
Ji serwehşan gelek zêde bela dîn.

Ji segsaran hebek ez bûme rahet,
Dikêşa min⁸⁷ g’emê azarê firqet.

Ji bozengan kirim der hubê dilber,
Hilanîm û birim teyrê g'ezenfer.

Ku qesdê canê min kir teyrê der seyr,
Kîşand ejder bi enfasê xwe an⁸⁸ teyr.

2315 Xilas bûm ez ji wê⁸⁹ çol û beyanan,
Li hev dan birçî û pêxwas û uryan.

Dinalî min li bin yek darê encîr,
Ji îşqê dilbera ku bûyî teqdîr.

Me dî qesrek, di navda Melke xatûn,
Ji wê min dî cewaba durrê meknûn.

Xudê tewfîqê da ifrît edem bû,
Ji bo min Melke xoş yar û herem bû.

Şev û rojê dikir behsê hebîban,
Diaxiftin ji nû cerhê g'erîban.

2320 Muhessel, em bi xêr hatin Serendîb,
Eger çenda me dîn pîr⁹⁰ derd û asîb.

Wusalê dilberan bo min qerîb bû,
Mirada min ji du le'lên hebîb bû.

Li min xoş tê mirin, nek ez cuda bim,
Wekî perwane qurbanî çira bim.

Bila umrem seatek bî di gel yar,
Ne sed salê bimînîm bêy dildar“.

Çi xoş go serwebanûyê şekerrêz,
„Ella, ey şahibazê mest û xûnrêz.

2325 Heta tu can nedî nabînî tu kam,
Venaxuyî şerbetê le'lê gulendam“.

Go: „Can û ruh dibexşim ez bi carek,
Bibînim ez têr⁹¹ wê husnê mubarek.

Bi can û ruh ku meqsed bê muyeser,
Hezar canê mi bît qurbanê dilber“.

Muhessel, serwebanûyê semenber,
Bi tecrîbe xeber da ba dilawer.

Ji vî rengî gelek qet jê nedî e'yb,
Heqîqet dît işqê wî bîlareyb.

2330 Çi xoş go serwebanûyê gulendam,
Bi şehzade emîrê Misir û hem Şam.

„Mekêşîn⁹² g'em ji îro pêve yekser,
Ji rîya⁹³ heq ezim her bo te rehber.

Di gel xwe dê bibem te bag'ê Êrem,
Bi Şehbal dê bikem cerhê te melhem.

Ji qewlê heq, ku warid bûye ev xet,
Bi zay' naçî ecir al-muhsînîn qet.

Kesê du dil biket ba hevdu mail,
Heqîqet bî ku işqê wan bi wasil.

2335 Bi şeriê muftiyê surrê heqîqet,
Dê mexled bîti ew la şek di cinnet“.

Muhessel, burî ew meclis we rengî,
Dilê şehzade bû mexmûr û bengî.

Were saqî, tu bîne camê mutleq,
Tejî bî ew şeraba wehdetê heq.

Bibûsim ez ku wî camê mue'lla,
Ji lewhê dil mehû bîtin heyulla.

Were mitrib bi saz û çeng û tenbûr,
Bireqşîne dilê mey mest û mexmûr.

2340 Di gel çengê beyan ke remzê qudret,
Bikem guhdariyê esrarê wehdet.

SERÊ XXVII

*Berbi malbûna Serwebanû ji Serendîb û birina şehzadeye bi
xwera bal bag'ê Êremê wî lebîb.*

Sehergahê şefeq da ku tecella,
Ji şerqê arifan nûra mue'lla.

Nifûsê sabî' merzî bû yekser,
Muferreh bûn ji şewqê heftê kêşwer.

Muhessel, rabû serwê hefti perda,
Di gel peryan bi remza xwe xeberda.

Go: „Rabin, em herin bag'ê Êremzat,
Temam bû we'deê me û hatî ewqat“.

2345 Dibên, rabûn temamê cumle yekser,
Bi emrê serwebanûyê semenber.

Muferreh heft hezar perî dilawîz,
Semen bû û dilestîn û şekerrîz.

Ji sultanê Serendîb xwestî destûr,
Bi şadî û bi kêyf û zewq û mesrûr.

Gulab û misk û enber lê reşandin,
Bedîe ba-Cemal zêde hebandin.

Gelek wesyet kirin bo şahizade,
Ji wî serwa letîf û¹ sînesade.

2350 Bi hevra wan çî xoş go ez² wesîyyet.
„Eger te dvê nebit qetiê mehebet.

Dibêtin³ tu bikey şehzade mesrûr,
Bi wê husna şerîf û nûrun e'le nûr“.

Gelek xoş hatin ew wesîyet ji banû,
Işaret kir bi du⁴ qewseynê ebrû.

Bila bên du perî zêde bi şewqet,
Li ser piştê xwe deynin purr bi rehmet.

Ku şehzade nebînît qet cefaê,
Li bala xoş biket seyr û sefaê.

2355 Nekêşit qet cefa û muhnet û g'em,
Heta wasil dibîtin⁵ bag'ê Êrem.

Li paşan xwastî destûr şahê dilgîr,
Ji şah û Melke û Bedre û zenê mîr.

Dibên, şehzade çû cem yarê⁶ canî,
Du destên xwe di gerdenda⁷ weranî.

We rengî xoş girîn ew herdu dildar,
Heta nalîn ji wanra av û eşcar.

Ji dengê wan gelek erwah cemi' bûn,
Iyûn û dil tijî xûn û deme' bûn.

2360 Ji sozê işqê wan hatin bi ref-ref,
Melaêk û perî, insan û sef-sef.

Ji işqan ku fikir wan ah û nale,
Dilê erwahe ha bûn mest û wale.

Heta heft saetan wan kir bi zarî,
Ji çavê herduan av-xûn dibarî.

Muhessel, xwestî destûr şahizade,
Ji Sedê dilrûba û sînesade.

Go: „Seda, tu bike bo me⁸ duaê,
Ji xaliq purr bike hîvî û ricaê.⁹

2365 Ku zû bêtin mera,¹⁰ meqsed muyeser,
Biyêm û ez bibînîm te dilawer“.

Hilanîn dest û Sed xoş¹¹ dua kir,
Dilê rewhanîyan yekser heba kir.

Di gel dua¹² kir zêde bi tehsîn.
Digo rewhanîyan bilcumle amîn.

Selam kir, go: „Bi xatirê te, ey yar“,
Selam istandi Sedê mest û xumar.

Go: „Ya rebb, tu herî¹³ xêr û silamet,
Nebînî renc û rah¹⁴ û hem melamet.

2370 Di gel meqsed tu bêy û min bikey şad“.
Ji destê firqetê şeh kir bi feryad.

Gelo, sohtim bi narê iştîyaqê,
Nema sebrê me ez destê firaqê.

Li ser ta pê firaqê ro bibin reş,
Nehîşt bo me qîrar û taqet û heş.

Bi naçarî kirin sebr û tehemil,
Bi halê xwe çû¹⁵ şehzade bi dû dil.

Dilê şeh ma li nik Sedê dilawer,
Ruh û can çûn di gel serwê semenber.

2375 Muhessel, bû suwar mislê Sulêyman,
Şehê mexmûr li ser piştê du peryan.

Perî rabûn bi cemi' şad û bêg'em,
Bilind bûn û firîn ew berbi Êrem.

Bilind bûn ewqeder ta mislê g'erbal,¹⁶
Li ber çehvan dinê ma ew şîrîn xal.¹⁷

Bi zewq û kêyf û aheng û be seyran,
Ji jorda hatne xwar teşbîhê teyran.

Heta wasil bûn ew şîrîn di nêv bag',
Dilê şehzade lê bû dag'ê ber dag'.

2380 Bi emrê serwebanûyê gulendam,
Li bin darek tufah danîn şehê Şam.

Bi تنها ma emîrê işqê bazan,
Li balê çûn perî wek sî û qazan.

Çû qesra xwe, dibên, serwî şîrînxal,
Ji hatnê wê gelek dilxoş bû Şehbal.

Bedîe ba-Cemala mah û peyker,
Çû hucrek xoş¹⁸ çehvnêrî dilawer.

Bi destûr çûn perîyanê şekerleb,
Mufferreh ber bi mala xwe muedeb.

2385 Were saqî tu bîn camê muella,
Tejî bîtin şerab nûra¹⁹ mucella.

Bi yek qitre ji wê camê şekerleb,
Munîr bi²⁰ Qafê ta Qaf zulmetê şeb.

SERÊ XXVIII

*Esîrbûna şehzadeye bi dest peryê Qulzemê, ku ji Şehbalê
êremyanra bû sebebê derd û g'emê*

Bi dewranê felek qet xoş mekin¹ dil,
Gehî gul nisbete, gahî ço sunbil.

Gehî roj û surûr û xemr û camin,
Gehî hizn û girî û hem zûlamin.²

Mualqisse, dibên, şehzade dîsa,
Di dilda meşe'la işqê weîsa.³

2390 Dinê pirr kir ji dengê saz û çengan,
Ku wî dî şiklê narincu bîşengan.

Li ser hewzek murebbe' ferşê mermer,
Rûniştî bû miqabil zarê⁴ e're'r.

Ji gerhanê felek tîrê qezaê,
Li nik xwe çend nefer dîn wek belaê.

We zen bir ew ji xelqê Êremêne,
Nizanî ew ji ser çeşma g'emêne.

Ku wan dî şahêbazî mest û dildar,
Li cem rûniştin û jê kirin⁵ pirsîyar.

2395 „Tu ew adem neyî,⁶ pirsra me hel ke,
Perî kuşt û bi xwera anî Melke?“

Ji serxoşî cewab da bê teemmel,
„Belê,-go,- ez ewim“. Wan go: „Tefeddel.

Resûlê teyne⁷ em, rabe, eya mîr,
Bi emrê şahê Şehbal tuyî nêçîr“.

Ji Şehbal ku bihîst, wî⁸ qet nekir deng,
Hilanîn û birin, ta hefti ferseng.

Bi derxistin ji mulkê Êremê mîr,
Du dest û ling û gerdên⁹ kirne zencîr.

2400 Birin ser kuhekî zêde muella,
Ji qelbê wî bi derxistin heyûlla.

Bi wan go şahizade: „Ev çi hale?
Bi bêbextî we ez girtim wehale.

Bibêjin halê xwe, ez we¹⁰ nizanim,
Ji halê xwe û we ez bê¹¹ gumanim“.

Ewan go: „Em ji xelqê Qulzemêne,
Ji bo te baisê derd û g'emêne.

Me kuştin şehryê te cumle bi¹² yekser,
Çi bab û dê û çendî mîr û begler.

2405 Te kuşt şehzadeê me es qisasê,¹³
Te jî em dê bhelînin wek risasê.¹⁴

Dibînî em çilin, lê şeş hezarîn,
Şehê Qulzem li pey te em hinarîn.

Ji esmanan dixwastî me, ji erdan
Bi destê me ketî îro tu erzan“.

Go: „Erê,¹⁵ kuştina min qet nihîn¹⁶ g'em,
Welê şehryî û bab û dan çi kir hem?¹⁷

Ji minra¹⁸ dîti wan¹⁹ bêhed cefaye,
Bi aqîbet li ser min dîn belaye.

2410 Çi tali'ek xirab û nehs û ebter,
Bû ew tali', ku ez pê bûm ji mader“.

Muhessel, şahizade, ku kirin bend,
Gelek hatin temaşa, serxoş û rend.²⁰

Ji ehlê Qulzemê ger can, eger pîr,
Bi hevra go: „Çi²¹ heyfe kuştinê mîr?“

Bi esla, destê kes neçû ku bikujin,
Ji ber qisasê xûnê şah birêjin.

Bi qewlê arifan, aqilmendan,²²
Nekuştin, lê kirin mehbûs di²³ zîndan.

2415 Serê zîndanê girtin, purr kirin²⁴ teng,
Bi mislê paceyek têda şehê şeng.

Li ser danîn muwekîlek qewî purr,
Ku hişyar bît li şîrê mest û sef durr.

Bidatê nan û avê, da ji ekber,
Çi bî teqdîr nivîsî û muqeder.

Were mitrib di gel çengê bibêje,
Sedaê muhbetê xûnim birêje.

G'erîb û²⁵ aşiqim, min nîne qet kes,
Ji g'eyrî wahidê dana û eqdes.

2420 Di zindanê çî xoş go şahizade:
„G'erîbek aşiqim, purr bê murade.²⁶

Ne min têt dîti rûyê welêdeynan,
Ji g'emze muhbetê têtî du e'ynan.

Ne min têt dîti rûyê Sedê canî,
Ji işq û muhbeta yarê nihanî.

Ne min têt dîti şehre Misir û Şaman,
Ji şewq û işqê le'lê tas û caman.

Ne min têt dîti²⁷ çek û esp û suwarî,
Ji huba²⁸ badeê çeşmeyn xumarî.

2425 Ne min têt xwar teamek xoş, bi lezet,
Ji derdê işq û soz û ahê mehbet.²⁹

Ne têt bûn³⁰ carekê çeşmem ji xwabê,
Ji birq û işq û şewqê aftarê.

Cefa û derd û dag'ên bê e'ded bes,
Gelek min dîn di bin çerxê muqewwes.

Ji hizn û derdê min dî bûme muzeter,
Îlahî tu şeva reş key munewwer.

Qerîb û qadir û heq û qedîmî,
Kerîm û rebb û rehman û errehîmî.

2430 Tu sitarî û g'efare ez-zinûbî,
Mucîb ed-de'wa û keşaf el-kirûbî“.

SERÊ XXIX

*Xeberhılanîna Şehbale ji qulzemyan, ku şehzade
xapandin, birin bêguman we herba Şehbale bi wanra û
standina şehzadeye ji wan bêzîyan*

Kesê mudter ku dua kir bi esma,
Ji sidq û bawarî-yû¹ caê tenha.

Di gel secde û selewatê amînî,
Ecîb û² dewate al-dayî dibînî.

Wekî duaê şehzade qebûl bû,
Bedîe ba-Cemal zêde melûl bû.

Ji işq û mehbetan kir ah û gazî,
Nema purr ew biket xwe sur û tazî.³

2435 Sedaê wê çû guhê serwebanû,
Ji g'em xwarbû qedê wê şubhê ebrû.

Du ta bû qametê serwê elîf reng,
Ji huznê mest bû bê bade û beng.

Çeleng rabû û hat nik wê hîlalê,
Zeîf û zer, bûye xwar⁴ şubhê dalê.

Go: „Ey rahet , sebab çin ah û nale?
Dikem rabem herim nik Şahibale.

Bikem tedbîrê işqê te bi herhal,
Bi nerm û şîrînî gel şahê Şehbal.

2440 Sebir ke, ey mehê şîrîn liqayem,
Mekêşîn g'em, eya çeşm û çirayem“.

Go: „Ey ummê, şefiqem, ez dikem sebr,⁵
Welakin, tu çiraê leyletul qedr.⁶

Li ku hêla sedaê wî nima bê,
Dilê min pehtë⁷ işqê wek kebabê.

Ji ehlê Qulzemê çil kes tamamî,
Dibên, hatin dixwazin⁸ şahê Şamî.

Ji bo qîsasê ew hatin bi destûr,
Ditirsim ew biken şehzade rencûr.

2445 Hîlak bûm ez ji derdê işqê⁹ mehbet,
Bi tecîl rabe, tu qet meke hucet“.

Ku ew rengî bihîst serwê şîrîn xal,
Çeleng rabû û çû nik şahê Şehbal.

Di gel zewq û sefa û bûs û hembêz,
Xeber da serwebanûyê şekerrêz.

Temamê halê şehzade seraser,
Ji işq û mehbetê ehwalê doxter.

Teecub ma gelek şahê şîrîn kar,
Go: „Ey serwê, li ku hêla te ew yar?“

2450 Mikanê wî nîşan da, şahê go: „Weh“.
„Xirabî kir te, ew hîşt, ey¹⁰ şîrîn meh.

Ji ehlê Qulzemê çil kes bi ejmar,
Dibên, hatine purr¹¹ mekar û g'edar.

Ditirsim şahizade ew qisas ken,
Tebîet agirin ew, wê risas ken“.

Bi derket şah û pansed merdê cengî,
Verêkir wê demê pey mîrê bengî.

Çiqas gerhan¹² perî ew ademîzad,
Nedîtin, lê ji pîrek mislê Ferhad.

2455 Bihîstin ku çihil kes, ehlê Qulzem,
Hilanîn û birin ew şahê purr g'em.

Vegeryan pêşî Şehbal û kirin¹³ e'rz,
Go: „Ey yaran, li ser min bû sefer ferz“.

Emir kir, cemi' bûn pansed hezar mêr,
Hemî merd û dilawer¹⁴ bûn û wek şêr.

Bi gurz û nîze û şemşêr û cewşen,
Suwar û namidar anîne rewşen.

Xirabê wan wekî Rostem bizanin,
Bi deng û nav û zor wek qehremanin.

2460 Ji gurzê wan dibin kuh û cebel kerd,¹⁵
Ji dengê wan dibî bûlerzêê erd.

Wekî birq û birûsê¹⁶ ew çelengin,
Ji zor û qewatê ew mest û bengin.

Ji nehshed men bû gurzê wan giranî,
Serê şûr û rîman zehrabê danî.¹⁷

Ji gurzê wan diçû¹⁸ wek meşe'l ateş,
Ku bin vartane gurz¹⁹ mîrê perîweş.

Di gel Şehbal firîn, ew çûn wekî berq,
Dinê kir wan ji dud û ateşê g'erq.

2465 Ji Êrem derketin, ew çûne Qulzem,
Diken de'wê şehê naçar û purr g'em.

Cewab çû şahê Qulzem: „Eskerek purr,
Ji Êrem hate ser te şêr û sefdurr.

Bike tehbîrekê bo xwe tu, ey mîr,
Weger ne, xelqê Qulzem bû bi²⁰ hêsîr“.

Emîrê Qulzemê manendê şêran,
Bi derket, emir kir mêr û dilêran.²¹

Ji etrafan cemi' bû bo wî esker,
Dibên, sêsed hizar kes hate defter.²²

2470 Li hespê berqê reftarê suwar bûn,
Dilêr û sefdurr û xoş namidar bûn.

Kirin ne'rî û pehnî dane hespan,
Wekî berq û birûsê²³ çûn bi çespan.

Muqabil eskerê ferxende îqbal,
Vewestan Qulzemî sef girte²⁴ derhal.

Egîd û sefdurrê şahê ferehbexş,
Bi cewlan bûn li meydan şubhê ateş.

Ji ehlê Qulzemê çend merdê dilêr,
Muqheher çûne wan ne're wekî şêr.

2475 Li hev xistin wekî şêr û pilengan,
Bi gurz û nîze û şûr²⁵ û kulingan.

Li paşan tevlêhev bû²⁶ herdu derya,
Serê tîr û rîman kûr kir sureyya.

Bi şîr û tîr û rîm hevdu dirandin,
Ser û zend û du²⁷ dest û pê firandin.

Ji qehra tevlêhev bûn av û ateş,
Ji erdê ta felek dûmanê kir reş.

Dibên, rojek bû, ew roj şubhê heşrê,
Ji²⁸ wextê heşrê bû, heta bi neşrê.

2480 Ji waweyla û g'ulg'ul ristexîze,
Di²⁹ dest wanda³⁰ şkestin gurz û nîze.

Xudê tewfîqê da şahê Êremzat,
Ji jorda ayetê *fethûn qerîb* hat.

Di gel wê ayetê *nasrûn min ullah*,
Digo rewhanîyan sed barekellah.

Li mêydanê bi gurzê xwe huner kir,
Kesî şûrê xwe lêxist wî bi ker kir.

Kemend kir wî li mêydan şahê Qulzem,
Li paşan eskerê Qulzem bû mulzem.

2485 Di hîna dîtê fîrset şahê mehrû,
Cewab û mujde şand³¹ bo serwebanû.

Hîlala new bihîst ew qal û gufte,
Ji mesrûrî bû wek³² heyvê³³ du hefte.

Gelek zêrr û cewahir wê eta kir,
Dilê jar û g'erîban xoş³⁴ û şa kir.

G'erîb û mexmûr û mest û xumarem,³⁵
Ji lutfê heq gelek umîdwarem.³⁶

Tecellaê ferecbexş û³⁷ munewwer,
Seraê dil di hîna kir muemer.³⁸

2490 Ji enwarê şefeq, ji etrafê gerdûn,
Munewwer bû seraser Qulzemê xûn.

Ji qewlê rawîyê³⁹ esrarê wehdet,
Şehê Şehbali çû ser textê heybet.

Kirin hazir li pêş wî şahê Qulzem,
Muqeyyed dest û pê, mehzûn û mulzem.

Go: „Ey bedexterê tali' bûyî reş,
Bibêj te pê çi kir⁴⁰ ew mîrê mehweş?“

Go: „Min ew anîye, ez wî qisas kem,
Bi narê qehrê qelbê xwe risas kem.

2495 Tu çi dixwazî, eya şah û emîrem,
Bi esker hatî ser me tu ji Êrem“.

Go: „Ey tali' sîyahê,⁴¹ bê murwet,
Şehê xûnxwarê, mestê camê⁴² g'urbet.

Bûyî mêhvanê me⁴³ di bag'ê Êremda,
Çi rengê killê zemîret ev⁴⁴ reqemda.

Bibey şehzade û tu⁴⁵ bikey bi kuştî,
Ji minra g'îret û namûs çi hiştî?

Kesê g'îret nebî, nabîti navdar,⁴⁶
Eger dunya, eger axret şîrînkâr“.

2500 Şehê Qulzem go: „Ey şahê xudanbext,
Bîqabî bo te umir û⁴⁷ tac û hem text.

Benîadem ku hen⁴⁸ bêetibarin,
Ji espê bozî⁴⁹ nefse şûm suwarin.

Ji wanra navêtin ew çendê g'îret,
Sebeb çin reht û qelb û hem⁵⁰ zemîret“.

Hewalê şahizade, şahê Êrem,
Xeber da serbiser bo⁵¹ şahê Qulzem.

Li paşan got û⁵² şahê dilmunewwer:
„Nizanî tu ji benîadem peyember.

2505 Çiqas rabûne ew em bûyîn muhtac,
Eger abid, eger hakim, xudantac.

Xusus şehzadeê me⁵³ purr wefaye,
Pêyg'ember zadeye, ehlê⁵⁴ sefaye.

Ji eqlê wî û ulm û husnê enwer,
Xeber daye Sulêymanê pêyember.

Ji tali'ê wî ew reng bûye melûm,
Bedîe ba-Cemal bo wîye meqsûm.

Ji cinsê ademî di bag'ê Êremda,
Nehatîne ne kes ew xet⁵⁵ reqemda.

2510 Heta îro ku peyda bûye ew can,
Ji hikmet hatye ew bûye mêhman.

Ji emrê rebbê rehman û g'effûre,
Ewe zawa, ezim bo wî xezûre.

Li ser wîye di gel te min şer û ceng,
Diger ez g'eyret û namûs û hem deng.

Seatek zû verêke ew bila bê,
Weger nakî, tu bibihê⁵⁶ wê çewa bê.

Dê rabim, şehre te zêrr û zeber kem,
Bi şemşîrê⁵⁷ bi cewher te bi ker kem.

2515 Bikem emwal û mulkê te bi hêsîr,
Zen⁵⁸ û ferzend û eqreb qeyd û zencîr.

Verêkem cumle bo Asim bi carek,
Ku alem bêjê bo me, sed tebarek“.

Şehê Qulzem bihîst ev reng ji Şehbal,
Mueyyen kir ji dil wî hal û ehwal.

Go: „Şaha min, ji qeydê xwe riha ke,
Dilê meg'mûm⁵⁹ purr zewq û sefa ke.

Ji bo xatirê te, ey şahê Êrembag',
Dê melhem kem dilê mecrûhê purr dag'.

2520 Bi kêyfa te bikem, çawan te xwastî,
Bi tehqîq û mueyyen, her bi rastî“.

Gelek xoş bû dilê şahê şirînsurr,
Ji wan⁶⁰ qewlê şehê Qulzem wekî durr.

Ji qeydê qehrê berda, kir muxelle',
Bi yek tacê⁶¹ cewahirbend muresê'.

Bi iznî şahê Şehbalê mubarek,
Şehê Qulzem çû⁶² xoş kir hem tedarek.

Biket mêhvanê xwe şahê Êrembag',
Ji qeydê g'em riha ket qelbê purr dag'.

2525 Ewî qesr û eywan kirin muheyya,
Ji bo şems û necûman hem sureyya.⁶³

Welê⁶⁴ g'embarî ma ya rebb, hezîne,
Ji g'eyri rehmetet⁶⁵ hîvî tunîne.

Ji behrê rehmetê qetrek sefayê,
Bikey ser qelbê me nuqsan tenayê.

Bi weslê Mustefe tu bikey me dilxoş,
Bi qurbanî te bît her dem Sîyahpûş.

SERÊ XXX

*Teslîmkirina şehê qulzemêya şehzadeye bi Şehbal û
efûkirina wîye ji qisasê bi kulîhal*

Tecellaê şefeq ji esrarê wehded,
Munewwer kir seraê qelbê¹ muhbet.

2530 Durrefşan bû zemir ez surr û² esrar,
Bi cemi'î g'ulg'ulîn enwa' etyar.

Şehê Qulzem muheyya kir bi enwan,
Sera û dar û dîwar,³ text û eywan.

Muzeyen kir be neqşek zêde⁴ enwer,
Muetter kir bi misk û u'd û enber.

Tê raxistin firaş ez xez û⁵ mahût,
Du textê zernîgar ez durr û yaqût.

Muqabil hevdu danîn zêrrê⁶ xilxal,
Bi emrê şahê Qulzem hatî Şehbal.

2535 Bi hevra çûne ser text ew cihangîr,
Bi sef seknîn g'ulam û sefdurr û⁷ mîr.

Di gel îkram û izaz û şerabê,
Surûr û kêyf û aheng û ribabê.

Şehê Qulzem emir kir dilkuşade,
Ji qeydê g'em riha kir⁸ şahizade.

Li paşî şerbetê, qend û mey û beng,
Birin himamê şuştin canê gulreng.

Bi nerm û şîrînî ew çardehê mah,
Kirin hazir li dîwanê şehinşah.

2540 Ji eql û ulm û erfana mahê yekşew,
Ji hevdu ferqî kir⁹ ew herdu xesrew.

Çeleng û şîrînî û şahane mênwal,
Temenna kir, dibûsî textê Şehbal.

We reng dua û medhê¹⁰ hem sena kir,¹¹
Dilê şehinşeh û¹² cumle heba kir.

Ji dua û sena û medhê pismîr,
Rijandin le'l û durr û şekker û şîr.

Ji medh û lefzê şîrînê çu şeker,
Muheyyer bûn du şah û cumle yekser.

2545 Li paşan mehrûyê azade ez g'em,
Temena kir şîrîn ber şahê Qulzem.

Di gel medh û senayê bûse da text,
Vewesta neyşeker ba tali' û bext.

Zibanê neyşeker bo şekeramîz,
Ço tûtî bû şekerxa û şekerrîz.

Ji medhê du şehinşahê serafraz,
Gelek xoş hat duaê mehremê raz.

Ji Şehbalê xudan namûs û şewket,
Li ser wî zêde bûn mêyl û mehebet.

2550 Şehinşahê Êremê go şahê Qulzem:
„Gelek bê misle ew cananê hemdem.

Xudan erfana û eqle-w¹³ purr xewase,
Te purr çê kir, ne kuştî ez¹⁴ qisase“.

Go: „Şaha, ew ji yumnê şehriyar bû,
Veger ne, qelbê me purr dîd û nar bû.

Ji bo xatir te min ew kerd¹⁵ azad,
Ji qisase û xûnê canê ewlad“.

Diger¹⁶ şehzade hem wî kir muxelle',
Bi libsê faxêre û tancek¹⁷ murese'.

2555 Gelek xoş hat ji şeh Şehbalê mesu'd,
Go: „Şaha, min ji te her ew bû meqsûd“.

Gelek mesrûri bûn hazir û guhdar,
Binêrin dê¹⁸ çi bîtin axirê kar.¹⁹

Ji ew safê hemîde nefsê kamil,
Di hîna bûrî mecme' bin xesail.²⁰

Tecellaê cemalê heqê peyda,
Dibit bo wî û ruh dê bîte şeyda.

Ji qewlê rawîyê exbarê gofte,
Ji şahê²¹ Êremê borîn du hefte.

2560 Ji şehre Qulzemê dilşad û bêg'em,
Gelek îkramê kir bo şahê Qulzem.

Di gel şehzade, şahê mest û mexmûr,
Ji şahê Qulzemê xoş xwaste destûr.

Cemî' eskerê perîyan bi etimam,
Di gel şehzade û şahê şirîn nam,

Berê xwe dane bag'ê Êremê çûn,
Biken bêg'em dilê Lêyla û Mecnûn.

Cewab û mujde çû bo serwebanû,
Bedîe ba-Cemala taqê ebrû.

2565 Surûr û kêyf û aheng û fereh purr,
Ji wan pêyda bû rêhtin gewher û durr.

G'enî bûn jê gelek muhtac û miskîn,
Bi derket eskerê Şehbalê rengîn.

Bû waweyla û kêyf û zewq û aheng,
Suwarîn namidar û taze û şeng.

Li mêydanê vewestan ew beraber,²²
Kirin rimbazî û cewlan û çenber.

Perîrûyanê mest û sînesade,
Dihatin xoş temaşa şahizade.

2570 Ji dîna wî²³ perî bûn mest û heyran,
Eyûnê mahêtaban kir bi seyran.

Bedîe ba-Cemala û serwebanû,
Kirin xoş²⁴ wan temaşa şahê ebrû.

Muferreh bûn tamam cumle perîweş,
Ji kêyf û zewq û le'lê camê zerkeş.

Şeraba wehdetê heq mest kirim dil,
Wekî bilbil dixwazim g'unceê gul.

Di gel bedrê du hefte mahê yekşev,
Bi hevra çûne cem Şehbalê Xesrew.

2575 Ji dîna wan gelek mesrûrî bû şah,
Nerm bûsîn du paê şehê şîrînmah.

Meha şîrîn ji babêra dua kir,
Di gel medh û senaê dil heba kir.

Ku dil xoş bû şahê Şehbal ji doxter,
Vegerya berbi qonaxê xwe dilber.

Welakin serwebanûyê şekerrêz,
Li nik Şehbalê ma mest û dilawêz.

Dibûsî çeşm û rûyê şahê Şehbal,
Bi yek fîncan dinûşî wan meya al.

2580 Şehê Şehbal ji serwêra hikayet,
Ji ewwel ta bi axir kir riwayet.

SERÊ XXXI

*Razîbûna Şehbale bi şug'îlê şehzade û tedbîrdîtina wîye
ji bo wusala wî mehcûrê dildare*

Tilu' şemsê enwer ku şefeq da,
Gul û belgê reyahînan¹ ereq da.

Sedaya bilbilan gerya di nêv bag',
Dibû mirîyê dused salî ji ber sag'.

Ji qewlê rawîyê mîzanê mewzûn,
Nivîştim nameê wek durrê meknûn.

Dibên, Şehbalê çû qesra muberek,
Ji bo şehzade kir qesrek tedarek.

2585 Bilindî heft tebeq bû, zêde dilkeş,
Li ser ta bin² libin zer bû³ muneqqeş.

Ji durr û gewheran meşe'l wekî nûr,
Dikir çavê hevsûdan kor û⁴ ez dûr.

Tê raxistin firaşê rengê-rengî,
Ji dîba û ji sof, etles firengî.

Reşandin lê gulab û misk û enber,
Çû navda şahizade bi emrê serwer.

Di gel çend mahê rûyanî muedeb,
Dibûrand şahizade roz û hem şeb.

2590 G'emê îşqê di dilda bû gelek purr,
Gehî digrya, gehî dikenya wekî durr.

Gehî dilxoş ji weslê bag'ê Êrem,
Gehî ji işqê dibû mehzûn û purr g'em.

Gehî kêyfxoş ji şewqê şahê Şehbal,
Gehî mehzûnê işqê zulf û hem xal.

Gehî dilşadê bag' û taq û eywan,
Gehî purr g'em ji derdê roj û heyvan.

Gehî mesrûrê eyamê wusalê,
Gehî mehzûnê işqê laûbalê.

2595 Di gel ahan dinalî ew şeb û roz,
Ji dil naçê g'emê durrê⁵ şeb efroz.

G'emê işqê hebîban purr cefaye,
Emanet qet mebîn zewq û sefaye.

Di nêv cergê⁶ me dîsa şubhê ateş,
Bilind bû narê badê⁷ meşe'la geş.

Ji qewlê rawiyê ser sefheê xûn,
Guher rêzê dilê Sêyhûn û Cêyhûn.

Ji le'lê leb dibarî şîr û şekker,
Muselsel sebherengî durr û gewher.

2600 Ku hîna şahê Şehbal hate qesrê,
Kirin zewq û surûr heta bi esrê.

Şehê Misrê çû nav qesrê mue'lla,
Çehvnêrî qedê nûra tecella.

Bedîe ba-Cemala mest û bengîn,
Ji hatinê dilberê⁸ dil bû bi teskîn.

Welakin wî⁹ dixwastin şerbet û mey,
Ji mêyrenge du le'lên şekkerîn ney.

Di dilda agirek hîlbû çû meşe'l,
Muselsel zulf û¹⁰ der gerden wekî g'el.

2605 Kîşandin berbi qesrê şahizade,
Dilê fincan kerî kir rengê bade.

Gelek bê extyar rabû nezer kir,
Ji peryan kes nedît û dil du ker kir.

Wekî birqê ji şehzade bi derket,
Misala tûtîyê qesdê şeker ket.

Ji wî baê nesîm û nûrê enwer,
Muşeweş bû ji mesrûrê dilawer.

Ji nageh dî li nik xwe meqseda dil,
Wekî bedrê du hefte nûrê kamil.

2610 Kirin hîmbêz hevdu, bûn hem ag'ûş,
Du aşîq dil ji hubê mest û medhoş.

Ji le'lê leb¹¹ vexwarin şerbet û mey,
Dilê miryan ji wê meyê dibû hey.

Gehî serxoş ji cam û badeê îşq,
Gehî mest bûn ji dest û penceê îşq.

Ji qewsê husnê tîrendazi bûn ew,
Li ser piştê kumeyt rimbazî bûn ew.

Xerabî yek ji wan sadir nebû qet,
Nekêşa katiban cuz qencîyê xet.

2615 Ji halê wan nebû qet ba xeber kes,
Ji g'eyrê wehidî dana û eqdes.

Welakin serwebanû pê dizanî,
Bi qewl û fielê wan yaranê canî.

Wekî yek hefte burî ji hatinê şah,
Çeleng rabû şîrîn serwê cebîn mah.

Çû dîwanê şehinşahê serefraz,
Dibê, kêyf û surûrê mehremê raz,

Beyan kir haletê şehzade dîsa,
Go: „Ew murde dixwazet le'lê Îsa.

2620 Nemayîn wî qîrar û sebr û taqet,
Ji dest çûyîn surûr û kêyf û rahet.

Peyember zadeye û şekerzubane,
Ji işqê bûye bê nutq û beyane.

Gelek dîtin cefa û der berr û behran,
Çîya û çol û wadî, deşt û sehra.

Deh û pênc sale derkeftî ji g'urbet,
Ji bab û dê û yaran bûye firqet.

Gelek dîtine wî renc û cefaye.
Mubarek tele't û nûrek sefaye.

2625 Heqîqet aşiqê husnê Bedîe,
Dilê xwe daye işqê wek mebîe.

Diket meylê wusalê husnê dilber,
Ji wî hem aşiqe zîbaê doxter.

Gelek bêtir¹² ji wî dixwazî wusalê,
Ji işqê bûye doxter wek hîlalê.

Yeqîn teqdîrê şahê zulcelale,
We reng aşiq bûyîn bedr û hîlale.

Gelek ehsane, ey şahê dil azad,
Dilê wan key¹³ bi camê wesletê şad.

2630 Di rîya heq bike, ey şahê muxtar,
Cizaê qencîyê qencîye, ey yar“.

Gelek xoş hatin ew eqwal û exbar,
Ji şeh Şehbal û gotê¹⁴ tuî muxtar.

Reza da serwebanûyê dihen¹⁵ teng,
Siba dê bikeyn saz û kêyf û aheng.

SERÊ XXXII

*Berhevbûna şehêd peryan we qazîyê wane li bag'ê Êremê û
reqs û semaya wane ji bo revandina derd û g'emê*

Sehergeh hate ser textê durrefşan,
Şehê Şehbal û kir zêde zerefşan.

Emir kir cemi' bin xûb û şekerxend,
Bila bèn û biken ew reqs û govend.

2635 Perîrûyanê mest û zêde dilşad,
Biken reqs û sema der bag'ê şeddad.

Nivîsî name ser ehdê Sulêyman,
Bila bèn hefti padşahê cinan.¹

Di gel ebba² û esker, cumle yekser,
Seg'îr û hem kebîr û şab û doxter.

Ji dil guh dê, bizan esmaê şahan,
Xudan edil û sexa û dadxwahan.

Ji ewwel Ebyez û Meymûn û Exzer,
Di gel Berqan û Muzhib, sadis Ehmer.

2640 Şehê sebi'e Seîd Ebdurrehman,
Dibêjnê Zewbe' purr rehm û ehsan.

Xudan cah û meratîbin, bi şewket,
Wekî padşahê îslamin bi heybet.

Dibên qadîyê wan Meyteterûne,
Xudan ulm û kiramet rehnemûne.

Şehê a'zem ewin wan sîne sadan,
Dibexşin ew muradê bêmuradan.

Gelek bêçare bûne ji wan bi dewlet,
Wekî min bê newayî camê g'urbet.

2645 Dîger³ herçî ku hen xidmetguzarin,
Ji camê wan şehan mest û xumarin.

Bi emrê padîşahê zulcelale,
Ku ew hatin bi emrê Şehêbale.

Cemi' bûn ew di nêv bag'ê Êremda,
Ji elhamê qelem ev reng reqem da.

Bi reng-reng hatin ew dildarê dilbed,
Li ser ta pê şîrîn û leb şekerxend.

Di gel wan saz û tenbûr û çeg'ane,
Sedaê mitribê sahib tirane.

2650 Spî û kesk û sor, ezreq û zer,
Reş û narincî û ebleq beranber.⁴

Dihatin sef bi sef, reng-rengê yaran,
Wekî gul, çiçekê ewwel biharan.

Ji wesfê wan nizanim ez çi bêjim,
Xumar û mest û sewdaî û gêjim.

Dihatin bir bi bir, bi reqs û govend,
Diken heyi mewatan ew şekerxend.

Tealella ji wan mest û xumaran,
E'ded zêde ji sed nehsehd hezaran.

2655 Bi cumle mest û mexmûr û dilawîz,
Semen bû⁵ û dilestîn û şekerrîz.

Munewwer husn û qamet serwî bûstan,
Ruh û canên ji bo me meyperestan.

Hezar reng g'ulg'ulîn enwarê telet,
Di nêv bag'ê mîsala bag'ê cennet.

Ji wan mesrûri bûn darê gulumil,
Dinalî mitriban manendê bilbil.

Nezerbazîyê wan çeşm û e'yûnan,
Gelek aqil kirin şubhê cunûnan.

2660 Ji reqsê qametê serwê û e're'r,
Gelek mislî me bûn mecnûn û ebter.

Ji her şeş cîhetan zewq û surûre,
Sedaê mitrib û sewtê bilûre.

Bi reng-reng xemilîn horî di cennet,
Perîrûyanê mest û purr mehebet.

Ji zingzingê tilism û toqê yaran,
Xuşînê zêrr û xelxal û guharan.

Ruxê enbersifet lê bûyî peyda,
Gelek mislê me bûn mecnûn û şeyda.

2665 Perîrû cemi' bûn der bag'ê Êrem,
Ji tirsê kêyf û zewqê xoş revî g'em.

Ji terfê zewq û hemó aheng û surûre,
Ji terfê reqs û govend û bilûre.

Ji zewqê padîşahan û emîran,
Gelek xoş bû dilê jar û feqîran.

Hezar rehmet li wan canê letîf bî,
Selamê ma li balaên binê⁷ şerîf bî.

Çî ger nuqsanim û tişteke nizanîm,
Duaçî û meddahê wan şehanim.

2670 Ezim nuqsan, ewin xoş ehd û peyman,
Wekî morem li dîwanê Sulêyman.

Sulêyman nisbetê cananê mexmûr,
Diken zewqê bi saz û çeng û tenbûr.

Gerandin saqîyan cam û peyale,
Di nêv caman şerabê çarde sale.

Ji zerfê zêrr û fincanê çû elmas,
Mufferreh bû dilê sed Xidr û Elyas.

Mirî hey bûn ji le'lê şubhê Îsa,
Li Tûrê meşe'la nûrê heq îsa.

2675 Dikir wan padişahan û emîran,
Mufferreh şuşeya⁸ qelb û zemîran.

Gehî ba cam û fincan û mey û beng,
Gehî saz û ney û tenbûr û aheng.

Gehî bi deng û sedaê purr melahet,
Gehî şekerzubanên purr fesahet.

Gehî şetrenc û nerd û rûdi şahî,
Şeyaling û çi berbet gûşemahî.

Yekayek pê dileyîzîn padişahê,⁹
Emîr û beglerên rû şubhê mahe.¹⁰

2680 Gehî rimbazî¹¹ û hesp û suwarî,
Gehî kaşo û goy û kêyf û yarî.

Gehî nêçîr û seyd û geşt û seyran,
Gehî şahîn û baz¹² û çerxê teyran.

Gehî ba dest û berdê pehlewanan,
Wekî şêr û pileng û hem beranan.

Gehî ba çerxê gurzan û kulingan,
Gehî ne'rinê filan û nehengan.

Gehî hew-hewlîyê çeşmê g'ezalan,
Gehî seyranê husn û zulf û xalan.

2685 Gehî tîran di¹³ bavêjin nîşanê,
Ezim nîşanê wê tîr û kêşanê.

Gehî dileyîzîn bi şemşîr û metalê,¹⁴
Gehî seyran li ser bedr û hîlalê.

Welê şekerleb û şîrîn dehanan,
Sera pê dilberan û newcûwanan.

Dikir reqş û semayek zêde mehbûb,
Ji îşqê mestê bûn talib û metlûb.

Di bag'ê Êremê qesrek nemabû,¹⁵
Di navda reqş û govend û sema bû.¹⁶

2690 Direqsîn mest û bejnê serwê, e're'r,
Li ser ta pê g'erîqê ez zêrr û gewher.

Li ser pencan dileyzîn ew şîrînsurr,
Şîrîn û şeng û dilber şubhetê durr.

Ji zulfê wan diweşyan¹⁷ misk û enber,
Ji husnê dilrûba yaqût û gewher.

Şîrîn datanî wan ser pence û pê,
Nerm hiltanî zû danîn wekî bê.

Ji hat û çûyînê wan pê û pencan,
Serê mûr û meges nedibû ber encan.

2695 Tielalla ji wan bejnê mubarek,
Tebarek, sed tebarek, sed tebarek.

Ji husnê dilrûbayîn mahê taban,
Sedaê mitrib û çeng û rubaban.

Dilê min bir ji nû baê mecazî,
Bi sed ker kir bi şîrê serfirazî.

Bi şev naê me xew dîsan ji şewqê,
Şerabê saqîyan û çeng û zewqê.

Li pey fincanê yaran zêde mestin,
Dilê min bir¹⁸ bi zulfa xwe vebestin.

2700 Li pey xwe dê bikêşin şubhê tule,
Bi min pur xoşe, ew hal min qebûle.

Kesê negrî bi zulfê ahê tabê,
Dimînî ta abed ew der e'zabê.

Me lew girtine ew zulfê muenber,
Terik nadem bê kuştin camê dilber.

Ji dildaran ji minra her ehed bû,
Letîf û pak û zat û surr¹⁹ semed bû.

Cinûn û mesti bûm ez, dîn û²⁰ ebter,
Ji xemr û saqî û fincanê dilber.

2705 Meken bawer bi hiş bim, ey burader,
Ço eshab el-kehf ta rozê mehşer.

SERÊ XXXIII

*Cimeî bûna rewhanyane bi terz û ayîn we tecrubekirina
şehzadeye bi mêrxasî, qebûlkirina wane bi tehsîn*

Te'alellah ji padşahê muqeddes,
Di bin daêrê çerxê muqeddes.

Çi çê kirye ji şewqê mîm û dalan,
Gelî yaran nezer den zulf û xalan.

Ji qewlê rawîyê surrê heqîqet,
Mutîe' emr û fermanê şerîe't.

Ji cezb û fikir û seyranê terîqê,
Deranî durr di nêv behra e'mîqê.

2710 Binêrin g'emzebazî surmeê çav,
Çi reng rêhtin cewahir, durrê xoşnav.

Ji çerxê hevtumîn û erş û kursî,
Heta heftum zemîn û ga û masî.

Çiqasî ku hebûn enwa'ê mexlûq,
Ebûs û dilber û aşiq û meşûq.

Cemi' bûn ew di nêv bag'ê Êremda,
Ji elhamê wereng kilkem¹ reqem da.

Şefeq da kewkebê purr tali' û bext,
Ji eywanê ehed danîne deh text.

2715 Cewahirbend û zêrr û zêde zîba,
Firaşê lacêwerdî,² xez³ û dîba.

Ji ewwel hate ser yek şahê Şehbal,
Bi iz û şewket û ferxunde îqbal.

Xudanê rojê⁴ şebt û Leylê rabie',
Li ser textê duwem ba bedr⁵ û tali'.

Çeleng rûnişt li ser wêne bi nazil,
Milaik û Ezrayîl û Kesfeyayîl.

Mueyyen ismê wî Meymûnî şahe,
Libasê wî û etbaê sîyahe.

2720 Şehê Muzhib xudanê rojê yekşem,
Di gel Leylê xemîsî textê⁶ bêg'em.

Li ser textê seyem rûnişt bi destûr,
Li ser⁷ nazile Rûqayîlê purr nûr.

Çû ser textê çiharim şubhê lem'e,⁸
Xudanê rojê duşem Leylê cum'e.

Şehê Ebyez xudanê sidq û tesdîq,
Li ser wî nazile Cibrayîl tehqîq.

Xudanê Leylê sebt û rojê sêşem,⁹
Çeleng ew hate ser wî textê pencem.

2725 Şehê Ehmer ewe ba Qehremayîl,¹⁰
Li ser wî nazile hem Semsemayîl.

Xudanê Leylê yekşem rojê çaran,
Çû ser textê şeşim şubhê xumaran.

Bizan ew şahê Berqan bû we bê bak,
Li ser wî nazile Mikayîlê pak.

Xudanê rojê pencşem Leylê isneyn,
Şehê Exzer bizan ew¹¹ quretuleyn.

Li textê heftêmîn ew purr fidayil,
Çeleng rûnişt li ser wî Serfyayîl.

2730 Xudanê rozê cume' Leylê sêşem,
Çû rûnişt ew li bala textê heştêm.

Dibêjînê, şah û Seyid Ebdurrehman,
Li ser wî e'nyeîle¹² hemî an.

Dibêjînê, Zobie'mayîl bi şewqê,
Dixwazîtin gelek aheng û zewqê.

Diger qadîyê wan Meyteterûne,
Çû ser textê nehan ew Rehnêmûne.

Li ser textê dehan ew şahê Qulzem,
Çeleng rûnişt wekî Keyxesrew û Cem.

2735 Emîr û begler û pismîr vewestan.
Diken seyrê cemalê¹³ şox û mestan.

Kirin zewq û surûr û kêyf û aheng,
Bi cam û tas û saz û neg'me û çeng.

Bi emrê Şehibalê¹⁴ sînesade,
Kirin hazîrî dîwan şahizade.

Ji bona padişahan wî xoş dua¹⁵ kir,
Ji duaê¹⁶ dilê cumle heba kir.

Şîrîn gerya edeb zerîn kulahan,
Yekayek bûsî textê¹⁷ padişahan.

2740 Vewesta neyşeker ber sedrê dîwan,
Şefeq da şemsê enwer burc û keywan.

Misala serwê, e're'r, dest li ser dest,
Gelek medh û dua kir şêrê sermest.

Dua û medhê ew reng kes nedîde,
Bi çeşman û ne gûş ez kes şunîde.

Muheyyer man li wî şah û cema'e't.
Li ser wî zêde bûn meyl û mehebet.

Li dîwanê mue'zem şahê Şehbal,
Go: „Ey şehzadeê fexende îqbal.

2745 Tu wer rûnî di gel zerîn¹⁸ kulahan,
Bileîzin fil û ferzê padişahan“.

Şîrîn şehzade leyzand fil û ferzîn,
Di gel şah an wekî azade ber¹⁹ zîn.

Peyade²⁰ rex dida wan padişahan,
Dikir dilxoşîyê zerîn²¹ kulahan.

Di hîna dîti firset hate ewqat,
Li ser piştê feres wî şeh kirin mat.

Di hîna mati bûn²² ew padişaha,
Ji dîwanê revî kelbê sîyahe.

2750 Bi emrê şah li paşan tas û fincan,
Gerandin saqîyan ser dest û pencan.

Ji ewwelda vexwar şah û emîran,²³
Heta dor hate me jar û feqîran.

Ji deh fincan kirin şehzade²⁴ yek reng,
Ji sed rengî dinalî şubhetê çeng.

Di gel çengê dinalî şahê dilsoj,
Dûxanê dil dibû mij pêşberî roj.

Ji mestîyê nebû eqlê wî zail,
Şehan ew purr hejand mislê celacil.

2755 Çiqas çerxandin ew şahbazê Şamê,
Nedîtin nuqteyek jê ne temamê.

Ji dil wî dabû terkî masûwella,
Bi hevra gotinê sed barekella.

Bi meydanê suwarî û nîzebazî,
Kirin tecrîbe ew şahînê qazî.

Muhessel, çendi esbabê kemalat,
Ji wî dîtî bi tertîb û mewalat.

Bi cemi' razî bûn ew şah û begler,
Ji şahbazê²⁵ şîrîn mest û dilawer.

2760 Îlahî min bibey ser wê meqamê,
Ji dil dûr key mij û dûd û g'emamê.

Elîmî tu bi esrarê quluban,
Dibînî cumle qencî û uyûban.

Ji bo nuqsanîyê ma tuyî cebbar,
Gunekarem nehî g'eyrî tu g'efar.

Big'efrîn, ey g'efûr, zenbê Sîyahpûş,
Ji camê muhbetê ke mest û medhûş.

Were ey saqîyê mest û xumarem,
Ji minra bîne fincan, zulfê yarem.

2765 Wekî zincîr û g'eluwan ez kêşandim,
Serê wan efiêyan dil herîşandim.

Were mitrib di gel çeng û bilûrê,
Mufferreh ke dilê şeyda ji nûrê.

Dixwazîtin dilem nûrê tecella,
Beyana surr û esrarên mualla.

SERÊ XXXIV

*Tecribakirina şehzadeye bi eqî û ulm û merîfetê we
xemilandina Bedîe ba-Cemalê bi zêrr û zînetan ji bo erûsê
û dewetê*

Bi emrê padişahê padişahan,
G'efûrî, asî û sahib gunehan.

Dibêjim bo te çend xal û nişane,
Nezer ken hûn ji qewla¹ durrefşane.

2770 Çi xoş go Şehêbalê² sînesade,
„Eger tu waqîfî, ey³ şahizade.

Sualatê mera⁴ tu bide cewabê,
Ji erfane dil û ulmê⁵ kitabê“.

Dibên, şehzade go: „Ey şahê Êrem,
Mufferreh bin⁶ ji te qelb û zemîrem.

Eger min zanîn ew, dê⁷ bidem cewabê,
Weger ne, şahê,⁸ ez rahê sewabê.

Biket efüyê gunahê bendeê mîr,
Sualatan kerem ke, ey cihangîr“.

2775 Ji ewwel Şehêbal go şahizade:
„Munewwer bî dilet ez rengê bade.

Ji dunyaê bibêje, ey şîrîn can,
Çi nêzîktir heye bo ins û bo can?“⁹

Go: „Ey şahinşahê purr lutf û ihsan,
Mîrin nêzîktire bo cin û insan.¹⁰

Ji karê kirdîkar kes pê nîzanî,
Ê baqî, her ewe dêket¹¹ me fanî.

Hezar sal umîr bûrî şubhê xewne,
Di wextê neziê her ew hal û kewne“.

2780 Di dûra gotî Şehbalê şîrînsurr:
„Ji mêran û jinanda¹² ew kîn purr?“

Go: „Ey şahinşahê mest û dilêran,
Mueyyen pîrtîrin jin her jî mêran.

Çira? Ê ku jinî, bê qeydî ew jin,
Jî jin hem kêmtîre ê tebiê jin“.

Diger go şahêbazê mest û sefdurr:
„Jî miryan û jî sag’an ew kîne purr?“

Go: „Ey şahê tebîbê derd û dag’an,
Mueyyen purtîrin mirdî¹³ jî sag’an.

2785 Çira? Her çî mirî, carek dî naê,
Çî sag’î ku hene dêçîn¹⁴ fenaê.

Kesê bi qewlê jinê kir,¹⁵ her mirîne,
Mebên sag’in, bi sag’î wan mebîne“.

Li paşan got Şehbalê şîrîn nam,
Bî şehîzade emîrî Misîr û hem Şam.

„Jî minra bêje, ger tu nîktedanî,
Xîrabe zêdene, yan abêdanî?“

Go: „Şaha, zêdene¹⁶ herçî xirabe,
Çi avai¹⁷ xirab dêket wehabe.

2790 Êmaretê dilê can çêtire, ey yar,
Ji êmaretê cîyê dar û dîwar.

Dimînit yadêgara dil xeberdan,
Xirab dêbîti qesrê dar û berdan“.

Go: „Ey şehzadeê sahib surûre,
Bibêje da ji insanan çi dûre?“

Go: „Şaha, dûre ew¹⁸ dunyaê fanî,
Kesê cahil nebî xoş pê dizanî.

Kesê mir jê dibîtin bête’det dûr,
Çi cardî¹⁹ nabînî wî pîrê bê nûr“.

2795 Şehê Şehbal go: „Ey emîrê²⁰ sermest,
Ji ecisadan çi tişte kêmîr we pest?“²¹

Go: „Ey Şahem, cesed bê ku nefes ma,
Bi pûlek na hêjî, ew ten ebes ma“.

Go: „Ey ferzend, çiyê purrtir di tenda“.
Go: „Ew şekke di nêv can û bedenda“.

Go: „Ê taltir çi tişte di vê²² dinêda?“
Go: „Destengî û derwêşî ku têda“.

„Ji dunyaê firehtir,-go,- çi tişte?“
Go: „Ew qelbê ku qane’ , wek fereşte“.

2800 „Çi tişte, ku ji seng û ber qewîtir?“
Go: „Şaha, ew dilê bê dînî,²³ kafir“.

Go: „Şirîntir çîye der qelbê insan?“
„Tekebir,-go,- şîrîne, ey purr ihsan“.

„Ji agir,-go,- germtir ew çi tişte?“
Go: „Ew qelbê herîsê pîs û zîşte“.

Go: „Ê bêtir çîye ez zemherîr sar?“
Go: „Ew bêhîvîbûnê meqsed û kar“.

Go: „Esqeltir çîye ji kuh û cîbalan?“
Go: „Ew buhtane, ey şahê delalan“.

2805 „Ji ruhê,-go,- bibê, da ew çi tişte?“²⁴
Go: „Ew emrê heqe, rebbê fereşte“.

Go: „Ey şehzadeê şîrîn cenabe,
Bibê, kengê dê rabîtin hisabe?“

Go: „Şaha, ew yeke ez penc xewasan,
Nizanî kes bi wan ez a'm û xasan.

Tenê ew pê dizanî, ê di nêv bag',
Gulan reng-reng didet, miryan diket sag'.

Xudayek zulcelal û bê nezîre,²⁵
Li ser eşyan hemî yekser qedîre.²⁶

2810 Li me nêzîktire ji heblul werîdan,
Li ber wî xef nihîn²⁷ surrê ebîdan“.

Ku dî wan padişahan şahezade,
We rengî purr kemal û sînesade,

Bi hevra gotinê: „Sed barekella,
Xudê tofiqê da, nasrûn mîn ella“.

Kirin şehzadeê Misrê muxelle',
Ewan şahan bi heft tancê²⁸ muresse'.

Durr û gewher bi ser wîda weşandin,²⁹
Gulab û misk û enber lê reşandin.

2815 Gelek xoş bû dilê şahê şirîn nam,
Ji dil bûsî ser û çeşmê şehê Şam.

Go: „Ey ferzendê dilbend û temîzem,
Bi to bexşîdem ewladê ezîzem“.

Gelek xoş bû dilê ehlê cemaet,
Li ser hukmê zebûr û qewlê tewrat.

Girêdan eqdê inkahê du yaran,
Muferreh bû dilê mest û xumaran.

Îlahî tu muferreh key dilê ma,
Bi dîdarê wusalê sorgulê ma.

2820 Wekî bilbil binalînim³⁰ şev û roj,
Bibûsim rûyê werd û le'lê pişkoj.

Bi emrê padşahê serfirazan,
Di gel çeng û ribab û tebl û sazan.

Melaik nisbetan bir şahizade,
Xudamên horîreng bir³¹ sînesade.

Birin herdu uşaqê³² mest û mexmûr,
Li hemamê bişûn ew canê purr nûr.

Di nêv quba çû çerxê lacêwerdî,
Hilanîn perde heyv û rojê³³ erdî.

2825 Ji ewwel şûştin ew şahzadeê şeng,
Bi avê gul vemaalîn canê gulreng.

Ji pakanra çî hacet şûştin û av,
Ji wanra lazime yek leme'ê tav.

Libasek padişahî kirne berda,
Ji wê bedrê me bes ev reng xeberda.

Welakin durrê burcê şahê Şehbal,
Yekayek zulfê enber ser wekî dal.

Ji hev pişkavt û ez ser ta bi daman,
Ji mîyman lam kirin dûr wan xudaman.

2830 Belavbûn taê enber ber roê gul,
Yekayek helqe-helqe mislê sunbûl.

Li ser ferqê wekî miskê reşandin,
Gulavê germ û germ enber weşandin.

Wekî meşate pêda anî şane,
Muenber ta bi ta bûn, dane-dane.

Li ser canê wekî kafûr belav bûn,
Ji avê gul tijî xuh û xunav bûn.

Bilûvkî hevrişim pembûyê jendî,
Vemaalîn şewqida nûrîn ji rendî.

2835 Nerm bû bê e'ded ew canê kafûr,
Muşeweq husnû ha nûrin ela nûr.

Wekî şûştin sera-pa canê enwer,
Vehûnan yek bi yek zulfê muenber.

Nerm avêtine ser libsek muneqqeş,
Heta xuh da, hişk bû canê mehweş.

Kirasek kirne ber canê şîrînê,
Ji hewrîşmê muneqqeş, karê çînê.

Ji işqa wê mîsala mahê yekşew,
Zeîf û zerdî bûn Ferhed û Xesrew.

2840 Kirin mehbûsê qeydê zulfê şebreng,
Gelek mecnûn sîfatê bê mey û beng.

Li ser ferqê wekî miskê bi du şeq,
Şîrîn danîn û tacek³⁴ zer muşeweq.

Ji elmas û durr û yeqût û cewher,
Selasil³⁵ secde bir ber zulfê enber.

Gul û rêyhan muqabil bûn di bag'an,
Muanber xaleha teşbîhê zag'an.

Çi hedê gul di gel wechê munewwer,
Miqabil bît û rêyhan zulfê dilber.

2845 Welakin min ji bêfehmi xeber da,
Di gel wê gofteê dil sed keser da.

Ji libsê sundus û istebreqê rend,
Şîrîn xemlî sera-pa ew şekerxend.

Ji sed rengî kirin ber libsê faxir,
Ji gerdên rêzi-rêz durr û cewher.³⁶

Guharên şebçirag' asa çu perwîn,
Mucella bûn di gûşê mahê rengîn.

Cebînbedra munewwer bû du heftê,
Li bala zulfê enbersa nehufte.

2850 Wekî heyye û eqariban bi gerr bûn,
Di gel dildar û meczûban bi şerr bûn.

Gelek kuştin bi herban a'rebê reş,
Gelek mecnûn kirin mestane bê heş.

Muqewwes ebrû weş miskên suwadîn,
Di binda elifek û du e'yn û sadîn

Ço elfê katibê xet lê kêşandî,
Li ser ta pê bi zêrrabê reşandî.

Di gel nûnan bûyî teşbîhê du dal,
Ji durrek ser muneqçeş şubhetê xal.

2855 Gelek kuştin bi rû û elf û sadan,
Gelek bexşîn miradê bêmiradan.

Lebê le'leş şîrîn mest û mey û beng,
Çû durcê durr, dehen wek g'unçeê teng.

Cewahir nisbetî sinên wek elmas,
Muredbexşê dilê sed Xidir û Ilyas.

Zuban şîrîn, şekerxah û şekerrîz,
Bi remz û keyd û fitne hîleengîz.

Ji keydê wî xilas nabin çu erwah,
Şua'yê şewqê xeddêyna çû misbah.

2860 Şîrîn û şeng şoxe ew şekerleb,
Zeqen sîm çahê zemzem, sêbê g'ebg'eb.

G'ezalîn gerden û çeşmanî ahû,
Du nûnên ser-nigûn qewseynê ebrû.

Ji tîrê mêje û qewseynê yengî,
Dilê mecrûhê men bû mest û bengî.

Bi husnê gerdena teşbîhê a'cê,
Dê bistînî ji ahûyan xeracê.

Ji hind û çîn û tirkistan û zengî,
Bixara û Xorasan ta Firengî.

2865 Ji şerq û g'erbêha distînî gerden,
Xeracê dilrûbayî ta bi merden.

Eceb gerden ku maran lê şer û ceng,
Cewahir lê bi zêrrê reng û ber reng.

Ji medhê gerdenê nabit temame,
Eger bêjim hetayî „yaum el qîyame“.

Dû narincin, ter û zîba û mehbûb,
Li ser sedrî çû ferfûrîne mektûb.

Nizanim leymûnin, yan sêbê narîn,
We rengî mest û zîba û xumarîn.

2870 Ji e'ynê kafûrin ew du hebabe,
Diden qelbê uşaqan ez-tirabe.

Tufeylê işqê meyxwarem çû mestan,
Mirad û meqsedem goyê du bustan.

Muhessel, qed wekî serwê û e're'r,
Ji nazdarî vexwarî avê kewser.

Kemberbestin li bejnê³⁷ şubhê e're'r,
Li ser piştê ji hevrişmek di gel zer.

Murekeb têk vedaê ta wekî mû,
Serê saçag'ê wê ser dan bi ejnû.

2875 Cewahir lê muselsel rêz ber rêz,
Ferehbexş û dil estîn û dilawêz.

Cewahir kirne engûştê hena reng,
Ji wê şewqê şefeq da daneê seng.

Kirin zendan cewahir, zêrr û³⁸ bazin,
Rewanê³⁹ aşiqan yekser dixwazin.

Mukemmel xemilî canê⁴⁰ wekî nûr,
Li ser textek zerîn danîne ew hûr.

Kirin zewq û surûr û kêyf û aheng,
Vexwarîn şerbet û şîr û⁴¹ mey û beng.

2880 Zuleyxa nisbetî daxwaze Yûsuf,
Surûrê⁴² mujde da camê teasuf.

Çehvnêre li Leyl Mecnûnê aşiq,
Li derda bê wekî Ezra û Wamiq.

Ji berbaê nesîm efşan bibit gul,
Ji sed destan bixuynî gul be bilbil.

Were saqî, tu bîn camê meya saf,
Vexum ta seh bikem menaê keşaf.

Ji le'lê camê tê mizgîn peyapey,
Dilê miryan ji wê camê dibit hey.

2885 Were mitrib di gel çeng û ribabê,
Bireqisim, fir bikem camê şerabê.

Dixwazim sewtê mitrib û mey û beng,
Me navên nam û namûs, şerr û ceng.

SERÊ XXXV

*Zifaf we xelweta bûkê û zavê û xilasbûna wane ji firqetê
we wê davê*

Tecellaê şefeq da badenûşan,
Dilê meyxarî bû pîrr tabê çoşan.

Misala zerreê bê dest û payî,
Bi reqsan çû teleb şems û¹ ed-duhayî.

Bi zewq û kêyf û xoşî û bi aheng,
Melaik nisbetan bir canê gulreng.

2890 Ji ber dergahê burcê zuhra danîn,
Hicab û perdeya şermê hilanîn.

Sifet horan li hev nêrîn, ku rabin,
Ku Mecnûn û Leylê ba hevdu şabin.

Bi derkeftin bi hevra ew şekerxa,
Ji Yûsufra tenê ma ew Zuleyxa.

Selam kir şahizade mislê bilbil,
Ji şewqan pişkivî² leb g'unçeê gul.

Di gel redê selam rabû pê ew şem',
Di gel perwane kirdin sohbet û cem'.

2895 Vexwarin şîr û mey û şehd û şeker,
Bi le'lên badenûş û mest û ehmer.

Heta heft saetan mest bûn bi hevra,
Di destanda bih û ezman di devra.

Guvaştin aşiqan hevdu bi yarî,
Ji bûse mest bûn le'lên xumarî.

Çi xoş bûs û kinar û badenoşin,
Şîrabî û xumar û mey firoşin.

Ji şerqê, meg'ribê ta fecrê sadiq,
Kirin zewq û sefa Ezra û Wamiq.

2900 Sulêyman nisbetî Belqîsê sanî,
Cewahir kun kirin surrê nehanî.

Di behra zeynetê masî g'eriq bû,
Bedexşan qetre-qetre lê feriq bû.

Ji cezb û lerzeê seyrê³ terîqet,
Mecazî çû gihîşte ser heqîqet.

Ji behrê wehdetê çûn hewzê kewser,
Kirin g'uslê dilê dana we⁴ dilber.

Gulab û misk û enber lê reşandin,
Bi ser yek da cewahir purr weşandin.

2905 Ji koşe sohbetê rûniştin ew yar,
Heta çil roj û çil şev çû bi ejmar.

Çi bêjim, halê uşaqan bi defter,
Temam nabî⁵ heta rabîti⁶ mehşer.

Umir nîne ji minra ez bibêjim,
Di medhêda cewahira birêjim.

Were saqî, tu bîne camê wehdet,
Ji⁷ koşa sohbetê purr zewq û lezet.

Bibûsîn le'lê camê mestîyê ma,
E'dem bîtin wucudê hestîyê ma.

2910 Were mitrib di gel tenbûr û u'dî,⁸
Bibêje neg'meê terkê wucudî.

Bibir wawê wucudê suhbetullah,
Dibît pêyda û terkê masuallah.

SERÊ XXXVI

*Derketina şehzadeye ji gêrdek û zîyaretya Şehbalê û afrîn û
duaê wîye ji wanra bi qedrek*

Ji enwarê tecellaê îlahî,
Nesîmek hate ser rengê sîyahî.

Çi¹ misk û enberin yan zulf û xalin,²
Yeqîn nexşek ji nexşê zulcelalin.

Ji perdê hefti rengî hate der bedr,³
Munewwer, tele't û mexmûr û dil sedr.⁴

2915 Xiramîn, nazenîn şahane rengî,
Muheyyer man li wî mexmûr û bengî.

Heta çû neyşeker westa li ber şah,
Şefeq roj û munewwer şubhetê mah.

Wekî azade serwî bi tali' û bext,
Temenna kird, bûsî⁵ payeê text.

Sucuda mehbete qed kir wekî dal,
Muferreh bû li wî purr şahê Şehbal.

Bi destên xwe⁶ moberek ser hilanî,
Li secde û⁷ go: „Ey yaranî canî.

2920 Moberek bin⁸ li te ew cam û fincan“,
Bi ser wîda reşandin durr û mercan.

Çiqas ehlê dîwanê, şah û yaran,
Ecma bûn ew⁹ li ser şubhê xumaran.

Di hîna qudretullah¹⁰ hatê dewlet,
Ji jorda ew dibarî¹¹ ser te rehmet.

Ji rehman û errehîmê hey û qeyyûm,
Tecella det dilê danaê meg'mûm.

Selamê hamilanê e'rşê her şeb,
Di gel cemi'ê milaikêd muqereb.

2925 Di fecrêda dêbîn ser te peyapey,
Ji şewqan dê binalî dil wekî ney.

Ji ceberûtî û melekutî¹² û lahût,¹³
Muqamatan dibînî ta bena sût.¹⁴

Çi rengî qaimin cemi' melaik,
Di ber emrê şehê nûrîn araik.

Bê xwab¹⁵ û xurdenin ew bextê feyroz,
Di emrîda¹⁶ muqîmin her şeb û roz.

Çi xoş taet dimînin der qîyamê,
Ji şewq û hubê ta yaumilqîyamê.

2930 Ji rake di wan min nîne hesûde,¹⁷
Welê zêde ji wanî der sicûde.

Çi xoşe secdeê mehbûbê canî,
Di wî secde bibî canê me fanî.

Îlahî tu ji bo min key nesîbe,
Sicûde murdenê pêşî hebîbe.

Siyahpûş purr g'erîbe mubtelaye,
Muradê wî ji te hub û ridaye.

Şerabê saqîyan nadem bi kewser,
Sicûde dilberan sed¹⁸ textê qeyser.

2935 Wekî kelbim di ber yaran dibim renc,
Ji yemlîxa dixwazim payeê qenc.

Wekî Leylê em û Mecnûn sifati,
Ji ednayê dibînim ez necati.

Ji renc û hem cefaê xwe edem kir,
Nesîbê xwe di esrarê qîdem kir.

Ji jorda xwe diavêt ez bulendî,
Nesîbê wî dibîtin rencê kendî.

Were saqî, werîne camê rahet,
Şeh û şehzade ji yekî bin bi firqet.

2940 Binoşim ku lebê fincanê mazi,
Bibim Mecnûn li pêşî tu û qazî.

Were mitrib bi saz û u'd û tenbûr,
Sedaê xoş ji saz û nay û sentûr.

SERÊ XXXVII

*Şiyandina Şehbale wana bi bal Misrê we zavabûna
Sedelmuluke bi Melke li ser rê û gihîştina wane bal murad
û zivirîna erdê Misrê*

Tecellaê şefeq ku roj bi derket,
Dilê dana mueref çû bi ser ket.

Li dîwanê şehinşahê muezzem,
Dibên, şehzade çû nik şahê ekrem.

Vewesta neyşeker ber sedrê dîwan,
Misala zerreê roj û heyîvan.

2945 Dibên, Şehbalê alî gote: „Ey meh,
Eger bûyî tu mehzûn û li cem me,

Ji bo te izne, ey yaranê meg'mûn,
Niha bab û dîya te bûne mehzûn.

Niha ew bûn ji bona te nerahet,
Vexwarin wan ji bo te camê firqet.

Bibêj bo min, tu hez key te bişînim,
Ji vê qenciyê selahet¹ ez nabînim“.

Welê Seyfulmulukî hem rida da,
Li nik serwê banû xoş² cewab da.

2950 Wele serwê digo şehzade mexmûr,
„Bisek car dî biçim bixwazim³ destûr“.

Muhessel, carek⁴ dî şahê şîrîn nam,
Dida destûr ji bo şehzadeê Şam.

Di wê gavê kirin hazir ji bo mîr,
Ji hed zêde newadir û⁵ cewahîr.

Meta'ê misk û enber, zêrr û gewher,
Temam nabit, çi binvîsim bi defter.

Ji qewlê rawîyê şîrîn exbar,
Hezar e'frît li wê malê kirin bar.

2955 Verêkir⁶ Şahêbalê dilmunewwer,
Ji bo şehzadeê şîrîn dilawer.

Hezar şîrîn g'ulamê nîke mehzer,
Li ser ta pê g'ereq ez⁷ zêrr û gewher.

Hezar dî carîyê wek avitabê,
Didan te'ne li rûyê mahitabê.

Sera pa xemilîbûn ew şîrîn xal,
Ji dîba û durr û zerîn û xelxal.

Temam mest bûn şerabî û şekerleb,
Dihen g'unçe ji qudret sêbê g'ebg'eb.

2960 Hezar dî carî û g'ulmanê canî,
Verêkir şah ji bo Belqîsî sanî.

Ji bo destûrê bûn ew êtifaqê,
Vexwarin şerbetê camê firaqê.

Qedê Şehbali bû teşbîhê dalê,
Ji huznê firqetê ebrû hîlalê.

Girî teşbîhê baranê nîsanê,
Cewahir rêz kirin wê durrefşanê.

Li werdên sor⁸ dibarî xoş gulabe,
Ço doxterê dî we rengî rûyê babe.

2965 Ji dil ahek kişand teşbîhê nare,
Ji wê ahê ceger bûn pare-pare.

Mirarî rîzi⁹ bûn û¹⁰ baderengî,
Li ser husna şîrîn û mest û bengî.

Ji hizn û nalîyê hem¹¹ serwebanû,
Binefşe nisbetî serda bi e'jnû.

Bi reng-reng zêde kir nûrîn cemalê,
Qedê serwê letîf û şubhê dalê.

Di gel wê girîyeyî serwê semenber,¹²
Ji dil bûsî rûyê wê xûbê doxter.

2970 Di gel wê bûsî destê maderê xoyîş,
Meha nûrîn liqaê sîne purr îş.

Dua û medhê kir hem bê hisaba,
Di gel wê bûsî kef û pîyê baba.

Li paşan rabû bûsî dest tamamî,
Di gel iz û kerem, go: „Es selamî“.

Dibên, şehzadeê mest û dilawer,
Ji dil bûsî kefê Şehbalê serwer.

Bi destûr û bi izazek tamamî,
Li pêş wan rabû ew şehbazê Şamî.

2975 Muheywe kir ji wîra textekî zer,
Muleme' bû tijî elmas û cewher.

Dused men bû muzeyyen durr û mercan,
Kirin hazir li pêş şah, wan nedîman.

Şehê Şehbal we namekul selamî,
Di gel izaz ji bona şahê Şamî.

Verêkir name, paşê go peyame,
Ji bo Saliho Poşîn îbin Hame.

„Selam ken hûn li a'm û hem xewasan,
Xisûsa bab û dan, cumle we nasan“.

2980 Li paşan ku ji bo wan kir wesyet,
Dibarin wî ji çavan etkî şewqet.

Şahê Şehbal bi tertîb û bi temcît,
Kirin ahazir li wê dused efarît.¹³

Emir kir ser e'frîtan, hilînin,
Gelek alem teecub jê bimînin.¹⁴

Muessel, wan hilanî doxter û şah,
Li bala xoş dikir wan hem¹⁵ temaşa.

Hilanîn textê zer¹⁶ cumle bi nazdar,
Dused kes bûn, tamamî ew bi ejmar.

2985 Bi cumle rakirin bala bi yekser,
Eger şah û eger etbai û doxter.

Li bala wê dua kir wî bêhed¹⁷ eفزûn,
Di gel hemd û sena çû durrê meknûn.

Bi cumle çûn û hem bêderd û asîb,
Heta ku daxil bûn şehre Serendîb.

Bi zewq û kêyf û şadî û bi inwan,
Serendîbê neman ger pîr û ger can.

Bi cumle hatine vêkra temaşah,
Di gel Melke û Bedre, hem zenê şah.

2990 Di gel şahê Serendîb Sedê şeker,
Bi vêkra¹⁸ hatine cem şahê dilber.

Gulab û misk û enber lê reşandin,
Cewab Tacelmulukra wan şihandin.¹⁹

Dibên, şehzade û Sedelmuluk şah,²⁰
Li dîwanê rûniştin ber berê şah.

Vexwarin şerbet û şîr û mey û beng,
Wekî mexmûrî bû şehzade ew reng.

Ku ehwalê gozeşte wî xeber da,
Dilê wî ah û efg'an û keser da.

2995 Hewalê xwe ku çû ba şahê Qulzem,
Ji wanra got û cumle bûne mulzem.

Welakin, wan digo: „Eşkurulillah,
Bi xêr hatî, hezar û hemdulîllah.“.

Li paşê hefteyek Tacelmuluk şah,
Dibên, hatin bi cumle, çûn temaşah.

Bû²¹ şadî û kêyf û hem surûre,
Li paşî çendi rojan bû²² mirûre.

Welakin, Bedre û Melke, zenê şah,
Mudamî bûn li nik Bedîe çûn mah

3000 Wekî²³ muqdarkî bûrî, go: „Ey Sed,
Tu çawanî? Bibêj, ey yarê dilbend“.

Bedîe ba-Cemal go: „Bo min ehwal,
Tu bûyî aşiq li Melke, hal û ehwal.“²⁴

Bibêje halê xwe bo min nihayet,
Temamî derd û kesran, hem melamet“.

Digo: „Şehzade,²⁵ dimrim, nîne derman,
Meger tu bibî²⁶ Efleton û Loqman.

Xeber me ji hev heye, weqtê tu çûyî,
Dilê wê purr heye min bo te gûyî“.

3005 Li paşan hate nik şehzade Melke,
Go: „Ey mahî, hewalê xwe tu helke.

Bixwazim te ji bo Sedelmulukî,
Bi iznê şah û hem Tacelmulukî“.

Muhessel, Melke razî bû cewabê,
Da şehzadeê mexmûr²⁷ ez-tirabê.

Dibên, wê gavê şehzade çû nik şah,
Hewalê Sedî gotê hem di gel mah.

Welê şeh got: „Ey yaranê canî,
Ewe carîye ji bo te, tu dizanî“.

3010 Li paşê wî ji bo Sedê dilawer,
Çû bûsî yedê şah xweste mehê enwer.

Li paşan kirne şadî-yû nişate,
Di gel xwe anîn şerbet û simate.²⁸

Kirin dawet û kêyf û bû surûre,
Di gel saz û ney û u'd û tenbûre.²⁹

Heta heft roj û heft şev wan temamî,
Kirin zewq û surûr û şahê Şamî.

Li paşî heftêyek şah da wekalet,
Bi şehzade dilê wî bû³⁰ rahat.

3015 Girêdan eqdê nikahê du yaran,
Mufferreh bû dilê mest û xumaran.

Heta behsê me hate weqtê gerdek,
Ne bû qet wêderê esla çû ferdek.

Bi hevra wan dikir kêyfi û şadî,
Heta ew çûn gihane wî muradî.

Di weqtê ku bi derkeftin ji gerdek,³¹
Wekî roj û heyvê çû û³² bi ser ket.

Muhessel, man li wê sê mah temame,
Li wî bûn muntezer xas û ewame.³³

3020 Ji qewlê rawîyê mîzanê mewzûn,
Dibên, Şehbal û serwê bûn bi meg'mûn.³⁴

Şehê Şehbal di gel serwê û peryan,
Hemî rabûn û hatin şubhê bazan.

Ku ew dîsan bi hev bûn şad û bêg'em,
Bedîe ba-Cemal çû wê demê cem.

Ku wî dî rûyê mader xoş û babe,
Dibên, çû balê wan û hem hêcabe.

Kirin zewq û surûr û kêyf û aheng,
Vexwarin şerbet û şîr û mey û beng.

3025 Kirin şehzade û Sedê muxelle',
Bi tacên zer, libasanê³⁵ mulemmê'.

Ji wan wan dûr bûn cefa û derd û zehmet,
Ji qelbê wan biderket kerb û heybet.

Di hîna eskerê zulmetê çû meg'rib,
Tilu'ê fecrê da bag'ê Serendîb.

Li paşê bû tilûi' şahê nihûman,
Munewwer kir xewas, hem ewaman.

Ji xew rabûn tamam, şah û begler,
We reng şahzadera bû dil munewwer.

3030 Xiramîn ber bi şahî bi nik mexmûr,
Çû kir qesdê bixazîtê we destûr.

Çira ku wî dikir purr cehd û fexrê,
Ku ew wasil bibî der şehre Misrê.³⁶

Muelqisse, dibên, xoş xustî destûr,
Ewî şehzadeê gel Sedê mexmûr.

Dua kir hem ji wîra şahê mehrû,
Di gel Tacelmuluk û serwebanû.

Dibê, bû huzn û gahek rabû dîsa,
Di hîna meşe'la hubê we îsa.

3035 Kirin tecrîzî Melke wan bi carek,
Heçî layîqî bijarin wan mubarek.³⁷

Melekezade, dibê, hat bê nezîre,
Dibê, bûse dida du³⁸ destê mîre.

Li paşan rabû bûsî destê mamî,
Di gel iz û kerem go: „Esselamî“.³⁹

Muhesel, xwastê destûr wê ji babe,
Ji serwebanû û hem purr hicabe.

Bi emrê şahê Şehbalê munewwer,
Cemi' bûn û efarît cumle yekser.

3040 Kirin hazir efarîtan bi carek,
Ji boy çûyîn kirin wan xweş tedarek.

Li wan bar kir ewan durr û cewahir,
Ji enwa'ê meta'ê cumle nadir.

Emir kir ser efarîtan hilînin,
Di gel hurmet, ezyet ew nebînin.

Meger ew çûn hılanîn wan e'farît,⁴⁰
Kirin seyran û geşt û kêyf û temşît.

We reng rabûn wekî ebr û nemê,
Bilind bûn û berê xwe dane Şamê.

3045 We rengî ew diçûn bi kêyf û dilxweş,
Nebûn esla ji wan şeyek muşeweş.⁴¹

Bi rê⁴² bûn ew bi şadî û bi fexrê,
Heta ew çûn gihane qurbê Misrê.

Bi sê saet ji Serendîbê bi Misrî,
Ewan çadir vedan û hem fecrî.

Didan destûr efarîtan, ew çûn,
Mufferreh ber miqamê xwe ku ew çûn.

Cewab çû şahê Asimê munewwer,
Go: „Hat Seyfulmuluk û cumle yekser“.

3050 Cewab ku çû şehê Asimê mubarek,
Di gel şoxa yemenî kir tedarek.

Dua kir wî ji bo xaliq sena kir,
Secûdê şukrê wî kafi eta kir.

Wekî Asim ku dît û rûyê Sêyfi,
Dibê, bûsî serî û Seyf û kêyfi.

Emir kir wî bi çawîş û delalan,
Seda kin, kes nemînîte di malan.

Çiqasî hebûn xelq di Misrê,
Hemî bûn şad û kêyfxoş wekî bedrê.

3055 Buhurîn ew ji surûrê û ji şadî,
Heta ew çûn gihîştin wî miradî.

Miradê wan ku hasil bû bi sehet,
Ewe qenc, em bikeyn vê qissê temmet.

DAWÎ

BERHEVDANA HERÇAR DESTNIVÎSA

SERÊ I 1.Ev beyt di destnivîsa B, C, D-da tune; 2.B: hem; 3.A: kirya be; 4.A: Li ser da; 5.B: çû; 6.B: Virê key; 7.B: Ku serxoşim ji îşqê;

SERÊ II 1.B: e'rfan; 2.A: Ku Îsmayîl û çû key ber teesuf; 3.B: hespê; 4.B: rehmet key; 5.B: tesedduq da be yetîm û esîran; 6.A: rûnişt û; 7.B: besîr û hem elîmî; 8.A: fedl û; 9.B: Bi; 10.B: çû; 11.B: gunehê min; 12.C: gunahê min estafg'urullah; 13.B, C: zahir; 14.C: Kerîm; 15.C: Bi hirmetê resûlê teyî kerîm; 16.A: hurmetê; 17.C: el-semed; 18.C: kebîrî; 19.C: Ji Xudara ew yaran; 20.C: Xudaê tu bexşî bo te ewlad; 21.C: heta; 22.Ev beyt tenê di C-da heye; 23.B: xwe ku; 24.C: Hemî hatin û westan ew li dergah, Di gel Salih bikin tedbîr ji bo şah; 25.A: hat û; 26.C: Bi hevra wan go, ew; 27.C: Di xaliwê çî bit; 28.B: Çû; 29.C: Çira çewa ava bî bajar sewabe; 30.C: Qedem nî ser serî em dê biçin pêş; 31.B: çû; 32.C: Cîmaet; 33.C: Li; 34.A: jarî; C: em bêjin; 35.B: çapik; 36.C: ehê alîreza da mislê şeker, Ji lebê şîrîn diretî durr û gewher; 37.B: Be cumle hatin û; 38.B: bûsî ew textê; 39.C: Ji bo; 40.B: Çû; 41.C: ehadîs dibit deyail; 42.C: mekanî; 43.C: Hîvîdarî ji şahê purr teheyûr; 44.C: emanê bû; 45.C: bimirin; 46.C: Eger şah û gedayî, ger wezîrin; 47.C: Welê; 48.B: tu xwe baqî; 49.C: Di dunyâê ku xwe baqî nebîne; 50.C: mane û bais; 51.B: çû; 52.B: bît; 53.B: Me rû lew; 54.B: gunahan û; C: Bibexşînî vê gunehê hem; 55.B: narinc.

SERÊ III 1.B: Li ser ta penc poşî kurk û qaqim; 2.B: çûn çêrîn dîsan di hevda; 3.B: lêdîdan tenbûr bî sed reng; 4.B: xwestin; 5.B: sertan; 6.B: cediyû; 7.B: G'erq; 8.B: Pes ez dewatê û efyatê; 9.C: Bide min doxterê; 10.B: verê kir; 11.C: elmast; 12.B: Verê kir; 13B: bulengan; 14.B: Biçin em wan; 15.A: Dada; 16.A: rêda; 17.B: dê biçît; 18. B: nînin; 19.A: dabûn; 20.A: Qehtan û.

SERÊ IV 1.B: kirne; 2.A: pêncax û; 3.A: da; 4.A: hûr û; 5.B: xwend; 6.B; C: bedel kir; 7.B: çendan.

SERÊ V 1.B: cam; 2.A: Di gel Saliho rabûn çûn begler; C: yekser.

SERÊ VI 1.C: Di navda g'ulg'ulîn; 2.Beytên Nr. 303-305 di B û C-da tunene; 3.C: Îkî yûz bêş tamam altê û şeş; 4.C: Îkî yûz alte meş deve

qetre sîme; 5.B: şah; 6.C: Keldîler wê; 7.B: Kejaweh; 8.B:mehrê; 9.B: Bajar; 10.A: anî; 11.B: çehvêd; 12.B: gul; 13.C: Cubhet wekî bedrêye ji xetê reş misalê; 14.B: mislê; 15.C: Bejnê; 16.C: qerefil; 17.A: şems û; 18. B: guharan; 19.B: nînin; 20.A: sîm û; 21.C: tirî yû leymûn û sebalê; 22.B: du.

SERÊ VII 1.B: murg' û; 2.B: wek; 3.C: horyan; 4.C: şah kir bi firyaz; 5.B: dan; 6.B: şahê Asim; 7.B: dane; 8.C: Telalan; 9.A: Bi Saliho got û wî; 10.B;C: perwaz; 11.B: du; 12.B: Verê; 13.C: Ji tali'ê wan; 14.C: cewlaz; 15.B: Sedê; 16.B: Nihin wî; 17.C: zêr û zîv; 18.C-da tune; 19.C: pirsan; 20.B: feyzê; 21.D: Li; 22. B: Çû; 23.Ev beyt ji C hildaye; 24.B: Wekî wan nabe; 25.B;D: wan; 26.B: rexê; 27.B-da xoşxet bi herfê hûr şirovekirye „Îsmê Sîyahpûş“.

SERÊ VIII 1.B: Di alemda gera ew reng xeberdan; 2.B: çû; 3.B;D: Ku ulmê wan mînane beyta ber kef; 4.B;D: Asef; 5.B: şerqê; 6.B: çû; 7.B: şah; 8.B;D: tacê; 9.A: deranî; 10.A: bûn û ; 11.B: Ewîn, go, hîv û roj; 12.B: çû; 13.B: çûn bi; 14.B: Du car nehse derzar; 15.B: çû; 16.B: Zehrab; 17.C: G'enî; 18.A: werşen; 19.B: qende nava; 20.C: Di meclîsê gerandin, xweş vewestan.

SERÊ IX 1.B: Di xewla kir; 2.A: da; 3.C: destên; 4.B: sermest; 5.B;C: enberîn; 6.B: bûn gurcî; 7.B: û mehbûbê dilkeş; 8.D: hev; 9.B: Ji; 10.B: û têlê; 11.A: kebkan; C: kevokan; 12.B: nesrûr û; 13.A: g'eyr û; 14.B: le'1 û; 15.B: mislê; 16.B: çengan; 17.B: gûşîna; 18.B: danîn; 19.A: Neman; 20.A;C: pişkafî û; 21. C: wî; 22.B: hergîz; C: tu kes; 23.B: kêşan; 24.B;C: xeberdan; 25.C: Ricif kir bo bi sed dilan bû aşiq; 26.C: Ew xeber be; 27.C: Ji ferq û singê xwe dane derbe; 28.C: Nema; 29.C: digo; 30.C: Dûxanê dil dibû mij ew perîşah; 31. C: av; 32.C: renc û; 33.C: cergê her; 34. B: sohte; 35.C: sohtî qelb; 36.B: srcadeê; 37.Secadeê ewraq; 38.C: Sed; 39.C: Ez ji kê pirsê bikem wî menzila; 40.B: canan; C: caran; 41.C: gazinê bikem; 42.B: wisalê bixuyî; 43.C: dûrya; 44.C: Lew disojîtim ewê ez;

SERÊ X 1.C: eyûnî murg'î mahî; 2.C: Ji tîrêşna mûnîr bû; 3.C: qet; 4.C: ev ecîbe; 5.C: qet wî; 6.C: bihurandin ew an şev; 7.B;C: nihêrî; 8.B: Ketin; 9.C: çi xoş; 10.C: lê kirî; 11. B: ab; C: dirijtê ab; 12.C: di destan dît; 13.C: Dinalî û dinêrî wî; 14.C: sûret; 15.C: Bibêj; 16.C: dengê; 17.C: Bibim qurban ji te; 18.C: Çeleng rabû melûl, aciz û jar, Xeber bir bo şahê rencûr û xûnxwar; 19.C: hat û dît ew mahê; 20.C: dan; 21.C: Digot; 22.B: Bi vî; 23.C: girîn; 24.C: Ji çesm û zexm û naleh û ah; 25.C: Selîm bît ew; 26. C: Nivîsîn wan yekayek cumle; 27.C: gerdena; 28.C: nermeê; 29.C: wan digo; 30.B;C: derdek zore; 31.C: Illa ku we vadeyî, Ku subhanê el lezî ebdeyî; 32.C: cavî; 33.C: wan yekaneş; 34.C: Ji bo; 35.C:

xeber da; 36.C: ji wî yekser; 37.C: kir şîn; 38.C: gazî; 39.C: Ji cem; 40.C: nalîn; 41.B: fetil; 42.C: Wellah; 43.C: kak û nivîştan; 44.C: uleman; 45.B: bînî; 46.C: bînin bi xerwan; 47.C: Telalan; 48.C: Dirhem; 49.B: Feqîr; 50.D: xanan; 51.C: pitir; 52.B;C: çû; 53.C: çend me da bû ew; 54.C: nebû parî we; 55.Peyra beytek tê, ku A,B-da tune:Welî her û ji halê şahzade, Dibû her lehze we sehet ziyade; 56. C: danîne; 57.B: mehweş; 58.B;C: tenha ; 59.B: kerbê; 60.C: Kesîr û jar bibû der şahzade; 61.C: şeb û roj; 62.C: bi ser; 63.C: hezîn bûn; 64.C: g'embarî; 65.C: Dixwazin em ji te; 66.C: g'emrevîneç; 67. A: Heta ew terekê det, wê biden terk; 68.B;D: ji camê; 69.C: ji; 70.C: ji; 71.C: Wekî dînan ji işqê bûye serxoş; 72.C: Di gel Salih we çend; 73.B, C: teqdir; 74.C: Wekî; 75.C: hemî; 76.C: rahet; 77.B: Çu; 78.C: çi anîn û nebû lê yek we lê yek; 79.C: Li ber her cewrekê dibît; 80.A: heyret û; 81.C: Nebû ku min we; 82.C: Ne mayîn min; 83.C: Wekî tedbîrekî wî; 84.C: Ji halê wî jî; 85.B;C: ez; 86.C: sewabe; 87.C: Dilê işqê tenê; 88.B: Çu; 89.C: nîne; 90.B: nale; 91.B: Îlacê; C: Îlac û; 92.B;C: dizanin; 93.C: beranber; 94.C: bînî; 95.C: Ji ah û naliya wî me bûye qesd; 96.C: biket sûrê xwe û; 97.A: bît û; 98.C: me çûne; 99.C: nakî; 100.A: yarîcanî û; 101.C: min; 102.C: Ku mueyyen bim; 103.C: Heta kengê tu surrê xwe; 104.C: were tu bike; 105.C: cumle û; 106.C: Seffyeke; 107.A: Sedayek ji wî naê; 108.C: pê libasê wan; 109.C: Bi şîranî wî gote yarîcanî; 110.C: naket; 111.Ev beyt li C-da hebû; 112.C: ew rengî; 113.C: mexmûr; 114.C: xwe girt xencer jî; 115.C: gotê; 116.C, D: halê; 117.C: şems û zuhaya; 118.C: Ehwalê g'emê ez ji işqê çi bêjim, çi eyan kem; 119.C: Nemerd û zêr û mehrûyê; 120.C: A'mê çi bibêjin der halê me qebûlin; 121.C: munîrem.

SERÊ XI 1.C: raya te; 2.C: ji halê wî; 3.C: cîger têk; 4.C: Ji du çehvan me av û xûn reşandin; 5.C: sûreteç; 6.C: girîni kefte xamuj; 7.A: bihîstin; 8.C: Hikayata; 9.C: Rûniştin em; 10.C: Bi tenha man; 11.D: badeç; 12. C: paşan hatin heft heb; 13.A: Bibêjin; 14.C: metirse; 15.D: Efwan; 16.C: em; 17.C: min; 18.A: şandyê; 19.B: û dîtê sûret; 20.C: vexwarin; 21.C: weh; 22.C: dil ew; 23.C: neqaşî; 24.A: Bintê; 25.C: şandin; 26.C: şandîye jî; 27.B:Sefwan; 28.C:li; 29.C: go, ew; 30.A: meşçule.

SERÊ XII 1.B: wusala; 2.C: gote; 3.C: mizgîn ji bo wî; 4.C: şah; 5.C: mizgîn; 6.C: Bedlîe; 7.C: bizan; 8.B: bihîst; 9. B: ji zewq û hem ji şadî; 10.B: purr bûn; 11.C: purr nav; 12.C: ruh û can; 13.B;C: gotê; 14.C: gurciyê; 15.C: Dilê şahzade sed; 16.C: Bi serxoşî, bi kêf; 17.C: Ji bo şahzade rabûn; 18.C: sedaya; 19. C: ji deng û sedaê; B: Dinê xoş bû ji bi wî deng û sedaê; 20.C: bilûre; 21.C: Ji diwanê kirin enwarê enwer; 22.B;C: dîlbend; 23.C: Herin hûn; 24.B: bigirin; C:bigrin; 25.C: cuwaba; 26.C: ket ew; 27.C: defînek zêr; 28.C: durr; 29.B: xuyê raha; 30.C: Ji vî emrê li ser me qat; 31.C: xwastin; 32.C: dibêjim çûne; 33.C: şerqê; 34.C: seranser; 35.C: rûyê; 36.C: key evê; 37.C: bibîyê vî; 38.C: sewda mislê;

39.C: Veşêrin; B: Nebîtin; 40.C: herdem; B: herroj; 41.C: Dibûrand rojê ewî; 42.C: hebîba; 43.B: merhem.

SERÊ XIII 1.B: ehê mehrû; C: ehê rû me; 2.C: hatin, nanîn tu; 3.C: qelaşt heta bi navê; 4.C: avê; 5.B: geştê; C: kefte; 6.C: haleyek; 7.C: Ji nû dîn bû û sewda mislê mecnûn; 8.C: nekir; 9.C: seranser; 10.C: dunya wan; 11.B: mehrûy; 12.B;C: mêrgê; 13.B: alime heqa heye sag'; 14.C: Ji g'emê te çûn ji bo te extyare; 15.C: Di gel; 16.C: hunermend; 17.C: Eger ji bo me neynî; 18.C: derdê me bese; 19.C: babî; 20.C: çûn; 21.C: mesrûr bitin ez rê û rehmet; 22.C: vexwarin; 23.C: Welê ney; 24.C: weger ne banya te bo me mewcûd; 25.C: Welê şahê weger çend ji xebardan; 26.C: heyin bo me bibînim; 27.C: canan; 28.C: izna; 29.C: iciz û; 30.C: nîşanek qet ji metlûb; 31.C: derdî; 32.C: di; 33.B: erdan; 34.C. Wekî Seyfulmuluk dî mest û mehcûr; 35.C: reng bi reng çûn qesrê heyştî; 36.C: keştîya xwe; 37.C: Di gel ah û nalî; 38.C: hem keyf û; 39.C: xelqê Misrê; 40.C: xalî danîn ew; 41.C: min çî bi kuda; 42.C: Nizanim ez ji halê wî çî zûda; 43.C: „Hiza beyt Asim şah“; 44.C: Bêşikem dil min; 45.C: min sal firaq; 46.A: ser û; 47.C: zaq; 48.C: Ji iştîyaqê şewqê an yarê g'erîb; 49.C: Ey hewar, bi kuva çû ew serefraz; 50.C;D: min; 51.C: g'ereb.

SERÊ XIV 1.C: Ji; 2.D: mahê; 3.C: Ji; B;D: Li; 4.C: îbnî; 5.D: Efwan; 6.C;D: muhbetê bim; 7.D: pê dibin; 8.B: da ku; 9.B;D: durrê; 10.A: muhneên; 11.C: neg'me xanan; 12.C: Li paşan şeh; 13.B: ew; 14.B: bûn; 15.C: hatin; 16.C: Misirêne yan; 17.C: meqsûd û; 18.B;C: zai'; 19.C: meqsûd û; 20.C: we hem; 21.B: xaqanê; 22.C: dê biket; 23.C: teqrîr û; 24.A;B;D: efwan; 25.C: Dibîn xaqanê çînê, şahê Feg'fûr; 26.C: xweg; B: cumle rabûn; 27.C: kirin; 28.C: te'in; 29.C: wan dan; 30.B: kir şahê; 31.B: sexaê wî; 32.C: Li paş wan; 33.C: Çil ro; 34.B: dîwanê; 35.C: hatine; 36.C: beranber; 37. Beyt ji C hildaye; 38.A: burbut; 39.B: rojê; 40.A: çîn; 41.C: da navî.

SERÊ XV 1.C: Wekî; 2.B;C: Feg'fûrê; 3.C: wê; 4.Herdû beytên jorîn C-da bûne yek beyt: We rengî gote wan wî pîrê dêhqan, Çiqasî ez geraem der ber û behran; 5.C: Ne min diê ew, ne; B: ne min ew dîn, ne gûş; 6.B: gelek; 7.Beyt B-da tune; 8.B: çû; 9.B: ken; 10.C: da; 11.B: bûne; C: bûbû; 12.C: wî; 13.B: birûsk; 14.C: bi serda hate xwarî; 15.B: Ji wê birq û birûskê û baê nexoş; 16.B;C: bû dîsan; 17.C: sena; 18.B: ez; 19.C: her roj û hem şev; 20.C: fedl û; 21.C: bayek; 22.C: Di heft; 23.C: nuve; 24.C: Wekî; 25.B: Ji wê birq û birûsk; 26.B: hatin; 26.C: bûne; 28.C: Dibêjin şahzade bûye hişyar; 29.B: mah; 30.B: eşa'rîn; 31.C: ji destê eşîyaqê; 32.C: Sohtim wê narê Firaqê; 33.B: bi kovan; 34.B: Kenanim ez; 35.G'ezel li C-da heta vire, beytê mayîn tunene; 36.D: ji; 37.D: wê; 38.D: hîlalan; 39.D: heyran û dînim.

SERÊ XVI 1.Welê gemîya Sedê; 2.C: çûye berbi; 3.C: zûda; 4.D: Di gel; 5.C: Ya; 6.C: bo te; 7.C: ku; 8.C: Biçîn da bixun; 9.C: loqme; 10.C: Kişandî: „Ey, way, wey; 11.C: rûyeş; 12.A: Ku em têdayîn û diçin li rêye?; 13.C: „Ji dûrda hatine çend gemîye û merd“; 14.C: cuwanan; 15.C: bûne; 16.B: û ji zengî; 17.uhC: bû sed ji; 18.C: temamet; 19.C: Bide ber xwe çîyayek dê bike erd; B: erd; 20. Karê wan cumle înan; 21.C: hev; 22.B: kulabê; 23.C: ceng bi; 24.C: nîze, şemsîr; 25.B: Ji ber derbê rim û sinanê zehrab; 26.C: Dibên bû xûn û ew behr û we ew ab; 27.C: vala bûn; 28.B: Digotin; 29.C: tamam bûn; 30.B: ewan; 31.C: gurz; 32.C: ba şûr û tif û hem; 33.C: Ji dused zêde ji wan kuştin bi xencer; 34.B: elmas; 35.B;C: Dibêjin; 36.B: Go; 37.B: wî sîyahî; 38.: Birne; 39.C: bag'ê; 40.C: sêr; 41.C: bûne; 42.C: Ji ba pirra digo; 43.C: bibin em ta; 44.C: Du ebrû; 45.C: deryan; 46.C: wesmendan; 47.B: zift; 48.C: lêvaa jêrîn hate; 49.C: qalind; 50.C: diranê; 51. C: jê; 52.B: diçûn; 53.C: dehla; 54.B: Bi serda bû ji; C: Di berda bû; 55.B: kemer dabû; 56.C: Dused me'an kember zêr bû li piştê; 57.C: çûye; 58.C: muhbet; 59.Ev herdu beytên jorîn A-da tune; 60.B: Qîçaq; C: Fencaq; 61.C: bi navdengim; 62.C: çewan tu; 63.B: tuyî; 64.A: bigir, ey; 65.B;C: bûye; 66.B;C: Bi wan bînin herro; 67.B: Herroj tanîn; 68.C: Bi wan anîn herro; 69.C: bûya; 70.B;C: Dê; 71.C: an; 72.A: û revîn; 73.C: Li; 74.B;C: bûne; 75.C: wan; 76.C: teleb her canib şandin; 77.B: bit dê.

SERÊ XVII 1.C: dîtin ewan; 2.B;C: Neşim; 3.C: herdu g'ulaman; 4.C: ji teaman; 5.C: Sefwer nakin em esla di behrê; 6.B: Nêzik bû; 7.C: Ku nêzik dîn ewan; 8.C: dîtin; 9.C: angur; 10.C: hede xuda kir; 11.C: „Bikin; 12.C: Bû; 13.B;C: ku; 14.B: naket; 15.C: qenc, eger; 16.C: çû çihil şev; B: çû ta çihil şev; 17.B: Li ser behrê çî cayî û çî mikanin; 18.B: feşne; 19.C: hem celale; 20.C: bilind bû xulqê; 21.C: ji; 22.C: Gehî wek tûtiyan bû; 23.B;C: raz; 24.B: yesemîn û serû û hem; 25.C: rozêgarî; 26.C: dîtin hatin; 27.B: kirî; 28.C: bûn; 29.C: merdek; 30.B: zîştî; 31.B;C: purr; 32.C: yek; 33.C: Bi sef sekinîn bê hed cumle segser; 34.B: we; 35.C: mêhwan; 36.B: bînine ber; 37.C: Dilê birçî bi wê têr ke ji etam; 38.C: kelaman; 39.B;C: dibên; 40.C: xarinê we firaqê; 41.C: gotin; 42.C: Ji; 43.C: mame; 44.C: min ji; 45.C: ewilda; 46.B: hate; 47.C: gemîye û jê ker kirim; 48.C: bun mal û milk û; 49.B;C: bozeng; 50.B: purr zeng; 51.C: bi ser; 52.C: xwera; 53.C: qesr û mal û zewc û mulket; 54.C: erwan; 55.B: doxterê; 56.C: Tu; 57.C: dît û; B: dîn, ne; 58.B: meyxor ez;

SERÊ XVIII 1.C: xarinê; 2.C: temsîyê; 3.C: bi heng û heng; 4.Danî ser serê xwe bêg'em; 5.C: Wekî şemsê ku dunya kir; 6.C: derkeft; 7.B: Gelek; 8.C: Gelek enwaê ji; 9.C: Temaşe kin mekanê durr û elmas; 10. C: rabû yaran; 11.C: Hilanît yek ji; 12.C: Go bavêje evê qîmet çû nîne; 13.C: du sal bûn; 14.C: Çiraya; 15.B: zînek; 16.C: merdê; 17.B: li; C: û; 18.A: rêyî; 19.C: çûn ber perê behrê; 20.C: Tewekul dane xudayî; 21.C: umîde;

22.B: wî du dest ez can berîd; C: ez can berîde; 23.C: pûr derda we; 24.C: bûn li; 25.B;C: keftê; 26.C: ber; 27.C: ser; 28.C: ewî dî teyrê; 29.C: Wekî; 30.C: bû; 31.C: Ji darê hate xwarê ew dilawer; 32.C: çû; 33. C: roj û şev bûne; 34.B: bûn wî; 35.B: nezer kir; C: lê nezer kir.

SERÊ XIX 1.C: eta; 2.A: bû; 3.B: para; 4.A: Revîtin; 5.C: nihêrî-yû; 6.C: Mucela; 7.B: çû û kir; 8.C: şaha kir qest; 9.C: Ji; 10.C: ez; 11.C: Muneqeş bû du dergeh bît ji mahî; 12.C: Ji serwehş û ji teyr; 13.C: kalan; 14.B: murese'; 15.B: kebik; 16.C: çihil car; 17.B: muelerq; 18.C: ket; 19.C: nazenîn; 20.A: jê; 21.C: Ji ser wechan; 22.C: demê; 23.C: ji xew ew xweş; B: nên bû hişyar ji bêhoşî; 24.C: gihan gazî deng; 25.C: Ji xew ew xweş; B: ji xewabê xwe; 26.C: nezer kir wî ji pace ez; 27.C: asîmê; 28.C: meha; 29.C: danî text; 30.C: ev; 31.C: kirî; 32.C: texte; B: text û; 33.C: li; 34.B;C: halê; 35.C: Welê tu halê xwe bo min; 36.C: dijwar û tehl û hat dikir; 37.C: eslanekî; 38.B: li; 39.C: Bi min go: " Tu metirse; 40.B: can; 41.C: Ji dîdarê to em ez ji dil me aşiq; 42.Ev beyt A-da tune; 43.B: bin; 44.B: ji xemrê bûseê leb; 45.C: temaşayî; 46.B: cehdê kir, min wî; 47.C: mestê wî kirime bi azad; 48.B: „Ey şîrîn mahî, çî; 49.B: mestê; 50.C: anîn me xwerinê carê; 51.C: me daê; 52.C: purrtir; 53.B: min kirî; 54.C: heyvê; 55.C: ew; 56.C: bûn deh sal; 57.C: Tu izhar ke go halê; 58.C-da dewsa vî beytî du beytê dinê hene: Dîbên şehzade go: „Ey raheta min, Qîrar û hoş û sebr û taqeta min. Gelek dûre û dirêje qîseta min, Bi îşqa xwe hebandî dîlbera min; 59.C: Ji ehda hatina wî maye.

SERÊ XX 1.B: der; 2.C: ser wê çin; 3.C: kirne; 4.B: Gelek ew ma; 5.C: go; B: „ehzade eger; D: ew; 6.C: carek; 7.C: Bi sed carî dipûsî; 8.C: em sê xuşk bûn; 9.C: kemale; 10.C: nebû bo da û babê min çû; 11.C: bi cumle; 12.C: kemle hemle; 13.C: hebû bo babê min; 14.B: heft; 15.C: hîme; 16.C: hemla; 17.C: Bi emrulle dibê rojek; 18.C: rûniştî ew di; 19.C: li; 20.A: maderem; 21.C: dengê; 22.A: xûb û dilber; 23.B: hebîb û; 24.C: yar û; 25.C: te; 26.C: dîlbera; 27.C: dîlber û ba; 28.C: Welê weku bişkojê zêr bû du bistan; 29.C: weda; 30.B: nazik bibe; 31.B: sebrê; 32.C: wê qet meke; 33.A: mah û; 34.C: Ku diêtin bag'ê me; 35.B: roj; 36.B: Wekî tu; C: Wekî wê; 37.B: şug'ûlê rast.

SERÊ XXI 1.B;C: nizanîm; 2.C: Çi rengî tyêt ji; 3.C: şahzade kir purr ah; 4.C: Çi muqdare ji bona; 5.A: cin û; 6.C: tamam bit; 7.C: we sù hat ew; 8.C: kerem; 9.C: kirîne; 10.C: dikî min bikî rencûr; 11.A: hat bi; 12.B: ewê; 13.C: Bi şadî-yû fereh çûn ber; 14.B: avît; C: avêtê; 15.Dewsa vî beytî C-da du beytin: Eceb peyde bû ba û toz û hem kerd, Ji ber baê dihejya qesr û hem erd. Ji nageh dîn be derket ew di kerdê, Wekî kuhek be ruh kefte erdê; 16.C: dîlberê; 17.B: medh; 18.C: dilsoj; 19.C: mirarî; 20.B: teqrîrê; 21. C: we; 22.C: û hem ehd; 23.C: diket; 24.C: Ji pêş hebîba enwer; 25.B;C: girtin; 26.C: wan; 27.B: Xiraman; 28.C: û xoş

qadir; 29.C: mehzûn û; 30.C: heq we; 31.C: Rîya; 32.B: adekî; 33.B: mahê; 34.C: Ji behrê-yu feweke; 35.A: xewra bû; 36.B;D: Çeleng rabû ji xew ew; C: Çeleng rabû şîrîn û; 37.B: kirin; 38.B;C: dîtê; 39.C: rengê; 40.B;C: çû û kir; 41.C: dîlbend; 42.A: pence; 43.C: merd; 44.C: derd; 45.C: wek bê; 46.C: rê-yû; 47.B: terîqê; C: terîqa; 48.C: navê; 49.C: hîna; 50.C: Misrê; 51.C: çûye; 52.C: kir; 53.C: dît li wê mîrê; 54.C: ku g'erîbe mîrê hemser; 55.C: bibêje; 56.C: ez; 57.C: mug'dare; 58.C: muhbet; 59.C: daye; 60.C: Tacelmulukê mîrê mehweş; 61.C: dîwanê mest û serxweş; 62.B: çû.

SERÊ XXII 1.Hemam kir, 2.B;C: şemsê; 3.C: nazik; 4.B: pakê; 5.B: bin; 6.C: bûn ji bo wan; 7.C: textek ji zêr; 8.B;C: Ji wesfê; 9.B: bûn ji wana rû; 10.C: dana jê bi ibret; 11.C: nûra; 12.B: hebîba, nazika; 13.B: bûse dan ew; 14.B: bûne; 15.B;D: Dipirsîn jê; 16.B: Ey şehzade, mesrûr be û dilşad; 17.B: be; 18.B: miradî tu; 19.B: mahê; 20.C: balif; 21.C: Du textê zêru tê danîn; B: danîn; 22.B;D: bûyî; 23.C: dibexşîn; 24.C: yeqîn; 25.C: ew; 26.C: ebrê; 27.B: hicr û; 28.B: hicran û; 29.B;D: xemr û; 30.B: g'embarê; 31.A: sau'd; 32.C: G'em û end û law; 33.C: wesil; 34.B: Dikêşe; 35.B: biçûya; 36.B: bibirya; 37.B: roj; D: roz û; 38.C: kirye; 39.D: herîqê; 40.C: hiznê; 41.B: mêjîn; 42.A: bixuyin; 43.C: nav; 44.C: Di dilê minda; 45.Ji zerbê daran we ez kirim giriftar; 46.C: ber; 47.C: dest di gerden; 48.B: te em; 49.B: te em; 50.B: bûn û ew; 51.C: yek bi yek; 52.B: kuşade; 53.B: şahê; C: şah; 54.C: Rûniştin; 55.C: di dîwanê; 56.B: munîrî; 57.A: kir bi; 58.C: bûn; 59.C: Bi hevra rabûn gotin ew bi carek; 60.B: çekanbaz; C: çengaz; 61.B: Di gel qesrek; C: Di gel textek; 62.B: şahiyê; 63.C: xanim çûn; 64.C: bînin; 65.C: zemîrem; 66.B: Ji hemra.B: talibe.

SERÊ XXIII 1.C: rûniştî; 2.B: bi hemrazî; 3.C: rawiyan ew; 4.C: Bibêje; 5.B: Ji wextê tu li min; 6.C: ser te cefa; 7.B: zulf û enberê exbar amîz; 8.C: dijwar hat; 9.C: nêzik bû; 10.A: Ji mat û matan; 11.C: merdem; 12.C: şew; 13.C: xordem; 14.C: birim; 15.C: Di behrêda; 16.C: nabin; 17.C: seranser; 18.B: naket; 19.C: naket dused kitab bi defter; 20.B;D: birim ber; 21.C: Ji; 22.C: bimînîm; 23.C: bi mislê; 24.B: Qefes kirim û ji wan ez mame purr heyr; 25.C: Dida min wan; 26.C: Ecîb mabûm; 27.C: Didane min; 28.C: Dibên şehzade; 29.C: tu ji; 30.C: Muqefes ez hilanîm wan; 31.B: mişqûl bi; 32.B;D: heta bi; 33.C: hilanîm; 34.C: ser; 35.B: ji; 36.C: Bi şeker û badam; D: gîyan; 37.C: bezekan em bixun; 38.B;C: Muhessel, ez hilanîm wan; 39.C: Ji dūrda; 40.B;C: Nebû; 41.B: dîn; 42.B: hatê; 43.C: hatin wan vëkra; 44.B: di pîr; 45.A: Yeka-yeka; 46.B: Xilas kir min ji; 47.C: hemd û sena; 48.B: Ji dest min; C: Ji destê min; 49.A: bo; 50.C: seyran; 51.B: Hikayet wî; 52.C: Çehvnêrin; 53.B: Werîn.

SERÊ XXIV 1.C: dilberan xoş wê; 2.C: ber; 3.C: muenber; 4.C: munewwer; 5.B: çendan; 6.C: Li ser xoş û; B: Li ser husn û; 7.C: Tecellaê; 8.C: nabû; 9.B: Tilûa'; 10.A: Kûkuîk; 11.C: mizgînem; 12.C: çadirê ji; 13.B;C: bûne; 14.B: mahê; 15.C: şubhê; 16.B: kebiç; 17.C: Direqîsîn ber bi xwe bûn; 18.B: Bi mahê; 19.B;C: Serwebanûyê; 20.B: çadirek; C: çadirek ji; 21.B;D: çeleng; 22.C: Çeleng rabûn û çûn ba; B;D: xoş ba; 23.B;C: naze; 24.C: behrê; 25.C: Bibêje; 26.B: sekran; C: kesrê; 27.C: Xelas ket te ji mekarê wî; 28.C: Ji bo min bû sebeb yekî; 29.B: xerdmend; 30.B: bin; 31.C: Ta axir; 32.B: Ji dil guhdar bû; 33.Bi eşaran bi yek tenbûr û; 34.C: dengê; 35.C: Ji nav behran deranîn; 36.B: tê; 37.B: Ji; 38.B: ba; 39.B: sûretê te; 40.D: Ku; 41.B: bûyî; 42.B: Bû metlûbê wî hem; 43.C: Bû meşoqê rûyê talibê; 44.C: şîrîn ku Melke rabû ew; 45.C: Dizanî; 46.D: Dirêhtin; 47.C: Diket ker-ker libasê xwe; 48.C: Go:“ Çewan kem; 49.B: roj û; 50.D: renc û.

SERÊ XXV 1.C: wechan; 2.C: Enberê; 3.C: zahir; 4.C: uşaqan; 5.C: Ji çehvê wê; 6.C: waslê pê û dest; 7.B: Ji; 8.A: Bi daim; 9.B. bûye renc; 10.C: sînesade cahê; 11.B: nihane; 12.C: nazik perwerîde; B;D: naz perwerîde; 13.C: dîdem; 14.B: ya; 15.C: Ji ew gustîl û ji ew xatem; 16.C: rica û; 17.B: Ji bona aqil û ulmê; 18.B: zarî û; C:Dizarî-yû; 19.B: G'erqê; 20.C: Ji derdê muhnet û qesrê serî zer; 21.C: germ-germ; 22.C: nerm-nerm; 23.C: me; 24.C: we; 25.C: Miradê şahzade û; 26.B;C: dikeyn; 27.B: xud; 28.C: Ku ew hemî ji bona te belayî; 29.C: maderem; 30.C: Nerm go Melkeê bedrê; 31.B: cîkî; 32.C: bibîne; 33.C: Li ber te şerhê halê xwe bixuyne; 34.A: şekeryar; 35.B: erabek; 36.C: Di weqtê ez ji te cuda bûm; 37.C: tên we; 38.C: Dilê min pur muşewêş bû; 39.C: bên ew ji çehvê nêrgizî xale; 40.B: Siyahpûş we; 41.C: Siyahpûşê birîndare; 42.C: telebkarê; 43.C: di fîncana; 44.C: ew şahê; 45.B: Dawûdî; 46.C: dêm we; 47.C: gelek; 48.C: rencûr; 49.C: çehvê; 50.C: g'emzadeê; 51.C: rencûr; 52.D: feyrûz; 53.A: piştê ew bêhiş; 54.C: şeb; 55.C: afg'an; 56.C: xend; 57.B;C: kafûr û; 58.C: dan lêv li ser lêv; 59.C: xumar; 60.C: tu; 61.D: weha; 62.C: bikira min tu bi; 63.C: îlahî ji; 64.C: birîndarê; 65.C: Bi destê rastê; 66.C: hilîni;C: Tu; 68.C: bikem; 69.C: bi; 70.B: ya; 71.A: dîlberek dî; 72.C: be bo; 73.C: bi te; 74.B: sidqê; 75.B: bîme; C: bibim bi; 76.B: enwerî; 77.A: meskîn; 78.A: te; 79.A: te; 80.C: selbê; 81.B: dîrê; 82.C: dibim; 83.C: bizan; 84.C: sohtîme; 85.C: nêzîkî hulqûm; 86.B: pûran; 87.C: estê xwe; 88.B: dest û; 89.B: can; 90.C: şehê; reng şeh dî; 91.C: ez wê wusalet; 92.B: û xîyalî; C: û xîyalet; 93.C: bûn wasil ew pîrr nedaî; 94.B: dildarê; 95.B: işq û; 96.C: ez bêderman; 97.C: terîqet; 98.C: dîlberan; 99.C: Weha reng digotin; 100.B: digiryand; 101.B: butan; 102.C: nihayet; 103.B: hemzareê; 104.C: ez bîdem wan; 105.C: Efyat û.

SERÊ XXVI 1.Bû; 2.C: bûm canê; 3.A: vexwarînC: Wekî em şîqîn nêzîk û hem dîr; 5.C: Li cem hev em bibin; 6.C: Wî dî şehzadeê şîrîn perîweş;

7.C: Letifa nazika; 8.C: Çi bêjim ez ji wan bit ew hewale; 9.C: Kerem ke; 10.C: te seranser; 11.C: ez dê bi bez bêm; 12.C: û bi bez bêm; 13.B: dil bi şûd; 14.C: Ey şahê; 15.C: Dê hasil bê miradê me bi mader; 16.C: bibêtin; 17.D: wê; 18.C: herdan; 19.C: xoş; 20.C: bi; 21.C: nizanin; 22.C: Dinalîn; 23.B;C: ejnû; 24.C: Dikêşa ahê herdu; 25.C: g'em; 26.C: nexarê; 27.C: cumle eflak; 28.C: bi zarî; 29.C: dikuştê; 30.C: We rengê deng û sêdaê şêrî pur nûr; 31.B: kebê; 32.C: hêja min kirî şerm; 33.B;C: vê; 34.C: Mufereh gote Melke û; 35.C: enberîn; 36.C: ew; 37.C: xeber û; 38.C: Çi rengî dil birin; 39.C: Ji wî dengî dilê mirya diket hey; 40.C: meratib û; 41.C: lefz û sazê; 42.C: meclisê tu wî; 43.D: exyar; 44.B;C;D: rengî; 45.C: ken; 46.B;C: ney; 47.B: ringande çeng û têlê tenbûr; 48.B: û we dil; 49.C: hubê; 50.B: çehvan; 51.C: işqê; 52.C: dil li min; 53.B: nale wekî; C: nalem wekî; 54.A: tên; 55.C: qelb û hin; 56.C: şekeryarê; 57.C: camê; 58.C: min; 59.A: kemeçe çu nîg dan; 60.C: min; 61.B: xwe; 62.B: -da ev herdu beytên jorîn gihîştine hev û bûne beytek: „Wekî dît Melke û Bedrê kemale, Bibêjin,-go,- çi sûre ew hewale.“; 63.C: nerm û du; 64.C: Di cewher; 65.C: bû; 66.B: şahzade û; 67.C: eşq; 68.C: rû; 69.B: Ji çehvê wî dirêjî; C: Ji çehvan ew dirêjet; 70.C: liqayek; 71.C: çiyê; 72.B: nûrê; 73.C: şîrîn; 74.B: nûrê; 75.B: derdmendim; 76.B: dinalin hem; 77.C: Dinalim ez; 78.C: wî ji mira; B: mira; 79.C: meqsedê te; 80.C: biçin; 81.C: xudawend dê; 82.B: husnê; 83.C: nehin; 84.C: Ji derdê; 85.C: misiryan; 86.C: Nebûm; 87.C: min ji; 88.C: ew; 89.C: ez ji destê; Bi ew; 90.C: me dîtin; 91.C: Bibînim nûrê; 92.C: Mekêşet; 93.B: Bi ezana.

SERÊ XXVII 1. C: Letifa; 2.C: ew; 3.C: Divêtin; 4.C: kir serê; 5.C: dibin der; 6.C: yaranê; 7.C: gerdênê; 8.C: min; 9.C: Ji xaliqê tu bike hêvî, ricaê; 10.B: mira; C: ji minra; 11.C: Hilanî destê xwe Sedê; 12.B;D: dua ku; 13.C: ew here; 14.B: ah; 15.C: bû; 16.C: g'erban; 17.C: dinê ma mîslê fincan; 18.C: Çû hucra xwe we; 19.C: şerebê nûr; 20.C: bît.

SERÊ XXVIII 1.C: meke; 2.C: Gehî karê wî hem hizn û girîne, Gehî şabûn û keyf û g'emrevîne; 3. işqê diîsa; 4.C;D: darê; 5.C: kirine; 6.C: nînî; 7.C: tene; 8.C: bihîst; 9.C: Du dest û gerdênê wî; 10.C: pê; 11.C: Ji halê xwe we ez zûda; 12.B: cumle; 13.C: me em qisas; 14.C: risas; 15.C: Raê; 16.C: min nîne qet; 17.C: Welê şehr we bab û dê çi kire qem; 18.B: min da; 19.C: Ji min dîtin ewan; 20.C: temaşa şekerxend; 21.C: Bi hevra gotin; 22.C: aqil û we mendan; 23.C: mehbûsê; 24.C: lê kirin; 25.C: G'eribim; 26.A: muradem; 27.D: dîn; 28.C: işqa; 29.C: Ji işqê têrê sewda, hem muhbet; 30.D: bûm.

SERÊ XXIX 1.C: bawarî ba; 2.C. Mucîbî; 3.C: Xwe rût û tazî; 4.C: Ze'f û zer bû, xar bû; 5.C: Go: „Ey ummê, şefağ lazime bi sebrê; 6.C: Welakin kanê şehzadeê Mîsrê; 7.C: sohtê; 8.C: hatin birin ew; 9.B: işqê û; 10.C: ew; 11.C: hatine we ew; 12.B;C;D: geryan; 13.C: ehbal lêkirin; 14.C:

merd û we zor; 15.C: merd; 16.B: birûskê; 17.B;C: tanî; 18.C: dibin; 19.C: Ku bizivirandin gurzê; 20.C: bûne; 21.C: mîr û wezîran; 22.C: esid hezar mêr hat bi defter; 23.B: birûskê; 24.C: girtin; 25.C: şimşîr; 26.B;C: bûn; 27.C: zend û; 28.C: Di; 29.A: Ji; 30.C: wan; 31.C: şehand; 32.C: yek; 33.B: heyva; 34.C: xoşik; 35.C: xumarî; 36.C: umîd û warî; 37.A: geracbeşî; 38.C: mufeser; 39.C: rawaya; 40.C: kirye; 41.C: siyah û; 42.C: mahê; 43.C: min; 44.C: kelek zemîrem ew; 45.C: şehzade wî; 46.C: nabîte namdar; 47.C: umrim; 48.C: Benîadem hene; 49.C: Li hespê boz û; 50.C: Sebeb çi reht kir qelb û; 51.C: ew; 52.B: gotê; 53.C: xususa şehzade; 54.C: ehd û; 55.C: nehatine ne hisn û xet; 56.C: tê bibînî; 57.C: şemşîr û; 58.C: Jin; 59.C: mexmûr; 60.C: wê; 61.C: camê; 62.C: çi. 63: Ev beyt tenê C-da heye; 64.B;C: Dilê; 65. C: rehmetê.

SERÊ XXX 1.C: kir li ser ew qelb û; 2.B: surrê; 3.C: dîwan; 4.C: kir bi neqaş û bi; 5.C: feraşê axzer; 6.C: zêr û; 7.C: g'ulam, sef li pêş; 8.C: ket; 9.C: kirin; 10.B: medhê; 11.C: Werengî wî dua, medh û sena kir; 12.C: Dilê şahê şîrîn; 13.B: aqilê; 14.B: nekuştî wî ez; C: kuştî ew; 15.C: min kir ew; 16.C: Di gel; 17.B;C: tacek 18.B: da; 19.C: serancam; 20.B: fedail; 21.C:Ji hatinê; 22.C:beranber; 23.C:wan; 24.C:wan xoş.

SERÊ XXXI 1.C: reyhanan; 2.C: pê; 3.C: bûn; 4.B: kore; 5.C: Ji dil g'emê wê rojê; 6.C: cerhê; 7.B;C: yarê; 8.C: dîlberan; 9.C: jê; 10.B: zulfê; 11.C: hev; 12.C: purtir; 13.C: bikey; 14.C: Ji ber ahbal digotî; 15.A: dîheng.

SERÊ XXXII 1.B: cinan; 2.A: enba'; 3.C: Di gel; 4.B: beraber; 5.B: bûyî; 6.B: zewq û; 7.A: ma li bela binê; C: me li wan; 8.B: şûşê; C: şûşe û; 9.C: leyîstî padîşahan; 10.C: mislê mahan; 11.C: rimbazîtî; 12.C: wezîr; 13.C: wê; 14.C: mertalê; 15.C: nemabûn; 16.C: sema bûn. 17.C: di şahan; 18.B: purr; C: wan; 19.B: pake zaf û pur; 20.B;C;D: şeyda.

SERÊ XXXIII 1.C: qelem; 2.B: Firaş û balgîyê ez; 3.C: Firaş û balgîyê exzer; 4.A: roj û; 5.B;C;D: bext; 6.B;C;D: hate; 7.B: Li ser wî; 8.D: nam'; 9.B: yeşem; 10.C: Qerewemayîl; 11.B: ey; 12.C: eynye nazile; 13.C: seyran cemala; 14.C: ehbal ew; 15.C: wî dua; 16.B: Ji duayan; 17.B: destê; 18.C: zêrîn; 19.C: ser; 20.C: peyaê; 21.C: Dikir dilxoş we zêrîn û; 22.C: bû; 23.C: wezîran; 24.C: şane; 25.B: şahzadeê.

SERÊ XXXIV 1.A: li qewsa; 2.C: şahêbazî; 3.C: ya; 4.C: suala ez dikem; 5.C: Ji erfana we dilê elim û; 6.C: mufereh bin; 7.C: zanî wê; 8.C: şahim; 9.C: bo cin û insan; 10.B: bo ins û can; 11.C: dê biket; 12.C: jinan; 13.C: mirî; 14.C: Di gel yekû hene dê biçin; 15.C: jinê bitin mirîne; 16.C: şahim zêdeye; 17.B: ava be; 18.B: ev; 19.C: Tu caran nabînê; 20.C: ehê ehbal we go: „Ey mîrê; 21.C: ecisanan ew çi tişte kêmîrî dest; 22.B: tişte vê; C: tişte di; 23.C: bê nûr; 24.C: Go: „Ey jî ruhê ku peyda bû çi tişte;

25.C: Xudayek bê nezîr û zulcelale; 26.C: Li ser eşyan qedîr û pur kemale; 27.C: Li ser wî xef nîne; 28.C: bi hevra tacek; 29.C: Ser şehzade reşandin; 30.C: binalim ez; 31.B: pur; 32.C: uşaqan; 33.B: roj ji; 34.A: tacê; 35.C: selamîn; 36.C: Di gerden bû durr û le'1 û cewahir; 37.C: bejna; 38.B: zêrê; C: cewahir zend û; 39.C: Ji wan; 40.C: canê ew; 41.C: şerbetê şîrîn; 42.C: rû.

SERÊ XXXV 1.B: şemsê; 2.C: Ji işqan bişkiwtin; 3.Surrê; 4.B;D: du; 5.B: nake; 6.B: rabit jê; 7.B: Di; 8.A: tenbûrê ûdî.

SERÊ XXXVI 1.C: Ji; 2.C: enberan, ew zulf û xalan; 3.C: Ji perdê heftê derket mîrê mehweş; 4.C: dilxweş; 5.C: dîbûsî; 6. C: Bi destê xweyî; 7.C: Li wucud we; 8.C: bit; 9.B;C;D: Reşandin wan; 10.C: qudrêtê purr; 11.B;D: Wekî baran dibarî; C: wekî baran dihatin; 12.B: Ji cebrût û melkot; 13.C: we layat; 14.C: bena sat; 15.C: xewn; 16.C: emrê wî; 17.B: min tên hesude; C: min tên wucude; 18.C: ser.

SERÊ XXXVII 1.B: Ji vî qenc û selahter; C: Ji vî qenc purr selahet; 2.C: Li nik serwê wereng ew; 3.C: Bisek carek bixwazim bo te; 4.C: carê; 5.C: newa'ê; 6.C: Eta kir şahê; 7.C: pê eqîq û; 8.C: Li rû, sûretê; 9.A: zîn ; 10.C: mirarî rêz dilû we; 11.C: Ji huzna wan dinalî; 12.C;D: senewber; 13.Ev pênc beytên jorîn her li C - da hebûn; 14.C: bibînin; 15.C: Li bala wan dikir hem xoş; 16.C: text, firîn; 17.C: wan dua kir wan bi; 18.C: hevra; 19.C: dişandin; 20.C: mah; 21.B: Bibû; 22.C: kir; 23.B: Ku çend; 24.C: Melka şîrînxal; 25.C: „Ey şehzade; 26.C: Eger tu bibîni; 27.C: Ji şehzadeê exmûrra; 28.Ev herdu beyt her C-da hebûn; 29.C: bilûre; 30.C: dilê wan bûne; 31.C: bi derkeffî di g'urbet; 32.C: çûn; 33.B: muntezer xatir ji a'mê; 34.B: mehzûn; 35.A: libas anîn; 36.Ev şeş beytên jorîn her C-da hebûn; 37.Ev beyt her C-da hebû; 38.B: Bi medh û dua bûsa da; C: Dua kir, bûsî we; 39.Ev beyt B;C-da heye: Beytên jêr li ser bingeha A,B,C hatine avakirin; 40.Hilanîn ew li bala çûn efarît; 41.Ev herdu beytên jorîn C-da hebûn; 42.C: Bilind.

Rêza kurtnivîsa:

Bin. - binhêre

Himb. - himberîhevkerin

e. - erebî

f. - farisî

înf. - înfînîtîv

pr. - pirranî

PEYVRÊZ

- Ab (f.) - av
abad (f.) - avedan, xên, jîyandar
kohne abad (f.) - dinya avadan, dinya xên, dinya kevn
abadanî (f.) - xênayî, avedanî, jîyandarî
ac - diranê fil
aftab (f.) - ro, roj, hetav, tav, xor
ag'az (f.) - pêşin, destpêkirin
ag'ûş (f.) - hemêz, baweş
aheng - cejn, şadî, eyd, awaz, xoşî
ahû - 1. xezal; 2. Eyb
alî (e.) - bilind, mezin
alîcâh (e.) - bilindcî
alî cenab (e.) - merivê navdar, berz û bilind
alîmenseb (e.) - cîyê bilind, merivê xawen cîyê bilind
alîmîqam (e.) - cîyê bilind, merivê xawen cîyê bilind
a'm (e.) - giştî, xelq. (*Bin.*: xas û a'm)
a'mê (e.) - bi giştî
amîz (f.) - peyvçêkire ji peyva *amîxten* - têkilkirin tê. (*Bin.* amîzmehbet (mehebetamîz); enberamîz; muenberamîz; şekeramîz)
an (f.) - ev
aqîbet (e.) - aqûbat, axir, dawî
araik (pr., e.) - erk, erak, dara bînxweşe
arasite (f., *inf.* Arasten) - rêk û pêk kirin, neqîşandin bi sûret
aremîden (f.) - hêsabûn, bîstandin, hêsanewe
arif (e.) - zana
